
ABDULAH OCALAN

# EM RAST NÊZÎKÎ RASTIYA KONGREYA 5. BIBIN



Berga 1.

# ABDULAH OCALAN

## EM RAST NÊZÎKÎ RASTIYA KONGREYA 5. BIBIN

**Dahûrînên Cotmeha 1994'an**
**Berga 1.**

*Weşanên Komîteya Rêbertî*

**Werger:** Ayten Amed
**Redekte:** Ayten Amed, Hacer Hilal

**Cihê Çapê:** Çapxaneya AZADÎ
**Dîroka Çapê**: Nîsan 2019

**NAVEROK**

**Rêberê Min Rêgez, Rêberê Min Gel,**
**Rêberê Min Welat, Rêberê Min**
**Darêzên Nirxên Mirovatiyê Ne!**

**Di Xeta Leşkerî De Rê Girtin, Ji Gelekî Xayîn,**
**Afirandina Gelekî Azad E!**

**Pêşengên Gel Hesabê Tiştên Ku Dijîn Jî,**
**Dadgeha Wê Jî, Di Serî De Di Nava Xwe De**
**Dikin Û Kesên Didin Kirinin**

**Di Çiyayên Kurdistanê de Yekîneyeke**
**Enternasyonalîst Tercîha Me Ye!**

**Rexne Dayîn Soza Bi Dawîkirina**
**Paşverûtiyên Dîrokî Ku Em Dijîne**

## Rêberê Min Rêgeze, Rêberê Min Gele, Rêberê Min Welate, Rêberê Min Darêzên Nirxên Mirovatiyê Ye!

Em karê xwe yê dahûrandinê bidomînin. Di civîna me ya îro de tevlîbûnên nû soz dane. Wekî din jî em tên dawiya dewreya xwe. Di dîroka PKK'ê de bi dawîkirina dewreyekê; ber bi netewek ve bilindbûn tê wateya qonaxeke girîng dayîna derbaskirine. Ev hêz, çareseriya wê û heta ku pêşkeftinên wê nedomîne dewre nayê bi dawî kirin. Herî kêm divê ku ez ji aliyê xwe ve bi vî rengî tehlîl bikin û bi azwerî bidim derbas kirin.

Her çiqas dewreyên despêkê gelek seranser û di asta pêşketineke sînordar de bin jî, di kesayetiya vê dewra dawî de bi qasî dahûrandinên ku asta hemû netew bandor bike, yên ku bikarin ji pratîka wê re jî tevlîbûnê pêk bîne û pêşketineke bandora wê ji niha ve derdikve holê ye. Hûn vê bi çavê xwe dibînin. Lihevkirin û duristî eve. Hûn di her kêliyê de soz didin, pêwendiya kesayetiya bi sozê ve girêdayî bi vî rengî ye. Ji me re jî mirovên girêdayî soza xwe pêwîstin. Ji xwe niha ji aliyê min ve pirsgirêka herî mezin, we anîna asta kesayetiyên bi vî rengî ne. Ji ber ku bandora gotin tevgerînên we yên pratîkî ewqas bi nakokin, ewqas bê encamin, bê îda û binketîne ku, ev ji dijmin zêdetir me qehr dike. Heta ez ji we re bêjim hûn derewan dikin dibe ku hûn xemgîn bibin, hem jî bi niyeta saf, zimanê saf. Ger bêjim hûn zarokin dîsa wisa ye.

Hûn ê bibînin dozên netew, dîsa dozên Partiyê dê wisa ji rêzê neyên destgirtin. Ji xwe di rastiya Kurd de ewqas bejnkurtî-qambihustî- ewqas bêçaretî ji ber van sedemane. Em dixwazin vê bidin derbaskirin. Divê ku hûn hinekî bûyîna mêrxasiyê ser bixin. Bifikirin, ger hûn hinekî nebin mêrxas, em ê çawa li rûyê hev binêrin? Pêwîstî bi durûtiyê nîne, pêwîstî xwe bidayîna kuştinê jî nîne. Ya ku divê bê kirin, rêzdarî li beramberî jiyanê û hêza li gorî pêdiviyên wê xwe pêk anîne.

Bi rojane ez bi xwe ji we re vedibêjim bawerim heta xalên herî zirav jî min anî û hîn jî pêdivî bi vegotinê dibînim. Ger hêza min têra we neke, min gotibû têra min jî nake; ger hûn ewqasî ber bi namerdî, sistbûn û mirinê ve bibezin, ez ê jî wisa ber bi jiyanê ve bibezim. Ev dibe helwest û şêwazê çalekiyekê.

Ger hinek ewqas bi israr ewqasî li ser xeta jiyanê miringeriyê ferz bikin, ger ez jî mirov bim, soza rêzgirtinê ku min ji jiyanê re daye heye, eşkereye ku ez ê di têkoşînê de gaveke din bavêjim. Vê jî dikim. Sozeke min daye xwe eve û dimeşînim jî.

Dîqat bikin, kesî ku zêde tiştekî ji we dixwaze nîne. Ya ku ji we tê xwestin tenê hûn bizanin li beramberî xwe rêzdar bin. Ger hinekî rêza we li beramberî jiyanê heye, hinek rastiyên vê yên bingehîn bibînin, bi sedem bikin. Vê derewê, vê rizînê, vê revê di kesayetiya xwe de rawestînin. Pêwîstî bi qeşmertiyê nîne. Bi taybet divê ku bizanin li pêşberî min weke mirov rawestin. Min ji bo vê xwe li beramberî we vekir. Bawerim hinekî rêzdarî bi we re pêşketiye. Dibe ku dema min ji we re got; "bila dar di destê we de nebe, henekê xwe bi kesî nekin, bi rêzdarî guhdar bikin" we xweşnedît. Ez vê gotinê jî ji rêzê û vala nabêjim. Li vir çîrokek heye. Ne ezeze, ev ne çîroka kese jî, çîroka gelekî ye. Dibe ku zahmetiyên wê hebin, bê derfetiyên wê hebin, lê di encam de çîroka gelekî ye, divê ku bê fêmkirin.

Qet nebe bila hinek rêza we ji vê re hebe, ger na hûn ê bibin ketiyek. Rewşa ji we re gotina sunepe, qeşmerên herî mezin derdikeve holê. Dema ku min îsyana xwe ya yekem ji we re vekir, ya rast min xwest ez vê bidim fêmkirin û ji wê rojê heta îro di îsyanê de me. Ev ketîbûn, ev sistbûn ti carî dê mirov rêzdar neke. Divê ku dev ji van taybetmendiyan bê berdan. Ji ber ku min devjê berda, min şer heta vir anî. We hêza min a şer dît. Bi çirava eşîretê û ketîbûna kesayetiyê bi qasî ku hûn dixwazin ji nedîtîve bên, asta netewî me çiqas hejand cîhan dibîne. Dijminê me her roj baş dide nîşan.

Divê ku hinek tişt heta hestiyên we bandor bike, bihejîne. Wijdanê we hinekî rabe ser piyan û ew belengazî sekinandin, divê hûn bidin diyarkirin kabîliyeta we ya jiyankirinê heye. Ya rast min ji we re got ez ne hewcedarê we me. Pêdiviya we bi hinek tiştan hebû, min xwest wê pêşkeş bikim, lê hûn nikarin vana binirxînin. Di bin navê şerê jiyanê de, yên ku herî zêde ketine kolanan, ber bi rast û çepê ve li hemû cihanê belav bûye hûn rewşeke wisa îfade dikin. Yên ku ketine nava vê belaya jiyanê, êdî divê ku hinekî xwe nasbikin. Ji ku derê ber bi ku derê ve, ji bo çi û ji bo kê tê jiyankirin? Ev di heman demê de îfadeya rêzgirtinê ye.

Zaroktî çiye? Ti carî wate nedayîna rastiyan, pir çavsor bi sûbjektîvîzmekê xwe xapandine. Ez li wê înada we ya metirsîdar dinêrim, matmayî dimînim. Hûn di pênava wê de hertiştî dikin. Înadên ku dê çi bibe nediyare, çima bi we re ewqas bi bandore? Ev ji hemû aliyan ve encamê lewaziyê ye, encama ji xwe bêbawerî, xwe xapandinê û xwe dayîna xapandinê ye. Em hewl didin hinekî vê nîşan bidin. Perwerdekirina we ji ya tê peyîn gelek zehmetire. Ne weke ku hûn texmîn dikine.

Ez nabêjim di vê cîhanê de tu kes we qebûl nake, lê hûn weke koleyên ji rêzê xwe bifroşin jî, hûn zêde nirx îfade nakin. Şêwazê zextê yên ku li ser tu gelê cîhanê ne hatiye ferzkirin heta dawî tê qebûlkirin, lê li ser wî esasî weke civakeke sîxwur jî dijmin nikare we îdare bike. Cenazeyên we jî ji dijmin re zêde tên. Dema ku rastiyeke wisa mijara gotinê be, ger hûn di îdaya çav ji wan re bigirin de bin û bi jiyankirinê re, divê ku mirov çi navî li we bike? Ger hûn bi vê nefikirin, teqez hûn ê nikarin sirê mirov çareser bikin û bûyîna mirovbûnê fêm nekin.

Min ji bo jiyanê şer jî girtiye ber çavan. Yên bi qasî min egîd jî nîne, lê "çawa bijîn, nihiniya jiyanê çiye" ji ber ku hûn bersiva rast nadin vê dibînim ku şerê we wê encam ne de. Di nava ewqas nakokiyan de ger em mirovekî çareser nekin, em ê çawa xwe rehet bikin? Hûn berendamên kadrotiya rizgariyê ne, ger hûn nikarin xwe ji belavbûnê derxin, hûn ê di eynê de çawa li rûyê xwe binêrin? Hûn ê çawa bikarin tehamula vê durûtiyê bikin? Vaye dema ku ez xwe tehlîl dikim hinekî din zelal dema ku vê dikim tişta ku dixwazim bidim fêmkirin ev e.

Bêhêziya mezin divê ku bê derbaskirin, divê ku ev şerma mezin hinekî bê paqijkirin. We hemû çiroka jiyana min di kêliyekê de dît; yê ku ewqas divê ji xwe şerm bike, rizî û mirovê ku ti hêvî, pêşeroja wî nebû xwe heyî kirin, ger gengaz be hinekî xwe kişandina nava mirovatiyê, hinekî xwe gihandina şerefê, li beramberî xwe ferzkirinên pir vekirî û qirêj xwe gihandina hêza berxwedaniyê ye. Hebe-nebe hevgirtin nîşandane. Hemû şer ji bo vê ye. Dijmin û kevneşopan, hûn ewqas durû, heta ezez kirine ku, ji ber hinekî jî hûn dîlê ajoyên xwe ne hûn hema dikevin. Em dixwazin şerma vê hinekî rakin.

Her kes dixwaze hinekî jî wê rewşa xwe ya ketî, alçaxî bi min bide derbaskirin. Ez têra vî netewî dikim, dikarim têra mirov

jî bikim, lê divê ku şeref weke meseleya taybet a kes bê nirxandin û bê destxistin. Şerefa netewekî, şerefa mirovek temsîlkirin, ger pêwîst kir bê kêmasî bûyîn, şayanî me bê dîtin, şayanî wê bûyîn şerefa rasteqîne. Lê ev nayê vê wateyê ku ji ber ez wisa me hûn hemû jî wisa ne. Ew divê azad bibe, êdî tak dê wateya xwe bibîne, kêm-zêde divê ku her kes bizandibe wisa bibe. Dibe ku hûn bêjin, "jiyana me rojên aware" ne û ji xwe hêrs bibin. Lê ez jî dibêjim ku, hûn ewqas kêm hatine tehlîlkirin û ewqas kêm di berxwedaniyê de ne ku, qet mafê we ji bo vê nîne. Ewqas deynê we li beramberî we zêdeye ku, mafê we yê daxwazkirina ji vê zêdetir nîne.

Pisgirêk ne erzan xwe rizgarkirina tak bi xwe ye, xwedayîna kuştin jî nîne. Pirsgirêk, tak di kesayetiya xwe de xwe gihandina rastiya gele û derketin pê dayîna kirine. Hebe-nebe pêwîste jiyanê di vir de bibîne û vê hêzê raber bike. Me ev nîşan da, lê hûn çawa dixwazin hema ji bîr bikin, hûn çawa astê dadixin, hûn çawa bi helwestekî din bê bandor dibin? Başe, li beramberî van ferzkirinên we, em çawa serî bitewînin? Hevrêyek ji bo ku hevgirtîbûna xwe bidomîne, ma hevalê xwe ewqas tengav dike? Sozên şerefê yên ku didin wisa ji rêzê, di ser guhê xwe re bavêje? Lê hemû gotinên we, ji ser guh avêtinê re wêdetir naçin.

Teqez divê ku em biguherin, bi qasî pêwîst dike veguherînin, xwe bigihînin şêwazê serkeftinê. Ger em vê nekin em ê nikaribin biçin cihekî, mafê me mirine. Em tawanbarin, divê ku em bimrin, çi dibe bila bibe, beriya jiyanê, ger hûn tawanbarin, serê xwe ji celad re dirêjkirin a herî raste. Ger hûn dibêjin; "na"wê demê xwe bikişînin nava berxwedaniya mezin. Dema ku we xwe kişand nava berxwedaniya mezin, wê demê li şûna mirinê, hûn dikarin mafê jiyankirinê bikar bînin. Lê tenê ev bi berxwedaniyê dibe. Û berxwdêriya PKK'ê vaye wisa derket holê. Bi taybet rêzdariya ji bo şehîdan divê ku wisa bê îfadekirin.

Ger em di vê çarçovê de nirxandinekê bikin; ji bo jiyana ku wateya wê hatiye xêzkirin mirin redkirin nebes be jî, çiqas bi zehmetiyên bê aman re rû bi rû bimîne, xala ku em di berxwedaniyê de israr dikine. Yanî ya ku derdikeve holê ev e; kombûna hemû şehîdan, ji jiyana di encama vîna dijmin de tê ferzkirin re gotina "na" ye. Û piştî wê ya ku tê ferzkirin mirine, ji wê re jî na dibêjin. Ya li şûn ve dibîne çiye? Bi înadeke mezin li

ber xwe dane. Li beramberî hemû hêza nedîtî ya dijmin, em jî li beramberî lewaziyên xwe yên ku nehatine dîtin raberkirina jiyanê ye, berxwedan xwe parastine. Vana ne têgehên wisa ji rêzê ne. Ne têgehên ku hûn ji bo dûmana cixara xwe yan jî ahbab-çavûşî hinekî bi xwe xwapandinê wateya wan bifikirin nîne.

Pirsgirêkên we pir giranin, yanî kesayetiyên ku hûn ferz dikin –ev jî dibe kesayatiya gelekî- di navbera jiyan û mirinê de wisa di tewişe ku, hûn ji zarokekî bêtir digrîn û dinalin. Dayikek ji bo ku girî û nalîna zarokê xwe bide sekinandin, bi şîr, şekir, şerbetê dixwazin bide sekinandin. Hûn bi mîlyonan zarokin û tenê ne bi şirekî, bi şîr hûn jîr nabin. Ji bo jîrkirina we divê ku mirov ewqas tiştên cur bi cur bide we. Rewş ev e. Bi ewqas tevgerînên ku nehatine pîvan, bi ewqas tevgerînên girî, helwestên we mîna yê zarokên çil salî, sî salîne.

Dîsa jî divê ku ne di xema we de be, hûn dikarin bêjin; “ma çi ji me bûye” Ez ê jî wê demê bêjim; “tu çiqas dikarî şer bikî, çiqas dikarî bifikirî, te çend pîhîn li dijmin da?” Çend çalakiyên we yên serkeftî nehe, îda û ezweriya te di çi astî de ye? Ez li vir ji te re dibêjim; “nebe derewker” Ger tu bibî derewker li aqûbeta xwe bifikire. Di şoreşê de derewkerî, di jiyanê de derewkerî; bi mirinê re yeksane.

Ez naxwazim li beramberî we nebesiyan bikim. Hedefa min li bermaberî êrîşa dijmin a lenetkirî ya ku teqez divê ku li dijî wê derkeve rawestîne. Em vê mijarê jî ji rê dernexin. Hema ev hat aqlê min; jiyannameya xefîlekî, yan jî xayînekî di nava refên me de yê niyaz baş çiye? Yekî wisa kiye? Ne sîxwurekî qeydkiriye, lê mîna xayînekî ye. Dinêrim, hêjmareke zêde hene. Hewl didim vana fêm bikim. Dixwazî bila qada dijmin a vekirî, dixwazî jî bila girtî be xeter nabînim yan jî ger xeter be jî ji heqê wî derketin zêde ne zehmete. Niha ya herî zehmet ku ji heq were; yên ku bi salan xefîl jiyane, yên ku weke xayînekî niyaz başin û heta yên ku di rewşa rêşaşiyê de ne. Neqandina vê dibe ya herî zehmet.

Yên ku nebin xwedî pratîkeke cidî ya ku hûn şayanî xwe dibînin, hebûn-nebûna wan yeke. Tehlîlkirina wî jî ne asane. Vaye çavkaniya xwe ferzkirinên xeter ku em nikarin jê re bêjin zaroktî jî ev e. Vana jî pir belavin. Hûn ê vê çima nebînin, bi kîja sedemê? Hûn nikarin ji nû ve mirov çêkin, çima hûn ji nû ve vesazî, ji nû ve pergalekê nabînin? Ger dijmin astenge hûn çima

lêdanê ser naxin. Ger nebesiyên we astenge hûn çima derbas nakin? Û hûn mirovin, çima hûn xwe nagihînin wateya vê? Hûn dixwazin bijîn, çima hûn sedema sereke ya vê jiyanê nabînin û nanirxînin? Bersiva van pirsan pêwîste. Berevajî divê ku em hevdû durû ragihînin û divê ku piştî wê em bi hev kevin. Çil qat zêdetir nirxa vî şerî ji ya ku hûn dipên zêdetir heye. Lê ti nirxeke van xweferzkirinan nîne. Pêwîstî bi bezîna derdor û gotina ku, “ez jî weke mirovê bi şerefim, mirovê hemdemim” û di cihê xwe de lîstinê nîne. Êdî nîşandana ku tu mirovekî çawa ye zêde ne zehmete.

Min ev şerma pir zû dît û bi ser xwe de çûm. Sedema sereke ya îsyanê ev e. Min qet cesaret nekir weke we bijîm û nakim jî. Ez li cesareta we ya jiyanê dinêrim ji vê jî xirabtir, li bermaberî vê şêwaza jiyanê matmayî dimînim. Kê hûn fêrkirin, hûn çawa şayanî xwe dibînin? Tenê matmayî mamînim, hêrs dibim, lanet dikim û ji bo vê çalakiya herî mezin birêxistin dikim.

Bi çi cesaretî nizenîna jiyankirinê, di jiyanê de xiyanet ferzkirin, di jiyanê de xeflet, di jiyanê de bê çareserî ferzkirine? Pewîste hûn van gotinan fêm bikin, ya herî girîng jî, divê ku hûn bersiva pêwîst bidin. Wekî din nabe bê fikirin. Hûn dizanin ez ne şerkeriyeke xirabim. Hûn dizanin ku min şer bi awayekî herî kûr, felsefî daye rûnişkandin. Jiyana netewekî, dîsa ya gelekî, heta ya takekî jî dadixim asta mafê devjêneger hûn vê jî pir bi zelalî dibînin. Li ser vî esasî tenê ne pevçûnê, em ê qiyametê rakin, divê ku hûn fêm bikin!

Li gorî we jiyankirina ji rêzê gengaze. Li gorî we heta dawî nexweşbûn jî gengaze, li gorî we hemû kesên ku pê re jiyan dikin bi asanî dikarin merheba bidinê, xemgîn bibin, kêfxweş bibin, kedî bibin. Na! Li gorî min nabe! Ez li gorî felsefeya mirov digrim dest; nabe! Li gorî qûralên wêjeyî, terbiyê digrim dest; nabe! Li gorî siyasetê digrim dest; dîsa nabe. Li gorî pîvanên feodal, kapîtalîst digrim dest; nabe! Heta li gorî pîvanên klasîk ên koletiyê jî digrim dest; dîsa nabe. Yanî ji hemûyan xirabtire.

Teqez divê hûn vê fêm bikin; vaye heta hemû hesab û kîtaban nekin, teqez ji pêwîstiya wê bawer nekin, em devjê berdin di oxira wê de jiyana xwe fedakirin, ya ku nayê xwestin bê bihîstin jî dibe ku hûn neçarî çareserkirina van tevan bibin. Ger tiştek bûbe armanc, ev xeteriya herî mezin jî bigire nava xwe, ger

ku bê wê nikare bêkirin, bê hedef neyê jiynakirin, çiqas zehmet jî be, hûn ê hemû dema xwe ji vê re veqetînin, bi raberkirina hemû behremendiyên xwe yên mirovî, hûn ê bi ser wê hedefê de bimeşin û vê jî weke meşa yekem a mirovahiyê lê bikin hûn nû dikevin ferqa vê rastiyê. Ev, ya ku we di dahûrandina min de jî dît û yek ji encamên yekaneye ku divê hûn jî xwe bigihînin.

Ev nêzîkatî, li beramberî jiyanê hemû îdayên we dirizîne. Li beramberî hemû bandorgeriyên jiyanê, di derbarê şêwazên jiyanê de ew îdayên ku hûn layîqî xwe dibînin û fêrbûnên we jî dê birîzîne. Bi hemû duristiya xwe min hewlda ku vana îspat bikim û qet nebe bi awayekî vekirî, mîna nîqaşeke mezin min ji we re pêşkêş kir. Ezmûna min ev bû; henekê xwe pê nekin, êrîşkar nêzîkî nîqaşê nebin, bi encamên wê ve girêdayî bimînin, wekî din hûn çi dikin bikin. Vê duristiyê nîşan bidin, divê ku israr li ser vî esasî be. Ger heye meşeke we encax di vê çarçoveyê de be. Ma weke din ez ê çavê xwe ji îxanetê re bigirim? Weke din ez xwe radestî vê ketîbûnê nakim û çav ji vê jiyanê re nagirim. Hûn îbadeta herî mezin jî ji min re nîşan bidin, tenê hûn ê bikarin nefretê pêş bixin.

Rastiya ku di dahûrînan de hatiye îspatkirin cudaye û êdî şayanî fêmkirinê ye. Ez jî li pey wê me. Bi hevrêtiyê, bi hewldana xwe ya xas, ez amade me ji parvekirina yên ku min amadekirine. Weke roja yekem ji nîqaşê re, encamên wê li gorî anûr û keda xweşik ji belavkirinê re heme. Ev welate, ev hewldanên herî hêja yên keda mirovin. Em ji tevlîbûna hemûyan re hene. Îfadeya rêxistinkirî ya ji hemû aliyan ve bi we re heye? Ev xizmeta ku ez pêşkêş dikim jî bila ya we be. Ger hêza ji nû ve despêkirinê raber dikim, ger duristiya te hebe divê ku hûn jî nîşan bidin. Wekî din em ê nikarin bêjin em di nava sînorên hevrêtiyê de tevdigerin. Ger hûn bi israr lumpentiyê, bê watebûnê ferz bikin, di derbarê we de divê êdî mirov çekên cuda pêş bixe.

Di koletî û lumpetiyê de israr êdî rewşeke tawan a ku ber bi ji derveyî civakê ve çûyînê dibeye. Tevî ku derfeta ji vê rewşê rizgarbûnê heye û xwe jê rizgar nekirin dikeve rewşa tawan de. Nêzîkatiyên ji rastiya derketinê, bi zanebûn ji rêya rast derketin jî di nava tawan de ye. Êdî dema ku tawan ket nava kar, divê ku şêwaza guncav ya cezadayînê jî bê pêşxistin.

Li gorî min di bingeh de daraz tê vê wateyê; tenê ne ji bo xeta rêxistinê, xalên leşkerî-taktîkî jî na, ya ku hinekî em dixwazin pîvanên wê bidin, di nava rêgezên jiyanî yên ku dikarin bên pejirandin de nehatina vê xeta jiyanê, nêzîkatiya jê re cuda, li dijberî derketin, ji hemû aliyan ve bingehê despêkirina tawanin û ger bersiva ji hemûyan re bê dayîn hebe, pêwîste hêza rêxistinê ceza bike. Di welatê me de niha her roj bi dehan mirov tên kuştin. Em lê didin, ew li me didin. Ew qûralên darêza mêtinger, qûralên xayîn ên jiyanê bikartînin, em qûralên azad ên jiyanê bikar tînin. Darêza di vî astî de ye. Darêza wê ya di nava me de, darizandina nefsa xwe ye, ev jî darêza herî mezine. Ger em vê darazê nekin darêza seranser a ku derketiye holê dê zêde watedar nebe.

Hûn ê ber bi xeta jiyanê ve bên kêşan, ger bi israr hûn xeta lawirtiyê ferz bikin, xeta jiyana dijmin ferz bikin, em ê şer bikin. Em ê li hev bidin. Pêwîst bike em ê hev bikujin. Nehatina jiyanê, nehatina jiyanake bi rûmet, tawanê herî mezine. Li beramberî vê durûtî tawane. Hûn ê bi kîja sedemê neyên vê? Tê yê çima xwe mîna girêkeke tawanê lê bikî? Azadiya xwe mîna tawanbar dayîna jiyankirinê, ji azadiyê dikare bê hesab kirin? Xwe pêşnexistin, di koletiyê de israr dikare weke azadiyê bê nirxandin? Ji qûralên jiyanê yên sereke rev, dikare weke azadiyê bê nirxandin? Ketin, di bêçareseriyê de israrkirin, her tim girî-nalin kirin dikare weke azadiyê bê nirxandin? Na! Ji van re azadî nayê naskirin. Ya ku bê ferzkirin hiqûqa darizandinê ye.

“Li ser navê mirovatiyê dadirêzim, li ser navê netew dadirêzim, li ser navê partiyê, artêşê dadirêzim” em ê wisa bêjin û bi ser de biçin. Dema ku em vê darêzê pêş dixin, em ê van hemû taybetmendiyên dijwar bigrin ber çavan û darizînin. Divê ku em li ser navê mirovatiyê bizanin darizînin. Qatekî di ser wî re, li ser navê netewbûnê darizînin. Dema tu ku qatekî din derket jor, darizandina pîvanên partiyê dikeve dewrê. Ya gaveke din li şûn wê, li gorî zagonên artêşê darizandine. Dema ku em hinekî din jî dadixin asta helwestên takekesî, li gorî estetîk û exlaq darêz dikevin dewrê. Yên ku di van xala hemûyan de darêzê negire ber çav, nikare xwe bide efukirin. Yên ku tên darizandin û nikarin bê tawaniya xwe îspat bikin, wê nikare bi serbilindî bikeve nava mirovan.

Hûn ê çawa pêşbikevin ji me dipirsin. Vaye ez jî ji we re dibêjim divê ku hûn darizandina xwe pêş bixin. Ma yên ku dixwazin bijîn ne hûn in? Dema ku ez yekî ji we bigrim pêşberî xwe û jê re bêjim; "tu alçexekî" hûn ê pê aciz nebin? Ji bo ku tu wisa nebî, pêwîste tu bizanî serkeftî ji darêzê derkevî. Ger heye rûmeta te divê ku tu vê nîşan bidî. Dema ku tu serkeftî ji darêzê dernekevî tenê ne li vî welatî, di vê cihanê de jî wê cîh ji te re nebe. Tê vê bizanî. Ger hûn ji vê darêzê serkeftî dernekevin, ne li vê cîhanê, ne jî li cîhana din ji we re cîh nîne!

Hiqûqa jiyanê ev e. Rêzdariya li beramberî jiyanê, mafê jiyanê û parastina wê di vê çarçovê de ye. Ger hûn hinekî din bizanin bifikirin, li ser navê mirovatiyê darêz çiye, em ê xwe çawa darizînin, dijmin çawa darizînin û encamên divê ku jê bên derxistin çiqas nefukerin, bi çi dikarin bên efukirin? Em daxin asta kêfxweşiyê. Bê van, hûn dikarin di nava komên hevalan de weke mirovekî tendurist kesên ku rêz li wan bê girtin bimînin. Çima di nava ferên gêrîla de weke despotan li wan tê? Çima di nava partiyê de rayeyê xirab bikar tînin? Ji ber ku vê darêzê serkeftî nakin. Çima ewqas tevgerînên nexweş li ser kesayetiya bi bandorin? Ji ber ku hûn vê darêzê bi awayekî serkeftî nakin. Çima di vê cihanê de tu kes qedir û qîmetê nade we? Çima hûn nikarin biafirînin? Welat çima xirbeye? Çima gelê we bi tinebûnê re rûbirû ye? Tak çima pir ketiye? Ez hêjî matmayî dimînim, hûn çawa cesaretî jiyankirinê dikin? Ji bo we, ji bo vî gelî teqez divê ku mirov vê rawestîne.

Min soza rûmetê da xwe. Di derbarê ez ê wisa xwe bidim jiyîn û ger gengaz be vî gelî û hêza min têr bike ez ê hemû mirovatiyê rizgar bikim, min ev soz da. Em ê wekî din derfet nedin ti şêwazê jiyanake din. Hûn çawa cesaret dikin û kêrnehatina xwe li ser me ferz dikin? Hêza Rêbertiyê, hêza rêgezê, hêza jiyanê–bûyîn ango nebûyîna min qet ne girînge-ji takekî re, heta ji partiyekê re, hate pergala rêgezên ku ne bi gelekî ve jî girêdayî ye. Lê hûn mîna fermanên xwedê, mîna komên rêgezên razber, mîna hevgirtina van dinirxînin.

"Em çawa ji vî olî, felsefê, bîrdozî û hevgirtina rêgezan re xiyanet dikin?"Wisa bêjin û xwe darizînin. Ger Kurd xwe wisa lêpirsîn neke, yê herî ketiye û teqez divê bê kuştin. Vaye dahûrandina rêbertiyê hinekî ev nîşan dida. Li gorî van rêgezan

yan jî li gorî espriyê, azweriya wê xwest xwe tehlîl bike, xwest xwe bide jiyankirin, xwest li ber xwe bide. Ev ne tiştekî dine. Ger hêjî dibêjin; "li ber xwe nadim, di şer de nikarim bibim hêza çareseriyê, nikarim rastiyan nîşan bidim" wê demê mirin baştire. Ez bi olan jî difikirim; çima Îslamiyetê wisa kuşt? Ez vê dibêjim, hinek alçax hîn jî qala teoriya dîktatoriyê dikin. Ger Hz. Muhamed ewqas mezine yan jî bi "la îlahe îllalah" li ser mirovatiyê rêgezek ferz kiriye, dibe ku ew jî li ser vê bingehê be. Ger serê yê nekiriye jê dike, divê ku mirov di vir de li wateya wê bigere. Bi bandore, çima ewqas dikarî lehiya mirovan di dûv xwe de biherikîne û hêjî di herîkîne. Vana ger di Îsa de, di Mûsa de tiştekî îfade dikin ji ber vê sedemê ye. Fîlozofên bi bandor, camêrên dewlet û yên siyasetê, kesayetiyên leşkerî ji ber ku her tim wisa bi rêgez nêzîk bûne dikarin bandorker bibin.

Kurd çima ewqas ketiye? Ji ber ku van hemû paşçav kiriye ewqas ketiye. Çima hûn ewqas bejnkurtin. Ji ber ku we asteke rêgezî ya wisa bi jiyanê nedaye qezenckirin. Hûn dibînin, ya ku ez dikim li beramberî we parastineke. Parastina nirxên mirovatiyê yên sereke, parastina mafê sereke yê netewekî, rêxistin û ger hebe artêşa wî, li gorî pêwîstiyan parastine.

Eşkereye ku ez mafdar derdikevim. Yên ku di bin tohmetên mezin de dimînin hûn in. Teqez pêwîste hûn di vê ezmûnê de serkeftî derkevin. Vaye em vê nîqaş dikin, em nikarin ji rêzê nêzîk bibin. Ger em ji rêzê nêzîk bibin, di nav de mirin heye, dijminê we bikuje, her roj em hinekan dikujin. Îro di rojekê de deh-bîst-sî dikevin, sibê wê bibin sêsed, sêhezar, sêsed hezar. Em dibêjin pêwîste rê lê bê girtin. Ji bo rê lê bê girtin, ger heye behremendiya mirov, hêz bi xwe gihandina rastiyê gengaz dibe. Wekî din em nikarin bi qasî ku ji xeletiyê re maf bidin naskirin durû bibim. Giriyê we yê pir zêde, gotinên we yên pir zêde "em nikarin çareser bikin, bê behremendin" tê wateya di xeletiyê de israrkirina we û hûn nikarin ji şaşîtiyan re erê kirinê ji min bixwazin. Ger ez vê bikim, bawerim xirabiya herî mezin, hem jî bi çalakiya xwe, ez dê li ser navê mirovatiyê bikim. Ev car ji bo gelekî, ji bo pîvanên vê partiyê em ê ser û bin bikin. Vê nexwazin.

Ez van ji bo vê dibêjim; hêjî yên ku dibêjin, "nikarim bijîm seranser dimînim" hinek kesayatiyên wisa yên ku nayên

fêmkirinin. Heta ez hinekî di bin bandora van de dimînim û ji xwe hêrs dibim, li beramberî vê li ber xwe didim. Başe ku vî hêzî raber dikim. Ger min raber nekira, minê jî nikarîba sînorê dijmin fêm bikira. Em ê pêngaveke nû pêş bibînin.

Dijmin îdaya "em di sala 1994'an de xilas nekin, em ê di 1995'an de xilas bikin" dike? Hemû hêza xwe ya mirinê ji bo vê seferber kiriye, ya ku ji dest tê dike? Dîsa hemû teknîka xwe, pere, bi komkirina mirovan a li dora xwe bi ser de tê? Wê demê pêwîste gotineke tu jî bikî hebe; di sala 1994'an de ger nirxekî berxwedanê di destê te de hebe, nirxê jiyanê hebe, divê ku tu serkeftina sala 1995'an çawa bibînî? Ev pirseke pir sotênere û ger hebe hêza we, divê ku hûn hinekî vê araste bikin. Ji ber ku ji bilî vê hûn ê nikarin hêza jiyankirinê bibînin.

Bi ser de biçin û bêjin; "bila serkeftinek jî bibe ya me, bila salek jî ya me be." Em vê jî nîqaş dikin. Ger li pêşiya hizrandina mirov astengiyeke sereke hebe, heta ku wê çareser neke nikare qala xaleke estengiyê ava dike bike. Ger hebe pirsgirêkeke sereke, hebe derfeta serkeftina şer, mejiyê mirov ji bo çareserkirina pirsgirêka xwezayê têr dike. Em hewl didin wê nîşan bidin, divê ku hûn vê nîşan bidin. Em dikarin berevajî bêjin? Em dikarin wan rewşên ku hûn pir şayanî xwe dibînin erê bikin? Di gotin de peyva serkeftinê; di pratîkê de ji hemû aliyan ve beriya dijmin pratîka xwe bi xwe valaderxistine! Di nava refên me de pir zêde derdikevin, em ê çawa efu bikin, em ê çawa ji nedîtî ve bên?

Ev hemû sedeman darêzêne. Nebêjin; "me bê wîjdanî kir, min nedît, nekarî nîşan bidim" çiqas dikare bibîne, nîşan bide, çiqas israra xwe heye? Di encam de bi şêwazekî ketiye. Tu bi gelek zehmetiyan re rû bi rû mayî, tê kî tawanbar ragihînî? Gelo mafê te yê xwe ragihandinê jî heye? Mafê te yê xwe li beramberî ewqas dahûrandin, bi ceza û zehmetiyên wisa re re rû bi rû hiştin, mirineke xirab li cihekî ne li bendê jiyankirin yan jî ketina nava fesla jiyanê heye? Ma hûn her tim wisa li nav naçin?

Terbiya mezin a şoreşê; cezakirineke wisa, qesteke wisa ji ku derê tê bila bê, şayanî xwe nedîtine. Ma kêm girîng e? Na! Li pêşiya her tiştî tê. Ji ber ku di her kêliyê de jiyana we wisa bi encam dibe. Divê ku mirov rê li ber wisa bi encambûna jiyanê, ya bi îşkence, tengezariyê bigre. Divê ku mirov vê meşa pir zêde ne

serkeftî rawestîne. Divê ku hûn xwe ji van tengezariyan rizgar bikin, ji bo vê israr heye. Bi revê hûn nikarin rizgar bibin, bi mirinê jî hûn nikarin jê rizgar bibin. Mîna camêran, mêrxasan tê bibî xwedî hêza çareseriyê, bimeşî, bi ser de biçî. Bi qasî ku tu dixwazî dikarî bifikirî, bi qasî dixwazî dikarî vîna xwe dijwar bikî û ev jî çareyeke. Tê binerî pêwîste tu bibî fermandarek, tê ber bi wê ve hilkişî; tê binêrî pêwîste tu bibî hêza vesazî-rêveberiyê, tê wê jî bike. Dema ku te mezin fikirandinê ser xist, piştî wê dê vîn pêşbikeve. Ji ber ku pirsgirêkên mezin, vîneke mezin dixwazin û ger îdaya te heye, tê bi asanî derxînî holê.

Ma ji bo dozên wisa dîrokî vîn nayê raberkirin, gotin nayê kirin, rê nayê nîşandan? Yekînekeye biçûk a gêrîla nayê avakirin, qadek ji jiyanê re nayê vekirin, di vê xala sereke de nayê meşandin? Nekin, ya ku hûn şayanî xwe dibînin gundîtiye, taybetmendiya demogojiya rewşenbîra ye. Hûn çawa dikarin van xisûsan bilêv bikin? Û hûn vê kêmasiyê her tim li ser navê min dikin. Ez bi nirxandineke wisa dijîm? Hêza ku hûn ji min digrin, hûn bi kîjan cesaretî wisa bikar tînin. Ev çi bêrêziya mezine, ev çi mafxwuriya mezine û ev nêzîkatiyeke çawa xirab ji xwe re kirine? Ev çiqas xirab bikar anîna mafê azadiyê ye? Yên ku van dikin kî ne? Vaye yên ku wisa mafê wê nadin dikin.

Ev mafê azadiyê teqez pêwîste em hemû rast bikar bînin. Heta ku mafê azadiyê, mafê jiyana azad, mafê ji bo azadiyê rast şerkirin neyê bikaranîn, em dev jê berdin bûyîna komeke partiyê, em ê nikarin bibin komeke çekdar, cemhetek jî. Weke komeke civakî jî em ê ti wateyê rava nekin.

Dahûrandina min pir watedare. Bi wê rewşa xwe ya zaroktî, bi kedeke mezin, min dixwest bibim komeke biçûk û di vê de israr, îro em veguhertin hêzeke rizgariya netewî ya mezin. Wê demê em dikarin pir bandor bikin. Ti tiştekî bêbingeh rê li ber bandorgeriyeke wisa venake, tu dînîtî ewqas mirovên bi aqil naherîkîne. Ger ev cihan ewqas bi aqile bi tena serê xwe dînîtî çawa dibe ku ewqas wan tengav dike. Ger ya min dînîtibe wê demê çi ji ewqas biaqilan hatiye? Berevajî derbasdare; nakokî bi mirovatiyê re ye, ne bi min re. Bê hişmendiya mezin, nejidilî ne bi min re ye, ji dervî min di her tiştî de, di her kesî de, dibe ku di hemû pergalan de be. Min bi xwe azad hiştinê re, maf çiye îspat kir.

Belê, şaşîtî di ku derê de ye? Madem ez nûnertiya ewqas rastiyan dikim, lê ev tiştên ku em dijîn de îca çine? Tu çi dibêjî Ab?

Ab.: Serokê min, ne xeletiye. Pirsgirêkek heye, ji wê rizgarbûn pêk tê. Yanî serweriya pergaleke paşverû heye, ji wê rizgarbûn pêk te. Pirsgirêk çêdibin, weke pirsgirêkan derdikevin holê. Helwesta serdest a paşverû ku sedên salan digire û bingehe, teşegirtineke bingehîn, li ser civakê, li ser mirov, li ser hemû qadên jiyanê teşegirtinê îfade dike. Pirsgirêk, pirsgirêka ji vê rizgarbûnê ye. Di nava têkoşîna rizgariyê de derdikeve holê, ger na xeletiyên xebatê nîne…

---.:Yanî min ji vê re gotibû weke tak mirovek ewqasî xwe derbasî jiyanê kirin. Ji vê re bêjim rêxistin dê aqlê mirêv jê bigre? Ger wîsa be, ez ê biçim ku derê, divê ku ez ji niha û şûn de çi bikim?

Ab.: Di vê mijarê de helwestekî qalibî û muhafazakar nîne. Dema ku pêvajoya Partî û têkoşînê tê şopandin merc ji bo pêşketina şoreşê helwest, kîja şêwazî pêwîst dike, ji aliyê partiyê ve pêkanîna wî heye. Bi vî alî ve pirsgirêka di cihekî de asêmayînê nîne. Serdehatinên niha, nirxandin, rêbaz ya rast pêvajoya ku em di nav de ne di şêwaza pêkanîna van de pêk tê. Nêzîkatiyeke wisa, pêşketinan pêk tîne û ji xwe pêkanîna wê jî tê dîtin.

---.: Li vê rewaşa xwe ya wasat binêrin; yanî meşa ku ti carî nikare xwe ji darbeyên dijmin rizgar bike, li stîlê jiyana xwe binêrin, hûn ê çawa li ber xwe bidin?

Ab.: Teqez em ê vê derbas bikin Serokê min.

---.: Lê hûn garantiya vê bi min re dibînin. Ger min ji hebûna we ya jiyanê re gotiba rêgez û hêza çareseriyê; ev heta dawî rastiyê rave dike. Lê vê jî nabîne û hûn dibêjin; “tu ewqas ji me re pêwîste” mîna zarokan, mîna zarokê di himêza dayika xwe de bi dayikê ve girêdayî jiyankirinê hûn şayanê xwe dibînin. Ji aliyê we ve ev ne zêde ye? Asta ku hûn jê re dibêjin wesat, asta we ya mîna zarok di hemêza dayîkê de jiyankirine. Gelo mafê we ji vê re heye? Mafê we heye ku hûn ji xwe re bêjin zarok.

Ab.: Nîne Serokê min. Çavkaniya xwe ji wê xala ku min qala wê kiribû digire. Rewşa ku çavkaniya xwe ji serdestiya paşverû ya ku bi sedên sal domiye, dema ku berê xwe didin

arasteyeke şoreşgerî derdikeve holê ye. Mirov pir hatine lewazkirin, ji nişkê ve nikare berê xwe bide pêşketineke şoreşgerî, pêşketineke azad. Ewqas zêde hatina jiyankirin jî ji ber vê sedemê ye.

---.: Tu pir bi asanî dikarî van baxivî. We hemû pratîka xwe jî wisa nîşan da, ez vana dehşetwarî dibînim. We ev rehetî li ku derê dît, hûn ji ku derê derdixin mirov wisa bi asanî dikarin bên meşandin, rêvebirin, şerkirin? Hûn vî şêwaz û tempoyî çawa layiqî xwe dibînin? Her roj ewqas li we tê dayîn.

Ab.: Ev dibe şêwazê nêzîkatiyek, dibe şêwazê nêzîkatiya jiyanê Serokê min.

---.: Ewqas kuştina we, jiyana we ya bi îşkence, ewqas rê vekirina we ji windahiya hevalan re gelo qet we xemgîn nake? Yan jî dema ku we xemgîn dike, gelo di dilê we de çi bager radibin? Ger bager ranabin gelo hûn çine? Hûn nabin kesên ku ji dil nehatine girêdan, ne şiyarin? Wê demê hûn ê çiqas bikaribin bibin rêberê gel, mirovekî şiyar? Belê, dema ku ber bi jiyana leşkerî ve bê kişandin, bi vî şêwazî hûn ê çiqasî, xwe bigihînin ku derê? Ger hûn hîn jî nehejîne, encax mirov dikare bi asteke pir teng rave bike. Vana hêjî di asteke wasat de ne û heta bi şêwazên pir cuda ger xwe didin jiyankirin diyare pir ketîne, pir alçaxin. Ger hûn jî di nava van de bin, hûn jî wisa ne.

Ez amadekariya damezrandina artêşê dikim, berê xwe daneke min a şer çêbû û ger kombûna we wisa be, ev gotin tev dikarin risteke xapêner bilîzin. Divê ku mirov bizana ji bînî derkeve. Derbaskirina dewreyekê ne asane, ji salekê re nêzîkatiya serkeftina watedar raberkirin ne asane û qaşo piraniya van dê biçin şer. Dê çiqas bê bandor bên hiştin gelo difikirin yan jî ji vê bê bandoriyê re serî tewandin tê çi watê dizanin? Xalên sereke yê artêşê ku neyên pêk anîn, binketineke rê lê neyê girtin, peywireke neyê serxistin piştî hebû û şûnde, çûyîn dê çiqas sûdmend be? Muxatabê van pirsgirêkan kiye? Beriya her tiştî hûn ê bikaribin jiyan bikin? Qezayeke ne asayî ji dervî vînê nebe, gelo vê carê hêza we ya xwe dayîna jiyankirinê dê hebe? Hûn ê bikarin min ji vê bidin bawer kirin?

Dema ku van dibêjim, mebesta min hemû partiye. Divê ku kombûna hemû şerker û vê dewrê jî em li ser zêde bikin. Ger na gotina “di asta wasat de man” nabe çareseriya kar. Min da

fêmkirin? Tenê ne ji bo vê dewrê, hûn dikarin wate bidin karê gav bi netewekî dayîna avêtinê û pêşketin çêdibe?

Ab.: Ev dewrê pir kûr derbas bû, ji aliyê hevalên ku li vir in, bi taybetî jî waneyê dawî, pir zêde dahûrîner bûn. Wê ev ji aliyê partiyê ve jî heman encaman bide.

---.: Nêzîkatiya rexnedayîna mezin tê bikare ji aliyê xwe ve jî bike, tê bikaribe vê nîşan bide? Bawerim tu dikevî ferqê. Xwe vekirina min fêrker bû?

Ab.: Gelekî fêrker bû. Di wê mijarê de tenê bi qadekê re sînordar nema, têkoşîn û hemû qadên jiyana mirov girt nava xwe. Ji vî alî ve berhemdar bû. Bû dubarekirina hemû waneyên vê dewrê.

---.: Xalên sereke, xisûsên ku min nîşan dan hêza we ya bi hizirandinê pêşxistinê heye? Nîqaşên ku we di navbera xwe de kirin, bi xwe sipartina xalên sereke hûn ê bikarin pêşketinekê raber bikin, dide nîşan, hûn bûn şahidê vê?

Ab.: Çavdêriya ku min ji hevalan, nêzîkatiya giştî wisa bû Serokê min. Di nîqaşan de…

---.: Ger bi xwe spartina van xalên sereke hûn nikarin hizrandinê bi awayekî şiyar pêşbixin, ez dikarim çîrokê dirêjtir jî bikim, derfetên min ên berfireh vekirinê hene. Ji ber ku hûn hêjî hîs nakin. Ger hûn dibêjin; “wîjdan ranabe ser piyan” hêza min a rakirina ser piyan heye. Bi xetên giştî êdî dê bikarin cewherî bikin?

Ab.: Bi pratîkê re bê yekkirin, pêşketinên girîng dikarin pêk werin.

---.: Bi vê dahûrandina xwe min serkeftina çi bi dest xwe xist yan jî aliyê ku herî balkêş hat nîşandan, hat destxistin çiye?

Ab.:Bi awayekî giştî bi çend hevokan, weke bûnewerekî civakî mirov ji jiyana wî re rast wate dayîn pir giringe. Di domdariya vê jiyanê de israr, dîsa di domdariya jiyanê de helwesta rast, li gorî mercan guncaw destdayîbûna pêşxistina jiyanê ya mirov, şêwazê rast pêk anîn jî …

---.:Şênbertir min li çi da yan jî ya ku hat serxistin çibû? Ya herî cewher, pêwîst, hat bilindkirin, xistin çiye?

Ab.: Ya tê xistin, ya ku li ser navê mirov ji dest hatiye dayîn, lê taybetmendiyên ku mirov temsîl nakine. Ya rast dibin taybetmendiyên mirov, dibe bûnewerê mirovî. Mirovatî, hemû

taybetmendiyên xwe yên jiyanê ku di vê qadê de, sererastkirina nirxên mirovatiyê. Ji xwe paşverûbûna hêzê beramber jî ji ber vê sedemê ye. Ger di çarçoveyeke tengtir de bê destgirtin, di nava vê de çarçoveya netewî jî heye.

---.: Ji aliyekî ve min xwe danî holê, ya din jî bi devên cuda yên dijmin –hema bêje rojana her ku diçe kûr dibe- nirxandinên ku tên kirin hene. Em ji tawanbarkirinên giran bigrin, heta durişmên li nav birinê, yên ku ewqas bi hev re dikevin nava pevçûnê, bi nakok, bi şerekî bê aman dixwaze bê tasfiyekirin çine? Bawerim di pirtûka “Ayetên APO”de te xwend û di gel vê de jî tu nûçeyên rojane dişopînî. Ji aliyê faşîstê herî mezin ve durişma ku di derbarê min de bilind kir jî te bihîst. Kîne ev, dixwazin çi bikin?

Ab.:Mîna hêzekî paşverû yê siyasî derdikeve holê. Weke îfadeyeke vê tê bilindkirin. Di aliyê şer de wisa tê dîtin. Lê di cewher de aliyê civakî, aliyê komelayetî pir li pêşe. Lê ev di nava hemû dîroka çînatiyê de dibe dijbertiya hemû pêwendiyên paşverû, parastina wan.

---.:Di pirtûka “Ayetan” de heye?

Ab.: Tiştên despêkê xwe dispêrinê di vir de ne.

---.:Di pirtûkê de êrîşî çi dikin û kî li pişta wan heye.

Ab.:Qaşo li dijberî “dîktatoriyê” têdikoşe Serokê min. Lê parastina hemû nirxên civaka çîna serdest heye. Bi xwedî derketina li pergalên serdest, pîvanên wan, qaşo li dijberî wan têdikoşe. Pir bi nakoke! Ya rast rewşeke dixwaze çi bêje ne diyar heye.

---.:Li yê dibêje nenêre, li yê dide gotin binêre û binirxîne.

Ab.:Yên didin gotin jî wisa ne Serokê min. Emperyalîzm, burjuvazî bi şêwazên cuda xwe di nava civakê de diteyîsînin. Tevî ku ew dîktatoriyên herî mezin derdixin holê jî, dîktatoriyên dîrokê yên herî mezin, dîktatoriyên faşîst derdixin holê jî, “dibêjin demokrasî û pergala ku dikare bê jiyîn ez im” niha dixwazin xwe bi cihanê bidin nasîn.

---.:Wê demê em bi demogojiyeke mezin re rû bi rû ne.

Ab.:Mesele, hema bêje weke pêşengê mîrateya demokratîk a cihanê, Alman xwe li pêş dibînin. Lê…

---.:Her wiha Almanya belaya herî mezin a serê mirovatiyê ye! Niha, yên ku herî demokratîk yên herî mirovî ewin û qaşo em jî dîktatorên herî mezinin!? Demogojiyeke mezine! Divê ku em vê çareser bikin. Ji bîrnekin ku, ev domogojî dema ku di zîndanê de îşkenceya herî mezin hat ferzkirin çavkaniya xwe dît. Dema ku vê îşkenceya mezin xwest mirovatiyê bibe, Mazluman, Kemalan bi durişma, "em ê devjî anûra mirovatiyê bernedin, berxwedan jiyane" û bi biryardariyeke mezin, di dîrokê de encax ya ku şayanî mirovên mezine berxwedaniyeke di vê astê de raber kirin; bi demogojiyeke mezin, bi îşkencê ya xwe yên ku li hev kirin, ji rê derxistin kîne, li beramberî vê yên ku nûnertiya jiyanê dikin kîne, yên ku pena birin û jiyan kirin kîne? Dîktatoriya ku li vir tê bilindkirin ya kê ye, mirovatiya devjê nayê berdan kî ye?

Demogojiyeke mezin di vê çarçovê de tê pêşxistin. Li pişta darbeya 12'ê Îlonê Emerîka û Almanya hebûn. Li Amedê di îşkenceyên ku hatibûn amadekirin de, tenê ne bandora hêzên îstîxbarî yên rêxistinê emperyalîst, yekser alikariya wan hebû. Esat Oktay Yildiran, nûnerê wan ê hevbeş bû. Zilamên taybet ên Evren bûn û li pişt wan ev hebûn. Dîktatorî li vir li dijberî çiye diyare. Mirovatiya li ber xwe dide heye li vir, ji hemû aliyan ve mirovatiya li ber xwe dide! Binpênekirina anûra mirovatiyê, parêzvaniya vê kirin wisa ne asane, mirovatî ji destê van rizgarkirin ne asane.

Demogojiya mezin a ku hatiye pêşxistin, xirabiya herî mezin a ku li beramberî bîranîna berxwedaniya mirovatiyê ya mezin hatiye pêşxistin kirine. Di sala 1982'an de xwestin PKK'yek nerm ava bikin. Qaşo li dijberî dîktatoriyê derdikevin. Yên ku îşkenceya herî mezin dimeşandin, demogojiya wan a mezin îro ger hinekî derketibe holê, dibe ku em pê şad bibin, lê ne ewqas jî. Em nikarin şad bibin, ji ber ku hîn jî ev demogojî li pê xapandinê ye. Ev li kêleka serê me û di nava me de ne.

Ji bo vê taybet destnîşan dikim; di nava piraniya we de ev jî yek ji wan bû, heta weke PKK'yiyek bû. Çima we ev xefîl ferq nekir? Ev ji bo min pir girînge, me çima ferq nekir. Bi van aliyan ve ger MHP, kontra bûya me yê gotiba,"pêwîstiya peywira wî ye, çi ji desta tê bila bike" û me yê bi asanî pêşwazî kiriba. Lê ji wan

xetertire, aloztir, di asteke neyê dîtin de, yên ku di kesayet de derdikeve holê kîne?

Tu dikarî bêjî, “ji serdemê wedetire” heta dawî ji hovitiyê re, ajoyên xwe re, navçegeriyê re, ji pêwendiyên mirov ên herî seranser re û xwe dispart xapêneriyên ji rêzê” Weke netew çi tiştên ku me parçe parçe dike hene, xwe dispê re vê; malbatgeriyê, herêmgerî, mezhebgerî, welhasil çi heye xwe dispêre wê. Çi tişta ku li beramberî dijmin ber bi lewaziyê ve dibe; bê rêxistiniye, xwe dispêre reva ji şere! Li ser navê hezkirina mirov; coşa giştî çi heye êrîşî wê dike.

Di Îslamiyetê de pir navdare, hejarek dema ku xwe wisa ferz bike, divê ku mumînek çawa xwe ferz bike; ger munafiqek ewqas be, dîsa divê mumînek çawa be? Xayînek xwe ewqas ferz bike, divê ku berxwedêrek çawa be? Di vir de jî mesele ne derketina holê ya takekî ye, ruhê sedan sal, rev, yên ku nayên gelerîbûnê, netewbûnê, civakbûnê, nayê bûyîna mirovekî bi rûmet hema çi heye, çiqas bi demogojiyê ser bê girtin, di binî de yên ku di sînorê lawirtiyê de mayî, lê weke vedîtina serdemê, di bin navê pêşketina herî dawî ya demokrasiyê de xwe meşandin mijara gotinê ye.

Li beramerî dijmin ên ku ji bo şorbeyekê çil teqleyî davêje, hemû Partî ji bo şorbekê, hesteke bê ar, ji ketîbûnê re pêşkeş dike, “li ser navê berxwedêrên mezin” berxwedaniya herî mezin qaşo wî raberkiriye dayîna diyarkirin û fêm nekirina we û demeke dirêj di nava me de mayîna vana min gelekî dide fikirandin. Li ku derê lewazî, li ku derê xwedî derketina li berxwedaniya mezin, hesabê wê weke tê xwestin pirsîn nîne. Ya din ger serbixin dê ji bo me bibe windahiyeke çawa mezin.

Bawerim ev mînak ji we re “ya serxistin, ya serxistin” çiqas sotêner û devjênegere dide nîşandan. Xwezî hestên we hebûna, ev tiştên ku tên gotin we hinekî din fêmkiriba. Min dixwest zêdetir tiştan ji we re nîşan bidim. Li ser navên hestan jî, li ser navê pêwendiyan jî min taybetmendî rêz kirin. Li ser navên hemûyan biqasî ku roman bê nivîsandin min agahî dan, taktîk da. Û vana mezînbûnê nîşan didin. Divê ku hêrs vala nebin, rondikên çavan ne vala bin. Min ev tev nîşan dan. Li ku derê rondikên çavan, li ku derê hêrs û di encam de min hûn birin ku derê.

Ger em despêkirineke nû ya PKK'ê bikin, hûn nikarin ji min re bêjin; "nêzîkatiyên wasat" yan jî, "nêzîkatiyên ewqas hişk" Di dema despêkirinê de çibû, ya ku encam bîne jî dîsa ewe. Neyên xapandin, deh sal, bîst sal beriya niha, vana di gerdûnê de, li gorî qûralên xebîtînê tiştekî îfade nake. Li gorî zagonan, despêkirin û bi dawîbûna her tiştî diyare û ya rast ez jî dixwazim li gorî qanûnên gerdûnî bixebitim. Mîsyona azadiyê ya mezin ya ku min ji xwe re diyarkiriye yan jî başiya herî mezin ku min ji xwe re nasiye; xwe tevlîkirina min a ji qanûnên xwezayî re, dev ji tengbûnên heyî hinekî derbas kirin, xwe tevlî vê sedê kirine. Muhafazakariyeke mezin heye, gelek bendav li pêşiya we hatine xêzkirin. Lê ya we mîna pelê ber bi lehiyê dikeve ye. Hûn dizanin bi ber lehiyê ketina pel, nayê wateya lehîbûnê, disa diherike, bi cihekî ve dizeliqe, dirize û diçe. Lê lehî dibe okyanûs, okyanûs jî asoya bê dawî ya jiyanê îfade dike.

Hûn ê çawa vê fêm nekin? Yê ku dijmin xîtabî dike, hûn nabînin, zemînên ku hûn nikarin lê bidin, xwe ferzkirinên we ez ê çawa asanî pêşwazî bikin û beriya her tiştî weke şerkerekî ez ê çawa rehet bisekinim? Ez ê weke we vê bêrûtiyê li beramberî xwe nekim û piştî wê nebêjim, "dixwazim bijîm" negirîm, ne nalînim û şîr nexwazim. Min ji dayika xwe re jî got, "ez dayikatiya te jî naxwazim, ji şirê te jî naxwazim" û heta niha jî wisa me. Divê ku hûn jî wisa bin. Eşkere ye ku, dayikeke Kurd wisa hesab kirin, ti şîrê ku bide we qet nîne.

Belê, Fu… te ji vê nîqaşê tiştek fêm kir? Hinek axaftinên me yên girîng çêbûn. Bawerim tu hîs dikî ku ev axaftin nihek tên çi watê.

Fu.:Rarte Serokê min.

---.:Te piştî demeke dirêj, dibe ku cara yekem tu çû û te gel dît. Te hinek nûbûn dît, nasnama xwe dît. Piştî demeke dirêj, dîsa cara yekem te hewl da xwe fêm bikî, asoya te çibû, azweriya te çibû û ya din tu niha gel dibînî. Xwezî te sê axaftinên me yên dawî guhdar kiriba, mirovek çawa dihizire, çawa dibihîze, çawa bersiv dide? Ji xwe tu texmîn dikî, ne bawerim tu zêde bê wîjdan bimînî.

Fu.:Raste Serokê min.

---.:Piştî ku te gel dît, rêxistin, şer dît herî zêde ji xwe hêrs bûyî û bawerim hindik mabû dem dem tu kontrola xwe jî ji dest bidî.

Fu.:Raste Serokê min. Lê di demên dawî de min hinekî xwest bikontrol bikim û bi rastî jî hêrsa min a ku li beramberî min heyî di civîna de anî ziman.

---.: Me dahûrandina wê kir. Hêrsa min a metirsîdar me nîşan da, lê hîn di îsyana yekem jî bi xwînsariyeke çawa–mîna romanê, bawerim tu bixwînî tu dikarî romana wê jî binivîsî-di temenên biçûk de min çawa parve kir, aqlê te wê rawest e. Ger tu bi rewşa min a dehsaliya wê demê berawird bikî, mirov di vê wateyê de weke zarokê çil salî tê hesab kirin. Te guhdar kir ne wisa Ab.?

Ab.:Raste Serokê min.

---.:Min karî ez hinekî wê hêrsa xwe ya metirsîdar nîşanî we bidim? Pir vekirî hêrseke mezine.

Ab.:Berfirehe jî.

---.:Îspatkiriye, ez wisa wêjevaniyê nakim. Min çîroka xwe weke heyî ji we re vegot. Hêrsa ku tu dibihîzî pir kême. Hêrsa ku di wî temenî de li hêrsa ku min raberkiriye binêre û piştî wê encamên ku bavê min jê derxist binêre. Encama ku dayika min derxistibû hebû digot; “Tiştek ji destê te rizgar nabe!” Ev gotin pir zêde dikir. Yanî tu dibê hêrs, hinekî fêmkirina me pêwîste.  Bawerim, niha tu dixwazî herî zêde bi rastiya Serokatiyê re pêwendiya wê deyne.

Fu.:Raste Serokê min.

---.:Hûn dibînin ez heta dawî baldarim û dixwazim şiyar tevbigerim. Naxwazim qusûrekê jî bikim.

Fu.:Belê Serokê min.

---.:Ji daxwaza min a teqez serkeftinê jî kes nikare guman bike. Lê te guhdar kiriba tê bizanîba ev wisa ne asane, karekî mezin ê hesab xwestinê ye, karekî mezin ê eyarkirinê ye, tê vana pir baş ferq kiriba, lê dîsa jî bawerim ku te fêm kiriye. Dema ku tu di girtîgehê de bû te gotibû, “hevalan ez ji bîr kirime” Ne jibîrkirin, we dît ez kedeke mezin a jibîrnekirinê didim, tenê ne te, ev hemû gel jibîrnekirin. Ez ji tu kesî re zêde name nanivîsînim yan jî naxwazim bêjim ku ez çawa ji bîr nakim. Lê bi qasî min mirov jibîrnekirin, bi qasî min ne tenê mirov, xweza kevir, kurm,

çûk jî jibîrnekirine. Ya herî girîng jî ne jibîrkirine, encam derxistine. Di çi astê de ye, we hinekî ferq kir?

We ferq nekiribe ez dikarim çîroka xwe zêdetir dirêj bikim. Ditirsim we weke tê xwestin fêm nekiribe. Yanî me hinek xalên sereke nîşan dan, ger na şopandineke bê aman a hêrsê, fêmbûna arasteya jiyanê û şopandina wê heta niha jî çiqas kûr û bê amane. Hûn hîn jî di rêgeza xetê de bi israrin, lê dibe ku we şopdariya vê jî nedîtiye. Hevaltî çiye, hevrêtî çiye, hûn niha dikarin baştir fêm bikin. Xwezî ev hêza we hebûya. Bawerim we ev bi baldarî ferq kir; qaşo li ser navê temsîlkirina me, bi niyaza baş we çi kar kirine ferq kiriye. Em ê li beramberî van çawa li ber xwe bidin? Vana kîne, dixwazin çi bikin?

Xebateke sînordar me dixwest em bidin we hebû, tu çû ser kar. Nihîniya sereke a li ser kar; bi derfetên herî amade û bi derfetekî xebatê ya herî serkeftî, li beramberî xwe ferzkirina dijmin a herî bi hêz – di roja me de dibêjin kontra- xwe teng kirin, çilmisandin, hemû qenalên karanînê rawestandin, di encam de gihandina asta nikare bikar bîne, şer bike, bimeşe. Bawerim tu dixwazî vê bibêjî.

Fu.:Belê Serokê min. Ya rast ên ku hinekî dixwazin partiyê fêm bikin, rastiyan jî vî alî ve baş dibînin. Ya ku di sala 1983'an de Semîr xwest bike, ya rast li wir hinekî hatiye kirin. Yanî şêwazê rêxistineke cuda, hinekî bandorên wê hebûn. Ew derfetên amade yên ku Rêbertiyê şandin nehatin nirxandin. Ya rast li ser derfetên pir vekirî jî, li wir pirsgirêk çêbibûn. Bi gav avêtineke biçûk ve girêdayî, tenê di civîneke ji rêzê de bi pirsgirêk destnîşankirinê ve girêdayî pirsgirêkên biçûk jî ne hatin çareserkirin. Ya rast li beramberî wê çarçoveyê helwesta niyaza baş a bi zanebûn heye.

Pirsgirêk ne ya bê behremendiyê ye. Ger mirov bixwaze di gav avêtineke ji rêzê ve jî, dikare pir tiştan bike. Lê gavek ji rêzê nehatiye avêtin, pîvan ji hemû aliyan ve neyê partiyê ne, ya rast pîvanên welatparêziyê, pîvanên mirovatiyê ji dest hatine dayîn. Rêxistingeriyeke cuda ya ku divê pê bê fikirandine. Yanî Semîr û hemû provakatorên din…

---.:Niha min ji bo vê nîşanî te da: Kîna ku te di zîndanê de pêşxist, hesreta welat û bêrîkirinên gel ji bo fêmkirina girîngiya rêxistinê ji bo ku bibe ceribandinek em te dişînin wir. Ji

bîr neke ku, em di paşeroja partiya me de û bi awayekî belave di roja me de, ger em rê lê negrin jî, di dema pêşiya me de dibe ku vana her derê dagir bikin. Ez ne bawerim sîxwurên qeydkirî bin jî. Vana rewşa ruhî, kombûna bandorên civakî, kevneşopane, dibe ku ev mînakên xafleta yên ku qet xwe pênegihandine bin, ev evîndarê kariyerê, dînê derfet-îmkanan; ev pir ketî û beşekî xwe pir di jor de dîbînin bûn!..

Tesbît kirina van jî bi serê xwe yek ji xebatên herî zehmete, nêzîkatiyekê dixwaze. Çarenûsa gelekî, çarenûsa kombûna şerkeran pêk tîne di destê xwe de girtin û şêwazê vê yê zirav girtin, qaşo li ser navê nûnertiya me kirinê nihîniyên xilaskirina ne! Tu hîn jî hinekî dixwazî jiyan bikî, lê îfadeya wê jî bibîne. Yê çawa bijî? Bêyî ku rêxistin hebe, çawa bijî? Bi derfetan tê çawa bikarî bijî?

Hûn dibêjin şer, ewqas derfetên şerkirinê hebûn, çawa tê rizîn hûn dibînin û tê çawa şer bikî? Hûn çiqas bi feraseteke xapêner derdikevin rê? Ji bo şerkirinê derfetê artêşekê heye, çawa tê çarçûr kirin, tu vana nebînî tê çawa şer bikî? Di van mijaran de bawerim tê êdî hinekî wijdana xwe kom bikî û bersivên rast bibînî ji bo vê me te şand qada peywirê ya nû. Tiştekî pir zêde ez ji van ciwanan re bêjim nîne. Girtina we di asta jiyankirin û şerkirinê de niha pirsgirêkeke mezine.

Te xwest tiştna bike, lê destê te çawa hat girêdan, hêrsa xwe jî te çawa bi zorê kontrol dikir tu bînî berçavê xwe, dema ku tu bi rewşên aloztir re rû bi rû ma, tê xwe bixî çi rewşê? Niyeta baş têrê nake, çûyîna mirinê jî têrê nake; ji bo serkeftinê bi serê xwe divê ku mirov bibe xwedî huner. Vaye şerekî awarte! Lê çawa û bi kê re? Tu yê vî şerî çawa pêş bixî? Bawerim ku, tevî ezmûneke ewqas mezin, arastekirina me ya rojane nebûya, dibe ku nûnertiyeke wisa bêyî ku hûn pê bihesiyana dê we biriba mirinê. Tu jî weke qûrbanê niyeta xwe ya baş di bin navê ku ez “şer dikim” de dawiya xwe bi xwe baniya. Dîsa çi bibûya dê bi min bibûya ne wisa?

Fu.:Raste Serokê min.

---.:Ez ji bo wê ji we re dibêjim, ma”hûn ji hinek tiştan fêm dikin?” Yên ku herî bi ezmûn diçin, di dema herî zêde xwe amade dibîne de jî, dikare nihîniyeke wisa bibe. Hêjî gumanên min hene ku we jî bibin. Ez ewqas dixwazim we bikim xwedî

bandor û rayedar û di encam de yên ku diçin hemû wisa erzan diçin. Ma ne heyfa we ye yan jî ji peywirên ewqas dîrokî re hûn çawa wisa bersiv didin. Piştî ku hûn wisa bûn û şûn de, em dikarin ji van re bêjin zarok, gelo vana dikarin çi bikin? Bi ezmûna xwe ya mezin, hêza xwe ya fêrkeriyê, hêza rêvebirinê ger hûn ferz nekin, vana wê ji hev bên belavkirin.

Ji xwe we dît ne wisa, şervanên pir hêja hene, çiqasî tên çarçûr kirin? Hêmanên ku divê bibin fermandar piştî ku wisa bû, ew nirxên şer ên bilind bi hovane hatine bikaranîn, moralê şervanan ketiye, çekan jeng girtiye, amûrên teknîkî jeng girtine pergal heye ango nîne nediyare. Ewqas dilên mezin, ewqas niyetên baş, ewqas azweriyên ku dibêjin, “em ji şer re hene” cesaret perçe perçe hatiya kirin. Heta ku tu vana nebînî çawa weke berpirsyarekî PKK’ê tê xwe vekişîne nava refên têkoşînê? Weke ku min got, alikariya min a rojane nebûya, wê we hemû bibirana. Ma ez dibêjim, “yeman şer nekin, yeman sernexin” Na!

Eşkereye ku, heta dawî bi hevaltî alîkarî tê pêşkêş kirin, lê realîte di asta derbaskirina we de ye, em li ser bingehên neyênî, divê ku rê li vê bê girtin. Lê em bêjin ku, lingê min şemitî, ketim yan jî ketim tengaviyekê. Ma di nava yên ku li şûn ve dimînin yek ji wan wê tiştekî neke, wê hêza mezin raber neke? Di binê vê nihîniya fetisêner de, bi xapandinekê, bi hesta şervaniyeke şayanî xwe dibîne, bila bi feraseta merdîtiyê biçe? Ne xirabiya herî mezin ku hûn li beramberî xwe bikine? Ya ku hatiye qeydkirin çiye?

Te dilê gel dît, te ezîma ewqas şervanên ciwan dît, te ewqas mirovên me yên xweşik dît, dê ew hemû bên xerckirin û tu berpirsyarî. Hest û dil divê ku li vir rabe ser piyan. Ji bo vê divê ku hûn hêza jiyankirinê raber bikin, hêza berxwedaniyê, hêza çareseriyê raber bikin, ger heye berhemendiya we divê ku hûn vê raber bikin. Min di kesayetiya xwe de hewl da vê hinekî be jî nîşan bidim. Li ser hemû axaftinan, di xalên sereke de jî, wate lêbar bikin û xwe hinekî din tevlî bikin hûn ê bikaribin vebiguherînin pirtûkeke wêjeyî. Ma em ê niha ne bin çareserî? Bawerim gel pir zêde dixwaze me bişopîne.

Fu.:Raste Serokê min.

---.:Rêbertî û mirovên bi rêbertiyê ve girêdayî bi dijwarî dixwaze bişopîne. Şervan li benda eleqeyê ne, li benda rêvebirinê

ne. Hûn nekin kiyê bike? Teqez ez di çêkerê de ti pirsgirêkan nabînim, yên di çêkerê de ne bi qasî ku mirov bêje bê qusûrin ji kar re amade ne.

Fu.:Serokê min, çavkaniya xwe ji rabernekirina hêza fermandariyê digire. Girêdana vê çêkerê bi şer re, herî kêm seranser be jî girêdaneke wan bi partiyê re mijara gotinê ye.

---.:Ev nirxeke mezine, hêza fedayî ye.

Fu.:Di nava refan de mayîn pir girînge Serokê min.

---.:Belê, rêbazên kontrayek ji dest nerevîne ferz kirine û bi qasî ku mirina xwe bigrin berçav li benda şerin.

Fu.:Raste Serokê min. Dibêjin ku, “qet nebe ez ê biçim di sînor de şehîd bikevim yan jî herî kêm ez ê biçim li welat…

---.:Pêwîste wisa ranewestim. Me dikarî em dilê gelê xwe, cesareta çêkera xwe û fedakariya wan bînin vê astê. Yên ku bi kar nayîne kiye? Ez naxwazim zêde bikevin nava rexnekirina we, lê divê ku hûn bikevin ferqa perpirsyariya xwe. Ji ber ku yek dike tu nikarî rehet bisekinî, ev nihîniya sereke, bi vegotina te rû firîşte bû û ger ji te re maba yan jî ji dûr ve be jî hinek şiyariyên me nebûna, wê bi salan bi wî rûyî bikişandana bi bibirana.

Fu.:Raste Serokê min, hinek tiştên ku bêwate ji min re dihatin hebûn, lê digotin, “duriste, yê ku her tim dixwaze bibe alîkare.” Ya rast ev xwe xapandineke mezin bû Serokê min.

---.:Xwe xapandin bû û li ser gelekî vî xafîlî xwe çawa ferz kiriye! Niha li vir pêwîste tu bizanî xwe bigihînî vê hêzê; di nava gelê me de çi heye, kî hene? Çi qewimîne? Çima, ji bo çi? Pêwîste hûn van pirsana bi awayekî sotîner ji xwe bipirsin. Ez matmayî dimînim, çima heta niha hûn wisa nebûne. Ger hûn wisa bin, evên tifalin, yanî wê zarok çi bikin? Ji bo girtina berpirsyariyê dê wîjdanê we têr bike?

Ev bi hêza çareserkirinê gengaze. Tu dibêjî; “ez dikarim bibim qurbanê vê niyeta xwe”bê wîjdaniyeke mezine! Ji ber ku li wir gelek heye, civata artêşa şerkeran heye; wisa bicîh hiştina wan bê wîjdaniya mezine! Bîranîna hezaran şehîd heye, keda wan heye. Rû çiqas firîşte be jî, bi gotina we nûneratiya herî nerm, a baskê nerm dike. Ev baskê hişk ango nerm kîne? Vê bê wîjdaniya herî mezin di nava refên me û gelê me de di nava me de bi parçekirina me kî dike?

Fu.:Ne li cihekî ji yek kesî re, li gelek cîhan hema bêje ji her kesî re dibêje. Dibêjin di asta rêveberiyê de yek nerm, yek jî hişke; ev rêbazêkî polîsa ye.

---.:Rast bizanin pirsan bikin. Çawa dibe ku hûn vê tevgera fesadiyê a mezin bi kîja cesaretî li ser mirovê me ferz dikin? Pîvanên wî çibûn, ji bo kê kirin, belê çawa kirin? Çavkaniya vê nêzîkatiyê çiye, evîndarê çî me bû? Madem nikare bike, çima dev ji me bernade? Te tesbît kir?

Fu.:Li cihekî din derfeta jiyanê nîne. Li cihekî din ev derfet nîne.

---.:Em bêjin Kurdê xeta navîn, xayînek, xafîlek? Gelekî mezin dixwaze bi hemû tiştê xwe ve şer bike; bi sedan, hezaran şervanên xwe ve hinekî dixwaze namûsê rizgar bike; ew tenê ji bo ku vê ketîbûna xwe bijî, cesaretê ewqas tişt li ser me ferzkirinê raber dikin, em ê çi navî li vî bikin? Ger em bêjin mirovê ku islah nebûne, terbiye nedîtine wê têr bike?

Bê terbiyekî din heye, 15 sala di nava partiyê de maye, her tim xwe wisa daye jiyankirin. Em li ser vî bê terbiyeyê mezin darêzê jî ferz nakin. Bi yek gotinê ev dikare bê terbiye bimîne. Weke ku nahêlin, heta dawî dikarin bitepisînin. Ev domdariya şopdariya axatiyê ye? Ne kopyayekî êrîşker ê mêtingerî yan jî tacîr, selefxurek be?

Fu.:Dibe ku herdu bin jî Serokê min.

---.:Em kombûna van hemûyan di nava refên xwe de çawa bigrin?

Ab.:Dibe ku şopdariya çêkera civakî be. Ev dibe teysîna mêtîngerî û taybetmendiyên pergala feodal, teşegirtina kesayetan. Ya din jî di pêşketina van de niyeta baş heye. Xala ku niyeta baş xwe gihandiyê nîşan dide, ya rast ew der pir girînge. Hinek lewaziyên van bikar tînin. Nirxa ku Partî dide, yanî xala wan a ku mirov tengav nakin, arasteya wan di xwe dayîna jiyankirinê de weke dane bikartînin.

---.:Başe, tengavkirina min ya we, bi giştî tengavkirina min a partiyê ji bo ku rê li wisa bikaranîn bigrim, pêwîste ez bi rêbazên yên çawa nêzîkî we bibim? Mesele tişta ku tahrîk dike; weke ku bi ser te de têm bi ser de biçim, wê bandoreke çawa biafirîne? Gelo li vir li gel hişt ter jî neşewite? Mesele ez wisa bi ser we de jî bêm yan jî ger wisa nebe ez çawa werim? Ji ber ku

wisa bawerim ku, ger şopandina min nebûya, bi asanî dê hûn jî bi xwe re bibirana.

Fu.:Gengaze Serokê min.

---.: Wê demê ji bo ku wisa gengaz nebe ez çawa ser de biçim, divê ku ez tevdîrên çawa bigrim?

Ab.:Pêwîste pîvan bên ferzkirin Serokê min. Bikaranîna pîvanên rêxistinê, ji wan re tawîz neyê dayîn.

---.:Me ferz kir! Tu dizanî herî dawî çawa sekinî. Te şopand, lêkolîn kir? Me gelekî ferz kir û me got; “ger berdêla wê mirin be jî, dê sînor bê vekirin” Hîn jî daye rawestandin, hem jî bêyî ku bê aqil û xeyalê mirovan, bi nebesiyên kêr nehatî.

Fu.:Niha pirsgirêk ne ewe, tenê civînek jî lidar nexistiye.

---.:Tu ferz dikî, civîn çênake. Dema ku civînê jî çêdike qûryeyê gundî, yekî ji ber xwe ve tevlî civînê bûye dibêje; “ min bê cidiyeta mezin dît, civîne, ne civîne ne diyare. Cigare di dest de ye û hemû laçkatiyan dike” Qaşo li pêşberî me ev girîngî dide rêzdariyê, vê raber dikin. Di cihê herî xeter de, şervanên herî bi hêja dikevin avê, çekan dixin dest û mirovên me tên girtin. Niha wîjdanê di vir de çiye? Ger tu berdî, gel bi xwe ya herî saxlem bikî. Tu du dostan teşwîq bikî, dîsa dikarî yê herî serkeftî derxînî holê. Em bêjin ev peywîreke. Wekî din perwerde dike? Ewqas nirxandin, ewqas dem mijara gotinê ye. Tenê yekî ji wan jî ji bo fêmkirinê eleqe nîşan neda.

Em her roj civîna çawa çêdikin? Li ser navê PKK’ê çiqas xirabkar jî derkevin, niha çiqas yên bi pergalê dilîzin hebin jî, ji bo min ev civîna min ji bo ku PKK’ê bikim PKK têr dike. Lê ewqas derfet heye, tenê civînek jî pêşnexistin mijara gotinê ye. Pêwendiyên bi gel re; gelê ku pir zêde girêdayî ye jî bi rêzdarî dest negirtin heye. Başe, ev kî ye? Yê ku xwe li gorî lewazî û nebesiyên gel eyarkirine, Partî dîsa li gorî zanyariyên me yên hevrêtiyê eyarkiriye, li gorî hemû zehmetiyên şer eyarkiriye, yanî di wateya bersiv nedayînê de nêzîk dibe.

Kî dizane di cihana van ya hundirîn de çi çawa derbas dibin? Dema ku raye di destê xwe de kom dike, kadro jî bi xwe ve girê da, hemû esasên bikaranînê xetimand bi vî rengî paşatiya rojekê zevt dike, bandoker dibe, kariyerek van têr dike. Gelo wisa dizanin ku xwedî hêzin?

Fu.:Azweriya kariyerê ya ku ewqas zêde mirov bandor bike gelo dibe?

---.: Encama yê ku zaafê xwe hene, lewaziyên xwe hene wê kariyeristekî mezin jêderdikeve. Vana tespîtên girîngin. Tu dibêjî, “dixwazim şer bikim” ez ji vê ne bigumanim. Tu dixwazî bi PKK’ê ve girêdayî jiyan bikî; wê demê heta ku tu van zaafên mezin, kariyerizmê nebînî, tu nikarî gavekê jî bavêjî. We bi çavên xwe dît, hûn zilamê rêxistinê ne, yanî ez dixwazim ji we re bêjim PKK’yî. Bêguman ji bîst salan zêdetire hûn hevalên rê ne. Ger hûn yên ku wisa kariyerizmê, weke encamên zaafên mezin ya ku tê ferzkirin nebînin, wê demê hûn ê çawa bikaribin nûnertiya PKK’ê bikin û ger ez şiyariyên xwe li van nekim, wê we daqurtînin û biçin. Bandorên asta navîn, ên pergalê li ser we ferz dikin. Ger destwerdan nekim dê we bixeniqînin û bibin. Tê bikarî bibî kadroyê berpirsyar yê PKK’ê?

Hemû şaneyên PKK’ê, asoyê gelê me, damarên ku her tim giyan-xwîn didin dixwazin bixetimînin. Ji aliyê gelek kesan ve, bi niyeta baş, bi rûyên pir rûpoş tê kirin. Divê ku em vê ronî bikin. Ji xwe ez li fedakariya we jî dinêrim, matmayî dimînim. Tu çi li min dîkî bike, şêwaza ku li ser we serwere nadim şerkirin, meşandina min qet nayê fikirandin. Nikarim bêjim, “di nava yek kêliyê de xwe ber bi rêxistin û şerê herî xeter ve bibezîne” nikarim wisa bikim yan jî wisa nayê kirin. Lê mixabin, piraniya we wisa dikin. Tu çiqas dikarî li gorî rastiyên rêxistinê bimeşî, bide meşandin? Te bersiv da van pirsan? Ger te nedaye tu çawa dikarî rehet rawestî? Di vê mijarê de, “tenê nabêjim em qûralên rêxistinê bikar bînin” Li gorî min wijdanê şoreşgerekî heye, moral heye, divê ku mirov li wê binere û bersiv bide.

Ma ez nizamim we bînim partîbûnê, ez kêm mînakan didim yan jî kêm derfet pêşkêş dikim?

Fu.:Na Serokê min, teqez ne wisa ye.

---.: Derfetên pir mezin tên pêşkêşkirin. Ma bi min re çiqas dikare li qusûra bê gerîn?

Fu.:Teqez nîne Serokê min.

---.:Çima? Hinekî şopandina Rêbertiyê gelek encamên baş derdixîne holê. Lê nîşandana vê em li vir bihêlin, başe ewqas ferzkirin çine? Ma ez zilamekî pir belengazim, pir bê îktîdarim,

pir kêmhişim, pir cuda tê nirxandin? Divê ku hûn hinekî vê fêm bikin.

Fu.:Ya rast hinekî ketîbûnên me yên heyî ne Serokê min.

---.: Ecêb! Mesele hûn dixwazin bibin leşker. Kadroyê fermandariyê, tenê kêliyekê be jî divê ku çavê xwe ji aso qût neke. Ez ê nebêjim ezaleyên wan ewqas nepixî, lê her tim şiyare. Tu dikarî hinekî bêjî tembelî, belê! Tê bêjî ji baldarî, perprisyariyê dûr nemîne, tê bêjî xwe di nava dûmana cixarê de winda neke. Vana şayanî fermandariyê nînin. Ez li beramberî feraseta we ya fermandariyê xemgînim, matmayî dimînim. Ji ber ku ji gelê me re fermandariyeke pêwîste. Pêwîste hûn axaftinên dawî yên Îlonê jî bişopînin. Bi ser de çûneke awarte heye. Nikarin komeke fermandar jî di qadê de bicîh bikin û çiqasî ezez dimînin, çiqas xirab winda dikin? Ma ev rewa ye?

Bûyîna komeke bibandor a fermandar, yê ku pir zêde bi moral, li ser esasê îşleyîşê serwer, yên ku awarte nebesiyan dibîne, yanî yê ku mirovan perwerde dike û dike leşker û bi vî rengî dibêje, “ez heme.” Em yekî tenê jî yên wisa nabînin, hesret man! Ma hûn wisa bibûna dê qiyamet rabe? Wisa bûyîn nexweşike? Tembelî çi dide qezenckirin? Ti tiştekî! Şêwazên jiyanên din çi didin qezenckirin?

Fu.: Her tiştî dibe.

---.: Em hesretî gelê xwe gihandina asteke bi vî rengî ne. Binêrin, ez dixwazim waneyê bê aman bi meşînim. Li gorî min em neçarin di her kêliyê de bibim komeke şoreşgerên wisa. Divê ku ti tevgerîn û fikrên wisa ji we rizgar nebin û em li ser hemûyan jî serwer in, em ji hemûyan re çareserîne, Rêbertî ev e. Rêberên gel teqez divê ku wisa bin. Ez hêjî çawa rojane li pê dahûrandin, hilberînê me; divê ku hûn vê bibînin. Tenê ne hûn, evê ku nû tevlîbûne jî ez çiqas girîngî didim mezinkirina wan û piraniya wan ne di ferqê de ne. Yanî wê dijmin we bikuje. Tu dibêjî bi tembelî jiyankirin; nirxa wî ya çend qurişan heye? Ya rast ew jî nakokiyeke, ez ne bawerim hûn bi tembelî bijîn jî.

Yên li vir hemû li me dinêrin, ger hinek tişt fêm kiribin, dema ku berê xwe didin xebatên hinek qadan gelo wê di asta pêkanîna waneyeke me de bin? Ger na, bi salane weke ku hûn dikin, pifî cixarê bike, bê kontrol raze, bê kontrol baxive, baldarî, hestyarî çiqase nediyarin. Pir bi xetere û ger ev wisa biçin ev

sextekar jî, mamosteyên van ên aqil, bibin rêberên wan, were û aram bibe; ma gengaze? Divê ku ev kar bên çareserkirin.

Piştî çend rojê din şûn de dibe ku em we belav bikin; ger bê amadekarî biçin, wê zû li nav biçin. Hemû yekîneyên me yên partiyê, yên şer wisa serwer nebin, xwe negihînin kombûna fermandarên wisa, ew nûçeyên em her roj dibihizîn hene, nûçeyên ku dilê mirov dişewîtînin û li berambarî vê qîjên dijmin ên serkeftinê hene, hema bêje wê teqez bikin. Ev car were û mezin nebe, were û nekeve ferqa berpirsyariyên xwe! Vaye herî dawî nûçeyên Dêrsimê! Dîsa me gihand demeke berxwedaniyê, binêre dijmin jî çi ferz kir! Uslûbê dagirker ê berê li ser gel ferz kir. Yanî tu dibêjî berxwedanî, xwe gihandina Dêrsimê, hinek tişt kirin pir zehmete. Li yên ku niha tên kirin binêre û wate bidê.

Bi şopandina me ya nêzîkî bîst salan em ji ku derê hatin ku derê. Tu niha dikarî baştir fêm bikî. Pêwîst nake tu zêde bitirsî. Berxwedaniya me naşibe berxwedaniya kevin. Heta tu dizanî, heta te jî dikarî bi carekê îsyan bikî biçî; me ew xeterî jî ji holê rakir. Wisa didome û diçe, ev jî çareseriyeke mezine, ev jî tolgirtineke. Me çîroka wê jî piralî da. Xeyalên Dêrsimê hebûn ne wisa?

Fu.:Raste Serokê min.

---.: Ger ev rastiya şoreşgerî ya mezin nebûya, li şûna xeyalên te dê tiştek nemaba yan jî wê xeyalên te bi erdê re bibûna yek. Bêyî ku te li Dêrsimê nêrîba, dê serê te bihata jêkirin. Tê yê weke Tûncelî li Dêrsimê bifikîrî û ji bo ku tu Dêrsimê weke Dêrsim bifikirî derkevî. Divê ku mirov wisa bi ser van salan de biçe, xiyanet li xeyalan neke. Tu dizanî asane? Eşkereye ku ne asane, girîngiyeke mezin jê re tê dayîn, lê hinek xefîl û xeyalperest, xwe dixapînin û wisa dizanin ku asane. Vaye dîsa qîjên serkeftinê yên dijmin hene yan jî gotina wî “ger hûn jî serî rakin, em ê wisa li we jî bikin” heye. Vaye tê li pêşberî wan vemirîba û biçûya. Hûn dibêjin; “Kesayatiya Mêrdînê” vaye ya ku vana şayan dibînin axatiye; ji axatiya Mêrdînê hîn xirabtire.

Xeyalên xwe zindî bigire û ji bo pêkanînê jî rê û rêbaz baş hilbijêre. Ez nabêjim devji xeyalên xwe berde, berevajî. Min carekê dît, xeyal kir û ewqas pêk anî; te jî ewqas di dilê xwe de jiyankir, lê te zêde nekir, sedemên vê lêkolîn bike. Divê ku mirov bi xeyalan nêzîkî hemû derê welat bibe, lê teqez pêwîste em

girêdanê jî di navbera xeyal û rastiyan de baş çêbikin. Yek ji wan nikare vê girêdanê pêk bîne, ev pirsgirêkên mezinin! Her yek ji wan li qadekê peywirdarin; xeyalên Agirî, Serhedê, xeyalên Botanê, xeyalên Garzanê, Bîngolê û hîn jî hene. Te çiqas xemilandiye bi wan xeyalan? Di gavekê de çi qulipîn, çima?

Me hewl da em van li vir çareser bikin. Bêguman wijdana min heye, yanî, teqez divê ku em qiyametekê rakin. Qet nebe divê em li ser kesayetiya xwe bi teyisînin, me ew kir. Ger ne li beramberî van bê wîjdana serî danîna min yan jî mîna we bi safîtî xapandin, dê bûba xiyanet li xeyalên xwe kirin û dema ku mirim jî dê tenê xeyalê wê li ber çavê min bimaba. Divê ku niha em hinekî vê ber vi jiyanê ve bikişînin. Ez heyret dimînim, tê çawa ewqas nirxandinan fêm bikî, tu nikarî veguherîn, hêzeke mezin a jiyanê? Te qet ev pirs ji xwe pirsî Fu..?

Fu.: Na Serokê min, heta niha min qet ne pirsî.

---.: Niha dikarî bipirsî?

Fu.: Dipirsim Serokê min.

---.: Tê bikarî bibersivînî? Ji safitiya vê re tê bikarî bibe hêza aqil?

Fu.: Ez niha Rêbertiyê fêm dikim, Serokê min.

---.:Yanî tu niha jî fêm bikî li gorî min başe, bi rastî jî fêmkirina me pir girînge.

Fu.: ...

---.: Teqez bawerim ku heye, xwe gihandina asta têrker pir girînge.

Fu.: Têr nake, ji ber ku pir zêde hat paşde xistin.

---.: Bi niyeteke pir baş yan jî dibe ku hatibe paşdexistin, di gelek xalan de dikare nebes bimîne. Lê ger tu dîqat bikî, Rêbertî cudatire. Tu hewl bidî yek bi yek dahûrînan fêm bikî û ji xalên sereke tevbigere û kûr bike. Di vê baweriyê de me ku tu hîn jî bi îdaye yan jî jiyana asan, ji qada şer tu naxwazî bê vekişandin?

Fu.: Na Serokê min.

---.: Îhtîmaleke mezin te xwe îspatkiriye û nebawerim tu ji qada şer vekişî û bikevî ser rêyeke alçaxî.

Fu.: Raste Serokê min.

---.: Wê demê pêwîste hostatiya rêveberiya pevçûna mezin, bi rastî jî pergala wê ya fikirandinê û ya herî girîng jî bê

raberkirine. Ger na wê heyf be. Ya rast dixwazim qala gelek tiştan bikim, lê divê baweriyê de me ku we fêm kiriye û pêwîstî bi dubarekirinê nîne, ger na tiştekî nahêlim. Li gorî min mirov ne bûnewerekî wisa bi asanî winda bikeye. Bi taybet di dozên wisa de bi asanî destê xwe ji qirika hev dernaxe.

A ji we re derfet, a ji we re gelekî bi we ve hatiye girêdan, a ji we re bê sînor xwarin-vexwarin, derfetên ku we biçek bikin, a ji we re ewqas berendamên şer, a ji we re rêyên ku hatine vekirin. Vê carê jî nebêjin; "di nava dewlemendiyê de em hejariya mezin dijîn" mafê tu kesî ya gotina vê nîne.

Wekî din tiştekî ku tu dixwazî weke peyam bide heye? Tu nêzîkî welat bû, te gel dît, tê çi bêje?

Fu.:Ya rast rastiya gel giştiye rewşa ku şoreşê pêk bîne. Bi rastî jî gel bi Rêbertiyê ve girêdayî ye. Kadroyên ku bikaribin hinekî wî bidin şerkirin, potansiyela wî ber bi şoreşê ve kanalîze bikin hebe, ev gel wê pir tiştan bike. Ya rast derfetên gelek mezin di holê de hene. Divê ku ev derfet neyên heba kirin. Teqez li şûna li ser nirxên hatine afirandin rojane îdarekirin, bi awayekî teqez pêwîste ev derfetên heyî yên nû li ser bên zêdekirin. Bi şoreşgeriyeke wisa encax mirov ber bi şoreşê ve biçe yan jî şayanî Serokatî bibe.

Şoreşgeriyeke ji rêzê dikare hemû tiştî tine bike Serokê min. Ya rast derfetên heyî jî naparêze. Ji van aliyan ve bi xwe re girêdayî çêkerê jî bandor dike. Ji aliyê ruhî, derûnî ve ji hemû aliyan ve ber bi cihên din ve dibe, ji partiyê dûr dixe, ji têkoşînê dûr dixe. Ji ber vê ye ku xeteriyên pir cidî hene. Divê ku mirov Rêbertiyê rast fêm bike, Rêbertiyê bi tendurist û bi hêz bişopîne. Bi ser xwe de çûyîn şerte, bi rexnedayîn nêzîkbûn şerte. Xwe negirtin, xwe ji hemû aliyan ve vekirin, rastiya xwe naskirin û bi qasî ku nas dike xwe guhertin jî pêk tê. Guhertin û veguhertin merce. Dibe ku di vê mijarê de pirsgirêka cesaretê hebe. Yên ku rexnedayîna xwe nakin pêşketinan pêk nayînin.

---.: Pir zêde rexnedayîn, bûyîna şopdarê Rêbertiyê, li beramberî nirxan hestyariyeke mezin raberkirin…

Fu.: Bi rastî jî nirx dayîna pêwendiyê…

---.: Bûyîna hêza pêwendiyê yan jî nirxeke mezin ji pêwendiyê re dayîn...

Fu.:Bi qasî ku Rêbertiyê nas dike weke tê xwestin nirxê wê dayîn, mafê wê dayîn gengaze. Lê ji Rêbertiyê dûr ne gengaze.

---.: Vaye min ew vekir, hûn nû dikevin ferqa vê. Di rastiya Kurdan de diyardeya Rêbertiyê niha tê fêmkirin, te jî niha fêm kir. Rêbertî, bêguman ji bo şopdariyeke mezine. Eşkereye ku ne ji ber ku ez jî Rêberim, niha APO ne Rêbereke, ez şopdarekî mezinim. Tê bêjî; “tu me, rêberê min li ku derê ye”

Rêberê min welat,
Rêberê min rêgez,
Rêberê min gel,
Rêberê min nirxên ku ji mirovatiyê re hatine pêşkêşkirine.

Ez ber bi yê zirav, xweşik û rast ve dibezim. Çibû Rêbertiya min? Bawerim ji ber ku ez despêkê axivim, min xew nekirbû ne wisa? Ji ber ku xafîl nebûm, ji aliyê gelik ji we ve nebesiyên ku hûn şayanî xwe dibînin ji wan re derfet nediyîn jî bo wê ye newisa?

Fu.: Di wateya bi rêgezan ve girêdayîbûnê, bi rêgez jiyankirinê de. Ji xwe ji jiyana bê van re jiyan nayê gotin.

---.:Divê êdî hûn van fêm bikin, teqez fêm bikin. Yanî niha ez ne kesayetekî dinim, ji ber ji we hemûyan zêdetir wate didim rêgezan, ji ber ku pêdiviyên wê derbasî pratîkê dikim, ger na ti nirxeke min a din nîne. Ev pêwîste. Vaye yên ku dixwazin di Rêbertiyê de kariyer bikin, cih vekin jî neçarin wisa bin. Lê pevçûneke Rêbertiyê ya mezin heye. Ji xwe ev nihîniya sereke jî ev danî holê.

Rêbertî çiqas bilind be, çiqas çereserker be, çiqas hestyarî be, çiqas vekirê qenalan be, çiqas karhêner be, çiqas ji dil be, çiqas rêxistin, civîn çiqas hevgirê derfetan be; sexteyê wê, kariyerîst yan jî ji dervî vê ji yên neyênî çi hebe kombûna wan hemûyan û bi teysîna wan xwe wisa ferz dike. Rewşeke pê neyê bawerkirin a rêbertiya dijber derdikeve holê. Vana rêberên dijberin, ne şopdarin, kesayetiyên dijberin. Min bi dehşet ev ferq kirin, ger em nebin şopdarên bê aman, dijber çiqas xeterin. Bawerim hema hûn ketin nava hesta tawanbariyê, ji ber ku ev xeteriyeke, ewqas derfetên Rêbertiyê çawa bi erdê re dikin yek?

Fu.: Raste Serokê min. Ya rast mina dapoşîna perdeyekê bû. Zûtir dikarî bihata derxistin. Di holê de rastiyeke hebû, lê

nedîtin ne gengaz bû Serokê min. Şoreşgerekî hinekî hevgirtî dikarî ji vê derketa rê û bi asanî venêrîn bikira, tevdîr bigirta. Ez wê ji aliyê xwe ve efu nakim. Ji bo min xalake pir girînge.

---.:Ez tenê ji bo wir nabêjim; hemû jiyana PKK'ê bûne berçav. Ger te di dema xwe û li her cihî mudaxele kiriba, dê serkeftin çiqas nêzîk ba. Serkeftina ku hat windakirin û binketina giran a ku xwe ferz kir, gelo çi nabe, tu niha dikarî texmîn bikî?

Fu.:Raste Serokê min.

---.: Hemû ax-waxên berxwedaniya hezaran sal, hemû hêvî, hemû dil, hemû xwînên ku hatine rijandin, ked, roniya çav ji bo ku careke din zindî nebe ji dest diçe. Ger tu berpirsyarê Rêbertiyeke dîrokî ye, dê dilê te ewqas bi dîrokê ve girêdayî bimîne. Tu wisa bi dîrokê ve girêdayî ma, ma gengaze ku tu tembel bimînî yan jî gengaze tu şiyar tevnegerî? Dev ji wî berde, li gelê ber serê xwe rojane dijî binêre, naxwe, nade xwarin, wan derfetan dide. Min di rapora yekî de dît. Dibêje; "pariyeke nanê zûwa nabîne, ger dahatekî dest dixe wê jî weke dahat dide partiyê" Yên wisa gelekin. Naxwe, venaxwe, ji partiyê re dixebite, yên wisa bi hezaran hene di nava gel de û hûn di nava gelekî wisa de ne.

Em li wan nirxên ku tên çarçûrkirin binêrin; gelo perê çend kedkaran dike? Ew çekên jeng digirin, amûrên din ên teknîkî, pirtûk… Tenê tu hesabê pere bike nikare ji bîni derkeve. Dîsa xerckirinên pir erzan hene. Ya herî girîng jî xerckirin û hilberîna wê negirtin heye. Xiyaneta li kedkarê hejar, kedkarê ku her tiştê xwe dide de îca çiye? Divê ku mirov hesabê van bipirse.

Ev nihînî divê ku hinekî ji aliyê wîjdanî ve jî bê lêpirsînkirin. Dixwazim bal bikişînim ser vê. Dibe ku pir niyet baş bin jî. Gelo ez jî niha têrkerim? Dîkat bikin, hêjî rewşeke klasîk nîne; tenê nermbûneke xebatê raber dikim. Lê çawa dixebite, tê jiyankirin, tevî vana hemûyan jî, ji xwe dipirsim te girêdana vî gelî, eleqeya vî gelî heq kiriye. Heta tevî ku me ev mezinbûn hemû pêk anîne jî ji xwe dibirsim; "gelo şayanî Rêbertiya vî gelî me" û bi vî rengî her roj xwe dadirizînim. Ger perpirsyariya min heye, "ez çiqas berpirsyarim" xwe bi awayekî vekirî datînim holê. Dixwaze bi ecibînin, dixwaze ne ecibînin. Min got ger hinek ji we baş dijîn, werin min ji vî barî rizgar bikin. Behremendiyên ku bi min re rabûne ser piyan û yên hemû çêkerê

berawird bikin, bi qasî çiyayan ferq heye û piranî ber bi îstîkameta berevajî vê dimeşin. Divê ku bên sererastkirin.

Li ser navê gelan divê hem mirov rast baxive, hem jî mezin baxive. Ez ji hemû aliyan ve perteka xwe anîna ziman a we re tiştekî nabêjim. Dîsa hêrsbûn jî di cihê xwe de ye, lê divê ku ev bi hunerê polîtîk ve bê înşakirin. Bikevin nava hemû çêkerê, bikevin nava gel, dema ku pêwîst kir mezin qîr bidin, dema pêwîst kir mezin baxivin, pêwîst kir mezin ferman bidin, lê bi rastî bila nêzîkî şêwazê hunerî yê ku polîtîkaya me serkeftî dike be. Ger na biçe belav bike, “min xwe winda kir” nabe. Bawerim ku hûn min difikirin, heta hûn dixwazin bi min re bibin alîkar jî, lê gelo tu dikarî ser bixî?

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Ger nebin bar bextewer bin.

Fu.: Belê Serokê min.

---.:Me yek ji hevalê xwe yê herî kevn ji vir rêwî kiribû. Vaye hevalê me yê C. B. Got; “ez ê girîngiyeke taybet bidim ji bo ku zirarê nedim” Weke ku erka wî zirardayîna me ye. Lê di wateyekê de jî mafdar e; ji ber ku li pratîkê dinêre, nikare ji zirardayîna mezin wî dûr bigire. Nirxandineke di cih de ye, lê nebese. Erka şoreşgerekî ne zirardayîna min e. Divê ku li ser esasê peywirên xwe weke parvekirina mezin bê nirxandin ne wisa?

Fu.: Raste Serokê min.

---.:Dibe ku ez hinekî westiya bim. Hûn li vir vehesiyane. Hûn hinekî barê giran rakin ma wê çi bibe? Divê ku em hinekî jî wiha bin ne wisa? Her ku diçe zêdetir barê Rêbertiyê dayîna ser milê min ne raste. Ji bo min dibêjin; “dîktatoriyê dike” dîktatoriya çi! Ez ê devjê berdim wê bêjin, “revî” Xwezî we barê partiyê di nava xwe de parve kiriba, xwezî hûn barê navendê parve bikin ku ez jî bikarim xwe şûn de bidim, wê dinya hemû bibe ya min.

Ji xwe ez mirovekî bi kedê dijîme. Bi qasî ku bikarim xwe îdare bikim dikarim bixebitim. Yanî dema ku em dibêjim; “gelo em ê bikarin ji binî derkevin” em ewqas berpirsyar nêzîk dibin. Hûn nikarin bi asanî nêzîk bibin, bi asanî ji nav derkevin. Lê hinekî jî ez ê hewl bidim berpirsyariyê bixim ser milê we. Dibe ku hûn di vê çavdêriyê de bûn û we digot, “gelo em ê çawa nêzîkî peywiran bibin, gelo wê Partî çawa me qebûl bike” û dibe

ku hûn bi qiswet jî bûn, bi salane gav bi gav ez hewl didim we nêzîkî peywiran bikim. Û hûn pir jî bi xwestek bûn.

Ez ji we re didim nîşandan ku ez çawa me. Vana hemûyan weke mînak jî digrim dest. Xwe gihandina peywirê, peywir diyarkirin ne asane. Yanî ger hûn bêjin; “bê sînor ji parvekirina peywirê re em hene” ev ne asane. Ji ber ku ez bawerim hûn hinekî bi aqilin vana dibêjim. Divê ku hûn hîn kûrtir bikarin bifikirin û karên mezin ji dest we bên êdî. Bêyî ku hûn bên lîstokên ewqas xayînên di nava we de, xefîl, bêyî ku bên lîstoka yên ku xwedî fikra sabîtin, însîyatifa PKK’, hestyariya PKK’ê, kabîliyeta serkeftina rast a PKK’ê, tempoya wê, bi şêwazê lêdanê nîşan bidin û bi vê dijwariyê bikin her bijî ji we re.

Hûn şayanî peywiran dîtin ango nedîtin nîne, em girîngî didin şêwazê encamgir û watedar. Bi mehane weke ku em we ji sifirê perwerde dikin eleqe nîşan didin, xizmet tê pêşkêşkirin. Vaye we hinek alîkarên me dîtin. Derfetên pir mezin, eleqeyê çawa bi dijbertiyê bikar tînin? Ez hinekan bigrim pêşberî xwe wê tenê bigirî û binale. Tu çima xwe dixî vê rewşê? Ma min xwest hêza we ya gotin, hêza we ya çalakiyê ewqas lewaz be? Na! Derfet û îmkanên pir mezin hatin pêşkêşkirin, tu dikarî bibî xwedî îdayeke mezin, her wiha wê rêzeke mezin jî jê re bihata dayîn. Ev derfetên we heta dawî hebûn.

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Te çima bikar nanî. Wê demê te xwest tu kê bixapînî û di encam de kî hat xapandin? Ji ber ku ez vê dikim ji min re dibêjin; “despêkê camêr bilind dike, piştre jî dixe” Piştî beşek ji provakatoran jî ketin vê dibêjin. Wisa ye? Edalet çigot? Rewşeke van ya wisa pir bilindbûnê jî nebû, pir di jêr de bûn, pir ketîbûn. Çawa bi hewldaneke mezin me hewl da em wan bilind bikin? Dema ku ev li bilindahiyê bûn, gelo xwe çi hesab dikirin, ev fêm nedikirin? Ji bo ku tu di bilindahiyê de bî, ger tu çûkek be jî divê ku tu baskê xwe li hev bidî. Ger tu baskê xwe li hev nedî tu yê bikevî.

Ev dixwazin li ser xaliya Eladdîn rûnin. Bi fermana xwedê jî bi xaliyê dixwazin li hemû cihanê bigerin û ez jî dibêjim ku, xaliya Eladdîn nîne! Li gorî qanûnên xwezayê mukemela herî dawî ya teknîk firokeyekê û te difirîne; çûk jî bi hinekî li hevdana baskên xwe dikarin li hewa bimînin. Hûn jî dibêjin; “yê ku bask li

hev dide bila ne li gorî çûk be, lê dîsa jî ez li bilindahiyê bim" Vaye ya ku hemû heval dixwazin ev e. Dema ku dikeve jî dibêje; "çima te em xistin" Ger wijdanê we hebe, ji bo ku ez xwe di vê asta Rêbertiyê de bigrim çawa li ber xwe didim lê binêrin; ez ji vê re nebêjim bilindbûn jî, xaleke pir zêde ya berxwedêriye.

Min hemû jiyana xwe ji we re vekir. Li ber xwe danbûnek mezin, berxwedaneke. Tenê ji bo ku bikarim li ser navê gelekî bim, ji bo îdarekirina rewşa, "yanî gel temsîl dike, ji gele" min ev kir. Asan nebûna vê min hinekî nîşanî we da. Niha bifikirin, yê ku di asta herî jor de li ser vî karî ewqas li ber xwe dide, yên ku xwe ji min jî jordetir dibînin qet baskê xwe li hevnedan, berxwedanî rabernekirina te tê çi wateyê? Minê gotiba xewna zarokekî, lê ne ewe jî. Lê em demekê zûtir vê nexweşiyê bidin derbaskirin. Ya din min qet xwe wisa bilindbûyî hesab nekiriye, nabînim, weke ku min got, weke xizmetkarê axur temîzkirinê dibînim. Yanî axwurên ku bi hezaran sal hatine qirêjkirin hene, bi ser gel de kirine, vaye ji bo paqijkirina wan qirêjiyan zêde dixebitim.

Hinek derketine dibêjin; " Rêbertî bilindbûne, di nava PKK'ê de te astek girt, di hemû temenê xwe de ya ku te hêvî nedikir giştiye wê, tu kes nikare destê xwe bide te" Ya ku ev xafîl dike jî ne ev e? Qoşo kariyer digre, ast digre. Em bêjin xewna wî ya hezaran sal pêk tê. Bawerim divê mijarê de metirsîdar dibin. Pir zêde hesaban dike, vesaziyan çêdikin. Di Kurdistanê de ev nexweşî heye. Yên derveyî me dibin, ên di nava me de dibin, heta dijmin be jî wisa ye. Em li Tansû binêrin, girêdana bilindbûnê di perçiqandina PKK'ê de dibîne û metirsîdar dibe. Dijmine wê bike, lê yên di nava me de wisa saxte daxwaza wan a bilindbûnê nayê fêmkirin.

Hûn naxwazin fêm bikin, bûyera ku hûn jê re dibêjin tembeltî wisa watedar dibe. Li ser xaliya Eladdîn ber bi hewayê ve firîn li xweşiya her kesî diçe. Lê ev tenê xewneke, tenê xalîyeke kêrnehatiye. Kariyeristên PKK'ê jî wisa ne. Dîqat bikin, kariyeristên PKK'ê ne bêkarin, bê kedin û ne sengerên ku bên dagirkirinin, heta kariyer û sengerên ku herî zêde xebatê dixwazine. Ez ji we hemûyan re vekirî dibêjim. Werin kariyera min parve bikin yan jî bîzat dagir bikin, hinekî pêwistiya wê pêk bînin; ger hûn pêk bînin hûn yên herî mezinin.

Mîratxwurî çiye? Tam jî di vê xalê de mirovên ku tên zanîn hene, gelek şervanên ku te bipejirînin hene. Dê ber bi hemû cureyên xizmetê ve bibezin. Biçin, ji axayê herî paşketî yê Kurdan bipirsin, di gundê xwe de nikare axatiyê bike, lê di nava refên PKK'ê de yên ku dixwazin bibin axa hene. Dibêjim, "nekin" axayê herî kevnar ê Kurd jî ger nikare weke ku hûn dijîn jiyan bike, tê çawa axatiyê bike? Dibêje; "em wisa fêrbûne" divê ku ev bê derbaskirin. Ger nebe bi revê hereşe li me dike. Weke ku tu dizanî axatiyê bikî, tê bizanî di nava rêxistinê de jî jiyan bikî. Divê ku di vir de darêz bikeve dewrê. Tu bi salan weke axa li ser pişta me jiyayî. Dema ku me rastî jî nîşanî te dan, tu ji hemû aliyan ve vedimirî. Tu dibêjî; "ez di tengezariyê de me, xilas bûm" Gora xwe bi xwe bikole, bi xwe bikeve navê. Tu nikarî wisa bêrûtiyê bikî.

Vaye terbiya gel, vaye terbiya Rêbertiyê! Bêguman fêmkirina we jî têrê nake, teqez divê ku hûn fêm bikin, bizanin bi sedan kesî bidin fêmkirin. Vaye hûn hema dibêjin me rakir perwerdê, civîn li ser civînê çêkir. Ez her civîneke xwe wisa derbas dikim. Heta tenê bi kesekî re bi demjimêran eleqeder dibim. We bi salan ev başguh kir. Ev hemû divê ku wisa bên derbaskirin, hem jî bê aman. Ji ber ku ciwan zêde ne westiyane. Ez hîn çawa bikim? Tevî vê jî hûn dibînin; hûn tempo, asta eleqederiyê dibînin. Çiqas watedar nêzîkatî ji we re tê kirin, hûn dibin şahid. Bêyî ku hûn kedeke ji rêzê raber bikin, çawa dikarin bêjin; "em mîlîtanin" Ji me re jî mîlîtanî pêwîste, ger na dê me di kevçiyeke av de bifetisînin.

Mirin heye, santîmek li pêşiya me mirin li benda me ye! Çima ev bibe çarenûsa we? Ya rast hûn dixwazin ciwaniya xwe bijîn, lê ewqas bi xefîlî, ewqas ji ber xwe ve, ewqas nebes dibe ku, ji bo ez li wir ewqas bi aman dibim. Rêbertî, yê ku vê dibîne, nebes, bersiv dide şaşitiyan, ya herî girîng jî dizane asta têrkeriyê tengav bike yanî kesekî wisa ye. Di hemû qadan de ev wisa ye. Çima dibêjim? Yên ku di nava mercên herî rehet de ne, yên ku herî bi wate dikarin ji Rêbertiyê encam bigrin, nikarin nêzîkatiyeke ji rêzê a peywireke rast raber bikin. Dikarin xor li keda xwe, li mirovê xwe binêrin.

Bêguman gelekî ewqas bênirx hatiye hiştin, dibe şahidê takê wisa û dê tak jî bikevin nav xwe ferzkirinên wisa yên bênirx.

Em dixwazin rê li vê bigrin. Gelo çiqas dikare bandor bike yan jî werin bandor nebin. Yên ku pêş nakevin kîne? Bila yêk derkeve bêje; "ez pêşnakevim, ez nayêm rêvebirinê."

Di nava rexneyeke ewqas mezin de, bawerim hûn çareseriya mezin jî dibînin. Wiha ka ez Rêbertiya pratîkî bikim, werin em binêrin nemeşin. Bi qasî ku hûn şayanî xwe dibînin gengaze? Bila yekîneya min bêje; "ez ewqas bê amadekarî me, bê perwerde me, di hemû qûralên şer de dervî pîvanê me" de bila bêje, ma gengaze? Tam jî hûn di vê xalê de winda dikin. Dema ku we aliyê xwe yê bihêz yan jî Rêbertiya taxtîkî, heta Rêbertiya ku daxwaza şervanan temam kir, wê demê bibin hûn ê bikarin çi ser bixin. Ev mafê şervane. De binêrin bê ka îca artêşbûn çawa bilind dibe, çalekî çawa xedar lê dide û bi encam dibe. Ji we re ev pêwîste.

Her kêliyeke min hesab pirsîneke. Xewkirin nîne, di tempoyê de ketin nîne, nedîtin nabe, ji moral û coşê dûrbûn qet nabe, bê pîvan-hesab kirin gav nayê avêtin. Deka bila dijmin were û min asteng bike. Astengiyên derve, yên hundirîn weke ku hûn pir zêde li xwe tînin, bila min jî asteng bike. Ger stîl wisa be, şêwaz wisa be, astengkirin gengaze? Ez tawanbariyeke erzan li we nakim. Bi salan ji bo ez jî bigihêjim van encaman min sebir kir. Dibe ku temenê we jî têra xwe gihandina van encaman neke, ez wê pir balkêş pêşkêş dikim. Hêjî ya ku ji we re pêwîste şêwazê xebata di nirxa zêr de ye. Şêwazê serdeçûna armacan li oxira wê we canê xwe feda kiriye, serkeftina serdeçûnê, ji hemû aliyan ve amadekirina wê û meşandina wê ye.

Ez nikarim rehet jî bibim, çima? Ger ne di çarçoveya civînekê de bûya, bifikirin ez li yek ji wan çiyaya me, heta hejmareke firehtir di bin fermandariya min de ye, wan kêmasiyên ku dikin gengaz bû ku bê gotin; "çima em nabin fermanber, taxim bê morale, bê cîhe, bê lojîstîke, rast nameşe, dijmin, pêşiya difna xwe nabîne?" ma gengaz bû. Ez li beramberî şêwazê we yê Rêbertiyê matmayî dimînim, şerkeriya we. Li vir ez çawa pê karim, civînekê çawa dimeşînim, fêr bibin. Dikarim zêdetir jî vekim.

Hûn zehmetiyan dijîn yan jî berfirehiya vir ji ya çiyê cudatire. Li çiyê mirov zehemtiyên mestir hîs dike. Dijmin jî li ber serê wê ye di nava hev de ye, baldartir dibe. Tenê kêliyekê jî

pêdiviya parastinê paşçav nake. Fersendên lêdanê kêlî bi kêlî dişopîne û nikare nenirxîne. Hişyariya di vir de rewşa di amadebûnê de, li çiyê di bin guhê dijmin de hezar qat zêdetir tê pêşxistin. Û hesab xwestina dîrokî bi vî şêwazî tê meşandin.

Çendika ji we wisa kiriba, yên ku dûrî ji kûrahî ve dibîne, li gorî vê bi qasî sebrê yên ku dikarin tempo jî bigirin hebûna, bibînin we yê heya niha çend serkeftin bidest xistibana. Yanî hinekî dûrî dîtin gelek zehmete? Dîsa hêz bi bandorgerî pêşwazîkirin derfet û îmkanên heyî baş nirxandin, xwe hinekî eyarkirin, rêkûpêk kirin ji we re pir zehmet tê?

Ya ku fêm nakim ev e, berevajî vê dê kêlî bi kêlî we nebe? Hûn ê çima ewqas qesta xwe nekin? Zimanê we tê girtin hema bêje lingên we weke ku felçbûyî hûn nikarin bimeşin, baxivin û tevî ku hûn saxlemin. Ma sihêr li we kirin? Di holê de ez heme, min sêhrên ku li ser min kiribûn çawa hilweşand, min şêwazê xwe çawa dît. Şêwazê Rêbertiyê yê ku we hemûyan girê dide, fermî, fiîlî û bi îspat şêwazê ku divê pê ve bê girêdan, çima ne be yê we? Hûn ê bi vê jî bifikirin? Na! Hûn ê hemû mezinî, dewlemendiyan bidest bixin.

Min sernexist, hûn dibînin. Feqîrekî weke min, ji bo ku deh qurişan ji bavê xwe qut bikim min qiyamet rakir, ew roj hîn jî dibîra min de ye. Ji bo ku nanekî tîrê bigrim di nava êrîşê de me, min niha xwe gihand asta herî bibandor a welat û gelekî. Yên ku alîkariyê ji min dixwazin, yên ku di Kurdistanê de herî zêde xwe axa didîtine. Çawa bû ev çîrok? Me ew ji we re vegot. Min gelek xist nava vî karî, min ber bi rêya rast ve kişand û da xebitandin. Ger ev raste, tu zêdetir bikî û bide xebitandin. Ger min serxistiye bila ev bibe serxistina te jî. Xirab fêrbûn li me nayê. Dewlemendiyêkê jî tu tevlî bike!

Tevî ku em şerekî mirinê jî dimeşînin, ger ji Rêbertiyê raziye. Di dîroka me de ti demê tiştekî wisa pêk nehat. Mirovê me çi dixwaze? Pir vekiriye; hinekî pere dixwaze, hinekî eleqe dixwaze, xatir-qimetê dixwaze, rêz-hezkirinê dixwaze, jiyaneke şayanî mirovan dixwaze. Ma negengaze, pir zêde nehatiye îsparkirin? Dibe ku cara yekem di rastiya xwe ya civakî de serkeftinên neyên aqil û xeyalan me bi dest xist. Ne mûcîze ye, ji hemû aliyan ve bi zanist ve girêdayî ev serkeftin hatiye destxistin. Hûn ê çima hîn jî xwe nedinê? Yên ku hejarin hûnin, hûn teqez

erkdarê dîtin û lêgerîna vê ne. Ji ber ku dijmin em pir hejar hiştine. Pir ji rê derxistiye, pir nexweşik kiriye, pir bê rêz û bê hezkirin hiştiye. Divê ku hûn fetih bikin. Ez jî wê nîşan didim.

Hûn dibînin, ya rast ez bi xwe jî najîm. Pir zêde li xweşiya min naçe. Di dema borî de hema bêje di hemû mijaran de, di xisûsên madî û manewî de li gorî dema borî berevajî me. Piştî ku min xwe gihandê ji bo min weke pêşbirkekê bû. Hesta tenê, “min rastiyê dît” têra min dike. Ez xelata wê naxwazim, ger min bixwesta min dikarî saltanatê ava bikim, dikarî pir cuda tevbigerim. We dît ku ev pir pêwîste.

Ez li halê we dinêrim “hanî dibêjin ji bo nexweşê li ber mirinê ye ji bo ku wî bîne ser xwe derman pêwîste” hinekî jî hûn dişibin vê rewşê. Hûn ê hîn jî fêm nekin, hûn ê hîn jî nefikirin? Hûn ê bimrin! Ya rast nebes bimînin, bi nîqaşê asta têrkeriyê bi xwe bidin pêkanîn. Ez hîn jî dikarim bî kûrî û berfireh bikar bînim. Di nava we de hinekî dibêjin, “ewqas bese” ez xwe dispêrim wê û hîn jî serde diçim. Bi min re di serdeçûnê de sînor nîne. Teqez divê hûn rast fêm bikin.

Hevalên bi ezmûn hinekî dizanin. Tevlîbûna wan bîst salan derbas dike, hîn jî dibêjim, “em nû dest bi fêmkirina Rêbertiyê dikin.” Ger di dema xwe de şêwaz girtibana, dikarîn gelek serkeftinan di jiyana xwe de bi cîh bikirana. Hûn hema dest bi fêmkirinê bikin da ku, hûn bikarin gelek serkeftinan tê de bicîh bikin. Ger waneyên ji ezmûnan bên girtin hebe, qet nebe hûn hema fêm bikin.

Jiyana bê serkeftin, binkeftî mirine. Bila hesab dîsa ya we be, lê bila weke hesabê demeke beriya niha nihîniya wan xefîlan nebe. Hesabê serkeftinê be. Di serî de hesab li beramberî xwe bidin, despêkê efukirinê di nava xwe de pêk bînin. Dema ku hûn bawer bûn ku hûn vê tam dikin li nava hemû refan belav bikin. Teqez ez wisa me. Berê hesab bi xwe re dikim, despêkê dest dixim qirka xwe, biryarê di hundirê xwe de didim, dema ku ji rastiya wê piştrast bûm, kêliya ku min jê bawer kir, tu dibînî carekê bi ser derdorê de çûm û ger ev cihan be jî nikare li pêşberî min raweste. Çima? Ji ber ku min di dilê xwe de ya rast dîtiye. Hêza xwe ji ku derê digrim, ji hesab pirsîneke bi vî corî.

Ger hûn wisa bikin hûn ê bibînin ku derfetên serkeftinê çiqas zêde bûne. Di gel pir tiştên din de, ya rast hûn dizanin ku ez

qet nayêm xapandin. Li ser min ji aliyê dostan, ji aliyê dijmin, ji aliyê xefîlên di nava me de xeletî çiqas tê ferzkirin? Ger min bawer kiriba, ketibama wê ji min eser bimaya? Ne heta niha, dibe ku hîn di çend rojên îsyanê de eser nemaba.

Hûn dibînin, bi hemû safîtiya xwe, ji diliya xwe tevî ku dijîm jî, îstixbarata dijmin a herî ji xwe bawer, tenê ne îstîxbarata wan jî, rêxistina xistinê, dîsa bi hestyariyeke mezin ez çawa derbas dikim. Ewqas durû hene, xafîl hene, me çawa hemû derbas kirin. Hema bêje yên ku min bişopînin, li beramberî hejmareke mirov heya an nîne. Ji rêderxistinê re berandame, hem jî jixweber bi koman hene, tevî hêjmara me jî, min çawa arasteyek şopand. Yê ku tu jê re dibêjî mirov divê ku hinekî wisa be yan jî ger hûn dixwazin qala asta Rêbertiyê bikin, divê ku hûn hinekî vê fêm bikim.

Netewên cuda, komên cuda, komikan ji bo rêberên xwe dibistan avakirine, fêrkerî pêşxistine. Ez niha ji we re pir balkêş, bi qasî ku di hemû temenê xwe de hûn ked bidin û xwe negihînin, di cihê ku hûn dixwazin de bixwînin encam negirin perwerdeyeke wisa; perwerdeyeke Rêbertiyê, perwerda rizgariyê bêyî ku qut bikim ji we re pêşkêş dikim. Di nav de çîroka hemû mirovatiyê heye, di nav de ji hemû aliyan ve derfetên binxistina dijmin hene, xwe gihandina jiyana herî mezin heye, di nav de hêrsa xwe derbaskirin heye, hezkirina xwe bi awayekî herî mezin pêşkeşkirin heye, rêzgirtina herî mezin heye. Ji vê hêjatir çiye û ji bilî vî nirxî wekî din çi dikare we rizgar bike?

Weke her tim dibêjim, em li beramberî mirovê xwe rêzdarin. Rexne û rêzdariya ku nehatiye dîtin, dikare bê jiyîn, bi vê em dixwazin we bigihînin asta pêşwazîkirinê. Dîrok, daye nîşandan ku êdî wê wekî din nebe. Şansê kor tişta ku bike kiriye. Me jî dîroka azadiyê hinekî xist meriyetê. Ez ticarî naxwazim civata hevalan bixim tengaviyê û dibe bi şêwazê di dîroka ti rêxistinê de nehatiye dîtin bi hevaltiyê dimeşînim. Lê divê ticarî ev ber bi xafîlbûnê, wisa xwe li hewa hiştiyê ve nebe. Ev kêmasiya herî mezin a bê kirine.

Bi taybet di çarçoveya van waneyan de, teqez Rêbertiya ku pêk tê, ya ku ji aliyê serdeman ve, dîsa ji aliyê hemû dijminên roja me ya îro ve xistiye û ji xwebûnê dûr hiştiye, ji bo xwe neçarî dayîna jiyanê kiriye, şêwazê gelekî bi vî rengî û bi ser xwe ve

hatinê ye. Şêwazê bilindbûnê, şerê vê yê mezin, di binê hemû mercan de, ger pêwîst bike tenê yek kes be jî, jê re bûyîna spartek, dema pêwîst kir hemû cihan jî li dijberî be, li dijî rawestandin, bi hemû core rêbazan bi şerkirinê dê bikare ber bi encam ve biçe, teqez dê bikare serkeftinê jî bi dest bixe Rêbertî yê ku vê nîşan dide ye. Ev Rêbertî jî, bi awayekî xwezayî weke ku dibe qismetê herkesî, di encama hewldanên bi israr ya ku teqez bibe serkeftine.

Ev, heta dawî hetiye îsparkirin, ya li şûn de dimîne şopandine, ya li şûn de dimîne bê aman, lê heta dawî bihêz li ser hemû pêvajoyan xwe ferzkirin û belavkirine. Divê ku mirov bibe hêza rêveber û venerîna vê. Ev, ewqas zelala, lê bi qasî wê jî fikirandin û hema bêje ji aliyê her kesî ve yên di nava me de dixwaze bila tevlîbûneke nû be, dixwaza bila yê herî kevn be bi pêşwazîkirina peywirê û serkeftina wê jî pêk tîne teqez ya ku dikare bike Rêbertiyeke. Me wisa amade kir. Min xwe kirina mînakeke vê ya baş ser xist.

Heke pirtûkekê tenê jî naxwînin, çîrokeke biçûk fêm bikin ew jî bes e. Dibe ku hûn di dibistanên hunerî yên mezin re derbas nebin, bi guhdarkirina çîrokekê fêm bikin, ew jî bese. Dibe ku hûn di dibistaneke leşkerî, dibistaneke siyasî de derbas nebin, dîsa bi lêhûrbûna li ser çend çîrokên jiyanê yên ku me raber kirin hûn dikarin hemû waneyên pêwîst bigrin. Di vê mijarê de ya ku tê xwestin; bilindbûna eleqeya jidil, cewherî, ewqas jî hestyarî û hişyariye.

Ev hemû di nêvenga gel de pêdiviyên devjêneger ên şerin. Hûn di kîja rêxistinê de bin ev pêwîstin. Ev car ger hûn di nava me de bin, zêdetir pêwîste. Wan ferzkirinên bê aman ên dijmin ku digotin; “me di sala 1994’an de xilas nekir, teqez em ê di 1995’an de xilas bikin” em heta dawî berevajî dikin. Dest bi operasyonên ên herî mezin ên dîrokî kirine. Bi gotina wan, -împaratoriya Osmanî jî di nav de- nûnertiya herî mezin a KT’yê dikin. Tevî ku em bi derfetên sînordar bi ser de diçin, qet ne di nava şer bi xwe de ne, bi hêza qûmandayeke ji dûr tê dîtin ku di van karan de dikare serkeftî be. Hîn ji nêzîk ve, bi germahiyê û ya din jî bi mîlîtaniya girtina pişta xwe ya waneyên vê salê divê ku nêzîkatî bê raberkirin, ev vekiriye. Dibêjim, Ne serkeftin bi asanî tê bidestxistin, ne jî weke ku gelek texmîn dikin, dibêjim serkeftin gelekî zehmete. Na! Bi mercê pêdiviyên wê di asta herî kêm de jî

bê pêkanîn em dikarin bi dûrişma serkeftineke tam bi ser sala 1995’an de biçin.

Bi destkeftên niha heyî bê aman dijmin bê şopandin ji niha ve yê ku binbikeve dijmine; destkeftin ya gelê me yê ku di pêşengatiya partiya me de serdikeve ye. Tenê hûn vî şerî di xwe de bidin despêkirin, tenê bi vê dewrê bidin meşendin jî ji niha ve serkeftin teqeze. Bi çarçoveya vê dewrê ve girêdayî bimînin, bi rêbazên nêzîkatiyên ku derketine holê li qadên têkoşînê belav bikin. Yên li welat astengiyan ava bikin jî, astengiyên ku dijmin ava dike çiqas li beramberî jî rawestin, hûn ê bibînin ku bi vê hêza we yên ku hatine serxistin çawa li pê we bên. Hedefa dewrê ewqas zelal û di çarçoveya wê de jî serkeftin veşartiye. Êdî dor tê bikaranîna vî şansê ku hûn ê di ti demên jiyana xwe de nikarin bidest bixin. Bi hişyariyeke mezin a şêwazê bi karanîna vê, dor tê bi ser de çûnê.

Ji bikaranîna xwe li ser vî esasî wêdetir ti çareyeke we ya din heye? Ji serdeçûneke jê vê wêdetir ma çareyeke din we heye, azweriyeke we ya hêjatir heye? Ji bo ku hûn bi ser hedefên dijminê beramberî xwe de biçin ev kîna mezin, sedemên mûezem hene. Ji nîşandana vê wêdetir dikare bijare û azweriyke we hebe? Ger nîne, wê demê ev şans baş ne nirxandin, nirxandin û nebûna xwedî serkeftinên girîng ne gengaze. Em vî şansî didin, weke ku me ji hemû aliyan ve ronî kiriye, ger hûn jî şayanî xwe bibînin, em ê heta dawî bi we re bin û dibêjim ên ku di vî şêwazî de rê bigirin serkeftina wan teqeze.

Vê dubare dibêjim ku, hûn çiqas xwe behremend jî bidin diyarkirin, hûn neçarin li gorî qûralên sereke yên Rêbertiyê tevbigerin. Dibe ku ez bikevim rewşeke pir xirab jî, yan jî tine bibim, lê ya girîng xalên wî yên sereke ne. Ger hûn li gorî wê tevnerin wê rêgezên wî li we bikevin. Ger ez jiyan bikim, ez ê li we bidim. Ez ê çima ji hêza jiyanê re bêjim, “erê” bawerim we hinekî dît.

Dubare dibêjim; serweriya rêgezan di Kurdistanê de heye. Ev rêgez bi asanî nayên derbaskirin. Wê misoger hinek hesabê vê bixwazin. Ger hûn bi zanebûneke kûr û berpirsyariya van tevbigerin, wê camêr ji we derkevin. Ne yek dibe hezar derkevin. Ya ku niha jî çav li rê ye eve û ji bilî vê taybetmendiyên tên awatkirin, ne jî jiyan dikare gengaz be. Em ya şayanî me ye

bibînin; yekane rêya ku tê fermankirin û ya ku bigihîne armancê şere. Ji min zêdetir hûn bi cesaret û fedakariyeke mezin di nava vê de ne. Ya din di vê çarçovê de hinekî temamkirine.

Ger di dîroka Partiya me de, bi taybet di hewldanên me yên artêşbûnê de ya ku qet em ne li bendê ne, weke ku bi tu kesî ji me tiştek nedaye qezenckirin, taybetmendiyên xirab, neyênî, yên ku nayên qûral û qaydeyan, keyfî ji tembelî xwarin xwarinê em bigirin, heta bi çavsorî xwe fedakirinê çi heye, di rastiya şerê ku em pêş dibînin de yên ku ne hişyarin, neguncawin, çi hene û vê carê bi rastî jî weke ku hatiye qezenckirin, biryarkirin û weke ku di gavên yekem de hatiye avêtin hûn bimeşin dê ev serkeftin bê.

Hinek yan jî hemû dîroka lanetkirî ji min re dibêje; "serkeftin ne gengaze." Min ev gotin bi mîlyonan car guhdar kir û bersiva ku min jê re da; "serkeftin gengaze û bi vî şêwazî jî rê lê nayê girtin." Bi tena serê xwe min mîna artêşekê şer kir, heta vir anî. Ev teqez wê vê fikrê bi we re bafirîne; em di ku derê de kêm in, di ku derê de şaşin. Dil dixwest ku, we di despêkê de ev dîtiba, wisa ketibana nava vî şerî. Min dixwest ku bê ewqas şehadet bên jiyîn me serkeftin bidest xistiba, hemû jî bibana hêza fermanberên şerekî demdirêj, lê nebû. Ji windahiyên bê aman zêdetir, windahiyên dervî qûral hatin dayîn. Niha em amadene rê lêbigrin. Hinekî jî ji bo şehîdan jiyankirin ev e. Teqez heke serkeftin pêk bê wê ev bê serxistin.

Dema me despêkir şêwazekî me layîqî xwe dîtî û dide qezenckirine. Marîfetên me yên takekesî ji ejdadên me mayî ji rêderxistinên dijmin, ferzkirinên wan çi dibin bila bibin dikarîn li beramberî me rawestin? Tevî vê jî niha vîna ku dimeşe, nerîna ku ser girt ma ne ya me ye? Ez nabêjim, "her tişt di cîh de ye, misoger raste" lê ya diherikîne, rêxistin dike, di de şerkirin ev e. Wê hinek di nava me de derkevin, dikare jê baştir jî bike. Eşkereye ku dîsa jî zemînê ku me amadekiriye ji vê re derfet pêşkêş dike. Ev jî êdî çîrokeke dîrokî ye, em ji dil û can bi vê ve jî girêdayîne.

Vaye di şexsê vê dewrê de partîbûn û artêşbûna we divê li ser vî esasî pêk were. Ev perwerdeya ku me daye we, divê ku li ser vî esasî li ser rastiya têkoşîna me û ya ku dixwaze qezenc bike, ser bixe wisa bê teyisandin. Di berdêla çi de dibe bila bibe,

vî şansê xwe li ser esasê jiyaneke têkoşînê ya demdirêj divê ku hûn binirxînin û teqez qezenc bikin.

**12. Cotmeh.1994**

## Rêgirtina Me Ya Xeta Leşkerî, Ji Gelekî Xayîn, Afirandina Gelekî Azade!

---.: Civîna me ya duh di derbarê çi de bû Ab? Te rexne û rexnedayîn bi xwe da despêkirin, em dikarin çi navî li rastiya te ya rexne û rexnedayînê bikin?

Ab.: Li ser esasê xeta Rêbertiyê–ji xwe ev ji bo her mîlîtenekî pêwîste- dahûrînên ku hatin kirin me esas girt. Ya ku di xeta Rêbertiyê de tê temsîlkirin, bi giştî di Kurdistanê de temsîlkirin-nekirina taybetmendiyên mîlîtanên şoreşger, xalên xwe gihandin ango negihandina wan me nirxand, rewşe li beramberî wê, paşverûtî, sedemê berevajî bûnê me destnîşan kir. Li dûrî wê bûn, rewşên berevajî bûne derketin holê.

---.:Bi cewherî hinekî din veke. Di rastiya me ya pratîkbûn û teorîkbûnê de te çi temsîl kir, çi îfade kir?

Ab.:Di teoriyê de hinekî teng, teorî dogmatîk bi destgirtin, ya rast nêzîkatiya min hinekî şêwaza diyalektîkê û îdealîst kirina yek derket holê. Ez wisa dibînim. Di şêwaza pratîkê de neketina pratîkê, li ser vî esasî ger bikeve pratîkê jî di nava pêşketineke rast a leşkerî-siyasî de nebûn, yê ku bi çêkerê re dikeve nava li hevkirinê û heta pêre dibe yek bû. Ew bi xwe nakevê, lê dema ku dikevê jî rast nakevê, pratîka ku li ser çêkerê bandor ava nake xeteke pratîk a wisa derket holê.

---.: Te pêwendiya vê bi asta paşketî ya artêşbûnê re çawa anî ziman?

Ab.: Di pratîkê de rewşa dîtina van paşverûtiyan heye. Lê divê ku ew bên sererastkirin. Ev peywira min a sereke ye. Ez ketim nava rewşa ji dervî pratîkê lêgerîna çareseriyê. Wê jî qet çareserî ne anî, berevajî paş ve kişand, ew meylên heyî pêştir bir, her ku çû hevsengi jî têk da. Yanî rastî destnîşankirin, di wateya perwerdê de rexne pêşxistin, hişk, şikêner, yê ku hevsengiyê xira dike rewşeke wisa derxist holê.

---.:Tevî hewldana me ya metirsîdar jî di artêşbûnê de, bi taybetî jî di despêkê de helwestên nebes ku min raber kir, tu dibêjî risteke girîng lîst, ne wisa?

Ab.:Raste Serokê min. Di mijara rêveberiyê de jî ya pir zêde derket holê û giştî meşandin, ya din jî xalên pratîkî yên yekser hene.

---.: Bi uslûbê xwe, şêwazê taxtîkî, tempoyê xwe ve di pêşketina vê aloziyê de rista te gelek girînge. Welhasil em dikarin hinekî din jî dahûrîna te bikin, ez li şûna hema derbasbûna wê, hinek xisûsan, bi taybet piştî 1986'an di dahûrîna kesayetiya xwe de dixwazim bi teyîsînim. Di vê navberê de hinekan ji te re ev gotine; "bingehê rexneyên ku ji te re hatinê nîne."

Ab.:Ez pir zêde xeyalperestim.

---.:Xeyalperestî çiye, aliyê te yê xeyalperest çibû, aliyên te yên ku bi rastiyan re hev nedigirt çibû?

Ab.:Min duh jî diyarkir Serokê min. Em jî dema hatin kongreya sêyemîn me rexne dikir, me rewşa giştî erênî dikir. Heta me digot pêşketinên baş. Li ser vê pratîkê jî rexneyên rêxistinê hebûn, rexneyên me yên di hûrkariyan de hevnedigirtin. Lê di xalên sereke de em tam di nava nakokiyê de bûn, fêmkirina rexneyên partiyê, yên Rêbertiyê ji bo me gelekî zehmet bû. Piştî ku em ji girtîgehê hatin di 6-7 mehên dawî de me çavdêrî kir. Beşeke pir mezin a hevalên li welat rewşa me ya wê demê dijîn.

---.:Wê demê tu jî gelekî bû evîndarê xwe. Niha jî, "me zêdetir kir, ji niha û şûn de ji vê zêdetir negengaze" rastiyeke bi vê şêwazê li beramberî te diparêzin. Yanî rewşa te ya berê li beramberî te diparêzin. Bawerim rastiya pratîkî…

Ab.:Tê nîqaşkirin Serokê min.

---.: Li gorî te rastiya pratîkî rastiya kê ye?

Ab.:Dibe taybetmendiya çêkera civakî ya Kurdistanê ku, di bin serdestiya mêtinger de teşe girtiye Serokê min. Yên ku îsyan dike, yên ku mîna çarenûsê li îsyanê dinêrin, di wateya siyasî, leşkerî de yên ku nakevin pergala rêxistinê, yên ku pêşketinên wisa naşopînin, di siyasetê, leşkeriyê û di jiyana civakî de dibe îfadeya çêkera asta paşverû derbas nake.

---.:Kesatiya tê zanîn a xeta navîn, derfetên PKK'ê yên bîrdozî-siyasî û pratîkî bikartîne, rewşa ruhî ya mêtingeriyê têkilî tevgerînên pratkî dike. Bandorgeriya PKK'ê jî bi şoreşgeriya xwe ya nivçe nîv bi nîv dixwaze bibe. Lê dibe rastiya kesayatiya hemû corê binkeftinê di nav de, damezrêneriya artêşê ya baş, yê ku bûyîna hêza şer a baş nagire berfirehiya xwe, peywirên sereke li

ber çav nagire, yên ku tên her wateyê, bi hemû corên xetên rast-çep, bi likûmînan dixwazin jiyanê bibin, dema ku pêwîst kir bûyîna çalakgerekî întîharwarî, dema pêwîst kir bi mehan dibe xwediyê pratîkeke serberdayî, asî-aware û bi vî rengî keyfîbûnê heta dawî şayanî xwe dibîne, dibe rastiya kesayetiyekî wisa. Rastiyeke gelek xetere. Di dema borî de tu jî wisa bû, niha jî vê li beremaberî te diparêzin. Berteka te çibû?

Ab.:Serokê min, ev ne niha ye, ji dema ku em hatine, di komên yekem de, bi hevalê Fu.. re me ev rewş nîqaş kirin. Dema ku mirov ji derve çavdêrî dike, dahûrînên rêxistin û partiyê yên piştî 1978'an fêm dike meylên me û nerîna me pir hatiye guhertin û pêşketiye. Li ser wî esasî me bi wan hevalan re nîqaş kiribû. Bi giştî bi hevalan re, di pêvajoyên perwerdê de me her tim ev mijar nirxandin û nîqaş dikir. Rewşa hevalan a despêkê dema em tên dawiya pêvajoya perwerdê diguhere.

Ji vê cudatir nîqaşeke me ya cewaz nebû.

---.:Niha yek bi yek we girtina dest ne gengaze. Ez bi van dahûrandinan dadigirim. Li beramberî kesayetiya ku hûn ferz dikin berxwedan, li beramberî tiştên dijmin ferz dike li berxwedan zehmetire. Yên ku xwe di bin navê rastiya şoreşê de ewqas ji dervî şoreşê digire, bi taybetmendiyên bijare ên şoreşê re dikeve nava nakokiyê, bê xem, kesayetiyên bê berpirsyarî, pir zêde mirov kehir û hêrs dikin. Û teqez şansê serkeftinê nîne. Ez we vedixwînim cidiyetê nabe, vedixwînim rêzdariyê nabe. Dibêjim hinekî hişyar nêzîkî rastiya leşkerî bibin nabe. Ji bo vê pêdiviya dahûrîn di kesayetiya xwe de kûr kirinê dibînim. Raste, ne raste, êdî wê jî di nava têkoşînê de hema bêje dixwazim bînim vê; "ji bo binxistina van ferzkirinên ev xwe tahlîl bikin, tu bi xwe çi dikî bike" vê dibêjim. Ji ber ku bi we re hestyariyeke wisa nîne ku, ger hebe jî cuda û xelete.

Niha beşeke ji we ya girîng hîn jî dibin sedem ku em heman fikaran jiyan bikin. Helwest û tevgerînên ku hûn raber dikin wisa ji min re ecêb tên ku, nayên fêmkirin. Hûn her tim şer jî dixwazin, gêrîla jî dixwazin, lê dema ku pêdiviyên sereke dibim mijara gotinê bi awayekî bawerneker hûn dibin sewdaliyên xwe. Dîqatkirina tiştên ku ez dibêjim pir lewaz be jî di gotinê de dimîne, hebe jî di hestan de dimîne, di şêwazê ji rêzê yên feodal de dimîne. Yanî li gorî we ev girêdaneke, vaye wisa dimîne û

diçe. Ya ku hûn jê re dibêjin, “rastî” tiştên ku hûn dijîn baş dizanin û yên tên tişta ku dijîn diyare.

Di welat de rêkûpêk nerîna li rojekê nîne, li ber difna wî pêşketinên bê aman pêşbikevin jî nikare wan binirxîne. Ger hebe jî behremendî nîne. Qaşo hemû jî dixwazin biçin şer. Ya rast tu kes ji we re nabêje; “ecele bikin, bikin biçin” lê layîq dîtinên ku hûn xwe bi xwe dikine. Me xwest em di vê dewrê de rê lêbigirin. Tawanbar nakim, yanî asta fêmkirina we ewqase. Ez nikarim we bibim heft saliya we û ji nû ve we pê bigihînim. Di nava pratîkeke zindî de digrim, lê encax hûn ewqas dikarin bên guhertin. Lê dîsa jî em naxwazin we weke çarenûsekê bidim nîşandan. Ez bingehîn fêm dikim, we ABC’ ya sereke winda kiriye. Pirsgirêka we ne ya ziraviya teknîkî ye, di bingehê wê de seranserî razayî ye. Ez xwe lêpirsîn dikim, divê ku mirov we jî li aliyekî bihêle. Ez dizanim min çawa rê li van hemû pêşketinan vekir, çawa xwedî lê derketim.

Ger ez berpirsyarê kedê me ez ê çavê xwe li çarçûrkirina we nagirim. Ji bo vê divê ku ez çi bikim? Hûn bi şêwazê; “Yên ku bi baranê re tên, bi lehiyê re diçin” nêzîk dibim. Şêwazê we, şerê we diyare, we canê xwe bi çendî dîtiye, bi çendî bifroşin, pir zêde watedar nîne. Destkeft çine? Ez nebawerim ku yek weke tê xwestin nêzîkatiya derfetan bidest bixe. Girêdana vê bi awayekî kûr bi rastiya gel re heye. Sivikatiya teorîk a rewşenbîrî. Ger heye tiştekî we yê wisa, girêdana wê bi rastiyê re nîne. Beriya her tiştî hûn çiqasî îfadeya jiyana azad dikin, we derfetê ber bi serkeftinê ve birinê çiqasî pêk aniye. Bi vê ve girêdana wê heye.

Di rastiya kurdan de ji bo xwe bûyîna leşker, şerkirinê em dixwazin çareser bikin. Em dixwazin we ji rewşa gidîşbûna ku dibe bela serî derxin. Bi vê rewşa we ya ciwanî û ji hemû aliyan ve rewşa we ya ji rastiyan qut teqez leşkertî pêşnakeve, ger bibe jî şansê xwe yê serkeftinê tineye. Ya din em bi zorê rê vedikin, dixwazin bidin jiyankirin. Dijmin jî ev tesbît kiriye û dibêje, “ev kar bi vî ve sînordare, dinya jî xira bibe ev camêr encax wisa dikare li ber xwe bide.”

Hemû stratejiya xwe ya şer spartiye min, niha hemû dema xwe jî wisa dike. Dibêje; “Artêşa me xwe bi sazî kiriye, Serok erkanekê biçe, li şûna wî wê deh Serok erkanên din bên. Nizanin wê ewqas leşker biçin em ê ewqas leşkerên din bînin, em ê

teknîkê jî nûjen bikin, nemaze karê ku ev camêr bike ewqase. Pergala ku pêşxistiye li ser esasê girêdanê bi xwe ve ye. Rastiya mirov a ku xwe dispêrê, rastiya şervanên ku xwe dispêrê bi vî rengiye. Di rewşa lewazbûna vî de, rewşa ji bin karan nederketinê, heta ji aliyê fîzîkî ve linavbirina wî dê ji hemû aliyan ve vê artêşê ber bi hilweşînê ve bibe. Çima em xwe nêzîkî çareseriya siyasî bikin, çima em nêzîkatiyeke din a leşkerî raber bikin. Rêbaza ku em ferz dikin dixwaze bila pênc salan, dixwaze bila deh salan be wê çareser bike.

Vaye ev zaafa me ya sereke dijmin ber bi feraseteke stratejîk a wisa ve dibe. Bi sazînekirina we ya artêşê, xwe neguherandina hêzeke bi pergal a fermanberiyê, hilneberîna we, her tim zemîn pêşkeş dike ku dijmin di derbarê min de stratejî û taxtîkên xwe pêk bîne. Ev jî pir xetere. Ez nabêjim tak nikarin rist bilîzin, divê ku bilîzin û em bilîzin jî, lê ev rist mîna usûlên we yên eşîreta, usûlê qelebalix ê mîna îsyankarên hov ku em jê re fersendê bidin, tê wateya ku em xwe vala derdixin.

Pirsgirêka giyanbir, ji hêza berxwedêriya tak, ji hêza afirêneriyê re rê ji sazîbûnê re vekirine. Hema bêje ji xwe bi xwe hilberîna pergalê karmendî dide qezenckirin. Xala ku hûn jî li beramberî li ber xwe didin ev dere, bi girêdaneke jê bawerneker jî hûn dikarin bidomînin. Lê hûn xwe nêzîkî pergalbûnê nakin. Teqez pergala ku we avakiriye jî pergaleke hêvî dide dijmine. Şerkeriya we ya bi bandorgeriya min a kesî ve girêdayî heta dawî dibe zemîn ji nêzîkatiyên xeter û ferzkirinên taktîkî yên dijmin re. Ya rast di despêkê de min qet texmîn nekir ku dê aloziyeke wisa derxîne pêşberî me. Em di sala 1982’an de di nava bendewariyeke wisa de bûn, wê biçin, çiya bibînin, wê xwedayê gêrîla li wir bikin. Mixabin belayên takekesî ku we anî serê vê bendewariya me, ji belayên dijmin hîn xirabtirin. Çiqas ketiyên gund hene, çiqas lewaziyên takekesî hene we hemû verşand.

Di wê çalakiya yekem de jî helwestên ku ketin navê hîn jî tê bîra min. Li kî derê, çima gêrîla paşket? Çûn ketin gundekî, derdora wî girtin. Soza Osmaniyan didin dibêjin; “werim teslîm bibin” ew kom jî wisa xwe teslîm dike. We di Başûr de dixwest xwe bi dûvika KDP’ê ve bikin û eyarkirinekê pêş bixin, we komeke gêrîla ya 300 kesî veguherand depê nivîs û jêbirinê. Halbikî di vê meha 1982’an de em pir bi hêvî bûn. Windahiyên

me bi qasî em bêjin nebûn kêm bûn, lê ew kesayetiya we ya ku dibe evîndarê xwe, rastiya we ya takekesî û wan xalên ku min gotin, bû sedemê van hemû windahiyan.

Mehemet Xoce tê bîra min, tevî ku ewqas niyet baş, kesekî durist bû jî, dikeve orta cebilxaneyê destê xwe radike jor û dibêje; "ez Mehmet Xoce, gule nereşînin, ez hatime we li hev bînim" biqasî ku wisa bêje safe. Wê demê hûn bi safîtiyeke wiha re çawa dijîn? Hema bêje rizgarkirina we ya ji destê wan, dişibe rewşa di bîra bê binî de rizgarkirina min a Xetîcê. Ev car hûn di vê mijarê de jî bi hêrs bûn. Hîn jî tê bîra min; we digot, "me ya herî baş jî dikir, ma çi dibû" Niha hewla fêmkirinê bidin bê ka we ya baş dikir yan na.

Hevalê Fu. dibêje, "ez niha nû Rêbertî dibînin û fêm dikim. Înşallah fêm dike. Hêvîdarim ku vê carê rast fêm bike, bê fêmkirinê serkeftin, pêşketin nayê fikirandin. Fu. wisa dibêje, lê nizanim çiqas ji dile. Em bêjin hûn bi me ve girêdayî ne, lê dema însîyatîf mijara gotinê be, wê jî heta dawî bi vekirina taybetmendiyên xwe yên keyfî, bi nenaskirina ti qayd û qûralî di bin navê "polîtîka" de ya ku nêvengê daye çiye, we ew jî wisa bi ezezî bikaranî. We çawa navbera xwe û Rêbertiyê vekir -ya ku jê re dibêjim Rêbertî qûralên serekene- û di encam de hûn dibînin ku we nekarî xwe jî ji bûyîna bela derxînin. Yanî hemû tevgerînên mirovê kêrnehatî di holê de ne.

Ji hêza me ya fermanber re Unal Erkan bangewazî dike. Van dahûrînên min ên dawî temaşe dike. Dibêje, "wê we înfaz bike, birevin werin" bawerim hinekî jî tesbîta rastiyê ye. Ji ber ku em ê darizandineke diyar pêşbixin. Yên ku ewqas bi xetê dilîzin, ewqas bi peywiran dilîzin camêrên wisa eşkereye ku em ê darizînin û ji niha ve dibêje "werin" Yanî xafleta yê me baş dibîne dibêje; "hûn ê tangav bibin, werin cîh ji we re heye." Beşekî pir mezin ê fermandarên me yên şer, bi qasî ku rê ji xîtaba dijmin re vekin xafîl, lê wisa dizane ku li ser esasê rastiyê şer dike. Dijmin dibêje; "fermandarên ne serkeftî" û vê ferq dike, çiqas bi xetêre nakokin, çiqasî bi me re nakokin dizane û li gorî wê nêzîkatiyên xwe didomîne, bangewazî dike. Eşkereye ku pirsgirêka me ne tengavkirina we ye, hûn hîn jî şer dixwazin, duristin û teqez hemû zehemtiyên kar jî hûn digrin ber çavan. Lê weke ku dibêjim, ziraviya vî karî, hunera wî dema ku dibe mijara gotinê hûn

netiştekin. Dibe ku hûn bi hevalan re nîqaş dikin. Bi rewşa xwe ya berê re berawird dikin û li ku derê hûn dehşetwar bûn niha dibînin. Çiqas dereng û piştî pir tişt ji dest çûn pêk tê. Divê ku hûn hinek pirsên sereke ji xwe bipirsin.

Weke ku min beriya niha jî got, stratejiyeke dijmin a şerê taybet ku rojane qala wê dike heye, taktîkê wî heye, girêdana vê bi Rêbertiyê re, bi we re, vaye girêdana wê bi wan hemû tiştên ku hûn jê re dibêjin rastî divê ku hûn girêdanê di navbera vê de ava bikin. Ger hûn dixwazin bibin behremendiyeke taktîkî, hûn hemû kesên ku qala rastiyê dikin teqez divê ku ji van pirsan re bizanin hinek bersivan bidin. Tu di dawiya sala 1985'an de hatibû, vaye ev hemû girîngin. Weke we tên. Ger rastiya ku we ferz dikir bê bîra we, dema ku me di tevahiya sala 1986'an de darizand çiqasî zora we çûbû… Lê bifikirin, ger ew darizandin nebûya, gelo we di xwe de israr kiriba hûn ê sax bimana? Ger heye asteke diyar, wê bi vê darizandinê ve girêdayî pêş bikeve. Vanê din ferzkirinên xwe yên kor, fanatîk kirine meseleya kesayetiyê.

Tevî ku nikarin bibin behremendek leşkerî jî, derbasî esasên rêzgirtina leşkerî nabin jî heta dawî fanatîk, heta dawî dervî rêzdariyê, dervî taybetmendiyên sereke yên leşkerî û di asta ku her tim li ser ben bilîzin, bên hemû corê lîstokan, bi hemû ferasetê re li hev bikin, ji hemû gavên kujer re rê vebikin, ji afirêneriyê dûr, mîna hemalan bikevin pratîkê, ziraviya kar qet neynin aqlê xwe çi heye hemû di vê rastiyê de veşartîne. Ji ber ku xwe westandin nîne. Ji ber ku heya dawî ziraviyên şerê gelerî di kesayetiya xwe de pêk nayînin. Niha yên ku di eniyê de ne, ne di rewşeke ji ya pîrejinan cudatir de ne. Yê li jorê axayeke, yên li jêr jî kole yan jî ji hemûyan gazandan dikin.

Kêliyek beriya niha di radyo de digot; "li Rûsya her kes dijberî her kesî ye, mafya jî hundirê wê duxwe û tine dike." Hinekî bi uslûbê ku hûn ferz dikin dema ku bê berawird kirin; mîna mafya, axayên rêxistinê, şerkerên her kes dijberî herkesiye, hûn nûneratiya şervanên wisa dikin. Dema ku di cihekî de têkelbûn, alozî derket wisa dibe. Min gav ne avêtiye nava pergala artêşê, lê wisa hîs dikim ku, bi pergalkirina we zêde ne zehmete, lê ne weke ku hûn texmîn jî dikin. Di serî de fermandarê vê tînin ber çavê xwe, di navbera kesayetiya wî û kesayetiya fermandariyê de eleqe nîne. Ez tiştekî ji leşkerbûna we re nabêjim, hûn dikarin

bibin leşker lê fermandarê ku leşkeran bi meşîne nîne û dema ku fermande û hêza rêveberiyê bû mijara gotinê hûn yê herî xeterin.

Em ê çawa rê li vê bigirin, em ê çawa alîkar bin? Tevî hemû zehmetiyan em dîsa jî waneya xwe bidin. Ku derê vê we bandor dike? Ez bawerim hûn hîn jî di mijara xeta leşkerî de biniyetin. Ji min çi dikare bê hêvîkirin, em çawa bandor bikin? Ji xwe ez veguherîme çi ez jî nikarim pênase bikim. Ez çiqas tayînker nêzîk dibin, çiqas bi aqilim, divê ku hûn fêm bikin yan jî bi taybet li beramberî van ferzkirinên we divê ku ez rêya rast bibînim. Gelo min veguherand alozî û xaçepirsê? Para min çiye, em wê jî fêm bikin. Weke bersiv ji van pirsan re Fu. tu çi dibêjî? Ji xwe Ab. nikare baxive, zimanê wî hinekî dialiqe.

Fu.: Serokê min, hinek nêzîkatiyên ku divê bên dahûrandinin.

---.: Qusûra bi min re dibe ku çibe?

Fu.: Ez nikarim tiştekî bêjim.

---.: Niha ez çima nikarim ser bixim, çima nikarim vana bikşînim nava pergeleke saxlem?

Fu.: Em bersiv nadin Serokê min.

---.: Divê ku ji min bê pirsîn. Ger we bersiv nedaye, wê demê bi nebesiya min re pêwendîdare. Divê ku ez hîn çawa bi ser we de bêm? Gelo ez lîberal tevgeriyam yan jî nêzîkatiyên min ên nebes di ku derê de ne, gelo diviya bû ez qet bi we re mijûl nebûma, nebesî di mijûlbûna bi we re de ye? Ber bi şoreşê ve kişandine? Bifikirin dijmin jî dibêje; “mijûl nebe vana nabin camêr.”Ez vê nirxandinê şayanî xwe bibînim? Yanî, “me tinekiriye, vaye ji wan camêr dernakevin. APO mijûl nebe” wê demê ev tê wateya radestbûnê. Vaye tê wateya li beramberî dijmin ji hemû aliyan ve ketina nava ya kevn, a kevn qebûlkirinê. Me dîrok bikar anî. Vaye koma herî kevn, her tişt di destê me de ye netirsin. Niha ya ku hûn dixwazin bifikirin, ya ku dixwazin pêk bînin, hêza we heye baxivin.

Ab.: Çare di pêşvebirina vê arasteyê de ye Serokê min.

---.: Bi salane em çiqas pêşve dibin?

Ab.: Dîsa jî pêş dikeve Serokê min.

---.: Pêşdikeve, lê tu were vê ji min bipirse. Ez dixwazim bi komê re bibim. Bahsa sazîbûnê dikim. Stratejiya dijmin, weke tak ez ê çiqas bikaribim li ber xwe bidim, nedim li ser

lêkolînkirina vê ye. Ger em kadroyên pêşeng ava nekin, em ê bikaribin vê stratejiyê têk bibim. Ger ev rast be wê demê divê ku bersiva we jî rast be. Hemû endamên navendî serê xwe girtine û diçin. Hinek ji wan pozbilindên gundî, hinek jî pozbilindên rewşenbîrin. Ez ji niyeta we ya baş guman nekim, lê hêza we çiqase? Hûn pîr bûne, gelo kêmbûna enerjiya we, we zêde bi îda nake? Ma êdî bi van karan re mijûlbûn pir derenge?

Fu.: Na Serokê min.

Ab.:Hîn ne derenge Serokê min. İdaya me jî ne kême, lê îdayên wisa ne di cîh de jî kirin ne raste.

---.:Misoger tu xwe nexapîne. Di çûyîna welat de te digot; "rizgarkirina anûrê" nebe hesta erzan a rizgarkirina anûrê?

Ab.: Na Serokê min, tenê bi serê xwe ne ew e.

---.: Ha em ji nû ve despêkekê bikin. Ez dîsa jî hevalên xwe yên kevn îhmal nakim, lê ketina rewşên kevn ji aliyê fîzîkî ve jî tê wateya tinebûnê. Ji xwe halê we ya rabûna ser piyan jî namîne. Me hûn bi rayeyê xemilandin, derfet pêşkêş kirin. Ez hîn jî ji xwe dipirsim, gelo bi rastî jî nikarin tiştekî bigrin? Min got, stratejiya dijmin gav bi gav min dişopîne. Yên ku vê vala derxin, serkeftina teqez di serokatiya taxtîkî de pêk bînin, soza serkeftina vê bidin kadro ne. Vana mîna hevîrin tu çawa bixwazî teşe bidê dê wisa teşe bigrin. Camêre ku di bûnya PKK'ê de wisa bikare helwestekî hişt ferz bike nîne. Dîsa di yekîneyên şerê çekdarî de jî wisa ye, lê fermanberên wê niha xwedî tevgerînên herî oportonîstin, divê ku em rê lêbigrin.

Li vir bi niyeta baş tiştek nayê rizgarkirin, bi fedakarî, cesaret jî tiştek nayê rizgarkirin. Di vir de ya mijara gotinê ye hostatiya leşkerî ye. Hem asta stratejîk, hem ya taxtîkî li ser esasê ya layîqe damezrandinê temsîlkirine. Wê demê me dikarî em ewqas bi we re nîqaş nekin, lê niha em bêjin derfetê kîja komê heye. Dîsa me ava kir, bila mêrxasî ji me be. Vaye binêre, li vir jî yên ku rastiya pratîkî ferz dikin hene û we çiqas alozî jiyan kir hûn ji niha ve dibînin. Yê ku ezmûnên ewqasî sal li ber çavan bigre wê ya rast bike. Ne bi xirab bikaranîna hêza min, li gorî ziraviyên hunerê leşkerî yên giyan girt divê ku bikare bîne hîza yê. Dibe ku we jî ez nasnekirî bim. Li şûna hinek rastiyên jiberkirî ji we re bêjim, gelo ez xwe vebêjim? Ez hinekî rewşa 1986'an vebêjim. Ez bawerim te tiştekî wisa gotibû, ne wisa?

Ab.: Pêvajoya piştre bû.

---.: Te çima ev got?

Ab.:Pêşketineke pir alî, pir zêde çêbû. Qaşo ji bin vana hemûyan derketin hebû. Çawa tê pêkanîn, çawa dibe? Bi pergaleke xebatê ya çawa xwe gihandin çêdibe? Ya din jî ew pergala xebatê çawa tê afirandin? Kesayet xwe qebûl nake. Vana ji aliyê pêşketina kadroyî ve serbenên girîngin.

---.: Başe, piştî 1986'an ji aliyê netewî û civakî ve li ser esasê rastiya civakî çi îfade dike. Dem çawa dikare bê pênasekirin? Rewşa nû ya ku ez ketibûn navê çibû. Ristên nû, lêgerîn, bersiv? Bawerim tu ji vana re bersiv dixwazî. Rewşa we ya bersivdanê hebûya, ji xwe hûn nediketin nav wan tengasiyên ku hûn ketin navê. Ev beşa çîroka min girînge. Serokatiya taktîkî di dawiya 1986'an de digot; "em bi 12'ê Îloneke nû re rû bi rû ne" û yên ku diviya bû berpirsyarê kar bin, dema ku pirsgirêkên şerê çekdarî nîqaş dikirin yên herî bê xem yan jî bêçare, bi taybetî jî bi nêzîkatiyên xwe yên ku digihîşt kokên taybetmendiyên tîpên neyênî, heta dawî bê hêvî jiyankirina wan dihat dîtin.

Danehevên heyî weke ku ji xwe rêkûpêk kirinê dûrin. Şehadeta Egîd û dahûrînên kesayetiyê yên pêvajoya kongra sêyemîn jî, hema bêje ruhê tasfiyeger, kesayetiya tasfîyeger, ya ku xwe ji pêşketinê mahrûm dihişt hemû bêçaretiya tîpên belengaz raber dikir. Provakatîf ne difikirin ku ji wê şûn de bên herikandin. Kesetiyên girêdayî pergalê, dema ku em îhtîmala çiqas bi zanebûn bi dewletê ve girêdayîne tînin berçav, îdaya van ev bû; "pêngava 15'ê Tebaxê ji encamgirtinê dûre. Heta ji bin peywirên ku giran dibin derketin jî pir zehmete" van jî bi keda xwe ya taybet dema ku xwestin careke din pêşbixin, di encam girtinê de pir bi îda bûn.

Bêguman dîsa ya ku di vir de girînge rewşa min bi xwe ye. Divê ku dîsa jî derketinê bi xwe re bidim despêkirin. Piştî ku yên herî zêde niyeta wan baş ketin rewşeke wisa û şûn de, rabûna min û gotina; "provakatoran wisa kir, wisa kar vala derxistin"weke gelekan dikir xwe avêtina min a erdê, her wiha nedibû çareserî. Ew bêtir helwesta we bû, xafîltiya xwe û feraseta kesayeta qederperesti ye. Min wisa pênase nedikir. Ger bê dîqatkirin, dema ku me dixwest em 1986'an çareser bikin xiyanet heye, xaflet heye, vedizîn heye, rêxistina provakator a ku pêşdikeve, hemû corê gundîtiyê, dev ji xwe berdanê, demogojiya

rewşenbîrî heye. Di binê vê de dewlet dixwaze bêje, “raweste” Îhtîmaleke mezin û endamê ku nûnretiya dewletê dike yan jî endam li ber xwedaneke dawî be jî dixwazin gaveke din bavêjin. Dibin kesayetên noker yan jî kariyerîst qet negirînge.

Ji aliyekî ve ev beş û ji aliyê din ve beşa me ya gundî, tevî ku di rewşa wate dayîna ji pêşketina re, bûyîna hêza çareseriyê, di rewşa heyî binirxîne de ye, ji ber niyetên xwe yên herî baş; “Yê ku rojekê rizgar bike paşa ye. Ji ewqasî re jî hezar car şukur, ya herî baş hat kirin, em bextewerin ku me xwe higand a mezin” bi vê hişmendiyê tevdigerin. Belê, ya din jî di nava vê hewayê de bi qasî ku nikare pêşiya pozê xwe bibîne kore. Zilamê yekem jî dibim ez, qaşo ew jî diçin bibim camêrê duwem, ê sêyem. Hewesên wisa kariyerîst dikevin nav kar. Ji min zêdetir di bin bandora provakatoran de ne. Weke min got nikarîbûm bi vê sînordar bimînim.

Rewşa min bi qasî ya îro nezana be jî, dîsa rewşa min a heyî, hesta şoreşger a realîteyê, di derbarê kar de çawa bên rêkûpêk kirin, ya herî girîng jî wê çawa pêk were, nêzîkbûnek hestyar, hişyar û li ser rojaneyiyê bi gavên pir saxlem re şêwaza despêkirina min serwere. Ev tiştên diqewimin û pêk tên çine? Ji aliyekî ve wate jê re hat dayîn, ji aliyê din ve jî bi têrkeriyeke pratîkî her tim bi bersiv danê em dixwazin pêş ve biçin. Teqez weke ku hûn nêzîk dibin qutebir nêzîk nabim. Ji ser serê xwe navêjim, hêvî çiqas mezin dibe bila bibe, yê ku bi qasî serê derziyê bê qezenckirin bi hewldana pratîkî dibim alîkar, bêy ku bêzar bibim, biçûk bibînim, zêde bikim jî her ku diçe dikevin nava rojaneyî yê.

Wisa tê fêmkirin ku, komkirina vê demê, weke ku di dîroka me de pir tê zanîn piştî îsyanekê, binketina wê ya giran, ji vê jî xirabtir ji bo neketina rewşa serberjêr çûyînê, tenê ne nîqaşkirina têkoşîneke çekdarî, ji bo ji tevgera partiyê ji dejenerebûn û parçebûnê bê dûrxistin hişyariya pêwîst yan jî pêwîstiya wê hîs dikim. Em ji pêngava 15’ê Tebaxê re jî bêjin îsyanek. Kêlî bi kêlî ew îsyana, min hem amade kir, şopand, hem jî ji bo ku ji hemû aliyan ve bi dawî nebe min hemû derfet seferber kir. Niha jî şayanî berawirdkirina îsyana yekeme. Hûn hişyariya di îsyana yekem de dizanin. Şêrê çekdarî ji îsyana yekem jî meztire.

Tenê ne li beramberî malbatekê, tenê ne li beramberî takekî, tenê ne li beramberî pergala civakekê, li dijberî artêşa wî ya kujer dibe. Rûbirûbûnên mîna van ên di dîroka Tirkan de darbeyeke pir mezin xwariye û xistiye rewşeke ji ya dema borî xirabtir. Her weha di pratîkê de bersiva ku hatiye dayîn ev e. Hema weke ku di 1980'an de, ragihandina partiyekê, bi qasî yên ku herî zêde ji xwe razî û paşê jî yên ku xwestin bi provakatoriyê bilîzin, yên niyeta wan herî baş jî di nav de digotin; "ji vê zêdetir nayê kirin, rista dîrokî hat lîstin" Her weha hewla wan encax têra ewqasî dikir. Ji pêngava 15'ê Tebaxê re jî –weke ku hat ziman-bersiva pêwîst nehat dayîn. Dîrokê jê vê zêdetir dest nade. Dixwestin vê dîrokê careke din bidin dubarekirin. Ji xwe hewaya ku ketibûn nav jî ev bû.

Weke ku min got, niha rastiya ku hûn dijîn jî ev e. Dilê ku di vir de raneweste yê me ye. Yê ku teqez dixwaze xwe kûr bike, xebata me ya mejî ye. Taybetmendiya min wisa ye. Berevajî ya bi we re heyî, taybetmendiya kesayetê di mercên herî zehmet de winda nake. Bi yê heyî re qet têrnebûn, xeteriyên ku tên ferzkirin pir baş dîtin, hîskirin, yanî bêyî ku xwe rast û çep razîne, pêdiviya saxlem meşînê bihîstine. Dil dixwest ku pêngava 15'ê Tebaxê, îsyangerên wê, pirsgirêk û rista wê baş fêm bikin. Wê vesaziya artêşeke gêrîla bikin, bilez xwe mezin bikin, bi hêz bikin û teqez saxlem li ser piya mayînê û wê bikarin rêya serkeftinê vekin çavê me li rê bû. Ji xwe hêza ku me amadekiribû, hêviyên me jî pir berfireh bûn. Lê me dît ku, bi taybetî jî di artêşbûnê de ev wê vî şansî bikar neyînin.

Hema weke kadroyên di salên 1980'î de îlana partiyê di partîbûnê de bikar nanîn, van jî wê îlankirina artêşê, îlan kirina şer di artêşbûnê de bikar neynin. Çawa ku dema em ber bi 1980'î yan ve hatin ji bo domdariya partiyê, ji bo ji nû ve avakirinê me giranî da guhertina qadê, xwe da mezinkirina xebatê, vê carê jî dişibe vê rewşê. Me got ku, mijara artêşbûnê ji kesî din re nehiştin yan jî têrkariya wê di asteke cuda de bi domandinê me baş kiriye. Kadroyên ku rist ji wan re hatibû dayîn, pir zêde ne di asta ku bikarin bibin camêrê karê xwe. Yên herî baş jî tenê dikarin baş çek biteqînin. Gundîtiya xwe kûr dike, rewşenbîr fêlbaziya xwe pêş dixe. Pir zêde berpirsyariyên dîrokî ne, bê navber gavên serkeftinê avêtine, ev wan zêde eleqedar nake.

Mirin jî ji bo wan dibe asteke divê bi xweşbînî bê pêşwazîkirin. Ji vê wêdetir xwestin êdî ji bo wan dibe karekî beredayî. Em çiqas jî hêvî bidin, çiqasî bêjin yê me wê ya herî baş bikin, em vê niyeta baş biparêzin jî, dîsa jî em pêdiviya zêdetir ketina nav vî karî dibînin.

Di zivistana 1987'an de, -hîn jî tê bîra min- min dixwest em dest bi karekî netewî yê asayî bikim. Dema ku em derbas dibin dahûrînên kongreya sêyemîn hene, hinekî dahûrînên şoreşê hatiye kirin, rewş hinekî din baştir dikare bê dîtin. Gelek endamên ku pêbendin di cihê xwe de rûdinên. Bi taybet asta kadroyên navendî yên astenger tên derbaskirin. Ya herî girîng jî ez ê êdî hinekî xwe cuda tevlî bikim. Ger navend rista xwe nalîze, ez ê rista navendê bilîzim, kadro bi rista xwe ranabe ez ê bêtir xwe tevlî bikim. Weke ku di pirsgirêka partîbûnê de bû, ez ê hêdî hêdî xwe seferberî pirsgirêka artêşbûnê jî bikim. Ya rast diviya hûn wisa nebûna.

Piştî 1982'an hatina welat bi pîlan bû û bi asanî dikarî bê pêş de birin. Yanî ya ku çar sal şûn de me anî bîra xwe, ya rast ên ku ketin nav berpirsyariya 1982'an dikarîn bi asanî pêş bixin. Hema mîna we pir dereng fêmkirin, fersend ji dest xwe revandin, rista xwe baş nefêmkirin, nelîstine. Ji ber vê sedemê bi qasî ku em bêjin; "kar li benda me ye, em ê pêdiviyê bikin" di serî de ji"çawaniyê" re bûyîna bersiv dest bikar kir. Ji lêkolînê re vekiriye. Di despêka 1987'an de me perspektîfeke; "fermandar kiye, peywirên wî çine" pêş xist. Ya rast ev manîfestoya pêşxistina artêşekê ye.

Beriya wê min digot; "mîlîtanê partiyê kiye û taybetmendiyên wê çine?"niha jî"fermnadarê artêşê kiye, taybetmendiyên wî çine, çawa dikare bi ser peywirên xwe de biçe, leşker kiye, çawa dikare bibe leşker, leşkerek çawa tê afirandin" me ev pirs lê zêdekirin. Piştî wê jî me berê xwe da perwerdeyeke berfireh. Bi despêkirina 1987'an heta dawî hem ji aliyê hejmar ve, hem jî bi lêhûrbûnê ji pêvajoya gêrîlatiyê re dereng be jî me careke din da despêkirin. Dahûrînên piştî 1987'an hene, dahûrînên Adarê, dahûrînên Nîsanê gelek fêrkerin, dîsa dahûrînên Çile hene, hîn jî di bîra mirovan de ne. Perwerdeya prarîkî ya ku herî berfireh em tevlî bûn, ji bo amadekirina komên awarte bi ser de çûn, destwerdana rewşa henase nade sitendin hovitiya ku

hêzên li welat di nav de ne teqez wê dîsa ji aliyê me ve be. Camêr gundiye, xwe xistiye, camer ji xwe raziye, yanî dê zêde xwe berpirsyar nebîne. Her ku diçe çîroka serhildêreke hov dibe yan jî “di çiya de mayînê”dijîn. Nemaze gelek ronîkere, em ê bi hewldanên sererastker mudaxle bikin. Pêşveçûn wisa ye.

Bêguman rewşa ruhî, kîn û têkoşîna wê demê ye. Di gel vê de dijmin Rewşa Awarte radigihîne, giranî dide dîplomasiyê. Ozal heta van deran tê. Tepisandina ku pêk nehat, bi taybetî jî behremendiya berdewamkirina tevgerê raberkirina me, wan ber bi ragihandina Rewşa Awarte û her ku çû vaye, “ev nebe, em ê bikarin di 1988’an de tine bikin” û pêşxistina vî pîlanî ve birin. Di hundir de nirxandinên ku MÎT’ê kirin hene.

Bi taybet rastiya ku li ser girtîgehê hat ferzkirin, “li beramberî têkoşîna çekdarî reformîze kirin” dîsa qala hevgirtina MÎT’ê hatiye kirin, ferasetên Şahîn wan ên weke “ev kar bi îmhakirinê nabe, ber bi meyla reformîst ve kişandin ya herî aqilane ye” wiha ferasetên bi vî rengî dibin mijara gotinê. Bawerim hinek çepgirên saxte jî alîkarî dan vî. Ya herî girîng jî di hundir de hinek weke vediz, hinek jî bi giranî di bin bandora wan de -heman tişt ji bo çiyê jî derbasdare, li Ewrûpa jî pir zemînê wê heye- dimînin. Bandoreke dewletê ya wisa heye.

Me, xweferzkirinên dewletê yên 1976’an, heta 1986’an bi şêwazekî ji baweriyê dûr bi têkoşîna kesayetî derbas kir. Ya ku herî zêde dewletê xwe dispartê, yekser ango ne yekser xwediyên vê meylê, wan nêzîkatiyên ku wan ên bêrêxistin dihele, hewldanên li navbirinê me vala derxist. Hem jî bi têkoşîneke mirinê digre ber çav.

Ev deh sal ya rast di nava rêxistinê de tasfiyegerî bê aman bû, bê partîbûn, gav bi têkoşîna çekdarî nedayîna avêtin, vala derxistin, heta yên di binê rêbertiya wan de heyî girtin û me jî mirî zanîn. Tasfiyegeriyeke wisa hat ferzkirin û me bi vê re şer kir. Şerekî ruhî yê pir mezin, me şereke taktîkî yê pir mezin meşand. Li beramberî şerê derûnî, bi morelekî mezin şerê li ser linga mayînê ye û em kêm nekin. Ji xwe, ev qonaxa dîrokî; di heman demê de partîbûyînê, afirandina pêşeng û rêbertiyê bû. Di kesayetiya serokatiyê de partîgeriyeke bin nakeve derxistina holê û hem despêkirina îsyaneke nû, hem jî heta berdewamiya wê niyet kirine. Dewleta ku xwe li ser vê ferz dikir û dîsa çêkara kole

ya ku ji vê re dibû amûr, çêkera nebes, tevî hemû înada xwe jî ji aliyê me ve hat derbaskirin. Em vê baş dizanin.

Ji bo piştî sala 1987'an jî, em fêm dikin ku dê dewlet cuda bi ser de bê. Bi taybetî di girtîgehê de rewşeke erênî heye. Rêbertiya provakasyonê a ku di 1982'an de derketiye holê heye, rêbertiya Şahîn Yildirim, lê di gel vê de jî çêkereke radest nehatiya girtin. Bixistina jiyanê, ber bi rehabîlîteyê ve kişandinê rêberiya ku pêş xistine heye. Weke ku di dîrokê de gelekî tê dîtin, bîranîna mêrxasên berxwedanê xirab bikaranîn û bi vî rengî biferzkirina guftûgoyeke bi hîle encam girtin. Weke ku min got, çiqas vediziye, çiqas zemîn pêşkêşkirine dikare bê nîqaşkirin, di demên pêş de wê baştir bê dîtin. Lê em niha baştir fêm dikin ku di nava me de xwestin amadekariyê ji rê derketina PKK'ê wisa bikin.

Meyla ku pêşdikeve meyla, "Partî em in"e. Heta hestiyên xwe pergal jiyankirin, bi taybetî jî mîna ronahiya di serê tunelê de li beramberî tarîtiya jiyanê ya ku tehamûla wê nayê kirin îbadet ji derfetê ku dewlet pêşkêş dike re kirin û bi vî rengî ji ya herî xeter re serî tewandin, ajoya jiyanê di serê vê ronahiya girêdayî dewletê de dîtin, xwe ber bi rast ve razandin û bi vî rengî tasfiyegeriya partiyê bi awayê herî xeter pêşxistin. Amadekariyên dewletê ev in. Ya ku li ser serê hêzekî berxwedêr ferz dikin ev e, lê di bingeh de dixwazin partiya li derve venêrîn bikin. Ew ji bo wan hêza berdeste. Dema ku dem hat ji bo bi şêwazê herî baş bikare bikar bîne.

Şêwazekî min heye, bandora dewletê di bin venerînê de girtin û hinekî bi wê meşîn. Dîsa li şûna çêkera gundî ya paşketî bi îsyargeriyekê tinekirinê, ew ber bi şerekî dirêjkirî ve birin. Yanî hema bi we re xistina nava pevçûnê, ne li hev rakişandineke weke ku hûn pir fêrbûne, karakterê xwe li gorî şerekî demdirêj veguhertin, provakator jî îdare kirin. Min pêdivî bi guhertina rêbazekî wisa dît yan jî ya herî rast ev bû û min ev li ber çav girt û dewlet îdare kir, gundî îdare kir, rewşenbîr îdare kir. Teqez neketim nav helwestên qutbûnên wisa yên bê dem. Hîsê min ên kûr, ezmûnên min ên jiyanê ji min re digotin; "ger tu dixwazî li ser piyan bimînî, divê tu wisa tevbigerî."

Bawerim divê ku di vir de hinek waneyên bingehîn bên derxistin. Bi taybet ên ku dixwazin şer dirêj bikin, dixwazin

pêvajoyên zehmet serkeftî derbas bikin li şûna ber bi kînên xwe bikevin bişkên û hilweşin, dema ku pêwîst kir di himêza mar de fêrî jiyankirinê bibin, tevî ku pir tawîzkar tê dîtin jî, di hundirê xwe de bizanibe mezin be, sererastkirinên herî mezin di dilê xwe de bike, di dema xwe de lêdanê pîlan bike û wisa pêvajoyan derbas bike. Ne di zemîn û şêwaza ku rakîbê wî dixwaze de, teqez kirina şêwaz û zemînê ku tê lê bidî. Ez ji vê re dibêjim taxtîkê derbaskirina pêvajoyê. Û teqez yek ji xisûsê taxtîkî yê serekeye ku we xwe negihandiyê ev e.

Rewşên ku hûn ketin nav, ya ku dijmin taxrîp kiriye, zemîn û şêwazê ku kişandiye nave. Ya min berevajî vê ye. Ji derve û hundir ve berpirsyariyên dîrokî hene û şerê mezin ê jiyanê tê dayîn. Heta ku tu ne bawer bî, tê bi şivanekî re jî navbera xwe xiranekî, mar ji xew ranekin, ji sedî sed tu yê lê nedî û bê bandor nekî. Li xwe binêrin, hûn li kî dera kar in? Bawerim vê berawirdkirinê hûn niha baştir dikarin bikin. Vaye nêzîkatiyeke wisa ye ku, ev bi min re daîmî ye, meyla min a sereke, meyla min a Rêbertiyê ye.

Vaye em pêdivî bi pêşxistina helwestekî din li beramberî dewletê dibînin. Em dikarin bêjin bandora navbera salên 1976-86'an yekser ango ne yekser kêm zêde me derbas kiriye. Dewlet jî vê dibîne, destwerdanên ku dewlet dike cuda ne. Weke ku min got, di serî de Rewşa Awarte, nêzîkatiyeke cerdevaniyê ya nû, ji wê eniya tê zanîn serdehatinên wan ên vekirîne. Dîsa di gel vê de –li gorî min ya herî girîng- dixwazin PKK'ê di hundir de xira bikin, di vê mijarê de jî xebatên girtîgehê bi pîlansaziyeke baş dixin dewrê. Di çiyê de yekser yan jî ne yekser –me ji van re digot kesayetên Hogir- bi tehrikan xirakirin, dewlemendiya Ewrûpa bikaranîn û heta niha jî wisa ye. Ji aliyê MÎT'ê ve birêvenebirin û fikirandin, sewqî pratîkê nekirin nayê payîn.

Ya herî girîng jî evê ku di zîndanê de derketi bû. Îhtîmaleke mezin Rêbertiya PKK'ê razandina xeta rast pîlan dikir. Bi taybet piştî berxwedaniya mezin a 14' Tîrmehê, dîsa piştî berxwedaniya Çileya 1984'an qetilkirina yên herî zêde li ber xwe dan, şehîtbûna wan, ji bo yên din bi xwe vedizînê kar gav bi gav xistina bin venerînê, bi dest xistinê û paşketîbûna çêkerê jî bû sedem ku ev bibin kombûna hêzeke girîng. Dewletê hinekî ev kar bi pîlan kiriye. Di rehabîlîtekirinê de risteke girîng dilîze. Em

hemûyan sîxwur îlan nakin, berevajî çêker duriste, lê girtine bin rehabîlîtekirinê. Rêbertiyek hatiye ferzkirin, azwerekî metirsîdar ê pergalê ye. Bi taybet jî ajoyan tehrîk dike.

Hûn dizanin di girtîgehê de, lewra polîtîkayeke bi destdayîna jiyankirina ajoyan hatiye jiyîn; li ser birçîtî, zayendîtî, bawerim li ser gelek ajoyên bi vî rengî, tirsa mirinê, nêzîkatiyeke ji van hemû ajoyan re dibe bersiv heye. Weke ku min got, vana hêdî, hêdî bi polîtîkayeke; "vaye tu dikarî wisa bibî, ji tirsa mirinê tê ewqas rizgar bibe, ger tu wisa bi me ve girêdayî bimînî, tê ewqas zikê xwe têr bikî, tê ji zayendîtî re jî wisa çareserî bibînî" vê bi awayekî kontrol pêş dixin.

PKK û kadroyên pir cuda dibin mijara gotinê û taybetmendiyên herî xweşik jî yên ku ji çek, ji şoreşa çekdarî nefret dikin, jê hez nakin, jê acizin, wê berevajî dibînin, eleqeya wan nîne û çêkereke azweriya xwe nîne. Li şûna wê ezeziyeke metirsîdar demogojiya ku aliyê wê a pergalê giran, ji bo xwedayîna ezezitiyê demogojiyeke metirsîdar, gelekî di ser pîvanên gelê Kurdistanê re jiyaneke takekesiye ku, vê jî bi mîrasa PKK'ê pêk tîne. Bi taybet hinek malbatên ku pêşengatiyê dikin û kes hene. Malbata Şener bi xwe û wî bi xwe jî ji gel bi mîlyonan komkiriye, malbata wî di asteke jor de dijî. Şener jî di girtîgehê de dijî. Ev ferq kirine, yanî tu li ser tasfiyegeriyê bilîzî li gorî pîvanên Kurdistanê tê mezin bijî. Hema mîna malbata ku despêkê me girt dest, weke malbata ku em di sala 1976'an de pê re rûbirû man. Yanî tasfiyegeriyeke tu li ser Kurdistanê ferz bikî, sîxwurî pir xweş dide jiyankirin.

Malbateke berê bi diziyê jiyaye, hemû corê fêlbaziyê kiriye. Ya herî ketî –ku ev jî di mercên Batmanê de dibin- ya herî diz, lê çav sore jî. Bi ketina PKK'ê ya Batmanê re, çiqas nirxên PKK'ê hene wan wisa qebûl dike yan jî bi diziyê digirin. Weke ku dixwazin hemû nakokiyên malbatê di nava PKK'ê de çareser bikin, hemû hejariyên xwe dixwazin bi PKK'ê têr bikin. Wiha serê vê wê biçe kî derê? Biçe dewletê. PKK, tevgera kedê ye, xwe şayanî jiyaneke wisa nabîne. Wê demê dest bikarê pîlana PKK ji rê derxistinê dikin, hema bêje di vî karî de pêşengatiyê digrin.

Hûn dizanin, diz jî hinekî çavsore. Ev jî yek ji yê herî çavsorin, malbateke ji rêzê ye. Di nava gel de jî cihê wan wisa ye. Ji xwe zemînê her provakatorêkî jî wisa ye. Bi taybet malbatên ku

tên bijartin, yên ku di çavên dewletê de wisa ne. Bawerim dewlet vê baş li ber çav digre. Hîn dema ku li derve bû, dîsa di hundir de jî weke eksenê sereke digire dest. Bikaranîna malbata din, piştî ku hat tinekirin di nava me de piştî 1987'an ev ji hemû aliyan ve serdest kirin. Despêkê, di girtîgehê de serweriyeke tam nikare pêk bîne, gelek komplo hene. Di sala 1984'an de ya ku tê zanîn, hêdî hêdî Îstîklal Marşî bi wan dayîna xwendin, lê dema ku bertekeke mezin a çêkerê pêş dikeve Şener; "dibêje, min behremendiya hişê xwe ji dest daye, bêyî ku bizanim min Îstîklal Marşî xwendiye" û wisa hewl dide çêkerê bixapîne.

Bi taybet berxwedêriya Hîlvan-Sêwerek di nava xwe de, ên ku di nava vê pratîkê de cîh girtine ber bi provakasyoneke cuda ve kişandin, tinekirin, yên durist, heta dawî li ber xwe dane xwe dibinê siya wan de dayîna jiyankirin, hevalên weke Karasû kirina aldarê niyetên xwe yên wisa bêyom, niyeta van a baş îstîsmarkirin. Weke ku em dikin, hevaleke jin weke taktîk bikaranîn. Ev der jî pir balkêşe. Em tevî hemû niyetên xwe yên baş, me çawa xwest em jinekê ber bi welatparêziya Kurdistanê ve bikişînin, hem jî di nava kar de girêdanên hestî, nêzîkatiyên ku weke pêwendiyeke taybet tê navkirin jî nayên kêmkirin. Heman nêzîkatiyê weke tevgereke tolgirtinê pêş dixin. Bi awayekî hostayane nêzîkatî ji hevala jin a ku herî zêde dikare li ber xwe bide, herî bi aqile re heye.

Em çiqas hostayane nêzîk bûne, ew jî wisa. Ev jî aqlê MÎT'ê ye. Aqlê Tirka hertim wisa ye, pir zêde texlîd dikin. Hîtler jî dibêje; "di cihanê de bi qasî serdestên Tirkan çîneke taxlîtger nîne." Ev gotina wî raste. Vaye li vir heman taktîka me texlît kirin. Min çawa kiriye, zilamê wî jî wê heman tiştî bike. Qaşo min bi rêya jinekê ev xapandine. Ji ber ku nêzîkatiyên min û niyetên min hinekî din cuda ye, ew jî dixwaze heman lîstokê bilîze.

Ger bê dîqatkirin, em navê wê jî dizanin, hevaleke bi navê S. Berxwedêr, xwe hinekî bi berxwedanê îspat kiriye, hevaleke navê wê hatiye bihîstine. Lê li gorî wan zaafên wê jî hene, rastiya girtîgehê heye, ji hemû aliyan ve di bin venêrîna wan de ye ya herî girîng jî keseke hestyare. Wê digrin dest. Nêveng amade dikin. Em ji amadekirina odeyeke taybet a bi begê me re razê bigrin, heta vekirina korîdorên ku taybet ên ku bi

demjimêra tenê tê de volta bavêjin. Hemû corê jiyana luks girtina ber çav. Dîsa derketin bi ajoyên di girtîgehê de hatine tepisandin dayîna kirin, evîna takekesî geş kirin û girêdana vê bi tasfiyekirina PKK'ê re baş avakirin.

Ji têkoşîna çekdarî ya PKK'ê, ji berxwedaniyeke giştî hatiye vekişandin hestyariyekê di kesayetiya van kesan de derxistina pêş, çêker li ser vî esasî bi herduyan ve girêdan û qaşo min "bi çîrokeke evînê çawa dewlet xapandiye" yanî bi çîrokeke evînê PKK veguhertina amûrê xapandinê û vê jî bi çavsorî kirin, bi hostatiyeke mezin jî bi şêwazekî kes nikaribe bi asanî rê lê bigre, asteng bike bi şêwazekî wisa bi hemû çêkera girtigehê dayîna qebûlkirine. Di encam de wisa jî dibe, yanî pêwendiya jinê bi qasî ku bikare hevalên herî berxwedêr bide întîharkirin qehir dike. Li ser beşa çêkera me ya herî berxwedêr jiyana rezîl, bê anûrî hem jî bi dizî fez dikin û didin qebûlkirin. Di vê de jî herî zêde hevalên berxwedêr bikar tînin.

Min KT çawa bikaraniye, zilamên KT' û heta zemînê ku xwe dispêrinê, wan jî xwest zemînê PKK'ê yê lewaz û zilamên wê bikar bînin. Hinek ji wan dikişînin gel xwe, hinekan jî li dijberî xwe di binê ferzkirineke kujer de dihêlin digrin û dibin. Qaşo bi ferzkirina evîneke şahane wê serkeftinê tacîdar bikin. Ya rast pir balkêşe û divê ku çîroka wê ji nû ve bê nivîsandin. Ne weke ku vî provakatorî nivîsiye, ya ku wî nivîsiye romana berevajî kirina rastiyê ye. "Berbanga Amedê ye" çiye, gelek çîrokê dişibin vê lihevanînê. Berxwedêriyên mezin ji aliyê provakatoran ve bi zanabûn berevajî kirin şêwazekî wêjeyî ye. Pêwîste bê sererastkirin, lewra di serî de jî divê ku mirov kesayetê ber bi berxwedaniyê ve bikişîne.

Provakatorek din hebû, bawerim tevdîreke dewetê girtibû. Di gel ku dibêjim teqez wisa bû, di girtîgehê de heta 1986'an jî li ser esasê kesên ku tasfiyekirine cihê wan dagirin komek derxistin. Ev zilamê bi navê Dîlawer jî yek ji kesên ku herî zêde min nirx didayê bû. Dema ku me despêkir min digot; "zilamê weke Kastro" Yanî dikare gêrîlatiya herî baş bike. Serê kêliyê carekê digot; "Dêrsim" dîsa milên xwe di nepixand û hema bêje mîna ku bêje "gêrîlatiya herî baş ez dikarim bikim." Hêvî dida, em jî wisa nêzîk bibûn. Bandorgeriya şerê çekdarî ya PKK'ê di kesayetiya

xwe de temsîl kirin û heweskirina hinek çalakiyan. Çend salên me wisa ji dest me girt, lê ti carî jî nekir, neda kirin.

Di hundir de jî çîrokeke wî ya balkêş heye, pêwendiya Sovyet, hinekî TKP (turkiye komînîst partîsî- Pariya Komînîst a Tirkiyê) Ev di dîroka Tirkan de şêwazê Kemalîst ê ku pir zêde tê dîtine. Bawerim ev wê xwe bisipartina Sovyetê ve bibe, divê vê jî li ser vê bingehî bişînin nav me. Ji ber ku Ewrûpa bi Avûkat nêtar kirine, Avûkat li ser demokrasiya cîvakî dilîze, ev jî hinekî li ser pêwendiyên Bûlgar, wê li ser pêwendiyên Sovyetê bilîze ku, ev du pêwendiyên herî serekene. Vana piştî ku bê bandor kirin hêdî hêdî bi ser me de hatin.

Me jî piştî 1987'an pergaleke pêşxistibû hebû, di dahûrandina provkatoran de, di dahûrîna koleyê wan çêkerê de encamên ku me derxistine. Kî li gorî wê tevbigere wê bijî, dixwaze bila biteqin, şêwaz şêwaze, yanî li gorî wê dê bê tevgerîn. Bêguman ji vê re ne amadebûn. Mîna îyotê hema di pêwendiyên wan ên bi vî şêwazî de derdiket holê. Ev kes jî wisa bû. Yanî bi şêwazê ku min got, ji demokrasiya civakî re, li ser esasê pêwendiya sosyalîzma pêkhatî, -ji xwe wê demê Haydar Kûtlû çûbû Enqerê- di 1987'an de tasfiyegeriyeke ferz kirin hebû. Xebatkarên wan ên di nava PKK'ê de jî hebûn. Îhtîmaleke mezin heta 1986'an jî wan çîrokên tên zanîn pêşdixin. Ev her du jî –em bêjin rêbertiya ji girtîgehê derketiye- dibêjin vî karî ji me re bihêlin. Heta bi henekî be jî ji min re ev digotin, "tu westiyayî û êdî vî karî ji me re bihêle" min jî ecêb dîtibû, yên ku ji meşandina xwe acizin çi daxivin. Lê niyetên wan ên sexte ji xwe wan jî dida dest. Xwestin hinekî nermbûna min jî bikar bînin, lê xwe dan dest.

Tê bîra min, em ji çêkirina nivînên taybet bigrin heta qeşartina fêkiyan, ez gelek nerm tevdigerîm. Heta carekê dema ku min greyFurdek qeşart û dayê kesayetekî bi qasî ku bêje, "wey Serokê min, greFurdê diqeşêre û dide min, çiqasî nirx dide mirov" wisa bû. Lê dema ku me hinekî rastiya kar ferz kir, bi awayekî xerîb ji nişkê ve, di Sibata 1988'an de întîhar kir. Rexneyeke biçûk a hevalan pêş ket dikeve nave gumanan, "wê min darizînin, bigrin?" hinek nirxandinên wî yên bi vî rengî hebûn. Ez ji bo vê dibêjim. Balkêşe! Nameyekê jî dihêle, name jî pir balkêş bû! Hinek nirxandinên wî yên weke "ez dixwazim bi

deng bifikirim"hebûn. Ji bo vê dibêjim; dixwest tiştna baxive, nekarî baxive. Qala malbata xwe dikir digot; "weke malbateke yahûdî" pir cuda bû. Bavê wî jî çil sal bû polîs bû. Mirov difikire; "gelo ev zarok wisa emadekirin? Yanî teqez tiştekî nabêjim.

Weke min got, piştî 1987'an pir ecêb bû, "vaye dibêje êdî em nikarin li ber xwe bidin" û ew jî kesekî bi navbang bû, endamekî heta dawî dê ji aliyê çêkera me ve bê ecibandin. Îhtîmaleke mezin weke endamekî pêşeng dikare bê fikirinadin. Ji xwe piştî wê yên din bi çar destan hemêz kirin. Avûkat, Fatma îhtîmaleke mezin hemû wisa ne. Yanî bi şertê mafê wan nexwarinê ez van dibêjim. Gelo dibe ku bi macerayeke burjuvaziya biçûk be? Dibe ku tiştên hêvî dikir û yên dîtin bû sedema şikestina xeyalan û ji bo vê çûbe? Dibe ku dîrok di demê pêş de baştir ronî bike. Ewqas negirîng bû. Yê girîng herduyên din bûn. Ya van pir çavsore.

Di sala 1987'an de li beramberî KT' çawa ku em têkoşîn dikin, ew jî mîna PKK'ê –em xwe jî bixin şûna komara PKK'ê- li dijberî me têkoşînkirina wan mijara gotinê ye. Heman stîl û heman taxtîk, heman çavsorî. Camêr tam xwe xistiye şûna min, tempoya bilind, bilez difikire, bilez tevdigere, bawerim di hestyariyê de jî hewl dide min texlît bike. Bi şêwezekî bawerneker rêbertiya di girtîgehê de ser dixe û bi vî rengî ji sedî nod pêwendiyan dixe bin venêrînê.

Bi taybet berxwedaniya Hîlvan-Sêwerekê heye, di girtigehê de beşê herî zêde li ber xwe dide ye, wan tine rewşa ku berevajî partiyê bikevin. Hinek ji wan ji partiyê cuda dibin û yê din jî –ên ku 18 cara îdam girtine hene- têkiliya xwe ji partiyê qut dikin. Yek vê pêk tîne, beşeke giring jî ya ku em jê re dibêjin çanda televîzyonê digre bin bandora felsefa jiyana 12'ê Îlonê. Bi hestyariyeke dijwar bi pergalê ve girê dide. Gelekî di ser pîvanên Kurdistanê re, heta di ser pîvanên jiyana me re jî di hundir de jiyanek heye. Di bin navê mafê mirovan de, -ji xwe ev bizav di dorfirehiya cîhanê de ji aliyê Emerîka ve tê ferzkirine- li ser girtigehê ev hatiye ferzkirin, mafê mirov, yanî mafên ku em li vir jî nikarin dest bixin dest xistine.

Pir baş xwe xwedîkirin, temaşekirina televîzyonê, her ku diçe di sînorên kujer de ev maf tên destxistin ku yê me jî dibêjin; "me li ber xwe da, qezenc kir," piştre derket holê ku ev

xapandineke. Dema ji nîşkê ve îskence ferzkirin ser û binê hev dibin û dibêjin; “em mafê xwe bigirin.” Ya rast mafê ku di girtîgehê de bê destxistin nîne. Girtîgeh girtîgehe, tu dîlî. Camêr li ser hemû tiştê te serwere, li vir şêrê maf nayê dayîn. Ya ku li wir bê kirin rizkarkirina anûra rast a şoreşgeriyê ye, radestnebûne, ger gengaz be tiştek dayîna rêxistinê ye, hinekî be jî bandorkirina derveye. Ji bilî vê dikare qala kîjan mafî bê kirin? Xwarina zêde ne mafe, zêdetir rehetbûn, zêdetir temaşeyî televîzyonê kirin, nizanim zêdetir çi nemafin.

Her weha ev weke meylekê pêşxistin heye û di encam de em pişre li yê derketine derve dinêrin, yên herî niyet baş jî di nav de, bi şêwazekî neyê bawerkirin nayên jiyana rêxistinî. Kesayetên wisa hestyar ên pir ketî. Berxwedêrên herî mezin ên salan çawa dibe ku ketin vê rewşê, me ev ji xwe pirsî. Demêkî kesayetiyeke pir bi zanebûn hatiye pêşxistin. Yanî çawa ku li derve em dibêjin mîlîtan kiye, taybetmendiyên wî çine, vê bê aman pêşdixin, di hundir de jî heman hatiye pêşxistin yan jî dewlet dibêje, mirovê sax kî ye, yê ku xwe ji tasfiyegeriyê re razandiye kî ye, yê ku rêxistinê vala derdixe kî ye, ji bo vê heta dawî ezez, heta dawî ketiyê jiyana ferdî, heta dawî di ser pîvanên madî yên di Kurdistanê de daxwaza jiyanê, daxwaza hest, daxwaza evînê dike kî ye, ev pêş xist. Û rêberên wan ên şerkêşiyê dike jî wisa ye.

Hîn jî tê bîra min, hevala me ya jin – bawerim di nava refên me de pêşketiye- hat me wisa hevdu dît, dawiya 89’an bû, despêka 90’î bû, tam nayê bîra min. Şener bi xwe jî 1989’an de her tim dihat gel me. Me li xanimê nerî me jê re got, “Zilam revî, zilam çû gel KDP’ê” wisa sivik me negot xiyanet jî kir pir aciz bû, mîna baranê rondik ji çavên wê barî û got; “çawa dibe.” Min dît ku ev kez di cîhana xwe de pir mezin kiriye. Di sexsê girêdana bi kesekî ve, dewlet jî amûrekî demokrate, PKK jî kiriye amûrekî zextê. Bi serdozgerê ewlekariya Amedê re li parka Amedê çawa rûnişitiye, çawa bidemjimêran nîqaş kiriye vedibêje. Qaşo wê êvarê biçin lokantayê û hemû armanca wî jî fêrbûna “bê ka kê tunel gotiye” wê ji serdozgerê Amedê fêrî vê bibe, yanî ev hemû bi awayekî safîtî dibêje.

Ji girtîgehê pisûlayek tê dibêje; “me dît bi serdozger re rûnişt” ji partiyê re radigihîne dibêje; “bila dîqat bikin” lê hevala

jin bi xwe jî vê asayî vedibêje. Yanî dibêje; “dijmin ehbab-çawîşê herî demokrate.”

Nayê fikirandin ku pêwendiya dozgerên ewlekariyê bi dewletê re nebe, lê hatiye vê rewşê, hem jî bi ya herî niyet baş re. Em jê guman nakin, naxwazin guman jî bikin. Rewşa kadroyên me yê herî sereke, di naverasta Amedê de ji xwe re digere. Hinekan vedixwîne dawetê. Qaşo ev jî yek ji kadroyên me yê pêşenge.

Dewleta wî heta dawî demokrate ku, piştre çareseriya ku ferz kirin hebû, heta dixwestin xwe bigihînin min jî, “gelo em nikarin APO jî bikşînin” mesele ev bû. Derfetên dewletê pêşkêşkirin hinekî bandor kir. Bandorkirine, girtîgeh jî di vê wateyê de ji hev ketiye. Rêbertiyeke hatiye pêkanîn heye. Çêkera li derve wahşî dibînin, mesele hevala jin bi xwe digot, “ew kiro te fêm nakin” Nameyeke hema wisa tê bîra min. Dibêje; “ger tiştekî bikin ez ê hemû cihanê bi serê wan de xira bikim” Min got çi ji vê keçikê hat. Mim got qey xwe şaşkiriye, gelo heneka dike? Meger rastiyekê îfade dike. Zilam berdaye nav me, bawerin hêrseke wan a rêbertiyê heye, ew vekiriye. Çêkera me jî hinekî çorse, bi gotina wê “kiro ne” dibe ku camêr tengav bikin, “jineke weke min” navê wê hinekî hatiye bihîstin, hinekî jî kî dizane çawa dikare bi bandor bibe, PKK’yî û gel di nava bendewariyê de ne. Her weha dixwaze vê bikar bîne.

Bêguman me dîsa pêwîstî bi nermbûnê dît. Jinê arandine, jin bûye qûrbana lîstoka evîna xwe. Ez jê re vê dibêjin, “rojane deh şehîd, hem jî navê mîna çiya hene, hinekî li ser bifikire, yek du dilop rondik jî ji bo wan birjîne, alçaxek reviye tê çi jê bike?” Ma gengaze tu bidî rawestandin? Bawerim ruhê PKK’ê, jiyana PKK’ê efu nekir. Ne bawerim hêjî bi me re mijûl dibe. Yanî PKK’yî ye, bi înade, dibe ku wisa jî xwe derbas dike, lê ev PKK, PKK ya wî ye, jiyaneke wî heye, ew jiyan ya wî bi xwe ye. Teqez wê rojekê derbasî jiyanê bike. Yek ji yê ku dibêje; “PKK ez im.” Ti axaftin nayne ser mêrxasiya xwe, ma wisa tê lîstokê?

Ketiye nava vê derûniyê; “evîna min ya herî bilinde û evîna min avîna PKK’ê ye, min xwest zilam rizgar bikim” li şûna ku rewşê îtîraf bike û rastiyan wisa deyne holê, jine, bi înad digot; “min ya baş kir, ev ne evîna KT’yê ye, evîna PKK’ê ye” bêguman min tiştek negot. Bi mehan em di nava sebreke mezin de bûn, wê

bi xwe jî pir baş dizanî ku provakator dixwazin wê bikar bînin, lê tevî vê jî îtîrafa xwe rasteqîn nekir, hinek rexnedayîn dan, lê ne bê xwestek da, ji bo rewşê rizgar bike da. Lê dîsa jî îda dike ya herî rast, ya herî bihêz ew e. Bêguman hatiye lîstokê, hatiye provakasyonê. Hevalên me jî tê bîra min, gelek hevalên me yên rêvebir, hevalên ji Dêrsimê digot; "em demêkê zûtir vê darizînin" Min jî got; "ev hatina lîstokê ye."

Ji xwe provakasyonên dewletê jî bi vê armancê ne, yanî em dikin leşker, tam di dema leşkerbûna 1987-88-89'an de, lê ew di nava nêzîkatiyeke leşkeriyê serûbin dikin de ne. Rêbertiyeke cuda, herdu jî hatin vir. Ez pişta xwe didim camêr deh jinan bi carekê ji rê derdixe. Ez li xanima din dinêrim, rojekê ji wargehê dûr dikevim, roja duwem wargeh vediguhere biryargehê. Nîqaşên ne di cîh de tên meşandin. Dibêjin; "jiyana artêşê, jiyana koxuşên girtîgeha Amedê tîne bîra me." Bawerim di pirtûka provakatorê dawî de jî heye, ev car endamê wê komê yê herî har dibêje; "jiyana PKK'ê ji ya girtîgeha Amedê ti ferqa wê nîne, em di girtîgeha Amedê de hîn rehet bûn, em KT'yê tercîh dikin" Bawerim durişma wan a dawî eve û ev gotine. Di rojnemayeke Alman de hatiye weşandin. "Li şûna ku em di binê dîktatoriya Stalînîst a APO de bimînin, em rêveberiya demokratîk a KT'yê tercîh dikin" vê pir baş tîne ziman.

Alman hinekî rastiyan wisa tînin ziman. Ji ber ku hinekî baweriya xwe bi wan heye, bêy ku bixemîlînin diweşînin. Li şûna dîktatoriyeke Apogerî, di Kurdistanê de serdestiya KT'yê hezar carî dipejîrînin. A rastî ev rastiya gelek ji wan tîne ziman. Yanî divê ku mirov fêm bike. Dîktatoriya Apogerî çiye, jiyana Apogerî çiye? Heta neyê fêmkirin bersiv nayê dayîn. Vaye di nava nêzîkatiyeke wisa de ne. Devê wan hatiye girêdan, tiştekî min ku ez pêşkêş bikim nîne. Ne gengaze ku jiyana ew dixwazin bidim. Evîna ku raber dikin, rêxistinek di rojêkê de bi erdê re dike yek. Rêxistîn nîne, pêwendî-pergal nîne. Ez ji bo heyfa xwe pê bînim nabêjim.

Ev hevala me ya jin çend rojan li Almanya ma. Hinek hediye ji me re anî. Ez ê bi spasiyê pêşwazî bikim, lê bideh hezaran Marq û piraniya wan jî pêlîstokên zarokan bûn. Bifikirin em şerê man û nemanê didin, çiqas bûkokên xemlê hene komkiriye û aniye, hemû xistine çend bawûlan, dîsa cilên xemlê

komkiriye û weke hediye ji min re tîne. Ev jiyaneke nû ye, tê li gorî wê tevbigerî! Roja duwam van keç û xortan dikişîne nava jiyaneke li gorî xwe. Û bi vî rengî xwe dide dest. Bêguman pere jî ji min e. Bi hezar û yek kedê em keçek du keçan, xortek du xortan pêdigihînin, hemû mesrefa wan ji min e, tehamûl û sebir jî ji min e. Lê bikaranîna pere û pêwendiyê mafê wan e. Rêxistin çawa tê damezrandin, di van çiyayan de jiyan hinekî çawa azad dibe, qet ne di xema wan de ye.

Jiyaneke ji ya girtîgeha Amedê xetertire! Ji xwe di pirtûka vî provakatorê dawî de bi hemû hûrkariyên xwe ve hatiye ronîkirin, îbret dide û gelekî jî fêrkere. Vaye herî dawî hevdû dîtine, ya ew xwe davêje lingê wî, ew jî di nava rondikên çavê wê de difetise. Qaşo çawa ji dîktatoriyê rizgar bûne, lê li ku derê? Di hemêza emperyalîzma Alman de û di bin parastina wan de ne. Li ku derê ye? Di parastina dozger de ye. Li hezkirina wan, li evîna wan binêre! Wiha vana pir girîngin. Yanî serê we ji van re zêde naxebite, bi xebite jî hûn çîrokê zêde şîrove nakin. Di vir de ya girîng girtîgeh xistiye destê xwe, bi awayekî objektîf komeke cuda ye, di pîlana sûbjektîf de jî teqez vedizîn hene.

Şêwazê berevajî kirina Esad Yildiran yan jî şêwazên cilê PKK'ê li xwe kirî. Dibe ku bi hev re jiyabin, herî kêm li hev kirin. Yanî îlahî pêwîst nake tu sîxwuriyeke bi sicîl bikî. Ji şêwazê jiyanê dûrketin xetertir e. Hebûn-nebûna me pêşketina têkoşîna çekdariye. Ji aliyê rastiya Kurdan ve ger nayê xwestin dîrok bê girtin, divê ku ez piştî 1987'an bînim. Teqez û teqez pêwîste em şerê çekdarî bidomînin. Vana jî tên dibêjin; "teqez û teqez tê têkoşîna çekdarî bixî" hêrîşeke wisa çêbû ku, hemû gêrîla tawanbarin.

Belê, ez jî rexne dikim, lê tevî vê jî dîsa mirovên herî bi rûmet ên ku li ser piya dimînin divê ku hûn bin, alikariyê jî li pê tînim. Dibêjin, "pêwîste vana hemû bên darizandin, heta bên îdamkirin" Çawa ku em ji zilma KT'yê re dibêjin lenetkirî, ew jî dibêjin; " PKK bi lanete" Yê ku vê lanetiyê dimeşîne KT'yê ye. Tawanbarkirin ne ji KT'yê re ye, li me li şerwanên PKK'ê ye. Semîr ji vana re dibêje; "Çawa ji dayik bûn em ê wisa jî wan bin ax bikin" ew jî dibêje, "di Botanê de çawa xilasbû em ê wisa bin ax bikin, bila kes vî sosretetî nebîne" Camêr ji aliyên xwe ve

aliyên mafdar jî dibînin, rexneyên me jî xirab bikartînin. Ev Hogirên ku ewqas tawan kirine eserê kêne?

Ev provakatorê dawî jî nîv bi nîv dibêje; "kî ji van berpirsyare? Êrîşên serdestiya Tirkan ên hezaran sal –serdestên din jî hene- nizanim ewqas komkujiyên dîrokî, ewqas mirovên me yên ku wan tine kirine hene, ev qet nayê aqlê wan. Bêguman ez hîn duh derketime holê. Hemû jî dibêjin, "tu berpirsyarî, KT xweşike, jiyana pergalê ya ku afirandiye xweşike, tu wisa, bi vî rengiye" Dikarin pir baş binivîsînin, ya rast divê ku ev der jî bê rexnekirin, bi rastî jî pergal hinek tiştan dide.

Pergal dibinê wan mercan de ya ku ez ê ticarî nikaribin bidim pêşkêş dike. Ji hinekan re bi zanebûn, hinekan jî ne raste rast. Mesele we jî ji pergalê hinek tişt girtine. Ez li raporê hinekan dinêrim, jiyana li vir bê mantiq dibînin. Hûn mafdarin, jiyana li vir ji bo we bêmantiqe. Berteka gelekan ji we ji ber vê sedemê ye. Hûn çima nabin PKK'yî? Yan jî ya ku em pêşdibînin ji we re bê wate tê? Hûn ji jiyana kevn qutnabin, ji xwe bandorkeriya KT'yê jî ji vê re guncav e. Ji aliyê Kurdan ve dîrokeke hatiye tinekirin heye, aliyekî xwe yê bê zindîkirin nîne, dîsa hemû derfet hatine desteserkirin, aliyekî bê karanîn jî nemaye, eleqeya we lewaze, nemaze pêdiviya we pêşwazî nake. Ger ev Kurdistan bê rizgarkirin jî ev pêdiviya we pêşwazî nake.

Rêbertiya me heta dawî bê derfete, nikare bersiv bide tu daxwazên we. Wiha hûn ê jî zêde xwe tevlî nekin. Dixwazim bêjim vaye ew jî li ser vê dilîzin. Dixwazin vê tahrîk bikin. Semîr digot, "ji çaran sê bi min re ne" rastî jî wisa bû. Bi hezar û yek kedê me li Ewrûpa hinek derfet afirandine, ew di yek rojê de pêşkêş dike. Dibêje; "rêbertiya me wisa derfet pêşkêş dike."

Heta 12'ê xew, bi zerika hêkê qehwaltî kirin, nizanin ji herkesî re evîna ku dixwaze pêşxistin, hem jî li Ewrûpa mal girtin. Yek ji wan jî nabêjin ava vî aşî ji kî derê tê. Ya girîng bidest xistiye, qaşo wê bikartînin. Yên din di girtîgehê de desteser kiriye, mîlyarên gel hene, bikartîne. Hogir çiya bidestxistiye wisa kartîne. Werin ji min pirs bikin li vir çawa mîna bi derziyê bîrê bikolim hinek derfetan dafirînim. Ne di xema wan de ye, ya girîng desteserkirina nirxa ye. Ji xwe ji rê derketine. Cihana wan serûbin hatiye kirin, bi tahrîkê ji rê hatine derxistin. Weke ku min

got, camêr, dema ku em ber bi 1990'î ve hatin min carekê dît ku diçe dixwaze bibe belaya herî xeter.

Em ê kongra çara pêşbixin, hema mîna jina provakator a ku di kongra sêyem de dixwest encam bigre, tam jî di vê xalê de dibêje; "em ê xiyanetan biteqînin, wê xilas bibin" Hevalekî bi xwe ev digot, "pîlanê me wisa ye." Di heman çîrokê de, kesayetiya me li gorî xwe şîrove kirin, li gorî xwe anîna lîstokê, ji çêkerê re berevajî veguhestinê wê encam bigrin yanî ji piştê ve bi xencerkirinê fîkirîne, ji bo vê jiyana xwe jî xistine holê. Beriya wê jî, ji aliyê camêrê nû pêgîştî ve tê pêkanîn. Bawerim ji ezmûnê provakatorên dema borî jî fêrbûye, herî kêm dewletê, "APO kiye, çiye, divê ku çawa nêzîkî wî bibe" ew da ye. Nêzîkî salekê li gel min bû. Min digot, "ev camêr –nebêjin zilamê duwem- ger bixwaze, yên ku ez dixwazim, dikare jiyanî bike."

Tevgerînên wî pir cuda bûn, mîna artîstan hatiye mezinkirin, li beramberî min çar çar tê xuyakirin. Lê piştre fêm dikim ku kesekî saxteye. Carek du caran mîn dît ku postalên xwe girênedaye û li cihekî ji xwe ve diçe. Min got; "di vî de sextekariyek heye, camêrekî li beramberî min çar çar çawa wisa dibe? Ecêbe!" Meger, ev sitîlê ku zilamê duwem xêzkiriye çav boyaxkirineke. Dema ku me şand welat jî, "em ê teqez bi bîranîna berxwedana Kemal Pîran a girtîgehê ve girêdayî bimînin" wisa wêje dikir û dixwest girêdana xwe nîşan bide. Em şans binasin. Ez jî di vê mijarê de hinekî niyet başim, yanî naxwazin aliyê din zêde bibînim, ji vî alî ve ger bê dîqatkirin girtina hinek tevgerînên wî zêde ne zehmete. Metîrsîdar fêrbûye, çavsore, girtîgeh li piştê ye, li gorî xwe tevdîrê xwe girtiye.

Li Ewrûpa ji aliyê demokratên çepgir ve eyarkirina xatûnê û Avûkat heye. Dîsa hinek eyarkirinên dewletê li çiya hene, ew dizanin. Bi xwe jî di wargehê de xebitiye, bi taybet kesayetiya Başûr a lewaz, kesayetiya xatûnê ya lewaz baş çavdêrî kirine, di nava PKK'ê de weke Sari Baran, dîsa weke Metîn kesayetiya van baş şîrove kirine, li gorî xwe navendek çêkirine. Dîsa kesayetiyên lewaz ên Başûr, bi taybet ên nîv rewşenbîr, yên nîv burjuvaziya biçûk lewazêyên wan tesbît kirine, ji hemûyan re şerbeta ku nayê dîtin pêşkêş kiriye. Hema mîna Semîr ku di 1982-83'an de digot ji sê du çêker aligirê mine, ew jî dibêjin ev çêker, "ji çara sê ji me ye, me kongreya çarem girt destê xwe."

Gotina Semîr ya ku dibêje me kongra sêyem girt, dişibe ya jinê ku dibêje me kongra sêyem girt. Ji xwe xatûnê di îdaya girtina hemû kongre de ye. Ev jî dibêje; “em ê kongra çara bigirin” Gelek ciwanên Başûrê Biçûk bandorkiriye û dişîne. Weke ku Sari Baran jî dibêje, gelek camêrên wisa hene. C. Ew jî camêrên pratîka hemalî ne. Ew bi temamî girtine bin kontrolê, mîna ku bi zaroka bilîze pê dilîze, safîtiya wî bikar tîne. Tevî ku zêde ne birêxistinîne, bi pîlan û sazûmane, wan pir baş bikar tîne û carekê min dît ku wê camêr bibandor bibe. Ev hîn zêde di dîmen de bi bandor bûne.

Em dizanin ku me rêbertiya giştî ya di Kurdistanê de çawa meşand. Em dizanin me gêrîla çawa henase bi henase mezin kir. Hemû hêza wî bûyîna zilamê duwem, rayeya xwe ji min digre, bi hêza ku ji min digre –ev taybetmendiyên wan ên hevbeşin- “ger tu dixwazî bihêz bibî, tê îcazeya Rêbertiya Partiyê bigirî, te ev girt ji hemû derdên te re dermane.” Lê me fêla wî girt, dibe ku Rêbertî rojekê bê mijûlkirin, sê rojan bê mijûlkirin, ne gengaze ku her tim bê mijûlkirin. Peywir hene, rist hene, teqez tê bersiva wan bidî. Bêguman armanca vî bidestxistine. Di pirtûkeke Ersever a ku nivîsandiye de digot, “di salên 1990’î de çawa ez bidest xistime, wê çawa bikuştana, lê li şûna kuştinê ya rast zindî girtin girîngtir bûye” wisa digot. Em vê çîrokê di vir de qut bikin. Pêwîstî bi zêde vekirinê nîne, ji xwe me hinekî vekiribû. Hinekî jî raste, bawerim dixwaze vê bêje.

Dîsa pêwendiyên di derdora wargeha me de armance. Hinek vedîzî hene û ya din jî di wê demê de şehadeta hevalê Hemze heye. Ew jî komployek bû. Rewşên lez pêşdikevin, rewşa bidestxistina rêxistinê derdikeve holê. Ev girîngin. Bawerim bi armancê karanîna min eyarkirin tên çêkirin, weke ku ji aliyê xatûnê ve hat kirin. Jiyana min hinekî ji bo wan girîngtire yan jî piştî ku xistin bin kontrolê û şûnde pîlana wan a tinekirina min heye. Nêzîkatiya van ya wisa bi pîlan, hostayane hene, di çapemeniyê de jî teyîsîna xwe kir û digotin; “me APO bi dest xistibû. Dîsa digotin, “ger me xwestiba me dikarî bikuşta, lê weke pêwîstiya taktîkî me zindî hiştina wî gucaw dît.”

Çîroka despêka 1990’î ev e. Yanî “me rêxistin xist destê xwe, hindik mabû em bixin dest” ev gotin bawerim ji bo ku Şener hêz qezenc bike pêdiviya wî bi pêwendiya bi min re heye, ji ber

vê sedemê van gotinan dikin. Gelek kesayetên PKK'ê hene. Her yek ji wan dikare serkêşiyê bike yan jî dikarin rêbertiyeke cuda ya PKK'ê bikin. Bi van aliyan ve zîndî mayîn û kongre bidestxistin, herî kêm ji bo dewletê, di nava PKK'ê de saxlem girtina xwesteka sipartinê heye. Ji despêkê ve hesabekî dewletê yê wisa hebû û herî dawî di 1990'î de dilîze dibêje; "tu Rêbertiya PKK'ê ji me re bihêle" ji xwe ez jî pir nermim, dibêjim, "ger tu dikarî bibî, ez jî li benda vê me" Ew jî hinekî bi vê dane bawerkirin.

Bi kurtî li ser esasê xwe sipartina komkujiya girtîgehê derketineke rêbertî û dîsa gelek provakasyona dest dane hev dixwazin rêbertiyeke pêş bixin, dema ku em ber bi 1990'î ve tên em hewl didin bê bandor bikin. Bi xwe spartina şêwazê rast, em ji niyetên baş ên hevaltiyê bigrin şêwazê xebateke rast ya bê aman bikaranîn û ya din jî bi teşwîq kirina wan dibêjim; "tu bixwazî dikarî bibî pêşeng, dixwazî zilamê duwem, heta dikarî bibî zilamê yekem, tenê layîq be, ger tu sexte bî jî tê derkevî holê."

Çîrokeke wisa ya kongreya çaremîn heye. Ya rast demek bû min ji hemû aliyan ve xwe ji kongreya çaremîn re amade kiribû. Wê demê konferansa duwem hatibû lidarxistin, di vê konferansê de gelek biryar hatibûn girtin. Di dahûrînan de, ji xwe sedî sed pêwîstiya perwerdekirina şervanan ji aliyê me ve tê diyarkirin. Dê encamekî cuda dernekeve holê. Ew ê jî tenê destê xwe rakin û bêjin wisa ye.

Çawa ku, ji niha ve amadekariyên kongreya pêncemîn tên kirin, bi bandorbûna kesayet yan jî ferasetên din bi bandorbûnê bêderfet dike, wê demê jî nêzîkatiyeke weke vê mijara gotinê bû. Ji bo kongreya 1-2-3'em jî wisa bû. Rêbertî her tim wisa dixebite, lê ecela vî jî heye. Misoger wê bigire, ji bo ku bigire wê hemû fêlbaziyan bike, kiriye. Weke min got, li gorî xwe dikare bigre, yan jî kêmek maye bigire. Di dîmen de tesbîtkirina vê zêde nezehmete. Bizmarên ev koplo jî ji vir-wir tên jêvekirin, diqete yan jî tê dîtin. Camêr ji gelek aliyan ve xwe dide dest, ji nişkê ve dixwaze xwe bavêje bextê min, yan jî weke niha heyî diçe xwe davêje bextê mîlîgeriya seretayî û dewletê. Tiştekî din yê ku bike nîne. Encama ku divê ji vir bê derxistin çibû?

Bê eman em careke din berê xwe didin ser xebatên piştî sala 1987'an û me xebatên xirabkar ên dewletê yên dîrokî asteng

kirin. Pêvajoyeke 12 salan heye, beriya wê jî ezmûneke deh salan heye. Çima pergala burjuvazî nekarî xwe bi min bide qebûlkirin?

Ya yekem em bê aman xwe davêjin nava 1987'an, pêşketina dewletê ya xirabkar a 1976'an li Enqerê heye. Deh sal jî beriya wê bû. Çima Enqerê ez ji rê dernexistim? Ew çîrokeke cuda ye. Di 1976-86'an de çima di şêrê xwe yê bê aman de ez bin nexistim? Niha ev jî demeke wisa ye. Yanî îsyanek, demeke nû ya gerîla. Li beramberî weke ez dixwazin pêşxistina min a şer, bi şêwazê ku em dikarin bêjin sepandinên girtîgehê xwe ferzkirin heye. Sepandina Ewrûpa, sepandina çiyê, hema çiqas sepandin hene hemûyan dixwaze di vala derxistina vê gavê de bikar bîne. Ya herî girîng jî, zemînê koletiyê ji yên weke we ji leşkeriyê, rêveberiya rêxistinê tiştekî fêm nakin re pêşkêş dike. Gelekî xwe spartiye van, ev qanûna poşmaniyê jî derxistiye, li ser koletiyê dilîze, li ser gundîtiyê dilîze, li ser demogojiyê dilîze, li ser axatiyê dilîze. Lêkolînên wî hene, lêgerîn hene.

Bêguman li beramberî van her tim xwe pêşxistina min jî mijara gotinê ye. Jiyana xwe ya rojane bi hemû aliyan ve bi hesab pêş dixim. Ez ji we re bêjim; hûn jî jiyan dikin, ez jî jiyan dikim, lê kî ji dijmin re xizmet dike? Kî lîstokên dijmin têk dibe. Kî xwe tîne rewşên ketî? Kî li ber xwe dide? Kî noqî dibe? Kî dimire? Hûn ê niha hewl bidin hinek fêm bikin. Dibêjim weke camêran fêm bikin. Darêjên salan di holê de ye.

Ji 1987'an şûn ve hemû di dahûrînan de heye, bîlanço jî heye. Di dîrokê de bi qasî ku kesî nekiriye min camêr perwerde kirin. Bifikirin, li dervî welat ya ku tu kesî nekir min kir. Di dîrokê de mînaka wê nîne. Me bi hezaran kes perwerde kirin, di salekê de ji hezarî zêdetir em perwerde dikin. Salên ku me hezar û pênsed kes perwerde kirine hene. Tevgerên netewî yên hemdem lêkolîn bikin, li dervî welat herî zêde yên ku hatine perwerdekirin pêncî kesin. Lenîn li Parîs, Îngîltere, Avûstûrya deh-pazde kesên Rûsî perwerde kir û Mao jî encax ewqas perwerde kirine. Ho Chî Mîhn (Hoşîmî) jî ewqas perwerde kiriye. Hemû şoreşgerên Efrîqî komeke perwerde dikin. Dîsa yên Kastro nêzîkî sedî nabin. Ya min tenê ne perwerdekirina 15 hezar gêrîla ye, ya din jî perwerdekirina gel heye Ji serî heta neynûkê hemû tişt bîzat bidestgirtin û pêşxistina min heye. Gelek ji we dê van li ber çav

negire. Çeka bi derfetên pir zehmet hatiye destxistin hûn her roj dihêlin û diçin, her roj dibêjin; “me roket teqand lêneket.”

Berpirsyarên vê kîne? Di rojekê de deh roketan diteqînin, yek ji wan jî îsabet nake, hemûyan jî weke nûçe dinivîsînin. Tişta tê devê min ez ji fermandaran re dibêjim, yên ku çekê wisa xirab bikar tîne nikare ji min re binivîsîne. Camêrê ku nikare rakêtekê li dijmin bide û bikar tîne, nikare qala namûsê bike. Li gorî vê roketê bigire destê xwe, baş nîşan bigire. Di rojekê de bideh hezaran fîşek çarçûr dikin. Ev çek we ne afirandine, li beramberî dijmin we sebir raber nekiriye. We erzan girt dest. Mêrxasên erzan. Ev çek ne hilberîneke jiyana we ye. Hûn ê vê bizanin, bi xwe erzan sipartina hêza yekî din, çekên ku bi hezar û yek kedê hatiye bidestxistin bi vî rengî karanîn hûn nikarin bibin mîlîtan. Ma ya ku hûn dijîn ne rastiya şere? Hûn ê çekê wisa bikar bînin û paşê jî hûn ê ji min re bêjin ku di nav gêrîla de çawa bûne fermandar. Ma ez ê çavê xwe ji vê re bigirim? Ez di oxira çekekê de, ez li wir çîroka xwe ya rojekê ji we re bêjim hûn ê biteqin.

Sayîqekî min hebû, min çek bi dizî li maşînê bar dikir. Dibe ku min mirina sayîq bigirta ber çavan, lê deqe bi deqe dilê min hema dima bisekine, xwe bi xwe digot, “ger bê girtin” Ji ber ku pêwendiyên min dostanî yên saxlem jî nînbû, ger heba jî min pir diparast. Divê ku ez çekekê bigihînim. Tevî ku rêyeke nîv demjimêrî bû jî, piştî deqa 25’ û şûnde heta ku serê erebê di derî de xuya dikir min yek kêliyê çavê xwe ji pencerê qut nedikir kêlî bi kêlî henase bi henase li bendê dimam û dema ku serê erebê diyar dibû hemû cihan dibû ya min. Piştî wê min dişand rêyeke dûrtir, dema wê jî 12 demjimêre. Hesab dikir, difikirîm gelo di wê demjimêrê de erebe gişt, ger negîştibe cihan li serê min xira dibû û bi vî rengî du-sê caran kontrol çêbûn, weke avên kelî bi ser serê me de hatibe rijandin, min dest bi fikirandinê kir, gelo ez ê çawa bikarim vê telafî bikim. Cezayê dayîna girtina çekekê sî sale. Gelo asta pêwendiyên me yên niha dikarin vê rakin?

Ev çîrok hemû ji bo we bêwatene. Çekê xerc dike û bêyî ku hûn şer bikin ji me re dibêjin. Bi sedan roket we xistin destê dijmin, bi hezaran fîşek we rizandin, tê ji vana re bêjî; “ger tu wisa nêzîkî çekê bibî tê çawa şoreşê bikî?” Me çek wisa da destê we, derfet wisa bikaranîn, ji nebûnê wisa afirand? Waha hûn ê vana fêm bikin. Me li ku derê kêmasî kir, li ku derê ketin

nebesiyê hûn ê wate bidinê û piştî wê hûn ê erêkirinê ji min bixwazin. Matmayî dimînim, bi awayekî mafdar em xwe berawird bikin, hîn jî nûnerên me yên wisa hene, çek pas digre, di yek carê de bi dehan çek dikevin avê, rêxistin tenê yek pêwendiyê nake, bêyî ku şerm bike dibêje ji desthilatdariyê ketim û tengav dibe.

Bi dehan civîn çêdikim, divê ku hûn çawa xwedî li nirxan derkevin, vê her tim di çîroka xwe de vedibêjim. Bûye desthilatdar an ne bûye ma di xemê de ye? Ger bizanin bibin desthilatdar jî serê min jî bişkînin ne xema mine. Û niha derdora min bi van dagirtiye. Çawa bêjim, ma ez wisa bûm desthilatdar, min wisa desthilatdarî bi dest xist? Dibêjin; “em wisa ne” Bira heval tu çawa wisa yî?

Niha pêwîste hûn hesta li vir fêm bikin, rastiyê fêm bikin. Ya ku em jê re dibêjin rastî ev dere. Rastiya we çiye, bi qasî çend qurişa behayê wê heye, li beramberî dijmin çiqas bihayê wê heye, çiqas dikare li ber xwe bide, çiqas hildiberîne, çiqas serwere. Wê hem winda bike û wê hem jî bi derfetên partiyê bijî. Ev rastgeriye. Vê rastiya xwe bigirin û hûn çi lê dikin bikin, lê wisa dernexin pêşberî me. Ev rastî bila ya we be. Ger hûn vê fêm dikin werin vir, berevajî heza we ya bikaranîna min jî nîne. Di vir de xapêneriyek heye.

Ez girêdanên wisa erzan naxwazim. Hêz dixwazim, behremendiyê dixwazim, behremendiya cidî, ya ku dikare şer bike dixwazim. Hûn ê vê fêm bikin. Çima dibêjim? Li provakator binêrin û li xwe binêrin, li xebatên me yên bê aman binêrin, nêzîkatiya xwe ya ji nirxan re binêrin. Hûn kîne? Niha ev waneya artêşê ye, min jî bi salan xwe da gêrîlatiyê.

Ji 1987’an zêde tiştek nemabû, hevalê berpirsyar jî rewşa wî ku bikaribe henase bigre nebû. Niyet başe, wisa zaniye ku baş dike. Di encam de dişibe ji bîra bê binî zilam derxistinê. Bimire we kêrî çibê bimîne wê kêrî çibê? Me dîsa jî berpirsyarî dayê. Hûn ê nizanibin şervanê amade bikar bînin, bi dehan bidin revandin, weke min got çeka amade çarçûr bikin û vaye bûye fermandar, mirov dikeve nava dehşetê. Ma bi we re dilekî çawa ye? Ev kesayet çawa dibe ya we ez hîn jî bawer nakim. Hûn çawa hîn ji mirov fêm nakin? Di vir de rêza min ji dijmin re heye, ji ber ku baş fêm dike. Hûn jî fêm dikin hemû stratejiya xwe dispêre

min û pêşdixe. Weke zarokanin, ger tu wisa bikî tê di nava şaşwaziyan de bimînî. Mesele hemû jiyan wisa di nava şaşwaziyan de derbaskirine. Ger hêza we hebe qurnaziya gundîti, sosreta rewşênbîrî ji holê rakin. Li xwe binêrin wê we heta kî derê bibe?

Weke min got, provakatoran di asteke neyê bawerkirin de sebir raber dikirin, hîn jî wisa ne. Li beramberî min çar çar dilîzin. Ez ê ji wan re bêjim her bijî. Me sîxwur jî nîşanî we da, digot; "em ji hemû aliyan ve amadene." Bêrê min zêde we tawanbar nekir, hûn dizanin rewşa birader jî derket. Dixwaze saziya biratiyê bikar bîne. Yek fêla pîrektiyê bikar tîne, yek girêdana hevrêtiyê bikar tîne, yek jî tenê girêdana biratiyê ya ku maye dixwaze wê bikar bîne. Lêke ha lêke. Li ser çiqas jeng û qirêja dîrokê heye, çiqas hovîtî heye, demogojiya Kurd heye, çiqas karên lanetkirî, nebes, bêyom henê wan bar dike. Di bin navê hevrêtiyê de çiqas tiştên lanetkirî, bê oxir heye wê bar dike.

Bira hinek dîl girtine. Çima wan bikar neyne ku, fersendeke dîrokî ye, qaşo wê mîna paşa bijî. Heman çîrok. Her ku diçe li beramberî têkoşîna çekdarî bertekek çêdibe û biçûk dibîne. Vaye ev bermahiyên jiyana ku ji aliyê mîlîgeriya seretayî ve tên pêşkêşkirinin. Dijmin dîsa ji dûr ve stranên ku lê dide, li bermaberî bandorên jiyana me ya fetisîner –li gorî wan wisa ye-dibe ku bersiv bibîne. Ya din aliyên kar ên ku li gorî xwe bikar bîne hene û mîrateya me heye. Wê kî mîratey bikar bîne? Çima ew bixwe bikar neyne? Li gorî vê dê kesayetê kûr bike, li ser esasê xwe sipartina vê xwe bihêz bike, xwe mezin bike, bi spartina vê xwe hestyar bike. Me derfet jî amadekiriye, salên 1992-93-94 tê wateya derfetan.

Çima hesab li ser 1991'ê neyên kirin? Ya herî girîng bi kar bîne, çiqas helwes-tevgerînên kevneşop hene, xwe bavê bextê wan, eşîretgerî-kabîletgerî, hemû corê girêdana hov yên xwînê wê çiqas te bihêz bikin van hesab bike. Me ev jî dît, lê hemû nehatina pîvanên netewî, nehatina pîvanên şer, nerehetiya ku ev rê jê re vedike û ji nişkê ve xwe razandina hestên hov. Qaşo fêrî jiyanê dibin. Xwe ji aliyên cazîbkar ên jiyanê re razîne, pir zêde pere xerc bike, lê dîsa jî bila jin bê aqlê te, wê bi kar bîne û şayanî xwe bibîne. Û li pêşiya van hemûyan weke astengî gêrîla bibîne, mîn jî weke astengî bibîne û dîsa bêje; "ax ev dîktatoriya APO." Ev

çîroke, yanî hinek wisa, hinek jî bi awayekî din, hûn her tim yê kevn dilîzin, paşverûtiyê dilîzin, hovitiyê dilîzin, bitevgerînên bê pîvan, bêhesab, grî û nalîn ango bi hestên erzan dilîzin.

Ez li virim, cihê min jî zêde nefirehe ku bilîzim. Ez derneketim çiya, min derfetê ji nêzîk ve bi dijmin re ketina nava şer jî bidest nexist. Li vir bi hinek derfetên biçûk min xwest vî karî pêş bixim. Bi qasî cihanê barê dîrokê min girt ser milê xwe. Min hewl da pêdiviyên gelekî ji aliyê stratejîk, siyasî, di pratîkê de rojane hemû pêşwazî bikim. Dîsa vana hemû ne di xema we de ne? Ya girîng rastiya we bi xwe ye.

Roja borî min ev got: Hêzeke we ya mezin a darizandina mirovatiyê nebe, hêza we ya darizandina dîrokê nebe, înadeke we ya partiyê nebe, ji înadgeriyeke ji rêzê ya gunditiyê wêdetir, ji îsyangeriya we ya gundîti wêdetir hesteke we ya îsyanger nebe, di derbarê çarenûsa şer de îdayeke we nebe, pir zêde hebe giyanekî we hûn ê bavêjin naverastê yan jî hûn ê bêjin; "bila biçe zêdetir çima tê xwestin?" Rewşa we ya ji gundiyekî îflaskirî wêdetir nebe gelo hûn dikarin çi îfade bikin? Lê ji aliyekî din ve jî dîrok şahidiyê ji vegotina me ya van deman re dike û dîrok jî dibe şahidê vê hêza min. Ez çawa bihêz dibim? Vaye wisa bi hêz dibim. Şerkeriya we ji bo min bareke. Di pirtûka min de şerkeriya we nayê nivîsandin. Xwe diecibînin, ya rebî li halê vê ecibandinê binêre! Ez hêjî xwe li pratîkê nadim, li leşkeriyê jî nabim, pir ji dûr xebateke wê dimeşînim.

Serkanê giştî yê dijmin jî dibêje; "nabe, ev camêr nikare vê bike." Ez pir ji rêzê xwe didimê, weke min got min xwe tam tevlî nekir. Ev rist û şeref min xwest ji we re pêşkêş bikim. Hewl didin hinekî li kêleka kar bisekinim, di holê de ye ku em çawa radiwestin. Dema ku dibêjim bêwîjdanî vê dibêjim.

Ger hûn bixwazin bibin leşker, gaveke bi şeref di dîrokê de bavêjin despêkê sekna vê ya mezin, hesta mezin, kabîliyeta bijareya mezin, hîskirina mezin, ya ku ji hemû aliyan ve dijmin digre dest, hêza şîrove dike, hêza ku xwe ji hemû aliyan ve digire dest, heta kî derê dikare bê tepisandin, heta kî derê dikare bê rûnişkandin, heta ku derê dikare li ber xwe bide, heta ku derê dikare bimeşe, çawa lê dide, çi dikeve ku derê, çi di ku derê de tê bicîhkirin, di ku derê de kîja ruh tê raberkirin, di ku derê de kîja fikir tê rûnişkandin? Ma hûn qet pêwîstiya pirskirina van pirsan

nebînin? Ma hûn ê li hember artêşa herî kujer a li pêşberî we ye wisa şer bikin? Ez naxwazim hûn erzan bimrin, ji bo vê ez pir zêde xwe didim perwerdekirina we. Şêwazên din jî yên şer hene; şerê bîrdozî, şerê rêxistinî, ez vana hemûyan didim.

Wê biçe Ewrûpa dê bêhna wî teng bibe. Rehetiya Ewrûpa heta hestiyên wî bandor bike, lê wê nikare yek du rêxistinan ava bike. Wê were vir jî û hêza xwe perwerdekirinê jî raber neke. Wê bigehe çiyayê herî xweşik wê li wir nakaribe xwe bicî bike, wê demê tu ji zû ve tine bûyî. Belê camêr tu xwe dihejînî diçî. Tu kesekî hundirê wî hatiye valakirine, çi eleqeya te bi şer re heye? Hûn dibêjin; "wey pergalê wisa kiriye, wey bandorên Kemalîzmê, wey bandorên feodalîzmê." Ez jî dibêjim; "wey bandorên mîlîtaniyê, şêwazê bûyîna camêr û vaya ez heme." Ez xwe jî pir baş nabînim, bi zorê kar dikim. Erka min a li vir ji rêzê ye. We çil qat zêdetir dikarî bikira. Ev dihat hêvîkirin.

Hûn pir zêde dixebitin, yanî bila kes şaş fêm neke; dema ku şêwazê we yê hemaltî bû mijara gotinê, şêwazê we yê gundî bû mijara gotinê hûn yamanin. Kes ji vê re tiştekî nabêje, weke min gotî dema bersivdayîna ji ziraviya kar re, ji karê dîrokî re, ji dijmin re dayîn dibe mijara gotinê hûn di holê de nîne. Vaye ecêbî di vir de ye. Dema valederxistina xebateke dijmin, dijmin xapandin dibe mijara gotinê hûn di holê de nînin. Dema xebateke dijmin dixwaze, şêwazeke dijmin dixwaze tê gotin hûn wê pir baş pêk tênin. Bi şêwazên ku qet divê neyê lêdan, lêdan, yê çeka xwe herî xirab bi kar tîne, hinek bi şêwazê herî xirab bikaranîn, ma ez ê hîn jî ji yê ku vê dike re bêjim gêrîla? Em ê rasteqîn bin, lê dîsa jî îdaya min ev e. Ez ê ji vê paşverûtiya we re nebim amûr. Hûn çiqas min bi kar bînin jî hûn ê nikarin min tine bikin. Ez dizanim xwe hilberînim. Min li ser pêgihandina leşkerekî, li ser pêgihandina gêrîla bi cîldan nirxandin kirin.

Fermandar kiye? Binêrin, ji ruhê wî bigre heta hemû ziraviyên fikrê me daye, yên ku pêk tênin kîne? Lê dema ku dor hat şêwazê niha, hûn di bin evîndarê xwe. Ev çîrok ne weke we nivîsandiye, divê ku weke ez dibînim bê nivîsandin. Durist bin, dilnizm bin, li beramberî xwe rêzdar bin, rast nêzîkî şer bibin. Hûn pir ji rêbazên xwe hez dikin, lê di nav de tiştek nîne. Pîvanên we yê jiyanê derfet ji pêşketinê re nadin. Kesayetiya ku ji aliyê provakatoran ve tê tahrîk kirine. "Her mêrxasek xwedî şêwazeke

karkirinê ye” li gorî we jî weke ku hûn dixwazin şer hebe, hûn heta dawî jê re hene, ev evîndariya we ye. Ez wê dizanim, hûn ji bilî vê ji evîndariyeke din razî ne? Ger weke we, weke hûn dixwazin be hûn jê re hene. Mirin jî pir bi asanî dikare bê pêşwazîkirin, lê weke em dixwazin dema dibe mijara gotinê eleqeya we radiweste, ruhê we tengezar dibe; jiyan radiweste.

Tangaviyên we çine? Vaye bi vî rengî xwe dayîna deste. Hûn dibêjin, “mirina me ji me bixwaze, hatina rastiyê nexwaze” “şêwazê min, tevgerînên min çiqas nexweşik, nebes bin, neyên leşkeriyê jî yên minin û ez evîndarê xwe me, bihêle ez wisa şer bikim, wisa jî bimrim” ez jî dibêjim ev nabe. Di damezrandina artêşa ku bikare li beramberî dijmin li ber xwe bide, di pêşxistina şer de astengiya serekeye. Bêguman yekî bi wîjdan bûya, rewşenbîr bûya, ew salên ku min li wargehê derbaskirin li ber çav bigirta, di her salekê de min çawa çar dewre bi cîh kir, ev heta îro min çawa kiriye dê fêm kiriba. Ji bo vala derxistina vî şerê mezin ê li nav birinê ez çawa xwe bikar tînim? Hêza we hebûna, hêza we ya hestan, hêza fikirandinê hebûya û we fêm kiriba. Ya girîng encam derxistine. Ji xwe yek ji pêşketinên şêtker a ku ez dibim şahîd ev e; “her bijî APO, te em pêşxistin, bi şeref kirin bi anûr kirin” vaye şêtbûn, qîra şêtbûnê!

Vaye xwe nimandineke din a Apogeriyê wisa dibe. Apogeriya ku ez napejirînim. Ewqas ji bo we ji serkeftina herî baş binirxtire. Ji bo Kurdekî dîtina van rojan mûcîzeyeke, lê ji bo min netişteke. Ji aliyê hinekan ve pirsgirêkên ku derdixin holê, hema bêja bi qasî çiyayê Agirî giraniyê ava dikin. Hûn dibînin heta dawî bi sebir tevdigerim, dibe rastiyan anîna ziman û dîsa hewl didim sibê çawa bijîm nîşan bidim. Zêde derfetên min nîne, hêza min ewqese, lê hêrseke min heye, kîneke min heye û hinek hestên min yên ku aîdê min hene. Bi awayeke vekirî dibêjim; bi qasî min hesap ji dijmin xwestiye, ez ê ji we jî bixwazim. Dijmin dibêje; “yan wê xilas bibin, yan xilas bibin” ez jî dibêjim; “yan wê bibin, yan bibin.”

Binketina ku hûn ferz dikin ma ez ê serî jê re bitewînim, dev ji jiyanê berdim, ez ê ji evîndariyên we yên çavsor, tevger û helwestên we yên hezar carî ji binkeftinê re vekirîne serî bitewînim? Ger yê hezneke hebe wê bibe namerdê mezin. Ez ê hemû jiyanê serûbinê hev bikim yan jî ez ê berxwedaniya herî

mezin li beramberî we nîşan bidim. Ti carî ji vê binketinê, ev ferzkirinên we yên vekirî re serî natewînim. Bi qasî ku hûn dixwazin bêjin, “rastî ev e” bêjin, “tu nikarî tiştekî din bikî.” Rêza min heye, hûn bi îdane, lê rastiya min jî ya apogerî heye û ez kîme? Yê ku tevgerînên ne li gorî pîvanên hevrêtiyê dike ne ez im, yê ku we fêm nake ne ez im, yê di hestyar û hişyariyê de lewaz nêzîk dibe ne ez im, yê ku derfet-îmkanên heyî çarçûr dike ne ez im, ketiyê hestan ne ez im, yê bê eleqeye ne ez im.

Hûn dibînin ez bi azwerî me, bi derfetim, berhem hênerim, di wateya neyênî de ji tu kesî re gotineke mine. Min hemû bilindkirine, ev mêrxasiya min e, ne ya we ye. We ev hêz raber nekir. Tenê ne ji aliyê me ve, we li beramberî hev jî raber nekir, her tim tepisand. We pir berevajî kir, pêdiviya kê bi sererastkirinê heye di holê de ye, yê ku derfetan xerc dike ne ez im. Yê ku derdixe holê kî ye, yê ku mafê pêvajoyan dide kî ye, yên ku nizanin derfetên amade bi kar bînin kîne di holê de ye. Û tevî vê jî hîn hûn ê xwe esas bigrin. Hûn nikarin di nava komployên xwe de, ne libergerîn û qîrînên xwe, ne jî di şêwazên xwe yên heta dawî bi qûrnazî û her ku diçe zirav dibe bifetisînin.

Bûyera ku hûn jê re dibêjin Rêbertî, bûyera ku dizane ji bin hemûyan derkeve ye. Aqlê xwe bigrin serê xwe, teqez naxwazim we tangav bikim. Xizmet çiqas giran tê dayîn vekiriye, rêya aqil yeke. Ger hebe hêza we, qet nebe bila niha tiştek ji destê we bê. Ev karên zehmet in. Ev kar, ji hestyariya ku ez raber dikim jî zêdetir hişyariyê dixwaze. Li min nenêrin, ji ber ku min her tim qirêjî paqijkiriye karên bilind me daye pêşiya we karê artêşê, karê çalakiyê me fersend nedît ku em bikin. Ez qirêjiyên we paqij dikim, rista ku ji min re hatiye diyarkirin ev e. Me karê herî xweş jî xist pêşiya we, we qirêj kir. Ajoyên we yên ji rêzê, hov, hestên we hene, evîndariya we ya cixarê heye, gelek nexweşiyên we yên wisa hene, we hemû xweşikî kirin qurbana van. Hûn van qirêjiyan bi min didin paqijkirin.

Derfetên herî xweşik hûn qirêjî dikin. Zilamê bê hest, mirovê ji ziraviyê dûr, ji hestyarî, nerîna mezin, mirovê ji edeb bê par, Kurdê kevn zindî nekin, çav vekirîno, hûn van hemûyan jî li ser min ferz dikin. Ji bo vê waliyê dijmin ê taybet digot; “werin, wê we înfaz bike” Bila qet meraq nekin, weke tê zanîn înfaz

nakim, lê şêwazê min ê înfazkirinê di meriyetê de ne. Çiqas aliyên we yên hov hene, dijmin xîtabî wê dike.

Qaşo em ê we bigrin nava artêşa gêrîla, qaşo ez ê nêzîkatiya herî radîkal di dema pêşiya me de ferz bikim. Difikirim, çi bikim? Ez çima bêparim, ji bo we çi nîşan didim, hûn di ku derê de winda dikin?

Kesên leşker û şoreşger teqez yên ku bihevrebûn û şadiyê raber dikine.

Devjêberdan, heta dawî dev ji xwe berdan bi we re pêşketiye. Yê ku em bêjin zilamê şiyare jî, bêberpirsyarê herî mezine. Teşhîs heman tişte. Ez ê bêjim baldare, hişyare, lê nêzakitiyên herî zêde dev ji xwe ber dide rabar dike. Bêjim perwerdekere, pîlangere lê yê herî belaveye. Tevgerînên herî zêde neperwerdekirî, di bin navê pîlan de nêzîkatiyên herî qutebir hîn jî nêzîkatiyên bi bandorin. Hûn van hemûyan jî bi şêwazê şayanî fanatîkekî be dikin. Ez ê we çawa biguherim? Ez ê gaveke din çawa bi we bidim avêtin? Em ji aliyê wijdanî ve jî nerihetin, gelo bi xistina we ya nav kar me kêmasî kir, ger me nekiribe hinekî din li ser navê me gelek kêmasiyan dikin, em ji vê jî ezabeke mezin dikşînin. Gelek derfetên giran biha, ji aliyê xwediyê wan ve tê çarçûr kirin.

Ez qala ruhê leşkerî bikim, hestyariyê, nermbûnê, dijwariyê, hostatiya taxtîkên leşkerî bikim? Ji bo ku hûn fêm bikin gelo ez çawa hîn zelaltir vebêjim. Ez qala çareserkirina we bikim, gelo çî we yê ku nehatiye çareserkirin heye? Bêjim derfet-îmkan, ma derfeta ku me ji bo şervanekî pêşkêş nekiriye maye? Gelo rê ji vê re vedike: Dibêje; “tu şiyandarî hemû tiştiyî” ew xwe dispêre felsefeya herî nebaş. We hewl da bi nêzîkatiya; “tu reîsî, her tişt ji reîs tê hêvîkirin” we bivê nêzîkatiya xwe em vala derxistin. Ger min bigota, “ma şer bê derfete, em nedin”ma we yê baniya aqilê xwe? Lê ger bêjim, bi vî halê we nabe” hûn ê dilê xwe bigrin? “Ez bêjim ev kar pir cidiye” hûn ê dilê xwe bigrin. Bêjim, “karê dilekî mezine” hûn ê xemgîn bibin.

Ger ez li devereke çiyê bûma, minê koma xwe amade bikira, pêk baniya. Gengaze ez li vir nefesê bi we bidim sitandin?

Ma gengaze nivî, sîxwur, xefîl bin ku qûrala pêk neynin? Ez rojane ji dûr ve li we dinêrim; em bêjin hûn jî li vir tabûrin. Fermandariya tabûrekê layîqî xwe bibînim, we wisa henase bi

henase nebezînim û qet ne di xema min de, ma gengaz e? Ez ê otorîta xwe bi kar neyînim, bi şêwazekî pir zirav, ez bi şêwazekî ruhê we jî pênehese bikim, hûn ê fêm nekin ku min çawa jî kiriye. Ger ez vî karê tabûrê bikim pîşeyê sereke ez ê bi pîvanên bi qasî ku neyê bawerkirin veguherim, bimeşînim û hemûyan jî bi azweriyekê, bi xwepêşandanên lehengiyê bikim. Wê nefikirin ka mirin ji ku derê ve hatiye. Ne xirabiya moralê, uslûbê şikayetê, ez ê weke azwerekî dozê bimeşînim. Derfeta min heye dikarim bikim. Ji xwe çalakiya min ev e. Gelê min wisa bi min ve girêdayî ye. Bi giştî çêkera artêşa partiyê wisa bi min ve girêdayî ye, le ev nayê wateya ku her tişte.

Ya din divê ku mêrxasiya we hebe, divê ku hûn li gorî mafê wê bersiv bidin qadeke xebatê, yekîneya xebatê. Bila mêrxasiyeke jiyanê jî ya we be. Ya min têra min dike, lê pêdiviya we pê heye. Beriya her tiştî pêwistiya we bi kesayeteke rêzdar heye. Em tiştekî nekin jî, xwe erzan nadin bikaranîn, erzan nadin kuştin. Çima her tim bibim qurbanê şaşîtiyên hinekî din? Tenê hûn vê pêk bînin bese. Lê binêrin, ewqas ruhê şer, cesaret, azweriya şer, gelek derfetan ez ê bidim, yê li ber serê we nediyare û hûn ê bibin qurbanê rêveberiyeke muhtemel û wê haya we jî ji vê nebe. Hûn ewqas xafîlin, hûn ewqas ji rist, ewqas ji yên ku em didin bêxeberin. Ez hîn çawa xwe vebêjim? Min çek çawa da, eleqe çawa da, komek çawa pêşwazî kir, dîsa di serê rêya vê wargeha me de min mirov çawa birê kirin?

Tê bîra min, torenên me yê oxirkirinê yên pir mezin xweş hebûn, min ew çawa rêkûpêk kirin? Di parçeyekî çiya yê bi qasî sîniyekê de me çawa destan jiyankirin, hûn ê çiqasî fêm bikin? Bi êşên metirsîdar, tengaviyên metirsîdar, lê li aliyê din jî bi hêviyeke metirsîdar me çawa jiyan kir? Ez kîja ruhî vebêjim, kîja rojê vebêjim, kîja pêvajo, kîjan salê? Divê ku bi qasî fêm bike dil û eleqe hebe da ku şayan be. Û bi awayekî herî baş tenê bi hesteke erzan dibe ku bigirî. Helbikî divê wisa be? Ji bo wê hûn dibêjin dil, divê ku dil çiqas mezin be, girêdan çiqas kûr be, mafê vê xebatê dayîn di kîja saxlemiyê de be û jiyankirin bi kîjan azweriyê bêdamondin, bin neketin bi kîja kedê û bê amaniyê be?

Yek ji hestên van salan jî, hêrsa ku gêrîlayê diçe binketinê ye. Ez ji vegotina “gêrîlayê diçe binkeftinê kiye, taybetmendiyên wî çine” ji fêm kirinê zêdetir, “gêrîlayê diçe binketinê û

taybetemdiyên xwe çine?” divê mijarê de dixwazim pirtûk binivîsînim. Çiqas karê pirtûk nivîsandineke xirabe ev. Rêxistikerên ku me şandin hemû aliyan, bûyîna xwediyê taybetmendiya ji hemû aliyan ve ketina bin xizmeta dijmin, milîtanên wisa çiqas êş dide. Tevî vana tevan jî yê ku soza şerefê dide ez im. Heta ku bijim bela serê dijmin a herî mezin ezim û destkefta herî mezinim. Ez tiştekî naynim ser soza xwe ya şerefê. Her tişt ji bo serkeftina qonaxa ku ez dijîme. Teqez pêdiviya sozên ku min dane dê bêkirin.

Ez dijim, welatê min dijî.

Ez dijîm, gelê min her dem ji vê zêdetir nêzîkî azadiyê ye.

Ez dijîm kelecan heye, azwerî heye.

Ez dijîm, hemû bandorên dijmin ên di qada me de mahkûmî binektinê ye.

Ew serkeftina min ya dine. Cihê we di vê de sînordare. Zimanê we bêtir zimanê grî ye. Zimanê; “dişewitim, tine dibim, di asta jêr de me” ev bi serkeftinên biçûk serxweş bûnê. Pêwîste hûn vê cudahiyê jî baş bibînin. Ti carî tevî van hemû neyêniyan jî me henaseyeke biçûk bi dijmin neda sitendin.

Ozal di asta herî jor de bi me re şer dikir û demekê hewl da bê îmanê got; “gelo em van karan nikarin bê xwîn çareser bikin” ji ber ku me got; “dibe” vaye wî jî got “cara yekêye ez ewqas rehet radizêm.” Aliyê beramber jî em wisa dikin. Ev karê me ye. Hûn çiqas fêm bikin, fêm nekin em hîn jî hemû dijminên xwe di rewşa ku nikarin xew bikin de digirin. Ne bi xêra we, ji ber tirsa wan ya li beramberî mine. Kesên ku xwe pîlan bike, rêxistin bike, ger bizane wisa tirs û xofê bide dijmin watedare. Hûn vê îstîsmar dikin. Tirsa ku me afirandiye, gelek serdestiyên stratejîk ên ku me afirandine hûn pir çarçûr dikin, hûn erzan dibin şîrîkê vê. Hûn erzan dibin şirîkê şerefê yan jî hûn ji nedîtî ve tên, basît digrin dest. Lê ne wisa ye.

Bi me re bi anûr jiyankirin bi serê xwe şerefeke, erdeme.

Bi me re ev dem jiyankirin ji bo welatekî, dîsa ji aliyê tola gelekî ve cara yekem tê jiyîn.

Gelek hestên niyeta baş li ku derê ne, şeref, anûr çi îfade dikin, tolgirtin çiye? Ji hemû aliyan ve rêzdariya jiyanê çiye? Ji zû ve we tiştên din jiyan kiriye, dibe ku mirinê bi xwe jî zû de

hûn dîtine. Bi vî alî ve yên mirî kîne, yên ku dijîn kîne, çima ez jî xwe pirs dikim.

Hûn dibînin, hêza zorê hemû alikariya emperyalîzmê girtiye. Di van salan de dîsa alîkariya hemû xayînan girt, lê li beramberî zora ku me ferz kir zêde ber bi encam ve neçû, ji bandorbûnê dûre. Yeke din jî zora me heye, tevî hemû berxwedaniyên navxweyî jî çiqas bi bandore? Çendeke ji wan jî hinekî xwe gihandiba şêwazê bi vî rengî xebatkirinê, bi ser de biça gelê wê hîn çi nebûna? We bikariya di çiyayekî de biryargeheke wisa avakiriba, derfetên pir nêzîkî şer bikariya wisa bi kar baniya ma wê jiyan çawa pêşketa? Biryardarî eve. Naxwazim tiştekî ji mêrxasiya we re bêjim, lê mêrxasî jî, biryardarî jî eve. Qet pêwîst nake hûn bêjin; "me fêm nekir, zêde pênagihim" Vekiriye, pir baş jî hûn dikarin bigihêjinê. Şansê xwe binirxînin. Hûn ê bigihin çi, divê çi yê we be, ma we hîn fêm nekiriye? Çi, çawa bikin, çi çawa bidin jiyankirin, li beramberî çi, çawa şer bikin, ma hêjî nayê fêmkirin? Ne zehmetiyeke wê ya wisa ku mirov nikaribe ji bin derkeve heye, ne jî rewşa ku raweste heye.

Weke her tim dibêjim, dema ku dixwazim şoreşgeriya xwe bidim kirin, mîna ku her kes biçe cejnê bû. Di roja yekem de wisa bû, îro jî wisa ye. Lê rastiya din jî, yanî ev kar tenê ne karê cejnekê ye, mîna hostayan gotî, "gel dema ji bo şoreşê radibim mîna ku biçin cejnê tevlî dibim" ev jî aliyê din ê kare. Wekî din şoreş, ji hemû aliyan ve pîrika xwezayî ya civaka ye. Yanî bûyera zorê ye, hewldana bi zorê afirandinê ye. Her çiqas em bi coşa cejnê nêzîk bibin û tevlî bibin jî, eşkereye ku bi pêşwazîkirina zehmetiyên mezin em ê vî karî bafirînin. Dil dixwest ku hûn di despêkê de nexapiyana, we tenê ev kar ji cejnê hesab nekiriba. Me dixwest ku tenê we ev kar ji zehmetiyan nehesibanda.

Jiyan ya herî watedar bû, yê ku fikrandinê jî herî zêde pêş dixe, ya ku hest jî herî zêde bilind dikir ev bû. Ya ku çareserî her tim di himêza xwe de dihewand çalakiya afirandinê jî ev bû. Ev bû rêzdariya herî mezin li beramberî mirovê me, ev bû rêzgirtina herî mezin li beramberî xwe. Ev bû rêya serkeftinê, ev bû rêya jiyanê. Te çima dafirotin, çima ji rêzê girt dest? Çima tu nebû xwendevanekî mezin? Çima te qîmeta soza hat dayîn nezanî? Çima te munafiqgeriya di nava me de zindî kir? Çima te hemû

corê jiyana pergalê ya ku genî bûye layîqî me dît? Çima, çima, çima?

Hûn min çi dihesibînin? Ma wê serî bitewîne? Gelo gengaz e? Ez bibim amûr? Ma gengaze? Ger we nasnekiribe heyf ji we re! Cihanê ceriband, ma serket? Bi grî û nalînan hûn ê min bandor bikin? Bi qasî ku kes bi we re nebûye ez bi we re me. Lê her tişt ji bo rastiya mezin, ji bo rastiya azadiyê ye. Bi her kesî re xatir heye, lê bi min re tenê xatirê azadiyê heye. Hûn ê vê ji nêz ve nas bikin, gengaz be hûn ê bi vê tevlî bibin. Yanî min çîvanokî nekir, xiyanet nekir. Û tu kesî weke min bi awayekî vekirî bi dengê bilind bi ser çalakiya xwe de neçû. Ez ewqas xwedî gotin û meşa vekirî me. Yê ku fêm nake dijmine, ya din jî şoreşgerê paşketî, nebes û lumpene. Gel bi vê rewşa xwe mezin girêdaye, li ser piyane û şervanê ji rêzê mezin girêdayiye û mêrxase. Êdî ger dijmin ewqas wane jê digre û pêk tîne, divê ku ew jî ji waneyê fêm bikin û pêk bînin.

Hêvîdarim hûn hem partiyê, hem artêşê hinekî fêm bikin. Ya ku em heta dawî tê de bi îda ne û di baş bikaranînê de bi biryarin ya ku dibe yekane girêdana jiyana me ya rastiya tekoşînê û divê hûn şansê wê vê carê çarçûr nakin. Ya ku hinekî din me zelal kir û tenê ne çîroka takekî, çîroka vejîna netewekî, rêya rast a gelekî şêwazê teqez rêya serkeftinê divê hûn şayanî xwe bibînin. Hêvîdarim ku vê care hûn cidî bin, cidiyetê di dema wê de, bi tevgerînên xwe yên têrker û teqez pêk bênin. Gavên serkeftinê teqez dikin kêlî bi kêlî hem ji bo xwe, hem ji bo hemû jiyana Partî-artêşê hûn ê bibin şopdarê wê. Ger ez jî bim çi tişta ku pê re nakoke di cih de û bi uslûbekî guncaw li gorî qûralan li dijî derkevin. Deynê xwe yê ku ji vê qonaxa dîrokî re bibe bersiv û hem şansê xwe yê jiyanê, hem jî yê serkeftinê bidin. Di wateya pêkanîna sozên ku hatiye dayîn, tangavkirina dijminê ku we heta dawî li beramberî kîn girtiye û dîsa di wateya pêkanîna hinek sozên ku we dane de hûn ê bi kar bînin.

Em ê li ser vê bingehê dîsa heta dawî xizmet bikin. Ji bo zêdekirina şansê we yê serkeftinê, em ê eleqe û alîkariya xwe bidomînin. Lê ya bi we re hatiye biryarkirin û bi îdaye, pêngava we ya jiyanê ku misoger bûye serkeftinan tê de bi cîh bikin. Çi tişta ku astengî ava dike hebe, misoger bi şêwazê encamgir û aqilane bi ser de biçin. Ev dibe ya herî rast. Ji bo vê veguherin, ji

bo wê dijwariya vînê, zelaliya fikir û çi pêwîste, li ku derê, çawa bêyî ku kêliyekê jî hûn xwe şûnde bidin bi afirînin, bi wê re jiyanê bibin. Ev, jiyana teqez serkeftinê pêk tîne. Ev, şêwazê şerê jiyana ku hema bêje hemû tiştê we ji nû ve bi we bide qezenckirine.

Ger ji aliyê xwe ve em ji vê re hinekî bûbin alîkar, em ê bêjin; "bextewerî ya me ye." Ya ku hûn pir awat dikin, hinekî jî layîqî me bûn emcax hûn li ser vê bingehê pêk bînin. Em jî dixwazin jiyana me pir zêde bi wate, şad, lê bi şans be. Ez ji vê zêdetir alîkariyeke din nakim. Niha bi qasî baweriya ku bi min tê, dîsa bi qasî hêviyên ku hatine girêdan hêza pêkanînê jî zêde dibe. Hûn dibînin, bêzarbûn nîne, rawestîn nîne. Gav bi gav afirandine, lê ez nikarim her tiştî jî bafirînim. Afirandin hinekî jî encamê keda kolektîfe.

Ji despêkê ve çiqas Rêbertî jî bikim, hema bêja di nava wekheviyan de em yekem in. Xwe gihandina vî şêwazî ji bo serkeftinê pêwîste û di vir de yên kêm hûn in. Yên ku ji wekheviyê re hêdî, heta pir paşketî nêzîk dibin hûn in. Yên di nava bendewariyê de û bi tehamuleke mezin alîkarî dike jî em in. Qet nebe vî şansê xwe bi dandor bikar bînin. Naxwazim girantir rexne bikim, ser we de bêm, lê dîsa bi hevrêtî, yên ku bi kûrî fêm kiriye, bi gotinên pir kêm encamên mezin derdixe û soza ku hatiye dayîn qet nebe îro di nava derfetan de dikare pêk bînin û yên herî bi şansê meşvanên azadiyê bila em bin û hûn bin. Di dîroka Partiya me de, di rastiya me ya artêşê de şansekî heta dawî nêzîkî serkeftinê ye.

Çima hûn ê bi kar neynin? Çima hûn ê mohra xwe li serkeftineke girîng nedin? Erk li ku derê dibe bila bibe, bêyî ku cudabûna mezin-biçûk bikin, dîsa astengî ji ku derê, çawa tê bila bê bêyî ku aman bide bêje; "teqez serkeftin soza mine jî" bi ser de biçin hûn ê bikarin bi ser bixin.

**14 Cotmeh 1994**

## Pêşengên Gel Hesabê Tiştên Ku Dijîn Jî, Dadgeha Wê Jî, Di Serî De Di Nava Xwe De Dikin û Kesên Didin Kirinin

Xebatên vê dewrê îro sê mehên xwe bi dawî dike. Bi asanî dikare bê gotin temsîla alîkariyên pir hêja yê tevlî jiyana Partiyê, artêşbûnê û heta jiyana civakî bikin hene.

Yek ji xebatên me yên herî zehmet bû. Di kesayetiya vê dewrê de teysînên civakî yên ku xwe ferz dikirin û bê çareserîtî bûn. Giraniyeke mezin ava dikir. Dîsa hemû corê ferasetên şaş ên ku li ser partiyê dihatin ferzkirin, bi koman ferasetên nedihatin artêşbûnê yên ne perwerdekirî, giraniyeke mezin avakirin û xwe li ser me ferz kirin. Dîsa yên ku nayên jiyana civakî, heta dawî takekesî, jixweber, tevgerînên aliyê lumpenî li pêş, weke pirsgirêkên mezin derxistin pêşberî me. Ji hemûyan re bersiv dayîn, ji ya ku dihat texmînkirin pir westêner bû, xebateke berfireh û berxwedanî dixwest bû û em tengav dikirin. Lê pêdiviya pêşxistina pratîkeke bi hemû partiyê zîrwe bide kirin hebû. Hatiye belgekirin, divê ku mezin bê lêkolînkirin.

Tu xebatek bi vê kesayetiya we ya nîvço ve nayê meşandin. Ev car şoreş, partiya pêşeng, xebatên artêşê nayên kirin, bê kirin jî dê bibe darbe. Lê dev ji xwe berdan, ji bo hişmendiya şerê demê bi windakirinê re wekheve. Ewqas belave, yên ku xwe bi pergal nekirine, ji xapandinên mezin re vekirine, ji lihevkirina hemû corê nexweşiyan re vekirî û kesayetiyên we yên ku ji hemû şêwazê çîna serdest re vekirîne pirsgirêkeke mezin ava dikin. Em neçarbûn pir kûr li ser van rawestin.

Di kesayetiya vê dewrê de diviya bû em ji hemû partiyê re çareseriyê nîşan bidin. Amatoriya hêzên me yên çekdar, pir seranser tevlîbûna wan, hindik mabû me ji hêrsan şêt bike. Berevajî kirina vê berpirsyariyêkê dixwaze. Em nikarin bibin xwedî meşeke durû, ya ku xwe dixapîne. Û hinek sengerên ku bi zorî û zehmetî me bidest xistine em nikarin xirab bi kar bînin, derfetan çarçûr bikin. Qet tehamula me jê re nîne. Serxistina kar li vir bimîne, tenê yên ku xwe kirine giranî û şûnde dimînin çend kes hene? Çend kadroyên sexte û nebes yên xwe li ser çavkaniya kedeke kûr û pêşketinên hatine bidestxistin ferz dikin hene? Me

hewl da ku em van hemûyan çareser bikin. Ji bo ku yê fêm dikin hema ji bo her serkeftin, serfiraziyê çi pêwîst be ew heye. Ji bo yên xwedî feraset, wîjdan xizmeta herî mezin hatiye raberkirin. Lê ji yên fêm nakin, di xwe ferzkirinê de israr dikin em ê bersiveke hîn tundtir bidin wan. Ji hemû corê fêmnekerên di nava me û derve de, ji yên nebes re mafê me yê serdeçûnê derketiye holê.

Nemaze asta biryardariya dewrê pir bilinde, taybetmendiya fermander pir pêşketiye. Hemû Partî, artêş û gel jî ber bi seha biryardariyê ve kişandiye. Divê ku ev bên dîtin, bên nirxandin, pêwîste dîsa rista xwe di cîh de û têrker bilîze. Ev bikaranîna şansekî mezine. Ger hûn nenirxînin hûn ê xirabiya herî mezin bi xwe bikin. Qet pêwîstî bi lafazantiyê, xwe veşartinê nîne. Niha dema zelalbûnê, rast hesabê salan dayînê, ji nû ve xwe ji welidandinê re amadekirine û ger gengaz be, xwe rast ber bi jiyanê ve kişandine. Me pir zêde ev got.

Ev şansê azadiyeke rasteqîn jiyan kirine. Ger hûn nenirxînin hûn ê xirabiya herî mezin bi xwe bikin. Bi gotina, "me seranser derbas kir, xapiyam, wisa hatim xapandin" gotin tenê rê li ber tawanbariyên di wateya lêborîna wî ji qebheta wî mestir dibe vedike. Divê ku hûn bizanin di jiyana xwe de cîh ji van ezmûnan re nedin. Wekî din bersiv ji xwîna ku hatiye rijandin re, ji kedên ku hatine dayîn re nayê dayîn. Berevajî, ev dibe durûtiya mezin, bê rêzî ji keda hevaltiyê re. Mafê tu kesî ji me ya kirina vê nîne. Bêrêzî ji nirxên pîroz ên ku di bingehê hemû nirxan de cihê xwe digre kirin, ji çarçûr kirinê re ti kes ne dikare xwe rayedar bibîne, ne jî dikare vê bêşermiyê nîşan bide. Di vê wateyê de jî me got; "dema rêzdarbûnê ye."

Em ji vê re dibêjin asta hemû netew pêwendîdar dike. Di jiyanê de pêşketin heye, vegûherîn heye, biryar heye, fermandêrî heye; hûn ê xwe bighînin vê, hûn ê rêz bigrin û li gorî wê tevbigerin. Ger bi qasî serê derziyê rêza we ji me re hebe, ji nirxên sereke re rêza we hebe, divê hûn vî hêzî raber bikin û ya herî girîng jî divê ku hûn mafê serkeftina têkoşîna şoreşgerî û rastiya wê bidinê. Bi şerkirineke demdirêj re, yekane rêya rêzdariya ku ber bi derfetên serkeftinê ve dibe eve. Di vê ku hûn ji xwe û partiya xwe re bidin îzbatkirin ku hûn ê wisa xwedî li soza ku daye derkevin. Hûn ê bidin diyarkirin ku xwedî vê

biryardayînê ne. Wekî din nabe, bi lafazantiyê jî di ser guh re nayê derbaskirin.

Gotina, “Em hatin lîstokê, ber bi rast û çep ve çûn, hinekan em ber bi vir û wir ve kişandin” tenê tawanê we giran dike. Di vê wateyê de bikaranîna şans di serî de mafê we û yê hemû partiyê ye. Me ya ku diket ser milê me kir, heta zêdetir jî kir. Ya dimîne bi temamî bi feraset, pêşbînî û cidiyeta we ve girêdayî ye. Berevajî yên ku di jiyanê de winda bikin hûnin û hûn ê careke din derfetê wisa ji nû ve perwerdekirinê nebînin. Dibe ku heta dawiya temenê xwe hûn qehra nenirxandinê bijîn.

Dewre tenê ne ji vî alî ve, ji bo hemû partiyê pîvanên ku hatine dayîn fêmkirin, di kur de jiyankirin û di jiyana we ya têkoşîna demdirêj de kirina bingehê ji nû ve ji dayikbûn û gavên serkeftî avêtinê, di derbarê teqez biryar û bûyîna hêza pêkanînê de xwe bikin xwedî meşeke saxlem. Ji aliyê hemû Kurdistanê ve, heta ji bo hemû hêzên şoreşa me yê hêza bingehîn û dostên wê bibin kesayetên şayanî pêşengatiyê, bi îda, rêberên nûnera gavên bi asanî winda nake. Xwe bînin asta şervanên vî şêwazî. Ya ku tê hêvîkirin, tê fermankirin eve û ya şayan jî eve.

Weke li ser zêdekirin em dikarin hinek sererastkirinan bikin? Di vê navberê de di wateya alîkarî dayîn ji kedên we yên islahbûnê û rexnedayînê di kesayetiya çend hevalan de em hewl bidin bibin alîkar. Weke zêdekirin hinek pirsên ku hûn bipirsin, xisûsên di nava hevgirtîbûnê de ji sererastkirinê re xisûsên guncaw hene? Di hemû dewrê de ya din jî em bi vî alî ve di ber çav re derbas bikin.

Ab.: Nirxandinên di meha Cotmehê de hebûn Serokê min, li ser wan hinek zêdekirin dikare bê kirin.

---.: Me duh dahûrîna gêrîla kiribû, em li ser wê hinek hinek tişt din zêde bikin?

Ab.: Ew dahûrîn hat nirxandin, berfireh li ser hat rawestandin. Mijarekî ji nîqaşê re vekiriye. Ew mijar di talîmatên Îlanê de jî hebû, nirxandinên ku di pêvajoya waneya artêş û şer de hatibûn kirinin. Pêkanînên pratîkî yên di qadên şer de hebûn, mînak hatin dayîn. Di nûçeyên duh yên Cîhazê de hebûn, li ser artêşê, şer û pergala gêrîla li ser nebesiyên rêveberiyê nirxandin hatin kirin.

---.: Wekî din ji bo mijarên ku bên zêdekirin pêşniyarên kesî heye? Dahûrîna min a kesî bi encam bû?

Ab.: Raste Serokê min, xalên sereke derketin holê. Ji xwe pêvajoya heta 1986'an diyare. Hem taybetmendiyên di nava pêvajoya civakî de pêgiştine, hem jî bi hevdu re di nava nakokiyê de bûn taybetmendiyên siyasî, rêxistinî di nava têkoşînê de hatine destnîşankirin. Nirxandinên di derbarê pêvajoyên piştî wê de jî ew temam kir. Piranî çawaniya şerê ku bi dijmin re tê meşandin hatin destnîşankirin. Ev beş dikare berfirehtir bê destnîşankirin. Bi mînakên cuda dikare bê vegotin, lê ya rast ên ku hatin kirin jî besin. Ev weke çarçoveyek bese.

---.: Me xwest em vê nîşan bidin; di pergalê de kesayet di temenên biçûk de, ji mercên herî hov re, ji nakokiyên jiyana civakî re em nêzîkatiyeke çawa raber dikin û wê çawa bi şêwazê îsyanekê nîşan didin, di çarçoveya civakî de, di nava çareseriyên pergalê de jî, çawa bi hêrsekê, bi lêgerîna maf em ser de diçin. Bertekên mercên başketî yên civakî rê ji vê re vedikin ber bi ku derê ve dibin? Ev salên ku gelek bi zehmetî derbas bûn, paşê li beramberî jiyana civakî ya ku pergal ferz dike hêdî hêdî çawa ji nav fedyokiyê derxist ji bo serkeftîbûnê, hemû hêza xwe seferber kirî berê xwe dide rastiya min a mamostetiyê? Pêvajoya perwerdê ya ku me nirxeke mezin dayê, lê bi pirsnîşanan ve dagirtî bû, di kesaytiya xwe de, bi nirxdarêzên civaka fermî xwe di nava nakokî û pirsgirêkên mezin de dît, daxwaza xwe ji van rizgarkirinê, em dizanin îsyan û bertek pir alî bû.

Pirsgirêkên ji civaka gund ber bi civaka bajêr ve çûyînê afirandin, ji bo neyê eciqandin helwestên ku hatin raberkirin têkoşîneke cuda ye. Rêwitiya ku ji paytaxta civaka fermî re hat kirin, li wir ya ku mîna kevneşopî û hemdemiyê dihat tabîrkirin nakokiyên pîvanên pergala fermî jiyankirin; dîsa di navbera înkara netewî netewbûnê de asê mayînek heye. Ev dibe sedem ku ez di navbera şoreş û dijşoreşê de asê mayînekê bijîm.

Dema ku em ber bi salên 1970'î ve tên, êdî ji jiyaneke îsyanger, her ku diçe bi zanabûn bijare ji aliyê sosyalîzmê ve tê kirin, li ser vê bingehê hîn bi îda, bi biryar ketina nava jiyaneke siyasî, berê xwe dana civakê, dibe kesayeta ku bi dewletê re rûbirûyê hev dibe. Vana hemû dibin, amadekariyên nirxandina dewlet û civakê û dij derketina wan. Di fikir û çalakiyê de bi

avêtina gava yekem re, hewldana bûyîna endamê herî li ber çav ê tevgera ciwanan ya wê demê, dîsa bûyîna alîgirê pirsgirêka Kurd mijara gotinê ye. Lê her ku diçe berê xwe dana rastiya bûyîna komekê û heta di asta rêbertiyê de hîn şênber, bi qasî ku bi dest bê girtin bûyîna xwedî gavên berpirsyar jî xisûsên ku her diçin pêşdikevinin. Pêdivî û neçariya vê fêmkirin û ji vê ne rev; çiqas zehmet be jî piştî despêka 1970'î bi bandora keda rêbertiyeke şênber re çûyîn girîngiyeke mezin di nava xwe de dihewîne.

Min hewl da vana hemûyan nîşanî we bidim. Eşkereye ku bûyîna koma gaveke siyasî ya girînge, ya rast rûbirûbûneke wisa bi dewletê re di navbera salên 1970-1980'î de qonaxeke çarenûsaze. Dibe ku bê fikrandin li nav neçûn tesadufek be, lê ji hemû aliyan ve di holê de ye ku girêdana xwe bi kesayetiya pêşwext xwe amadekirî re heye. Kesayetiyeke bi hestan, fikrên rast ve dixwaze pêşve biçe mijara gotinê ye. Dîsa di demeke gelek şoreşger tê de dihatin qetilkirin, bi birînên biçûk derbaskirin serkeftineke girînge.

Dema ku em ber bi salên 1980'î ve hatin, êdî ji bo ku em ji jiyana şoreşgerî ya ku bi fetisandinê re rû bi rû hatiye qut nebin, pêdiviya berê xwe dana qadeke şer a dervî welat derketibû holê. Tê zanîn ku ev jî pêvajoyeke girîng a dîrokî îfade dike, tevgereke wisa ya hîcretê, bidestxistina derfetên kûrkirina xebatên xwe bicîh kirineke guncaw a şer afirand.

Piştî salên 1980'î û şûnve, bi taybet li beramberî faşîzma 12'ê Îlonê, me xebatên herî encamgir û bi pergal ên dîrokî raber kirin. Bi taybetî ronikirina pirsgirêka Kurd, bi çalakiyê em derbasî qonaxa zindîkirinê bûn. Bi derbaskirina nêzîkatiyên Tirkiyê yên înkarger, ji aliyê siyasî, civakî, bîrdozî şoven, me xwe gihand rastiya dîrokî. Bi xêzkirina çarçoveya Tevgereke Rizgariya Netewî, araste diyarkirin hêzên pêşeng li pê hev me di derbarê çiyayên azadî belênî dikir de kûr kirin.

Em derbasî qonaxa 15'ê Tebaxê bûn. Navbera salên 1980-1990'î vê carê bê ka wê miletek rabe ser pîyan yan na, wê bersiv bide rêbaza şerê çekdarî û xeta partiyê yan na, wê di binê darbeyên faşîzmê yên hişk de bi eciqe yan na, weke wê bikaribe şansê jiyana azad bikar bîne yan na, ji pirsên dîrokî re bersiv avakirin û ji bo hemû corê hewldanan raberkirin, ji takekî ya ku bê hêvîkirin çiye ji nîşandana wê re aqil kirin, pêdiviyên wê

pêkanîn esas bû. Me hinekî xwest hêza lihevkirinê ya mezin, bikaranîna hêza têkoşînê di kesayetiya xwe de biteyisînin.

Em ji pêgihandina pêşeng ber bi pêgihandina gel ve derbasbûnekê dikin. Tevî hemû komkujiyên ku dijmin kirine me zanî ev gelekî bêdeng nabe, ji fikrandin û tevgerînê nikare şûnve bê xistin afirand. Dema ku em giştin salê 1990'î xebatên ku me pêk anîn bûn.

Ger hûn ji xeta bîrdozî, siyasî û leşkerî fêr nebin, ji xeta şer a takê ku şer di kesayetiya xwe de daye ji fêrbûna we re alîkarî hatiye pêşkêşkirin.

Em xwe çawa digihînin kesayetiya civakî? Dîsa me çawa vekirin di kesayetiya bîrdozî û siyasî de kir? Bi kelecana romanekê, bi uslûbekî herîkêner min di jiyana xwe de nîşan da. Çawa civakî dibim, di civakîbûnê de dijberî çime, çi esas digirim me ew nîşan da. Çawa gav davêjim nava siyasîbûna bîrdozî, bi kîja birdoziyan re dikevim nava pevçûnê li dijberî kîjan siyaseta di meriyetê de ye derdikevim? Bîrdozî û siyaseta ku hatiye pejirandin ji kîjan jiyanê re rê vedike? Kesayetiya siyasî, kesayetiya bîrdozî, bi naverok û uslûbê xwe ve çawa pêş dikeve me ew nîşan da û me mînakên ber bi kesayetiya leşkerî ve diçin hinekî raber kir.

Ji şêwazê pêgihîna bîrdozî, siyasî, civakî û hema bêje yê ku dibe cewherê van hemûyan, dibe îfadeya herî kûr ya van ber bi kesayeteke leşkerî ve pêşveçûn heye. Tevgerîna leşkerî, stîla leşkerî, pêşbîniya leşkerî, şêwazê tevgera leşkerî bi hestyariyeke çawa tê destgirtin? Teqez diyare ji bo we ya girîng û sotêner eve.

We hemû tişt li bin guhê hev xist. Bawerim piraniya yên ku ji welat tên, çek avêtine milê xwe hemû di vê rewşê de ne. Ji bo we me careke din ev wane di kesayetiya xwe de anî ziman. Hûn ê bibînin tenê ji bo dîtina çekekê, tenê ji bo perwerdekirina komekê, ji bo xemilandinê, fedakariyeke mezin, me hestyariya herî mezin raber kiriye. Yê ku vê nebîne nikare bibe leşker. Yên ku çîroka çawa bi destxistina çeka yekem nizanibin, nikare di PKK'ê de gav bavêje. Hebe nebe wê bibe yê nirxan çarçûr dike û kesê îflah nabe.

Yên ku çîroka koma perwerdeya yekemin çawa hatiye destgirtin nizane, wê bibe lumpenê bi hemû nirxên şer dilîze,

nizan û eşqiya. Bi destxistina çeka yekem, girtina ser milê xwe ya berpirsyariya perwerdekirina koma yekem, tenê kesek di sînoran re derbaskirin em ji henase girtina wî bigrin heta raberkirina berpirsyariya di çend sînoran re derbaskirinê keda kê çiqas derbas bû? Bêyî ku bizane di Rojhilata Navîn de hêzên ku alîkar bûn kîne, hûn ê tiştekî ji artêşbûnê fêm nekin. Çiqas xwêdan, xwîn hat rijandin, lêdana dilan çawa bû, şehîd çawa hatin dayîn? Heta ku hûn vê fêm nekin hûn ê şayanî leşkerî û çekê nebin. Li ser vê bingehê hûn ê xwe mezin li ber çav derbas bikin.

Hewldanên me yên bê aman hema bêjin vaye çil salan dibîne. Sî salên wê li ser esasê siyasî tê amadekirin, bîst sal pêşengatî, panzde sale jî em xwe ji kesayetiya leşkerî re amade dikin. Heta ku hûn wateya van nizanin, hûn ê bibin leşkerê çi, artêşa çi?

Me ev ji we re got; qet nebe rastiya xwe bibînin. Ji bîr nekin ku, fermandarên resen, yên ku di dîrokê de navdêrî hiştine yên ku xwe pêgihandine, yên ku girêdana herî kûr ji nêvengê re raber kirine. Yên ku girîngî nadin nirxên ku wan derxistiye holê mîrat xwurin û ew ê her tim alçax bimînin. Ji kedê re ewqas bêgane, ewqas ji ser serê xwe avêtî nêzîk dibin ti carî nabin leşker. Yên ku mîna dizekî berheman desteser dikin nabin xwedî ked, em devjê berdin nûnertiya kesayeta fermandarekî bikin, xwe bi awayeke oportonîstî, munafiqekî ferzkirinê wêdetir nikarin biçin.

Berî her tiştî pîvanên di leşkeriyê de hatine dayîn. Bi qasî ku kesayeteke, em ji aliyê exlaqekî, moral ve bigrin bêyî ku nerîneke bîrdozî ya saxlem hebe û yê ku vê jî li ser helwest û tevgerînên xwe nateyisîne li ser sekneke wisa serwer nebe nikare bibe leşker. Ew desteserkirina raye yê ku we pir layîqî xwe dîtiye, dîsa qaşo fêrbûnên gundîtiyê, gotina ez ji pratîkê fêm dikim xafleteke, tevgerîna herî zêde nayê leşkeriyê jî eve û mixabin vana hemû bi şêwazê herî neyênî li ser kedên me xwe ferz dikin ger em bînin ber çav, çima hûn nikarin bibin fermanberên navdar tê fêmkirin. Yên ku nirxên sereke esas nagirin, yên ku rêzdarî, fedakariya vê di her kêliyê de nîşan nadin, alîkariya xwe jî weke alîkarî ji van nirxan re pêşkêş nake, nikare bibe xwedî kesayetiyeke leşkerî ya bihêz.

Dema ku em jî ya para me dikeve dikin, dîsa me xwe tehlîl kir û ev nîşanî we da; kesayetiyên we yên ku nikarin di kêleka çekê re derbas bibin, nikarin di kêleka wêrekiyê re derbas bibin, me despêkê çawa gihand wêrekiyê, bi xêra rayeya partiyê, hinekî din ew rayeya ku hûn pir dixwazin û otoriteyê, kesayetiya leşkerî ya ku hûn şayanî xwe dibînine? Wisa nefikirin ku heta hûn van nirxan li ber çav negrin hûn ê bikarin pêş ve biçin. Xafleteke ewqas mezin, encax layîqî xayînan be, li PKK yekî saxlem û kadroyên wê nayê. Hûn çi dikin bikin pêdiviya herî mezin a girêdana bi nirxên PKK'ê û bizanin hûn ê çawa jê re bersiv bidin. Berevajî, dê xet we nede jiyankirin, bê xetî jî misoger wê we ber bi binketinê ve bibe. Xirabiya herî mezine ya ku hûn bi xwe jî, bi me jî dikine.

Hûn van nirxên sereke davêjin aliyekî çiqas ruh û taybetmendiyên neyênî hene; rayeya vê ya pratîkî jî heta dawî bê berpirsyarî pêşwazîkirin, qaşo bi ferzkirina qurnaziyên gundîtî, pozbilindiya rewşenbîrî hûn wisa dizanin ku hûn ê bi rêyên pir erzan fermandariyê bikin û vê xafletê dijîn. Çima ewqas xaflet hat nîşandan? Di axaftina duh de jî min bi zorê xwe girt. Hindik mabû li dijberî we bikevin êrîşê. Ji ber ku hûn amatorin, pergala leşkerî rûneniştiye, hûn ê ewqas kêyfî tevbigerin? Hêza we çiye, sînorê we çiye?

Ma wê qet haya we ji exlaq, pergal, bi taybet jî ji edeb nebe? Ma hûn ê ji qûralên sereke tiştekî qet fêm nekin? Hûn ê ji kedê para xwe negrin? Hûn ê ji keda xwe re rêzdariyê, bi taybetî parastinê qet nizanibin? Ji we hemûyan heta dawî pirsên sotêner tên pirsîn. Min xwe danî holê. Bifikirin, hêza kî ji we têra xebatê perwerdeyeke bi asanî bê meşandin dike, vesaziyeke taktîkî jî ji we dikarî bike? Cihê we teng bû, ma derfet nebûn? Çi eleqeya wê pê heye, derfetên we qat bi qat ji yên me zêdetir bûn. Lê taybetmendiyên ku we şayanî xwe dît; bi girtina çekê ketina nav helwesta xwe windakirinê, hêza ku çekê ava kir xirab bikaranîn û hema bêje ketina rewşa bûyîna bela heye.

Ez hîn jî di derbarê we de bi mijarên darêzê difikirim. Bi ku dera xeta leşkerî, jiyana leşkerî lîstin? Kî çiqasî pê list? Kê çiqas berpirsyarî ji min girt û ji niha û şûn de ji kê re çiqas par dikeve? Bi vê difikirim, erka ku herî zêde bi asanî dikare bê pêkanîn jî bi feraseteke seqet a azadiyê yan jî xirab bikaranîna

rayeyê vala derxistin di kesayetiya we de çiqas bi bandor bû? Ev raboriya we ya lanetkirî careke din li ser me ferzkirinê we zewq girt. Ji bo ku em li pêşiya we rawestin hema bêje me dijmin da aliyekî û me pêwîstî bi tevdîr girtinê dît. Heta niha jî tenê qûralekî em nikarin bi eyaletekê bidin pêkanîn.

Li gorî min gêrîla hîn di gav avêtina yekem de dê ji ku derê çawa hatiye nehatiba zanîn, bi çi çawa lê dide nehatiba fêmkirin û wê biba xwedî şêwazekî bivî rengî û wê di roja me ya îro de jî wisa bijiya. Çiqas berevajî hat pêkanîn? Çima wisa bû, çavkaniya xwe ji kî girt? Hema bêje bi qasî ku gav bi gav bê şopandin xwe eşkere kir. Di nava zanyariyên dijmin de, di bin dorpêçiyê de, di sengerê de asê mayînê xwe gihand xala linavçûnê. Di şêwazê şerê we de çiqas belave hat jiyîn. Gelo hûn pê difikirin ku bi vî şêwazê xwe ve we çiqas bi dîrokê da windakirin?

Hêjî rojane îmhayên yekeyan tê jiyîn. Dixwaze yên ku yeser rê ji vê re vedikin, dixwaze berpirsyarên ne yekser, gelo xwe di ber çavan re derbas dikin û bi berpirsyariya xwe dihesin? Ew hestyariya ku me di îsyana yekem a deh saliya xwe de raber kir jî nikarin raber bikin. Bi aqiliya zarokekî jî, tevî ku hatiye çil saliya xwe raber nakin, gelo dikarin qala kîja fermandariyê bikin? Yên ku hestyariyên zarokekî, şêwazê tevgera wî esas nagrin, dikarin qala kîja fermandariyê bikin? Li ser navê gelekî çima ewqas bê berpirsyarî tevdigerin? Bi zanabûn çav li windakirinê tê girtin.

Ma wê camêrek ji nava we dernekeve? Kesayeteke xwedî aqil, xwedî wîjdan, xwedî pêşbînî, xwedî pergal pêşnekeve? Mîna bolvêriyê hûn ê xwe xerc bikin? Çima hûn ê xaleke giraniyê jî li ser bingehekî rast ava nekin? Dema ku hûn çûn biryargehekê, giştin herêmekê çima hûn nikarin mîna bayekî rabim? Li ser navê pîvanê, li ser navê pergalê, li ser navê taxtîk çima hûn tevgerbûnê nadin hîskirin? Ma zimanê we hat qutkirin, dilê we sekinî? Dema ku dor tê nebesiyê, xeletiyan kesê ku ewqas xwe dide jiyîn, çima li beramberî nirxên bingehîn heman baldariyê raber nake? Mirov di nava gel de, li çiyayên azadiyê gelo qet cidî nabe? Ma qet pergalek nikare bê avakirin? Tiştên ku mirovatiya yekem di wan çiyayan de kirine, jiyan kirine qet nikare hêz jê re bîne? Ma

ewqas feraset rawestiya, kesayet hilweşî. Wê demê çikarê we li van çiyayan heye?

Çi wateya xemilandin, dayîna jiyankirin a kesayetiya qurnaztiya gundîtî ku îflah nabe, kesayetiya di dergehên KT'ê de pêgîştiye û ji rê hatiye derxistin dayîna jiyankirinê heye? Her roja derbas dibe mane zêdetir tê wateya ji dest çûnê? Hûn ê kengî devji basît lîstinê berdin, hûn ê kengî jibûyîna demagogan derkevin? Hûn ê kengî dev ji vê qurnaztiya gunditiyê berdin? Hûn ê kengî bikaribin rista xwe bi bandor bilîzin, şayanî dîrokê bibin, ji birsgirêkên sereke re çareseriyê bibînin û vê ser bixin? Ma wê qet azweriyeke we ya wisa nebe?

Hûn ê terbiya vê, jiyana sereke ya bi rêgez şayanî xwe nebînin? Bi wî uslûbê ku hûn şayanî xwe dibînin hertim bifetisînin? Hûn ê dev ji kesayetiya xwe ya fetisî, ti carî îflah nabe bernedin? Sibê, dibe ku dusibe di hinek qadên sereke de dest bi erkan bikin, di despêka vê despêkirina bi taybet hatiye amadekirin de hûn ê dîsa ya kevn ferz bikin? Bi vê hûn ê bikarin çi qezenc bikin?

Ger pêşengatî; jiyankirina rastiya gelekî be, di şer de teqez bûyîna xwedî gaveke serkeftîbûne be, xwedî nirxa di çalakiyê de teqez encam girtinê be û ji bilî serkeftinê ti vebijêrkeke din jî nebe, ma bêyî ku tu berpirsyartiya xwe bizanî derketina rê dibe? Wê demê wê kî we bide jiyankirin? Ma qet hesta we ya şermê nîne? Kî we bide jiyîn? Weke xwe nezanekî lumpen di nava refan de girtin çi eleqa xwe bi jiyanê re heye? Kesayetiyeke nehatiye tahlîlkirin, pêş ve nabe, di şer de tê çi wateyê û bi vî rengî ma hûn xwe di rewşa herî lanetkirî ya dîrokî de nagrin, weke nûnerê wê namînin, bi zimandirêjiyê ser nagrin?

Ev taybetmendiya kêrnehatî, nebes û nemaze perwerde çiqas girînge we fêm kir? We dît ku gavên saxlem avêtin çiqas girînge? We niha hinekî ez fêm kirim? Ez çima ewqasî bi mirov re eleqeder dibim? Ji bo çekekê çima ewqas ked raber dikim. Ji bo tenê fîşekek jî vala neçe çima ewqas hewldan raber dikim? Ji mirovê miriye-çûye ji bo ku leşkerekî biafirînim çima ewqas hewl didim? Lê hûn yê amade jî têk dibin, çi pêwendiya vê bi me re heye?

Em jî li warê xerîbiyê ne, lê bibînin em çawa nêzîkî nirxan dibin. Di qadeke biçûk de lêhûrbûnê bibînin. Pêwendiya

mirov bibînin, pêgîştinê bibînin. Ma hûn ê qet encam dernexin? Di vê wateyê de hûn ê qet pêdiviya xebateke biçûk jî nebihîzin? Her tim bi xwe li dînitiyê dayînê, bê wîjdaniyê dayîn, “fêm nakin, mabînim, nabihîzim” di nava vê hewayê de bilîstin û çûyînê hûn ê çi bidest bixin? Ma ev ne rewşa serxweşiyê ye çiye?

Ma artêş wisa dibe? Bi tepisandina yekî çarçûr kirina derfetan, bi xerckirina şervanan hûn ê çawa xwe bidin jiyîn? Ma ev bi xiyanetê re ne hevpar e? Rojêkê dema ku hûn derkevin dadgeha şer, gelo hûn ê bikarin hesab bidin? Û heta di wijdanê xwe de, tê bikarî dadgeha xwe ava bikî û hesab bidî? Ma wê qet muhasebeya wîjdan û dadgeha te nebe? Wê demê li ser navê gel tu xayînekî, xafîlekî, bela seriyî.

Pêşengên gel, yên ku berpirsyariyên mezin heta hestiyên xwe hîs dikin, hesabê xwe jî dadgeha xwe jî di nava xwe de ava dikin û tê wateya berpirsyarî bi her kesî jî dide avakirin. Me ev nîşanî we da, ez çawa vebêjim? Bi peyvan xilas nabe. Ez kîja salê ji we re vebêjim; li ser navê leşkeriyê, li ser navê pêşxistina derfetên leşkerî kîja rojê, heta kîjan demjimêran bêjmêrim? Ger bêjim tişta ku di dîrokê de tu kesî nekir min kir, hûn ê tiştekî fêm bikin? Ger bêjim; Di qonaxa herî girîng de, min xebateke serkanê giştî yê artêşa Tirk jî matmayî dihêle raber kir hûn ê fêm bikin? Qaşo hûn leşkerin.

Nirxandineke emperyalîzma DYE (dewletên yekgirtî yên emerîkayê) di derbarê min de hebû, ez vê ji we re bêjim hûn ê fêm bikin? Ev car hûn jî dibin hevalên me yên rê ku ji me bandor bûne. Mirov zarokê eşîretê be jî, ewqas nabe. Zarokên eşîretan jî yeman şer dikin. Ya we ji wê jî neyênîtire û taximeke ber lingan a ku nayê artêşbûnê, belavbûye, riziye dixin bîra mirov. Nemaze bilez xwe ji vê rewşê derxin. Hêza xwe, di derbazkirina wê hewaya xwe ya azadiya zexte de bi kar bînin.

Ne hûn ewqas azadin, ne jî ewqas dîlbaz (kesên ku xweşik diaxivin). Zimanê we berhev dide, asê dike. Ezeziya we jî ne azadiye, ruhê azadiyê jê distîne. Vaye dîsîplîna mezin a azadiyê ditina vê ye. Bi rastî jî ger îdayeke we hebe, dê berxwedaniyeke we bibe, divê ku li ser esasê dîsîplîna azadiyê be. Dîsa zimanê we hebe, divê ku bê aman rêgezên şoreşê vebêje. Heke îdayeke we hebe, divê hûn nûnertiya xwe ya xas divê çarçovê de bikin. We em bi kêrnehatina xwe, nebesiyên xwe ve bi

kar anî, hemû corê nexweşiyên xwe, dîsa yên tineker, bindixe, nêzîkatiyên vala derdixin we em dan xerckirin, dibêjim êdî bese!

Ez ê dîsa ji we re xizmetê bikim, lê hûn jî bizanin werin pergal û pîvanê wê. Em hişkbûnê li ser we bikar neynin, dibe ku hûn li ber xwe nedin. Dîsîplîna herî baş disîplîna jidile, lê em wê jî neynin rewşeke nenas. Em ji nava gelekî bi kulma hatiye terbiyekirin yan jî hûn ji nava gelê tawanbar ê ku bê terbiya herî mezin li beramberî xwe kirine tên. Bi çewsandin û lêdanê, hûn çiqas ji rê derxistin? Çiqasî li welatê xwe xiyanet, cewherê xwe xiyanet, kesayet û nasmane xwe xiyanet dan kirin û ketin rewşa kesayetiyên xayîn û mileteke xayîn. Ma em ê vê fêm nekin?

Leşkerî, leşkeriya şoreşgeriye. Di rêkurtkê re, di şêwazê herî kujer û bi azweriyeke mezin xwe rizgarkirine di heman demê de. Lê me neçarî rêbazên şayanî dijmine nekin. Dijminê we hûn ji rê derxistine, em we bixin rê. Rêbazên me sosyalîstî bin. Hûn dixwazin vê bêjin; “leşkertî meseleyek bi dar bê meşandine” Lê, ew rêbazê dijmine. Ger na piştî ku me jî derfet bidest xist û şûnde dikarî van rêbazan bida axaftin. Na! Em vê derbasdar nekin, lê ji ber ku ev jî wisaye em bi dîsîplînê jî nelîzin, bi kesî jî nedin lîstin.

Hîn çiqas kesayetiyên ku bi fermanberiyê dilîzin hene, bi qasî wê jî bi ya ku dibe cewherê taktîk disiplîne û pê dilîzin. Ger nirxandina derfetan li vir bimîne, di asta herî kêm de jî nayê nirxandin. Tenê ji ber nebesiya kesî yan jî ji bo rehetiya xwe xebateke pir mezin a taxtîk vala derxistinê di nava rayeyên fermandariyê de bibînin. Wê vana bi tawanê herî giran bê darizandin, ev car yê wan darizîne kiye? Heta ku hûn vê hêza darizandinê raber nekin em ê çawa bibin artêş?

Waneya bingehîn ji bo we eve. Yên ku dixwazin di taktîka me ya leşkerî de rê bigrin, qet nebe pêwîste çend waneyan fêm bike. Evê gelekî bafirîne. Ji gelê xayîn ber bi gelê azad, ji kesayetiyên xayîn wê ber bi kesayetiyên azad ve bibe. Pêwîste azweriya we li ser vê bingehê be. Îdayên we, hewldanên we yên bê xedar wê rêzdariyê bafirîne. Ger hûn pêdiviyên wê pêk neynin, hûn ê nikarin ji hukmê dîrokê yê ku dê we bi erdê re bike yek rizgar bibin, ger hûn dixwazin ji hukmê dîrokê rizgar bibin, hûn ê wisa bikevin rêya serkeftinê. Em rêberê vê ne.

Bawerim ku, sînordar be jî, hûn ê çawa bibin kesên berpirsyarên vê nîşan da. Ji rêza mezin a ku ez ji jiyanê re raber

dikim, min nîşan da ku ez xwe û derdora xwe şayanî xebateke bê xedar dibînim. Ez encax bi vî mercî xwe efu dikim; dibêjim, "te hinekî ev kar ser xist" Berevajî gengaze ez xwe efu bikim? Bi rêzdarî derketina min a pêşberî mirovan gelo gengaze? Silavdayîna min gelo gengaze? Ez nikarim durû bim, de îca qet nikarim xwe bixapînim. Ne bûbe, nehatibe serxistin ez mohra xwe lênadim, nehatibe heqkirin nabim daxwazkar. Ne terbiya min, ne feraseta min, ne exlaqê min, ne estetîka min, ne jî feraseta min a xweşikiyê vêna qebûl nake.

Di jiyanê de yekemîn xala ku xwe tê de efu dikim, gotina min a; "ger tu hinekî mafê vê jiyanê didî, ji ber tu bi anûr bû." Ya ku min bi jiyanê ve girê dide û di herikîne ev hest bû. Weke ku hûn dibînin, Serokatî eve. Misoger divê hûn fêm bikin û para xwe jê derxin.

Hinek tişt hatin fêmkirin Ab? Te dahûrîna xwe çêkir û me jî ya ku ji dest me dihat bi hemû aliyên balkêş ve rastiya xwe nîşan da. Weke hevalekî ji şoreşê bawer kiriye, yê ku demeke dirêje hêza di nava xetê de mayîn raberkiriye, lê pir zêde jî xwe negihandiye hêza çareseriyê û weke kesekî hîn jî dev ji vê îdayê bernedaye, tê çawa ji nû ve xwe tevlî bikî? Ji bo ji niha û şûn ve em çawa te erê bikin? Daxwazeke te ya têkoşînê heye? Ger heye tê çawa me îkna bikî?

Divê tu bizanî, bi ewqas nirxên mezin ên Partiyê, bi derfet û rayeyên wê bi qasî xwe xemilandinê, heta bi ser nexî tê nikaribî ji bin vî barî derkevî. Hinek tişt divê ku êdî hem teqez tu fêm bikî, hem jî pêdiviya wan pêk bînî. Dahûrîna ku tê di kesayetiya xwe de pêş bixî; teqez divê ku alîkarî ji bîranîna şehîdan û ji şerê yên ku dijîn re pêşkêş bikin. Ger tu nikarî li ber xwe bidî dikarî bibî malnişînê şoreşê. A rastî ji bo te zêde nayê fikirandin, lê dibe jî. Yan jî weke ku tu îda dikî tê bûyîna hêza mîlîtaniyê bidomînî? Vaye vê carê teqez pêdivî bi bûyîna despêkerê serkeftinê, bi van rastiyan heye ev mecbûriyeteke.

Asta te ya îda û baweriyê, asta çareserî û pêkanînê divê ku bê erêkirin. Bi wesfa "hevalekî kevne" li şûna îdarekirina karan, bi afirêneriya xwe, bi hewaye ku tê ji nû ve despêkekê bikî, divê ku tu rastiyê biteyisînî. Pêwîste tu me nexapînî. Ji bo ji niha û şûn ve xwe xapandin li vir bimîne, bi tiştên dema borî ku te dixwest bike û nekir bi telafî kirina wan xwe sînordar nekî û divê

tu bidî nîşandan ku qat bi qat jê zêdetir dikî nîşan bide û em jî vê erê bikin.

Ji bo vê îspatên te çine? Divê ku em mîlîtaniya te çawa binirxînin û erê bikin? Her weha çêkerek jî heye, tu çiqas dikarî baweriyê bidî vê çêkerê? Erêkirina wan jî pêwîste. Divê ku hûn bizanin bi anûr bersiv ji ewqas bendewariyên bîranîna şehîdan, tola ewqas girtî, ewqas bendewariyên gel re bidin. Teqez bi lafazantî û demagojiyê derbas nekin. Bi nebesiyeke cidî nêzîkatiyên leşkerî xira nekin, ji dest nedin. Ger heye nebesiyên te yên bîrdozî, ji moralê siyasî re, wê jî veke. Tu dikarî efuya xwe jî bixwazî. Ger îdaye te hebe, divê ku tu îspatên wê raber bikî.

Kongreyeke Emerîka jî, dema ku ji peywireke dewletê berendam hildibijêre baş lêkolîn dike, lêpirsîn, li gorî wê peywirê erê dike. Dema ku hûn dest bi peywirên xwe yên sereke dikin, divê ku em jî bikaribin lêpirsîn bikin, çil caran pê bifikirin û li ser vî bingehî erê bikin.

Vaye meclîsa me, vaye rêberê me. Êdî divê ku tu xwe divê çavçovê de lêpirsîn bikî, biparêzî. Daxwaza xwe ya peywirê bi îspatên rasteqîn tê çawa ser bixî nîşan bide û erêkirinê bixwaze. Tenê ne rexnedayîn, di derbarê ku tê serkeftî be jî divê tu pir zêde îspatan pêşkêş bikî. Dema ku te ev pêk anî, pêl bi pêl ev hemû çêker, heta Partî û artêşê jî divê ku weke kevneşopekê em di nava wan de biteyisînin, çawa ku min got, “ez çawa xwe didim efukirin” hûn jî efukirina xwe, dayîna efukirinê di vê çarçovê de, di nava pîvanên Rêbertiyê de divê ku pêk bînin.

Dem dem min hewl da ez te binirxînim. Çêker jî baş li ser sekiniye, te jî parastina xwe kiriye. Em vê çawa bi encam bikin? Em mafê axaftinê didin te.

Ab.: Ev demeke dirêje ez tevlî nava xebatên partiyê dibim. Di demên cur bi cur de, nirxandin û dahûrînên partiyê hem di derbarê giştî, hem jî rasterast di derbarê min de çêbûn. Bi hêza xwe jî nêzîkatiyan nikaribin pêk bînim jî, li beramberî daxwaz û ferzkirinên Partiyê gelek caran min jî hem şêwazê xwe yê mezinbûnê, hem jî rewşa xwe ya di nava xebatên siyasî, rêxistinî de hewlda binirxînim. Vana di demên cur be cur de hem nivîskî, hem jî devkî bûn.

Bi vê mehê re ev heft mehe divê dibistanê de bi du dewrên perwerdê yên ku didomin de cihê xwe digrim. Di derbarê

rewşa min de nirxandinên berfireh û rexne hatin kirin. Hemû waneyên Rêbertiya partiyê, di dahûrînên di derbarê xebatê partiyê de hatin kirin, di heman demê de bi xeta partiyê ya ku pêş dikeve, xeta Rêbertiyê, nêzîkatiyên jê re nebes, şaş, kêm, nêzîkatiyên ku zirarê didin dahûrîna pêkanînên pratîkî û nirxandina wan çêbû. Hemû nirxandinên bi vî rengî bi çêkera hevalan re, di bingeh de ji bo min bûn. Ev hemû ji xwe bi min re di nava nîqaşan de derbas bûn. Di heman demê de min wisa girt dest, hewl da fêm bikim.

Kêm jî be fêmkirina min a naveroka nirxandinên partiyê yên berê çêbû. Ji xwe şeş-heft sale, di pêvajoya ji pratîka partiyê qutbûnê de herî zêde ev pêvajoya ku ez di xeta partiyê de ber bi meşê ve birim û hîn zêde zanîna min pêşxist, piştî ku ji girtîgehê derketim û şûnve ya ku berê min da bi bandor tevlî têkoşînê bibim, dahûrînên Rêbertiya partiyê yên vê dawiyê, nirxandin û rexneyên ku pêş xistî bû. Bi lêkolînkirina wan min hinek encamên girîng derxistin. Min hemû lêkolîn nekiribe jî, beşekî mezin lêkolîn kir. Ev dahûrînên ku hatine kirin di ketina min a pêvajoyeke wisa de û daxwaza bi bandortir tevlîbûn ji pêvajoyê re çêkirinê risteke diyarker dîtin.

Herî dawî jî, dîsa di rexnedayîna min de di derbarê jiyana min a borî de min hewl da berfireh zanyarî bidim hevalan. Nebesiyên xwe çêbûn, me nekarî em wan diyar bikin, lê demeke pir dirêj bû. Ez ê van dubare nekim, lê dikarim li ser hinek xalên sereke rawestim:

Xeta Rêbertî ya pêşengtiyê, li ser pêşketina Rêbertiyê, di sê-çar waneyên dawî de dahûrînên ku kirin, di şêwazê pêgihandina min, nirxandina rewşa min a di nava faliyetên pratîkî de vekirîbûneke mezin a fikrê da min. Ji xwe nirxandina xwe ya rexnedayînê jî, li ser bingehê wê dahûrîn, di çarçoveya pê re berawirdkirinê de min hewl da bikim. Ew dahûrîn; bûn sedem ku ez nebesiyên çavkaniya me xwe ji çidigrin, di derbaskirina van de bêxwestek û bê rêbaz mayîna xwe baştir bibînim. Yek ji wan jî şêwazê mezinkirina min e.

Ya rast ew dahûrîn ji bo min gelek ronîker bû. Min pêvajoya derbasbûyî, rewşa pêgîhîna xwe nirxand. Ya di wir de hat vegotin ya rast dibe şêwazê Rêbertî, şêwazê xeta mîlîtaniyê. Bêguman her kes di heman astî de şêwazê Rêbertiyê, taybetmendiyên wî, pîvanên wî di kesayetiya xwe de teşe nade.

Lê şêwazê mîlîtaniyeke navîn jî, dîsa temsîlkirina hemû taybetmendiyên Rêbertî temsîlkirinê nagire nava xwe. Ew jî ji temenê biçûk bi pêşxistina kesayetiyeke mîlîtan, bi fêmkirina jiyanê nêzîkatiyeke bi fêmkirinê hewldana jiyankirinê pêwîst dike.

Ya rast di şêwazê mezinbûna min de ev nebesî hebûn. Min ev pir baş dîtin. Yanî di îsyangeriyê de, li dijberî neyêniyan derketin ti hewldaneke min nebû. Min her tim li beramberî tiştên wisa bertek girt, lê her tim bertekên sînordar bû, yên ku ber bi encamê ve nabin. Yên ku ber bi çareseriyê ve nabin, ji wê jî wêdetir, yên ku di nava nêzîkatiyên ji rêzê, malbata feodal pelçiqîbûn di nava xwe de digirtin, di encam de bûne îsyanên ku bi van ve girêdayî pêşketine. Ew îsyan ji şêwazê gunditiyê pêk dihatin. Ya rast pêşketina kesayetiyeke azad, serbixwe, hukmê jiyanê bike, di derdora malbatê de nebû.

Derdorê dibistanê jî di pêşketina kesayetiya serbixwe de zêdetir bandor kir. Ji xwe ji hemû aliyan ve dibistana pergalêye û ji ezeziya Kemalîzmê pêk hatibû. Piştî dibistana navîn jî ez di nava pergaleke perwerdê ya wisa de mam ku, di mijara pêşketina kesayetiya pelçiqî de bi şêwazê ku ji çîna serdest re xizmet bike, bandoreke pir mezin a pergala dibistanê li ser çêbû. Hema bêje em li gorî xwe pêgihandin. Ew şêwaza me ya mezinkirina di nêvenga gund û nava malbatê de, heta dawî ji pergala dibistanê re guncav bû. Ev jî heta dawî derfet ji perwerdekirina me ya pergalê re fersend da û kesayet wisa pêş ket. Ya rast lewazî hinekî di wir de ye.

Ev tenê niha nayê nirxandin, ez bi vê nirxandinê re nû rû bi rû nabim, partiyê beriya niha jî nirxandinên wisa dikir. Şêwazê mezinkirina zarokatiyê dê di jiyana mirovan de bi bandor be, wê girêdan di navbera wan taybetmendî û jiyana kevn de dê ewqas bê avakirin min zêde ferq nedikir, heta dikarim bêjim ku min ev qebûl jî nedikir. Mirov di pêvajoyên piştre, yanî dema ku di pêvajoya çalakiyên bizanabûn de ye, mirov dikare teşe bigre ev bawerî bi min re pir lipêş bû. Ev ji hemû aliyan ve ne şaşe, lê ji bo ku mirov di çalakiya zanînê de bikaribe bi hêz teşe bigre, divê ku taybetmendiyên berê derdorê danê baş tehlîl bike. Min rêbazekî rast şopandibe jî, wisa nêzîk nebûm.

Di pêvajiya xwe perwerdekirin, guhertinê de, paşê jî di dema ku min di nav xebatên siyasî, rêxistinî de cîh girt, di nava partiyê de xwe perwerde kir, bi bingehî nêzîkatî ji pêvajoya perwerdê re raber nekir. Ji bo wê jî nêzîkatiya min a nebes ku heyî û lewaziya di vê qonaxê de, taybetmendiyên min ên kesayetî ku ji biçûkî teşe girtibû taxrîbatên wê, xeletî, taybetmendiyên min ên nebes, lewaz, berbend di derbaskirina wan de di xwe gihandina min a encamekî têrker de astengî çêkirin. Li beramberî jiyana giştî ez ber bi çareseriyê ve nebirim. Dema ku ev jiyana şoreşgerî be, di jiyana siyasî, rêxistinî û her ku çû di ya leşkerî de ez ber bi çareseriyê ve nebirim.

Tevlîbûna min ji xebatên siyasî, rêxistinî re di rewşeke wisa de pêk hat, ji bo wê jî tevlîbûneke min a hevpar ji xebatên siyasî, rêxistinî re çênebû. Dema ku ew lewazî veneguherîn bihêzbûnê, esasên xebatên tevgera şoreşgerî, li ser xeta rastiya wê meşîn, derketineke ji van re hêz bîne kirin, xwe gihandina asta çareserkirina hemû pirsgirêkên şoreşê yên siyasî, xwe gihandina hêza çalakiyê divê ku tevlîbûneke wisa bê pêkanîn ku, min nekarî vê bikim.

Bi giştî di nava pêşketina tevgera şoreşgerî de, di pêvajoya tevgera ciwanan de tevlî bûm. Ev, ne tevlîbûneke zêde îda dixwaze bû. Tevlîbûna min ji partiyê re jî wisa çêbû. Ez di nava çêkera giştî ya hevalan de tevlî partiyê bûn. Ew jî ne pir berfireh û bi îda bû, lê nikarim bêjin qet îda jî nebû. Ya rast meraqa min ji tevlîbûna siyasetê re hebû, di zaroktî de meraqa min a wisa çêbibû. Bi xwestek tevlî nava tevgera ciwanan bûm. Hinekî baweriya min bi rastî û pêşketina wê hebû. Di nav de cih girtinê bi xwestek bûm, lewaziyên min ên ku bi tevlîbûneke mîlîtanî ji hemû pirsgirêkên wê re çareseriyê pêş bixe di esas girtina vî alî de lewaziyên min hebûn. Di wê çarçoveyê de min tevlîbûneke bi îda pêk nanî. Ji bo tevlîbûna partiyê pîvanên min ên amator û nêzîkatiyên min guncaw bûn.

Ev herdu rewşên biçûkiya min ku kesayetiya min a lewaz pêk tanîn, paşê di pêvajoyên pêşketina xebatên partiyê yên siyasî û rêxistinî de, bi qasî ku erkên siyasî, leşkerî, rêxistinî derketin holê neketina nav, ji van erkan dûr mayîn, xwe di nava xebatên amator de girtin hebû. Di heman demê de pêkhatina şoreşê xwestin, bawerî bi şoreşa sosyalîstî, pêkanîna wê xwestin, heta

tevlîbûna xebatên wê, lê neketina nava tevlîbûna mîlîtaniyeke ji hemû pirgirêkên wê re çareserî pêşxistinê, rewşa hêz jê re ne anîn pêşket. Ya rast nêzîkatiya min, sekn û rewşa min a siyasî, rêxistinî, tevlîbûna xebatên giştî yên partiyê wisa ye.

Ev rewş, ev nêzîkatî ez tevlî fikrên partiyê kirim. Min karî bi çalak tevlî xebatên rêxistinî, bîrdozî bibim. Di wê de qet min zehmetî jiyan nekir. Berevajî, gelek caran bi xwestek bûm. Di rastiyê de afirandina fikir ewqas ne asane, ez jî ne ewqas hilberêner bûm. Lê hilberîna partiyê ya fikir bihêze. Ez ketim nava hewldana fêmkirin formulekirin û ji nû ve îfadekirinê di nava xebateke wisa de bûm. Tevlîbûna min ji xebatên bîrdozî re jî wisa bû. Di xebatên teorîk de ez di nava xebatên wisa de bûm. Vê bi min re pêşketina fikrî pêk anî. Pêşketina bîrdozî pêk anî, hêza tehlîlkirina polîtîk pêk anî, lê xebatên pratîkî û rêxistinî xebatên leşkerî hewldaneke cuda pêwîst dikir. Qadên cuda ne, rêgezên wan ên cuda hene, şêwazê nêzîkatiyeke cuda pêwîst dikir.

Ez bi esasên xebatên bîrdozî nêzîkî xebatên din jî bûm. Min cudabûna taybetmendiyên xebatên pratîkî, rêxistînî, leşkerî neditin yan jî nexwest bibînim. Diviya bû bi ser lewaziyên xwe de biçûma û min derbas kiriba, lê ji min re zehmet hat. Li şûna bi ser lewaziyên xwe, zehmetiyên xwe de biçim, veguherandina hêz, ji zehmetiyan rev, bi karê ku dikarim bikim xwe sînordar kirin nêzîkatiyeke wisa min her tim di nava xebatên pratîkî yên şoreşgerî de dewam kir. Di hemû qadên pratîkî yên tevgerê de ji aliyekî ve ji bo meşîna kar erk girt, ji aliyê din ve jî di nava nêzîkatiyeke lewaz de mam. Ew hem tevlîbûna min lewaz kir û hem jî zirarên mezin da rewşa giştî ya tevgerê. Zirar da pêşketinên rêxistina pratîkî.

Di fikir de ticarî dijberî xeta partiyê ya rêxistinî, siyasî, leşkerî nebûm. Lê weke erkdarê pêkanîna wê min ew xet ticarî di pratîkê de pêk nanî. Ji bo rêxistin jî xwe bigîhînê, asta ku diviyabû ez xwe bigihînimê, min xwe negihandê. Mînak li ser mijara leşkerî min pir gotin kirin, nivîsand jî, min hewl da tevlî perwerda hevlan jî bibim; lê weke arastekirina wê min leşkerî ti carî bi xwe ne da xwarin, ez bi xwe jî ji bo ku bibim leşkerek, ji vê jî wêdetir weke erkdarekî rêveberiya rêxistinê leşkertî, weke pêdiviya artêşê rista fermanberekî listin min qet şayanî xwe nedît, min her tim xwest xwe ji derveyî vê bigrim. Min ew her tim ji

hinek hevalên din re hişt, ev min ji çêkera pratîkî û rêxistinî ya partiyê qut kir. Min hem di nav de cîh girt, hem jî bûm erkdarê asta herî jor, lê di pratîkê de min qutbûn jê jiyan kir. Ez vê niha baştir dibînim.

Di pêşketina bîrdozî û teorîk a partiyê de cihê min bû, lê fêmnekirina cewherê asta kûrahi ya afirêner, bêtirî xwe îdalîzekirin, di rêbaz de li şûna afirêneriyê formulîzekirin û qalibî dest girtin, teşe dayîn, her ku çû li ser bingehê qalibgerî û dogmatîzmê bi teşekirin hebû. Ev bêtirî xwe di şoreşa xeyalî ya Sovyet de derketibû holê. Dema ku nêzîkatiyên Rêbertî yên bîrdozî, teorîk, pêwendiya di navbera şêwazê min ê formulekirina wê demê dikim, xebatên dema borî jî dikarim bibînim. Bi taybetî rewşa dawî ya ku pergala Sovyetê ket nav, fêmkirina rastiya ya di vê mijarê de min pêk anî.

Piştî 1977'an li gorî qonaxên partiyê dem bi dem pêk anîn xwe perwerdekirin û pêşxistin, xwe kirina xwedî erk, li gorî formasyona ku pêwîst dike di nava kar de bûyîn, min pêşketinên wisa zêde jiyan nekirin. Li beramberî asta pêşketina partiyê min nûnertiya çêkera lewaz dimîne, ji derve dimîne, biçûk dimîne kir. Ev jî zêdetir ya bi giştî em jê re dibêjin qada Rêbertiya taktîkî rewşeke derket holê bû. Asta hevalan û di pêşneketina çêkera rêxistinê de ji aliyê min û hevalên din ve li gorî pêşketina xebatan li gorî xwe, xwe negihandina taybetmendiyên ku ji pêşketina demê re bibin bersiv, xwe negihandina çêkerê, di xwe de yên ku pêşketina rêxistinê tengav dike, dixetimîne, asteng dike bû sedema astengeriya sereke. Navenda rêxistinê pêş neket, navenda partiyê, artêş, çêkera fermandar pêşneket. Ev, bi qasî ku tevgera partiyê ya rêxistinî, leşkerî siyasî, girseyî her ku pêş ket, rê ji lewazbûna pêşengatiya partiyê re vekir û encamekî wê tengav dike derxist holê.

Min nirxandinên partiyê yên ku di derbarê dema borî de lêkolîn kir û ev encam derxist. Bi taybetî jî di pêvajoya ku ji partiyê dûr man lêkolînên ku min kirin bi kurtî bînim ziman; di nava xebatên rêxistinê de, dikarim bêjin di navbera xeta partiyê û ya burjuvaziya biçûk de di cihekî de bûm. Yê ku rastiya dibêje, rastiya dizane û xeta partiyê ya di vê wateyê de zane, lê dema ku dor tê pêkanînê, ne yê ku xwe tam dide pêkanînê, ne jî weke erkdar di rêvebirin û pêkanîna çêkera rêxistin a kadro rêve dibe,

min rewşeke wisa raber kir. Di encamê nirxandinên partiyê de min ev zêdetir derxist holê.

Dema ku mirov tên perwerdekirin, zanyarî ji wan re tê dayîn ya ku tê dayîn digrin, li gorî wê dikevin nava pêkanînê. Zêde mudaxelekirin, wisa ji aliyê vinê ve mudaxelekirina mirovan dibe ku bertek bafirîne, dibe ku ne rast be bi vê fikrê, tiştên ku dizanim weke tê xwestin di pratîkê de nesepandin çavkaniya xwe ji nêzîkatiyeke min a wisa digre. Li beramberî nirxandin û rexneyên partiyê biqasî ku min rastiya rêxistinê, rastiya partiyê fêm kir, min dît ku ne nêzîkatiyeke rêxistina şoreşgeriye, nêzîkatiya rêxistineke oportonîste. Ji aliyê partiyê ve jî teqabulî feraseta rêxistina burjuvaziya biçûk dikevin. Ev hem ji aliyê xebata siyasî ve, hem ji aliyê xebata rêxistinî ve, hem jî ji aliyê xebatên leşkerî ve heman ristî dilîze.

Mijarên din jî ji hev nequtin. Lewaziya min di xebatên siyasî de, di siyasetê de nebûna min a hêz, neketina min a nava nêzîkatiyeke serwerkirina wê ye. Mesele helwesta min hem li beramberî rêjîmê, hem jî li beramberî çînên serdest ên li Kurdistanê çavkaniya xwe ji tevlînebûna min a têrker tevlînebûna polîtîkayê girt. Hestyariya pratîkî, pêşbînî, ew bi amadekariyên pêwîst ê rêxisinê bi israr pêk anîn û ji nêzîkatiya bi jiyanîkirinê dûr man. Bi taybetî jî helwesta min a li beramberî çina serdest a Tirkan, hinekî jî çavkaniya xwe ji rastiya Tirkiyê girt, yanî li beramberî wan hêzan diyardeya têkoşîna çînî ya ku partiyê dimeşand weke tê xwestin temsîl nekirin bi nizaniyê min ve negirêdayî bû. Nêzîkatiya Başûr jî wisa bû. Ya rast çavkaniya xwe ji mafê mudaxelekirinê bi xwe re nedîtina min digirt.

Bi taybetî jî di Kurdistanê de weke xet, weke hêza rêxistinî, di demeke pêşengatiya partiyê pêşdiket de, diviya bû pêşengatî bê serdest kirin û nêzîkatiyên di qadên herî girîng yên pêkanînê de Partî tengav kir, zirarên cidî da pêşketina pêşengatiya partiyê. Min texmîn nedikir ev nêzîkatiya min ewqas zirarê bide partiyê, piştre min derxist zanebûnê. Ev min jî tengav kir.

Di mijara leşkeriyê de dikarim vê vekirî bêjim; taybetmendiyeke şerker bi min re nebû. Leşkertî hinekî jî şerkeriyê digre nava xwe. Di vê wateyê de di çêbûna kesayetiya min de, nikarim bêjim ji leşkertiyê re guncawe. Berevajî, di vê mijarê de lewazî hene. Min leşkertî, weke pêdiviya çalakiya siyasî

qebûl nedikir, di vê mijarê de Partî jî wisa ye; lê di nêzîkatiya min de ger siyaset pêwîst neke, çêkereke destdayî ji leşkertî û şer re nîne, nêzîkatiyên siyasî vê pêwîst dikin, min ev fikir dipejirand.

Vê jî dikarim wisa binirxînim: Ji şer û leşkertiyê re ev nêzîkatî, ya rast heta dawî pê ve girêdanê pêwîst dike. Di vê wateyê de ne xwedî fikreke herî biçûk a şer pêwîst nake, yan jî di Kurdistanê de Rêbertiya leşkerî, pêwîst nebûna artêşê nînim; berevajî di mijara pêwîstiyê de bi bawerim û ji vê jî baş ve gav navêjim. Lê di nava pêşketina wê ya pratîkî de, bi taybet piştî 1982'an dema xebatên leşkerî pêşketin jî, min ew rist neda xwe, min her tim ew ji hinek hevalên din re hişt. Ev nêzîkatiya min ez bi şer û rastiya leşkeriyê ve girêdayî hiştim, di pêkanîna pratîkî de lewaz hişt, dûr girt.

Ez hêjî di zanebûna hebûna pirsgirêkeke wisa de me. Bi taybetî jî pêvajoya heft-heşt salên dawî, bû pêvajoya ku şerê leşkerî yê partiyê di Kurdistanê de bi dijwarî hat meşandin, bû pêvajoyeke herî zêde ezmûnên pratîkî derket holê. Min ezmûna vê ya pratîkî weke tê xwestin jiyan nekir, min ev ezmûn negirtine jî. Ji ber vê taybetmendiya min, li beramberî xebatên leşkerî, artêşbûnê di ferqê de me ku dê dîsa lewaziyên min çêbibin û divê ku ez wan bi hewldaneke mezin derbas bikim. Ji leşkeriyê û artêşbûnê re li ser vî esasî nêzîk dibim.

Ez dikarim aliyê wê yê bîrdozî, perwerdê, rêxistinî di asteke mezin de pêş bixim. Di vê mijarê de di fikir, xwesteka pêkanînê de ti lewaziyeke min nîne. Xwedî daneheveke girîngim, hêza min heye, bi xwestekim. Pirsgirêkên pêkanîn, ên taktîk jî, di wê mijarê de pêdiviya min bi fêrbûn, fêmkirina ezmûnên şerê heft-heşt sale di Kurdistanê de derbas bûye heye. Ez ê wê di demeke kurt de bi xetên sereke bikarim fêr bibim, di vê baweriyê de me ku ez ê bikarim bipejirînim. Di fêrbûnê de bi xwestekim, lê ez ê bi zanebûna qutbûn û lewazbûna heyî ve nêzîk bibim û di vê baweriyê de me ku bikarim vê derbas bikim. Di derbarê leşkeriyê de jî nêzîkatiya min wisa ye.

Bi asanî dikarim vê bêjim; ez û hevalên xwedî heman helwestin, helwesta sereke ya pêşketinên piratîkî di wateya polîtîk, rêxistinî û leşkerî de lewaz dikine. Di vê mijarê de berpirsyariya me heye, hem jî bi şêwazekî cidî. Niha pêşketinên girîng hene. Tevî wan helwestên me yên ku vekirî li dijî

dernakeve, lê di pratîkê de bi pêknanînê asteng dike jî, pêşketinên pir mezin ên ku partiyê dest xistine hene. Ev bûn pêşketinên ku cihanê bandor dikin. Ji xwe ya ku heta niha me jî dimeşîne ev pêşketinên ku partiyê pêk anîne. Ev hêzeke mezine. Di vê baweriyê de me ku ez ê bi hêza ku ji vê bigrim, ez ê nebesiya mezin veguherînim têrkeriyê.

Niha bi min re li beramberî ev hewlesta astengker, lewaz hêrsek heye. Yanî rewşeke vê helwestê qebûl bike nîne. Di demên borî de dema ku xeletiyên wisa derdiketin holê, min nedikarî ez wan bi asanî bipejirînim, lê di çarçoveya pîvanên partiyê de jî, min bersivek nedît. Li gorî xwe li beramberî van hêrsa min hebû, rexneyên min hebûn. Min lewaziya wan jî di nav nêzîkatiyên rexnegir ên partiyê de pir baş dîtin. Rexnekirin, pêvajo nirxandin, di nirxandina pêvajoyan de ji destgirtina bûyeran zêdetir, esas girtina nêzîkatiyên partiyê kes hem di fikir de, hem jî di pratîkê de wê pêşbixe.

Di vê wateyê de jî deynê me heye. Yanî di encama pêk neanin me ya peywirê de rêxistin hêjî pirgirêkên cidî dijî. Di vê rewşê de hîn jî di pratîkê de, gotina di şoreşê de ez jî heme û bi îdame; pêkanîna erkên ku nehatine pêkanîn di zanebûna çareserkirina van pirsgirêka de me. Dizanim ku ev berpirsyariyeke mezintir, zanîna peywirê, hewldaneke zêdetir dixwaze, dîsa di vê zanabûnê de me ku yên nehatine kirin, kirina wan li ser me ferz dike. Ji pêvajoya niha û şûnve li ser vê bingehê nêzîk dibim.

Hêzeke pir mezin a ku partiyê afirandiye heye. Ev, xwesteka min zêdetir bihêz dike. Emzûnên mezin ên partiyê hene. Weke fikir jî hatine vekirin, pêvajo ji hemû aliyan ve hatine vekirin bi şêwazekî wisa bihêz girtin ji danehevên gêrîla, danehevên xwe ya fikrî, bi danehevên ezmûnan ji xebatê rêxistinê re, bi şêwazê ku alîkarî ji hemû xebatên partiyê re pêşkêş bike divê baweriyê de me ez ê bikaribim veguhezînim pratîkê.

Di tevlîbûna xebatan de bixwestekim, bi taybet di pêvajoya girtîgehê de min ev bêtir bi hevalan re nîqaş kir û derxist zanebûnê. Dikarim bêjim ku nêzîkatiyên berê lewaz jî me veguherand bihêzbûnê. Herî kêm ji aliyê min ve wisa ye. Bêguman bi erkên girîng re rû bi rû me, di zanebûna giraniya erkên ku nehatine pêkanîn û yên ku divê bên pêkanîn de me. Di

vê mijarê de hinekî hestyariyên dûrmayînê hene, ez wê jî li ber çav digrim. Ger pirsgirêkên nêzîkatiyê hebin jî, dê di vê çarçovê de derkevin. Yanî dibe ku di çarçoveya giraniya erk û berpirsyariyan de be.

Ji niha û şûn ve di hemû qadên xebatan de dikarim bi bandor tevlî bibim. Bi pêkanîna tevlîbûneke di aste pêş de, hem ya ku çareserkere, hem jî di pêşxistina pratîka serkeftineke tam pêk tîne de bi xwestekim. Bêguman ev xwestek di pratîkê de dîtinê pêwîst dike, hewldana pratîkî dixwaze, ezmûnên pratîkî dixwaze. Di vê mijarê de jî heta pratîk neyê raberkirin naxwazim pêşrabêj bim. Lê di asta ku Partî dixwaze de jî erk girtin, ji ketina pratîkê jî fikreke min a dûr sekinandinê nîne.

Ji dema borî ve di asteke mezin de pirsgirêkên me çêbûn û vana hemû li ser hev kom bûn. Pirsgirêkên me yên di xebatên siyasî de ji salên 1977-78'an, bi taybet ji 1982'an û vir ve pir zêde kom bûn. Vana yên ku ji partiyê re pirsgirêk afirandin, di nava partiyê de cîh da nêzîkatiyên cuda, bi taybetî jî nêzîkatî û helwestên zirar dan yekîtiya partiyê, weke tê xwestin pêkanîna xeta partiyê, hevgirtinê derxist holê. Me vana derxistin û di pêşketina van de berpirsyariya min zêde ye. Divê ku ev pirsgirêkên di berpirsyariya pêş û asta peywirê de derketine bên derbas kirin. Ez ji bo derbaskirina van dizanim ku divê hewl bidim û ji peywirê re di vê astê de nêzîkatî raber bikim. Di vê baweriyê de me ku ez ê di asteke mezin de ser bixim.

Me berê jî ji partiyê erk xwest û pir soz jî dan. Lê piştre em bûn sedem ku gelek pirsgirêk derkevin holê. Di encam de xeta partiyê nehat pêkanîn û nirxên partiyê zirarên cidî dîtin. Ya rast hinek nêzîkatiyên min, ezmûnên min, ezmûnên ku min ji dema borî derxistine, herî zêde jî pêşketinên ku partiyê pêk anîne dikarim nîşan bidim. Di vê mijarê de pêşketina ku partiyê derxistiye holê, çêkera rêxistinî ya jor ku afirandiye, êdî li gorî çêkera dema borî ku zirarê bide partiyê bê derfet kiriye. Di vê mijarê de li ser esasê xwe sipartina ezmûnên xwe, bi derxistina encaman, teqez dikarim diyar bikim ku ez ê weke berê careke din nekevin rewşên ku zirarê didin vê vekîrî dikarim bêjim.

Ez baş dizanim vana çavkaniya xwe ji ku digirtin, di encama şêwazê xebateke çawa de derdikevin holê. Ji ber ku pir xalan ji pir aliyan ve difikirim, bi xwe re nîqaş dikim, fêm dikim.

Ez ê careke din fersend nedim ku di xebatên pratîkî de derkeve holê. Bêguman nabêjim dê qet dernekevin, lê pir zelal dikarim vê bêjim ku; ez ê weke berê kêmasiyên mezin jî nekim. Di nava xebatên pratîkî de ger xeletî derkevin holê jî, wê ev nebin xeletiyên mezin. Partî jî wê derfet ji tiştekî wisa re nade.

Ji xebatên pratîkî re nêzîkatiya min a ji niha şûnve, wê ji ya dema borî cudatir be û teqez ez ê careke din nekevin nav rewşên berê. Bi kurtî yên ku ez ê diyar bikim ev in. Di vê çarçoveyê de dixwazim ber bi demeke nû ve bimeşim. Li beramberî Partiyê, li beramerî erkdariya partiyê ya nû helwesta min, rewşa min eve. Li ser vî esasî peywir dixwazim.

---.: Belê, di derbarê rexnedayîn û peyir xwestina hevalê Ab. de çend haval dikarin baxivin. Bi taybet nerînên hevalên ku ji nêz ve dinasin girînge.  Fu. tu çi dibêjî?

Fu.: Di pêvajoya girtîgehê de, pratîka piştî wê û li vir min ji nêzîk ve heval nirxand, bi pratîka wî ya berê re rû bi rû yî hev kir; gelek cuda bûn hene. Lê tevî wê jî, ya ku hîn jî ez di tevgerînên wî de dibînim kêmasiyên ku weke xeteriyên cidî dibînim hene:

Ya yekem, beriya her tiştî helwesta wî ya xwe navendî kirin, tenê hiştin. Ev helwesta wî ji aliyê gelek hevalan ve hat ferqkirin. Di bingeh de dikare hinek hevalên din bikşîne. Bêguman hewl dide ji nîqaş û biryaran re bike şirîk. Lê ev xwe tenê hiştin hinekî jî rewşeke di çêkera wî ya zirav de helwestekî tê çavdêrîkirine û hevalan ji xwe dûr dixe. Weke xeteriyeke cidî dibe ku di pratîkê de wî bixe tengaviyê Serokê min.

Ya duwemîn, heval pir zêde pirsgirêkan nîqaş dike. Di cihê ku zêde pêwîstî bi nîqaşê nîne, xalên ku bi asanî biryar dikarin tê de bên girtin hewldana wî ya kûrkirina nîqaşan, ji aliyê mercên şer ku em tê de dijî xeteriyeke cidî dafirîne. Bêguman ji aliyê perwerdeyan ve tiştekî nabêjim, lê di biryar girtin, ji aliyê pêkanînê ve dema ku em bigrin dest, hinek caran divê ku saniye jî bên hesabkirin. Di gel van kêmasiyên cidî yên heval de, dema ku em li gorî berê digirin dest bi rastî jî pêşketin û guhertineke cidî heye. Dema ku hinekî din mirov dadikeve kûrahiyê, dikare qala bandorê di van mijaran de bike. Li gorî min divê ku heval di van herdu xalan de pir baldar be.

---.: Bi aliyên din ve tu guncaw dibînî?

Fu.: Raste Serokê min.

---.: Xwe parastina wî raste? Daxwaza wî ya peywirê jî di cîh de ye?

Fu.: Daxwaza wî ya peywirê di cîh de ye Serokê min. Ez bawerim heval ji piraniya me zêdetir amadeye biçe welat. Wî bi xwe jî rexnedayîna xwe da. Piştî rexneyên ku partiyê pêşxistin, bi rastî jî veguhertineke bihêz pêk bîne, wê bikari peywirên mezin, ezmûnên mezin bi asanî ser bixe…

---.: Wekî din kî ji kevn ve nasdike? Fu. bi qasî ku ditiye di derbarê wî de nirxandin kir

Ce.: Serokê min, ji bo daxwaza peywirê ya heval tiştekî ku ez bêjin nîne, di cîh de ye, ez jî tevlî dibim. Bi rastî jî dema borî erkên ku pêk ne anîbû dema pêkanînêye û bawerim ku wê bikaribe vê bike. Di mijara daxwaza peywirê de jî dikarim vê bêjim. Lê hîn jî hinek nebesiyên ku bi heval re tên dîtin hene, bi rastî jî ger ev neyên derbaskirin dubare wê di pratîkê de rê li ber zirarên girîng veke.

---.: Çine ev?

Ce.: Xwe tenê hiştina ku hevalê Fu. jî gotî xwe dide der. Bi taybetî bi derdoreke teng re, yan jî xwe bi rêveberiya ku pê re dixebite sînordar dihêle. Bi wan re pirsgirêk çareserkirin û derbaskirina vê xwe negihnadina çêkerê heye. Ji aliyekî ve eşkereye raste, lê dema ku vê rewşeke bê dem girt, bi taybet weke ku di rewşa pratîkên me yên borî de jî hat ditin, diyardeye dê rêveberiyek bi şêwazên cur be cur bê xapandin, bikeve nava xapandinan û biryarên şaş ên cur be cur bide heye.

Tenê bi derdorekê re sînordar mayîn xetere û tê wateya xwe hepiskirina kes bi xwe. Ya rastî di bingeh de ketina nav çêkerê, bi çêkerê re nîqaşên cuda xistina rojevê objektîfbûna biryarê ku wê bigre pêk bîne.

Xaleke din jî, bêguman di vê pêvajoyê de di binê rexneyên zêde yên partiyê pêşxistin de rewşeke xwe çewsandî dibîne heye. Ya rast ev rexne kesayetiyê pir bihêz dikin, divê ku bihêz bikin. Hema bêje heval ji van ditirse. Ya din divê ku vê bigre dîqatê, ji aliyê roja me ve ji hemû aliyan ve çêker perwerdekirin û ji aliyê ku her tim kes perwerda xwe pêk bîne rojane di derbarê xebatên ku di nav de cih digre rexnegir nêzîk

bibe û divê ku kes jî ji anîna ziman a rexneyan netirse. Ev xisûs bi heval re pir kêm tê dîtin.

Di perwerdê de be, di nîqaşan de be, di anîna ziman a mijaran de uslûbê teorîk bi kar tîne. Di şênberkirinê de lewaz dimîne. Bi taybet weke rêveberekî di asta jor de cih digre dema ku bûyeran vedibêje, şênber dike, ji xwe dayîna hinek mînakan dikare hîn zêdetir çêkerê ber bi pirsan ve bikşîne. Her weha em dikarin bi asanî vê di uslûb û rêbazê Rêbertiya partiyê de bibînin. Rêbertiya partiyê dema ku di gelek mijaran de dahûrînan pêşdixe, di serî de ji xwe dide despêkirin û her ku diçe vê kûr dike. Weke kadroyekî di rewşa şopdariya Rêbertiyê de jî, divê ku vî şêwazî weke rêbaz ji xwe re hilbijêre. Heval jî di van xisûsan de pir zêde kême, aliyê wî yê teorîk giran dimîne, hinek caran teorî hemû pirsgirêkan çareser nake dibe sedema ji pirsgirêkan dûrketinê.

---.: Di dema dawî de bi çavê şervanekî çawa dikare bê nirxandin? Yên ku şerê germ ên di welat de jiyan kirine, gelo dikarin di derbarê wî de çend tiştan bêjin?

E.: Serokê min, heval rexnedayîna xwe da. Ya ku ez diyar bikim; dema ku bi ser pirsgirêkên dema pêşiya me de biçe, divê ku diyardeya ji xwe baweriyê hinekî din li pêş be. Di vê wateyê de ya ku ez dibînim hinekî nêzîkatiyeke wî ya dudilî heye. Dibe ku ev çavkaniya xwe ji bi îhtiyat tevgerînê jî bigre, lê ya zêde jî zirarê dide. Ev jî di gel çêkera me de, di şêwazê xebatê de derdikeve holê. Di şêwazê xebatê ya ku ez dibînim, di dema borî de di mijara ku hinekî şematîk dimîne de rexne jê re hebûne.

Dema ku em di vê mijarê de nêzîkatî raber dikin, ya ku di demê dawî de derdikeve holê; dikarim bêjim ku ev hatiye derbaskirin, lê xwe gihandina pêşerojê jî di roja me de derbas dibe, di rast nirxandina rojê de derbas dibe, dikarim bêjin di nirxandina vê de nêzîkatiyên nebes hene. Bi qasî ku min ferq kiriye; dema ku amadekariyê dike nêzîkatiyeke; “ez ê biçim welat, li wir despê bikim, bixebitim”heye. Lê tenê rojeke xwe ya vir jî bi ser pirsgirêkên xebata artêşê de çûyîn kirina gavek ber bi pêş ve avêtinê yan jî û ji hemû aliyan ve xwe di tevlîkirina vê de nebesî heye. Nemaze şema hinekî hatine tengkirin, di serî de hatine bicîhkirin û ji demeke dirêj re hatine hiştin. Divê ku ev şêwaz bê derbaskirin. Nêzîkatiyên nebes ji rojê re hene, ji pêşerojê re hiştin heye.

Ya din jî, pirsgirêkên hevalan anîn ziman tên zanîn, lê di çareserkirinê de bûyera bi tena serê xwe tevgerîn heye. Di heman demê de pirsgirêkên ku tên ziman, tevî ku pêwîst bibe artêş, lewaziya li ser wan serwerbûna heval heye. Ev di cihekî de nêzîkatiya lîberal bi xwe re tîne. Bûyera venêrîneke tam nîne. Bi vî alî ve dibe ku encamên xeter yên ku hatin ziman derkevin holê.

---.: Bi çavê şervanên jin çawa dikare bê nirxandin? Hevaleke jin jî dikare mafê axaftinê bigre.

Yı.: Serokê min, weke ku tevlî nerînên hevalan anîn ziman dibim, rewşeke heval a di bûyîna otoriteyê de lewaz dimîne mijara gotinê ye. Yanî wesfên Rêbertî bi van aliyan ve ji xwe re nekirina mal heye. Hevalan jî diyar kir, tenê bi teoriyê nêzîk dibe, sekneke wî ya bi heybet nîne.

---.: Wekî din?

Yı.: Serokê min, ya din jî fedyoke. Ji xwe di rexnedayîna xwe de diyar kir, Rêbertiya partiyê jî got; hîn jî wisa difikire ku heval di derbarê wî de xwedî darêzekê ne, bi vî alî ve fedyoke Serokê min.

---.: Hûn dikarin nerînên xwe vekirî binin ziman, lê li gorî ku wê xebatê bandor bike, ji aliyê erênî û neyênî nerîn anîna ziman dê sûdmend be.

S.: Serokê min, ya rast di derbarê gelek mijaran de ew pirsgirêka teorîk ku hevalan anî ziman dibe ku di hinekî di mijara nêzîkatî ji pirsgirêka jin re jî derbasdar be. Bi heval re ev du dewrene em li vir bi hev re ne. Di derbarê gelek mijaran de nîqaşên wî bi me re jî çêbûn. Di mijara perspektîfên girîng dayîn de alîkariya wî çêbû. Lê ji pirsgirêkan re çareseriya pratîkî yan jî çareserî pratîzekirin dikare qala hinek nebesiyan bê kirin.

Di biryarên ku qala wan hat kirin aliyê hevbeşkirin, hewldan bi taybetî jî di vê dewrê de li gorî min hinekî pêşket. Hewlda vê pêşbixe. Di xebatan de ev hewldana wî bi şêwazekî ber bi çav hat dîtin. Lê di wateya xwe gihandina encamên tê xwestin, hîn jî qala hinek nebesiyan kirin gengaze. Ji ber ku di mijara xwe tenê hiştin, di derbaskirina nebesiyên xwe de hem dema ku xwe lêpirsîn dike, hem jî dema ku pêdiviya hinek guhertinan di xwe de dibîne, hewldana wî ya ku vê bi derdorê re pêkanînê jî çêbû. Yanî di vê wateyê de guhertinên bi xwe re, ya rast di mijara bi derdorê re kirinê de jî dikare bê gotin şêwazek

girt. Ji qala berdewamkirina nebesiyên di vî warî de heyî kirinê zêdetir, ji vî alî ve bi taybet di vê dewrê de hewldanek raber kir. Lê di encamên van hewldanan de di derbarê encamên ku derketin holê de, mirov dikare bêje ne xwînsare.

Xwînsariya ku diviya bû di bidestxistina encama tê xwestin girtinê de di gelek xalan de me jî asteng kir. Lê ji aliyê kesayetiya fermandarî ve, xwînsariyek di hemû xalên bêçareseriyê de jî divê ku bêraberkirin û ev jî weke nêzîkatiyekê pêwîste. Di vê wateyê de jî dikarim bêjim nebesî hat jiyankirin.

---.: Wekî din?

İ.: Serokê min, nêzîkatiyên ku bi heval re tên dîtin bi taybetî di şêwazê giştî kirinê de ye. Bûyerên bi vî şêweyî zêde şênber nake, razber dimîne. Dema ku gelek bûyeran dinirxîne bi rastiyên giştî tevgerîn mijara gotinê ye. Me ev di nava demê de ferq kir. Qûralên heyî, rastî anîna ziman, lê di çawa destgirtina şênberiya van de weke tê xwestin nebûna hêza perpektîfê mijara gotinê ye. Di vî alî de pirsgirêka xwe heye.

Ya din jî pêşnexistina şer, hinekî jî leşkertî di xwe de nedayîna rûnişkandin heye. Nebesiyeke din a ku min bi heval re dît jî, di qada fermandariya leşkerî de pêwistiya meşandina erkên leşkerî bi qasî tê xwestin di kesayetiya xwe de neteyisandin mijara gotinê ye. Ev kêmasî xwe di vê xalê de nîşan dide. Ya ku fermanberek divê ku di şer de bike weke hevalekî şer dimeşîne, tenê xwe li gorî cihekî eyarkirin, bi dîtina hemû rastiyan wî tîne asta navenda hemû eleqeyan.

---.: Belê wekî din?

P.: Serokê min, ez bi heval re di dewreyekê de di nava heman xebatê de bûm. Heval di nava xebatên pratîkî de bêtirî xwe di derbarê rexnekirina xebatê de lewaziyek heye. Heval bi xwe jî anî ziman. Ev hinekî çavkaniya xwe ji nêzîkatiya wî ya lîberal digre ku, ev jî xebatê di nava seha pratîkî de zêde nerm dike. Di encam de, dema ku nagihije encamê tê xwestin, mudaxeleya heval pêk tê. Ev jî bi giştî şêwazê tewanbarkirin ango şikayet kirinê derdikeve holê. Di dema xebatê de xebateke mudaxele nayê kirin nagihêje encam, di encam de dema ku sernakeve ji neçarî vê dike. Nermkirina heval a xebatê, nêzîkatiya di nava xebatê de lîberal mayînê ber bi encamekî diyar ve nebirin, rewşa xwe negihandina encamê dafirîne.

---.: Wekî din?

Ş.:Ya ku min bi heval re dît; weke li ser bi qasî tê xwestin rexne nake pêvek, ya din jî weke tê xwestin neşopandina rexneyan dibînim. Mijareke din jî, nebesiya moral û coşa ku divê di femandarekî de hebe dibînim. Bi taybet dema ku heval di nava xebateke giran de be, di vê wateyê de weke ku lewaziyên cidî tên dîtin, di jiyana asayî de jî ev nebesî tê dîtin. Moral dayîna derdora xwe, derdora xwe herikandin û ew nebesiya di wê coşê de bi heval re tê dîtin.

---.: Wekî din

C.: Serokê min, di derbarê nêzîkatî ji rexneyan re hevalan hinek tişt gotin. Dema ku heval rexna dike ne zelale, dîsa ji fêmkirina aliyê beramber zêdetir, hinekî jî dibin rexneyên ku ji aliyê teknîkî ve tên pêk anîn. Dema ku ez vê bi şêwazê Rêbertî re qeyas dikim, dûrbûneke zêde dibînim. Bêy ku tu rewşa kesan li ber çav bigirî yan jî rewşa wan a xweser bêyî ku li ber çav bê girtin nêzîkatiyên wî ji kesan re hene.

---.: Belê wekî din?

Re.: Serokê min, ya ku ez diyar bikim dibe ku hinekî giştî be. Niha rewşa heval a bûyer û arasteyên giştî şênber dîtinê heye. Ev dikara di wateyeke klasîk de dîtin bê nirxandin. Di vir de bi têgeha demê bi hev re negirtina dest rewşeke wisa tê raberkirin. Nemaze demê baş bi kar nayne û çavkaniya sereke ya pirsgirêkan jî ji vir derdikeve. Di nava tevgerê de destnîşankirina tevgerînê nîne. Dikarim vê bêjim.

---.: Ji aliyên cuda ve we lêpirsîn kir, lê hevalê me yê Ab. di nava rastiya partiya me de di qonaxên pir girîng de bicîh kirin zehmete. Bi aliyên xwe yên erênî û neyênî ve hem ne zelale, em jî rewşeke aloz îfade dikin. Ji xwe û derdora xwe, heta ji ber yên dem jê dixwaze ji wan re bersiv nade, divê ku çiqas xwe berpirsyar bibîne? Dîsa ji ber ku di derdorê de nabe hêzeke rêveber a kolektîf bi bandor û yek jî ji vî alî ve hatina lêpirsînkirin yan jî bi qasî tê xwestin ser de çûna me, hema bêje bû sedem ku xwe di nava van pêvajoyan de winda bike.

Pir zêde ezezbûn û gelemperbûna wî heye ku, ev du aliyên bi nakokin. Aliyê wî yê gelemperî, çiqas şematîzmê rexne bike jî, bûyera tenê bûnê jî ewqas rexne dike. Tenêbûn, lê di heman demê de tevî ku otorite pir pêwîste jî, rewşa ne rû bi rû

hevnekirina wî ya otoritê heye. Di nava hewldaneke girîng a bandorker de nehat dîtin. Tevî ku di vê rewşê de bû, ger bi hêza rêxistinê û kolektîfîzmê meşandiba wê bi ser xistiba. Rabernekirina vê, xalên ku hatine rexnekirine.

Dîsa tevî ku diviya di asteke ewqas bi îda de be, di raberkirina helwestekî têrker a pêvajoya nebesiyên xebatê de bilez ferqkirin û derbasnekirin, di encama pêşketinê de xwe gihandina hinek nirxandinan dide diyarkirin ku dema xwe baş bi kar ne aniye. Di rastiya Rêbertî de milîtanê ku em dixwazin tehlîl bikin divê çawa be, çawa dibe navend, Rêbertî çawa tê înşakirin ji pirsên bi vî rengî re, dibe ku cara yekê di xwe de ewqas berfireh wate didiyê û heta pir jî bihêz bû. Pêşketina daxwazên xwe jî datîne holê. Lê rojane jî kesek ji niha ve tevî ku gengaze dikare gavên awarte raber bike, ji siberojê re hiştina wî tê jiyîn. Ev jî noqsaniyeke. Bi despêkirina serkeftinê derbasî rojê bûyîn şêwaz û helwestê rasteqîn ê PKK'ê ye, ev hewaleyî rojên nediyar kirin zêde rasteqîn nayê dîtin.

Tevî van tevan jî biryara hevbeş bi şêwazê, " daxwaza wî ya erkê di cîh de ye" Di asteke girîng de saziya rêbertiyê jî eleqedar dike. Bi qasî di dema borî de, saziya ku ji nêz ve berpirsyar dike ye jî. Hevalê me dibe ku di gelek aliyan de bibe alîkar, lê wê pirsgirêkan jî derxine holê, bi taybet nêzîkatiyên li gorî qonaxa ku Partî gihîştiyê û ya herî girîng jî, ji xebatên artêşê re bersiv avakirin, ger nebesiyên niha heyî hêjî bidomîne, her weha wê aliyên zirar dayînê jî dibe giran bibe. Her çiqas bêgotin ku dê rêxistin ji vê re destûr nede jî, ya girîng ne eve yan jî ne tevdîrên rêgirtinê ne; xisûsa ku divê ev nebe ji zû ve fêmkirina vê ye.

Eşkereye ku em ê hîn jî li ser rawestin. Weke ku ji şêwazê mezinkirina wî jî hat fêmkirin, ya rast zêde ne girêdayî pergalê be jî, taybetmendiyên wî yên îsyanger ne di asta şayanî kesekî pêşeng de ne. Weke ku ji aliyê gel ve di helwest girtina wî de ti pirsgirêk nînin, di mijara gelerîbûn çawa pêk tê de di têkoşîn û pêşwazîkirina pêdiviyan de ne balkêşe û ne li ber çave. Di tevlîbûna wî de aliyên lîberal pir li pêşe û di vê wateyê de lîbaralîzma burjuvaziya biçûk tîne bîra mirov. Li gorî pîvanên asayî ger dilê wî bixwaze kesayetiyek dike. A rastî, di rastiya

Tirkiyê de û di rastiya Kurdistanê de zimanê şoreşê aliyê vînê pir li pêşe.

Dibe ku lîberalîzm li welatên din, mînak di mercên Ewrûpa de pir baş be, lê di mercên vî welatî de zêdetir ber bi rastgiriyê ve biçe. Bi rast ve çûyîn niyeta xwe ya baş çi dibe bila bibe, bi vî rengî bi nebesiyên pir cidî ber bi zirar dayînê ve dibe. Ji nêvengeke bêbandor hatina wî, dîsa kesayetiya xwe li gorî bingêhên bi hêza leşkerî amadenekirin û taybetmendiyên wî yên lîberal rê li ber xwe girtina wî ya nêzîkatiya leşkerî heta dawî amator, li gorî xwe, bîrdozî nêzîkbûn daxwaza girtina wî vedike. Dema ku nebû bi şêwazekî şematîk, ya rast weke berdewamiya helwesta bîrdozî tewr nîşan dide. Dema ku çareseriya rast xwe ferz dike, ya rast vedişirê. Dixwaze bi hinekî din bide kirin, lê di wir de bi hêza rêveberiyekî ser de naçe. Dema ku ew jî dixwaze ser de biçe, anûra takekesî dike mesele û dimeşe, tenê ji bo anûra xwe ya takekesî û prestîja xwe rizgar bike dike.

Ev ji hemû aliyan ve kirina malê rêxistinê xisûseke zêde ne di ferqê de ye û şîlobûneke wisa dijî. Bi taybetî jî di dema borî de ya ku di pratîka 1983’an de hat jiyankirin ev bû. Derbasbûneke leşkerî saxlem nekir, temsîlkirin dibe, rêveberî dibe, bawerim çanda wî jî têra vê nekir, ezmûna leşkerî jî têrê nekir. Heta li gorî min ji heq derneket. Di xwe gihandina serkeftinê, ya serfiraziyê de di asta teorîk de çiqas bi îda be jî, zêde vîna xwe tûj nekir û di ser guhê xwe re avêt. Ji xwe şîlobûn jî li ser vî bingehî pêşket û xwest vê bi bîrdoziyê bigre, lê nebû. Bi şemayan, dîsa bi hinek ferzkirinan xwest bi xistina dewrê ya hinek kesan ve bike, nebû. Ji ber ku amade nekiribû, ne bawer bû, şîlo bû, nemaze jî ew pêvajo bi xeretiyên pir cîdî re rû bi rû hat.

Dikare bê gotin ku di xisûseke giştî de; bi taybet di rêxistina kolektîf, xebatên leşkerî de uslûbê wî nebese, nikare kolektîvîzma rêxistinê bide jiyankirin. Vaye tişta ku hûn jê re dibêjin tenêbûn yan jî dema ku dixwaze kolektîf bibe gelemperbûna wî jî eve. Herdu jî ne kolektîfbûneke şênber, di rêya yekîtiyê de rêgirtin nînin. Şerte ku herdu şêwazan derbas bike, bandorgeriya kes û însiyatîfa xwe bi awayekî berfireh bi çêkera kadro re parve bike. Teqez divê aliyên xeter ên raye tenê kirinê bibîne û bi taybet nêzîkatiyên şîlo dike, niyet çi dibe bila bibe divê devjê berde.

Raye encax bi kolektîvîzmeke bilind dikare jiyanî bibe, bi xebateke bandorker a kadro û bi rêvebirina wan a rojane dikare gengaz be û ev jî bi tengavkirina sînorên têrkeriyê wê rê li serkeftinê vekin, ev rastî tenê kêliyekê jî divê ku neyê paşçavxistin. Bi gelemperiyan dê şênberî neyê rêvebirin, weke nimayişeke vînî bi qasî morelekî bilind, encax bi dijwariya vînê dikare bê destxistin. Derbaskirina asta gotin, demagojiyê, hinek rastî di cihê xwe de gotin, di asteke girîng de şênber bûn, divê ku di asta têrker de bi kolektîvîzmê dest bi rojê bê kirin. Rêbertî vê pir vekirî raber dike. Divê ku xwe bighîne vê. Divê ku baş bizane bi stîlên kevn dê qet nikaribe ji nan rewşan derkeve.

Bêguman, pêwîste uslûb rêxistinî, fermî û bi taybet jî pêşketina leşkerî bide diyarkirin. Hêza gotinê hinek guhê mirov dixirmişîne. Em ji tonê deng bigrin heta li pê hev rêzkirina peyvan, aliyên ku nayên pîvanên leşkerî hene. Ev ji bo we hemûyan girînge û bawerim di ezmûn derbaskirinê de pêwîste vê xalê jî serkftî fêm bike. Asta niha ne asta xîtaba leşkerî ye. Kêmasiya herî girîng dibînim eve. Şêwazê xitaba leşkerî ne yê ku dêşîne, ne guh di xirpişîne, ne ber bi çewtiya lîberal ve dibe; divê xwe bigihîne uslûbê bi qasî ku naveroke xwe ya têrker heye ya ku ji guhan re xweş tê, ber bi moral ve teşwîq dike. Di vê mijarê de înadeke wî heye. Di kevneşopa leşkerî de ev nîne û ger israr bike, tenê bi vê asta xwe di zirardayîna artêşê de, ji ya tê payîn zêdetir rê vebike.

Leşkertî di wateyekê de uslûbe. Uslûba têrker ji bo we hemûyan heta dawî jiyanî ye. Tevî ku erkeke min a leşkerî şênber nîne jî, ez çiqas di meseleyên uslûb de dîqat dikim divê ku hûn binirxînin. Zimanê vê demê zimanê leşkeriye. Divê ku li hemû ziraviyên wê bê dîqatkirin. Di serî de heval û bi awayekî giştî hûn hemû, pêwîste di waneya uslûbê leşkerî re serkeftî derbas bibin.

Bi taybet yê ku tengav nake û guh naxirpişîne, bi naverok, moral bilind dike, di girtina vî astê de hûn ê hemû baldar bin. Ev teqeze, heta ku hûn nebesiyên xwe yên belave derbas nekin, hûn ê nikarin derbasbûneke serkeftî ya leşkerî bikin. Ji ber ku artêş tevgere. Artêş fermane, artêş xwe xwepêşandane. Girêdaniya vê jî ji nêz ve bi uslûb re heye û ne şerme jî. Ez jî ji razan-rabûnê bigrin heta di cih de pêşandana fîzîk ji nîşandana

hemûyan re heme. Bi taybetî jî fizîka belabûye, ruhê belabûye, vîna belabûye, di vê wateyê de teşegirtina me ferman dike.

Ev xisûs dikarin zêdetir jî bên vekirin, lê cewher tê fêmkirin. Di dema borî de aliyên ku min jî bi kûrî û pir zêde rexne kirine. Me niha jî bi kurtî anîn ziman, ew bi xwe jî dibîne ku êdî dê mîna berê nikaribe partiyê bixapîne. Heta di şexsê hevalê me de, hema bêje me hemûyan gelek wane girtin. Tehlîlkirina hevalekî, di asteke girîng de di tehlîlkirina me hemûyan û tê wateya alîkarî ji çareseriyê re kirine. Ger bi şêwazê zirav em derbas bikin, dîsa taybetmendiyên neyênî yên tên zanîn jî zirav bike û xwe bidomîne, wê bi destê xwe taybetmendiyên xwe yên herî erênî jî vala derxe. Em hêvîdarin ku nekeve nava bê şansiyeke wisa.

Êdî rastiya şerê partiyê yê fermander ku ferz dike, şêwazê encamgir divê ku bi xwe bide xwarin. Di vê wateyê de wê bikare xwe veguherîne, cuda bike, wê dev ji gunehê ne li cîh berde. Bêyî ku hewaleyî pêşerojê jî bike, di despêka rojê de mezinbûna vê nîşandanê dê raber bike.

Hemû tiştên ku hatin gotin diqat bike, tenê ne dîqatkirin, weke perspektîfeke fermander binirxîne; dixwazi asta milîtaniyê, dixwazi di asteke pêş de bila berpirsyarî û rêveberiyê be, di erkdarkirinê de em di baweriya ku wê xeteriyên cidî nebin de ne. Tevî di asta kesê herî zêde tê rexnekirin de ye jî, dîsa vê weke sedema bihêzbûnê, ne ji ber fedyokiya wî, berevajî, dê weke alikariya herî cidî ku pê re hatiye kirin bibîne û bi vî awayî weke ku wî jî diyar kir, dê bikeve rêya serkeftinê deynê xwe bide, ev weke şêwazê herî rasteqîn li pêşiya wî radiweste.

Ragirtin ne karê me ye, lê em ê bê aman bibin şopdarên rastiyên xwe ti carî neyê başguh xistin. Ev dîtiye ku, çiqas neyê fêmkirin jî, neyê guhdarkirin jî, di ferzkirina xeta partiyê de Rêbertî di xwe de pêkanîn bihêze û ev her dem wisa ye. Ya girîng ji vê re astengî avanekirin, ber bi rast-çep ve kişandin, şîlo kirin, pergal bê kêmasî, di cihê xwe de dayîna rûnişkandin, bêyî ku hilpeke di dema tevgerînê de jî mîna orkestrayekê, ji kîja têlê lêdide, dengê wê bi awayekî herî baş dayîn, bi vî rengî nebûna dengekî bê akort, ji dengê giştî yê koroyê re ew bi xwe jî bi dengê herî baş tê guhdarkirin tevlîbûna wî esase.

Teqez pêwîste hûn hemû vê li berçav bigrin. Erêkirina me ya leşkerî encax bi vî rengî gengaz be. Ji dervî vê erêkirin yan jî di nava sînorên pejirandinê de tevgerîn, helwestên we erêkirin negengaze. Ji vê hûn bi xwe berpirsyarin. Ger pêwîst bike wê zagonên me yên navxweyî darizînin, pêwîst bike wê zagonên giştî yên şoreşê darizînin û dijmin jî li nav bibe. Wê berpirsyar ji ew kes be.

Em jî ji bo ku zirarê di asta herî kêm de bijîn, neçarin heta dawî tevdîrên xwe pêşbixin û di roja me de jî hinekî ya pêşdikeve eve. Di vê çarçoveyê de li ser dema pêşiya me, weke ku vî şansî ji we hemûyan re nas dikin, niyeta me heye em ji vî hevalî re jî nas bikin. Bi rastî jî hem yên ku me bi perwerdê dan qezenckirin, hem jî xisûsên ku me çarçoveya wan xêz kirin dê sînorê têrkeriyê çawa bê bidestxistin nîşan didin. Soza ku hat dayîn encax li ser vê bingehê em qebûl bikin. Bawerim li ser vî bingehî jî wê serkeftin bê bidestxistin. Di dawî de tu çi dibêjî Ab?

Ab.: Ji dema borî ve, herî dawî jî li vir, nirxandin û dahûrandinên ku Rêbertiya partiyê kirin û rexneyên hevalan, ji bo min di asta pir zêde rastî desnîşanker de ne û di asta talîmat û fermanê de ye. Min ev vekirî dît; jiyana ku bi zirarnedayînê tê domandin, encamên herî zêde zirar dide derxist holê. Dîsa weke ku jiyana bilewaziyan dixwaze bê domandin derdixe holê, mirov ji bo hinekî din dike bela serî. Ya rast min ji xebatên şoreşgerî gelek wane derxistin. Di dema pêşiya me de teqez ez ê girîngî bidim van.

Li vir û di cihên din de rexneyên ku hevalan kirin ez ê ji bo xwe weke rehber, di mijara guhertinê de weke arastekirina xebatan bigrim dest. Hemû nirxandinên Rêbertiya partiyê yên dema borî, di roja me de û ji niha şûn ve ji bo min talîmat û fermanin. Bawerim ku di arasteya wan de ez ê xwe pêş bixim, ji bo bi jiyanîkirina wan ez ê bi hemû hêza xwe bixebitim, helwest û nêzîkatiyên nebes ên ku di dema borî de derketin, ya din jî ez ê nekevin nav helwestên ber bi şaşitiyê ve dibe, yên ku min lewaz dihêlin, ji bo vê dîsa baldariya ku ji destê min tê û hewldana pêwîst raber bikim.

Di nava pratîkê de hem di pirsgirêka rizgariya gelan de berpirsyariya ku min girtiye ser xwe, hem jî li ser esasê zirarên ku di têkoşîna borî de derketine ez ê deynê ku dikeve ser milê min

bidim, di vê mijarê de teqez weke ku di dema borî de bûyî, xwe paşdekişandin, tengbûn, ketina nava helwestên lawaz, ji aliyê siyasî ve, rêxistinê ji ketina nava lewaziyan re ez ê tenezul nekim. Her ku biçe ez ê di nava xebatan de risteke bi bandor bilîzim, xwe bighînim şêwazê mîlîtenekî û wisa bimeşim. Ez ê van bi meşeke wisa û di derbarê ku teqez ez ê serkeftinê esas bigrim de… soz didim.

---.: Em jî serkeftinê dixwazin.

Hevalê duwem kî heye? Fu. tu ma piştre?

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Tu dema çû te carekê soz da, berfireh bû? Rexneyên wê demê têrker bûn?

Fu.: Serokê min, di hemû dewrê de Rêbertiya partiyê rexneyên berfireh kirin.

---.: Niha pêwîst nake. Bawerim di derbarê qada peywirê de perspektîf û biryardarî hatiye dayîn. Ger di dema pêş de peywirdariyeke din çêbibe, bawerim di lêpirsîna careke din de em ê li ser têrkeriyê rawestin. Bawerim niha pêdivî bi nirxandineke wisa nîne. Ji xwe tu bi temamî tevlî dewrê jî nebû, di dewra borî de di asta sozê de te hinekî destnîşan kir. Di asta rexnekirin û rexnedayînê de bû?

Fu.: Raste Serokê min, Rêbertiya partiyê gelekî rexnekiri bû.

---.: Bese. Dema ku qadeke xebatê ya nû bû mijara gotinê hinekî din berfireh lêpirsînkirina te, gengaze wê ji daxwaza te ya peywirê re bersiv bê dayîn. Hevalên ku dixwazin bi vê rewşa xwe jî bi hevalê Fu. re bibin alîkar hene?

Ger nebe, ji bo bibe alîkar wekî din kî dikare soz bide? Ji rêveberiyê kî mane? Hevalê Ve., te karî xwe tehlîl bikî?

Ve.: Di asteke mezin de min tehlîl kir.

---.: Yanî rewşeke têkoşînê pêwîst bike heye?

Ve.: Serokê min, ji xwe dahûrînên Rêbertiyê…

---.: Em nirxandineke kurt dikin. Ez hevalê me yê Ve. ji hemû aliyan ve nasnakim. Pratîkeke kurt a Mêrdînê heye û ji xwe rapora wî jî heye. Weke amatorekî tevlî partiyê bûye, zêde partîbûn, artêşbûn jiyan nekiriye. Niyet baş maye, xwestiye pêşve biçe. Di mercên Mêrdînê de rewşeke derfeta vê bibîne nîne. Nemaze ev qad pir bi wate bû. Ji bo wê jî me di pêvajoyeke

berfireh a perwerdê re derbas kir. Dikare bê gotin ku, hem partînbûn, hem jî artêşbûn bi hemû bingehê xwe ve li vir ji nêzîk ve dît. Ji bo wî bawerim ji niha û şûn ve ya ku mijara gotinê ye; dê çiqasî bikaribe vê kombûnê bi gavên saxlem, şênber û baldar jiyanî bike.

Di rewşa niha ya heyî de perwerda wî ya teorîk heye, bi dewreke perwerdê ya wisa re, di asta herî jor de perwerdeya partiyê, yên pêwîst hatine dayîn. Di dema borî de di welatê me de di qada ku komen me tê de zêde berhemdar nebûn jiyaye. Ger dîqat bike di xebateke girîng de di asta berpirsyariyê de, heta di astên cuda de dikare tevlîbûnê pêk bîne. Em difikirin ku bi vê rewşa xwe yên ku girtine di jiyanîkirinê de hem divê bi îda be, hem jî wê bikaribe bendewariyan pêşwazî bike. Vekirina xeta ku li vir hat kirin, hem jî di wateya partîbûnê de, hem di wateya artêşbûnê de pir têqûz bû û wî bi xwe jî fêm kir.

Ya li şûnve dimîne bi gavên mezin di pêvajoyên aloz de li ku derê, çawa wê serbixe vê bizanibe. Êdî ev jî hinekî bi însiyatifa kes û behremendiya wî ve girêdayî ye. Heta ku pratîk neyê dîtin, di derbarê wî de çûyana nirxandinê dê zêde rast nebe, divê ku ev şans jî jê re bê dayîn, êdî divê ku bikeve dema dayînê.

Weke min got, em ji hemû aliyan ve ji naskirina wî dûrin. Eşkereye ku wateya hemû kes ji zarokatiyê girtina dest nîne. Ji xwe dahûrînên ku em dikin rista neynikê ji me re dilîze. Ya girîng di vê neynikê de xwe muqayesekirin, çi tişta ku divê bê derbaskirin hebe divê bi derbaskirin, çi tişta divê ku divê mirov xwe bigihînê xwe gihandine. Êdî ev jî erkeke perwerdê ye. Ger hûn dixwazin bi îdea di xeta Rêbertî de bimeşîn, ev bi vî rengiye. Hûn ê encam derxîn û para xwe jê bigirin. Weke min got ev ne lêpirsînekê, xwe gihandina asta lêkolînerekî baş, encamgirekî baş.

Em ne neçarin di rewşa lêpirsîneke giran re derbas bikin. Ji daxwaza wî ya peywir girtinê re jî di vê rewşê de bersiveke erênî dikare bê dayîn. Bi awayekî giştî tiştên ku di derbarê wî de ez bêjim evin. Hûn dikarin rastiyên xwe çawa lêpirsîn bikin û daxwaza xwe ya peywirê şênber bikin. Keremkin mafê axaftinê yê we ye.

Ve.: Serokê min, di hemû pêvajoya ku ez li vir man de, ez di dewrên pir berfireh ên perwerdê de derbas bûm. Dahûrandinên

Rêbertî yên berfireh çêbûn. Bi taybet divê salê de min di nava rastiya konferansa sêyemîn de cihê xwe girt. Dîsa vekirina qada pratîkî ya ku em jê hatibûn û di nava vê dema nêzîk de, di dîroka partiyê de, gelek rewşên dervî xeta partiyê ku di qadan de hatibû jiyankirin bi awayekî kûr di dema perwerdeya min de dahûrandina wan, ji bo min heta dawî rêvekir bû. Pêşveçûna kesayetiya xwe ji civaka em ji nav hatine girtiye, dîsa hinek bandorên qada pratîkê ya ku me tê de cih girtiye, hinek lewaziyên ku me ji wir girtine li vir di asteke mezin de min ev li vir derxistin zanebûnê. Min ev di dewrên borî yên perwerdê de ku li vir hatin meşandin pêk anî û dikarim bêjim min xwe pir zêde nêzîkî rewşa zelalbûnê kir.

Ji aliyê xwe ve di asteke girîng de zelal bûm. Dîsa dahûrînên Rêbertiya partiyê di derbarê dema pêşiya me de kirin, perspektîf, talîmatên di derbarê demê de, di asteke mezin de derxistina zanînê çêbûye, ji nêzîk ve hatine şopandin, di vê mijarê de dikarim bêjim gelek zelal bûme. Li ser vê bingehê di dema pêşiya me de di her qadeke ku Partî ji me re bide, yan jî di her peywirekê de, bi şêwazê herî baş ku ez ê nêzîkatî raber bikim, di xeta milîtanî ya ku Partî guncaw dibîne de nêzîkatî raber bikim, di van mijaran de ji xwe bawerim. Potansiyela kombûnên ku min girtiye bi şêwazekî guncaw ku ez ê derbasî jiyanê bikim. Dema ku rewşa pêkanînê bibe mijara gotinê, nebawerim ti pirsgirêk bên jiyîn.

---.: Yên ku heval ji nêz ve nasdikin, nasdikin û dixwazin nerînên xwe bînin ziman hene? Di derbarê asta hevalê me yê Ve. û daxwaza wî ya peywirê de kesî ku bixwaze nerîn diyar bike heye.

Ab.:Destnîşankirinên heval bi xwe çêbûn. Di dema perwerdeya vir de pêşketinên girîng bidest xist. Tiştên ji aliyê pratîkî vê girtin başbûn. Di dawiya dewreya din de rexne û rexnedayîn hatibû kirin, tiştên ku heval diyarkir hebûn. Ji wê demê heta niha me gelekî nîqaş kir, me berê jî rexneyên xwe diyar kiribûn.

Pêdiviya wî zêdetir bi fêmkirina xeta bîrdozî-polîtîk heye. Yanî divê bênavber perwerdeya xwe di vê mijarê de bidomîne. Ji bo ji niha şûn ve ji pratîkê û xebatên rêxistinê re hêza wî têr bike, di vê mijarê de bingehekî wî heye. Lê hinek lewazî hene. Li

beramberî pirsgirêkên pratîkî pêşketineke mezin dibe çênebû, bi çêkera hevalan re eleqederbûn arastekirin ji bo baş organîzekirina hevalan, yekpare nêzîkbûn girînge. Di dewra din de hevalan rexneyeke wisa pêşxistibûn. Di pêvajoya rexne û rexnedayînê de, di xebatên rêxistinê de, di pêwendiyên hevaltiyê de, di organîzekirina hevalan de, ya din jî di rêvebirinê de divê ku xwe bigihîne şêwaz û uslûbê partiyê.

Ji bilî vê ji xwe pêvajoya borî hat nirxandin. Di pratîkê de ezmûneke wî ya zêde nîne. Pêvajoya ji niha û şûn ve ji bo xwe wê taybetmendiyên sereke ku tên xebatên pratîkî û rêxistinî bide, wê demê baştir binirxîne û biwesifîne. Dikare peywirên girîng pêk bîne. Ger hinekî îdeal û bi pîvan nêzîkî pratîkê bibe, di demeke kurt de bilez nebesiyên ezmûnê, her ku diçe dikare berpirsyarî û peywirên mezin bigre ser milê xwe.

---.: Yekî ciwane, zêde ezmûnên xwe nîne, lê baş hatiye perwerdekirin. Ger hişyariyan jî dîqat bike, bi xwe qanûnên şer û wê bizane şerê germ ê rojane tê meşandin fêr bibe, ji niha û şûn ve bêguman bilez dikare ezmûnan qezenc bike, bi kombûna xwe ya teorîk dikare ji gelek peywiran re xwe edapte bike. Bi rastî jî divê ku azweriyeke wî ya wisa hebe. Xwe ji ya zêde kirinê, serkeftin û heta ger pêwîst bike bibe kadroyekî bandorker, mîna berpirsyarê herêmekê tevbigere û ji pêywirên mezin re xwe amade bike.

Xwe bi îhtîras, bi îdea, bi qasî ku bi coşe, pir bi pîvan, xebateke bi ewle, yek ji şagirtên herî bijare yê vê dewra me, heta yê dibistana me ya bijare ye, di pratîka vê dema nû de pêwîste di pratîka xwe de îspat bike û nîşan bide. Bi rastî jî ev îspatkirineke pir bi îdea ya partîbûn û artêşbûnê ye. Ger vê nîşan bide wê xwe jî, çêkerê jî qezenc bike. Yên ku di heman rewşê de ne peywira xwe îspatkirinê li benda hemûyane. Ji ber ku pîvan gelekî hatine mehandin.

Xebateke gelek bi asanî dikare bê serxistin, bi xwe ferzkirinên kesayet ên bê wate vala derdikeve. Û derfetên bi asanî mirov dikare ji heq derê, sererast bike û heta dawî dikarin bên dîtin bi kesayetiyeke wisa hatiye perwerdekirin re ya ku Partî emir dike, dîsa tevî ku şer bi xwe rojane bi asanî rê nîşande, nenirxandina vî şansî, bêguman weke ku ne layîqe, dê pir bi bêşansî ber bi windakirinê ve bibe. Wiha wê fersendê ne de vê.

Berevajî wê bibe kadroyekî bi îda yê demê. Gelek berendamên dibistana me ji vê berpirsyar in. Hevalê me yê Ve. jî di asta herî bi îdea de ye. Her weha wê vî şansî pir baş binirxîne. Weke gotina dawî di asta biryardariyê de tu dikarî soz bidî.

Ve.: Di nava vê pêvajoyê de, bi taybet hevalan, di nêzîkatiyên me yên di pratîka vê derê û pêkanînê de rexneyên wan ên cur be cur pêşketin. Vana rexneyên rast û di cî de ne. Di rênîşaniya van de, dîsa bi taybetî dahûrînên ku Rêbertiya Partiyê di vê demê de danîn holê, li ser esasê van dahûrîn û perspektîfan, herî dawî yên ku niha di platformê de derketin, perspektîfên pêşketin û li ser esasê arasteya talîmatan di dema pêşiya me de ez ê ser pratîkê de biçim, di derbarê ku ez ê bibim milîtanekî şayanî partiya xwe, gelê xwe… soz didim.

---.: Em serkeftinê dixwazin.

Wekî din di rêveberiyê de kî heye? Em di derbarê Ş. De nirxandineke kurt bikin. Hevalê Ş. Ez bawerim te di dema borî de jî dewreyek dîtibû, kîja sal bû

Ş.: Sala1989’an bû.

---.: Wê dewrê çend mehan domand?

Ş.: Nêzîkî neh meha mam.

---.: Tu ji ku derê hatibû, xwendavan bûyî?

Ş.: Ez ji Enqerê yekser hatim vir, xwendavan bûm.

---.: Ji kîja zanîngehê?

Ş.: Zanîngeha Gazî, Fakulteya Tibê.

---.: Tu çend salî yî?

Ş.: 26 Serokê min.

---.: Rewşa te ya sempatîzaniyê çiye?

Ş.: Wê jî salekê dewam kir, lê ez pê re mijûl nebûm.

---.: Şeş sal ji bo pêşketina kadroyekî pêvajoyeke biçûk neyê dîtine. Tu di pêvajoya perwerdeya 1989-90’î de ber bi pêvajoya perwerdê ve hatî. Piştî 1990’î tu yekser çû Amedê?

Ş.: Belê Serokê min, ez pênc mehan di navenda bajêr de xebitim. Piştre derketim bejahiyê.

---.: Berpirsyariyên ku te girtine û berpirsyariya te ya herî dawî çibû?

Ş.: Min di gelek astan de berpirsyarî girtiye Serokê min. Herî dawî min di yekeya Eyaleta Saha Navîn de cîh girt.

---.: Berppirsyariya herêmê?

Ş.: Qada Amed, Bîngolê.

---.: Herêma çenda?

Ş.: Bîngol niha di Eyeleta Navîn de herêma yekeme.

---.: Tu berpirsyarê koordîna herêma yekem bûyî?

Ş.: Raste Serokê min.

---.: Te çiqas rê li ber windahiyan vekir? Windahiyên Solhanê di bin berpirsyariya te de bû?

Ş.: Min rê li ber pir windahiyan vekir, lê di windahiyên Solhanê de berpirsyariya min nebû.

---.: Te rê li ber kîja windahiyan vekir?

Ş.: Piştî çalakiya Bîngolê 13 heval bi hev re şehîd ketin. Windahiyên ku min dan ew bûn.

---.: Wekî din?

Ş.: Windahiyên min ên din nînin, yên din di hêjmareke kêm de ne.

---.: Ya rast nasnekirina hêz, bûyera bê kordînetiyê ye. Yanî ji ber ku em hêz nasnakin windahiyên wisa tên jiyîn. Xwe bi cihkirina şaş çêbû?

Ş.: Na Serokê min xwe bi cîhkirina şaş nebû, ji ber ku em li ser hêzê neserwer bûn.

---.: Te nekarî xwe bidî guhdarkirin?

Ş.: Min nas nedikir, ji ber wê jî min nekarî xwe bidim guhdar kirin.

---.: Di gelî de windakirin, ji ber ku nekarî baş xwe bi cîh bikin winda kirin, ketin dorpêçiyê?

Ş.: Na Serokê min. Tevî ku li tepeyên herî stratejîk bûn, ne li tepe di kêlekê de mane. Hevalekî din ê berpirsyarê yekîneyê li gel wan hebû. Piştî pevçûn despê kir dikarî hêz vekişîne. Lê ji ber ku me hêz nasne dikir, dîsa ji ber ku navê pir hevalan hîn nedizanî, di nava pevçûnê de wê kî bikaribe çi bike nedizanî, dîsa ji ber bê hakîmiyetê, windahiyeke wisa hat jiyîn.

---.: Li Amedê ev rewş pir tên jiyîn, roja berê jî rewşeke wisa hetibû jiyîn û me hevdeh şehîd dane. Îhtîmaleke mezin bûyereke ji heman rewşan çavkaniya xwe digre. Çavkaniya xwe li gorî qanûnên şer tevnegerînê digre. Dikarin bêjin; “dikarin di kêleka vî tepî de bimînin, heta em dikarin rojeke sax bikevin

pevçûnê jî.” Ger tu fermaneke ji rêzê jî bidî, dikarî bêjî, “li vîr pevçûn nayê kirin, pêwîste bilez vekişin, ger pêwîst bike pevçûnê belav bike”dikarî wisa bê gotin. Bawerim van xalan hemûyan paşçav dikin. Pir kêyfî, şêwazekî bi asayî dijmin xwe bigihîne wan şayanî xwe dibînin yan jî pêdiviya derbaskirina vê nabînin. Divê ku tu xwe bigihînî leza ku teqez divê gêrîla pêk bîne, lez tevgerîne, demekê zûtir xwe ji dorpêçiyê derxistine, qet nebe xwe bigihîne derfetê şevekê û bivî rengî di asta herî kêm de bizane derbas bibe. Ya ku li Amedê nehat serxistin ev bû. Bawerim windahiyên ku dane ne kêmin. Heta niha jî rêveberiyeke serwer nebûye û xalên sereke yên rêveberiyê pêk nayîne mijara gotinê ne. Yek ji mînakên vê pratîkê jî tu yî û ev tê fêmkirin. Ez ê van xisûsan zêde venekim. Em ê di nirxandina Amedê, Garzanê û heta qadên din de bi dirêjî li ser bisekinin. Ez li vir bi kurtî bal dikşînim ser.

Rêveberî divê ji despêkê ve çêkera xwe binase. Nenaskirin jî nebesiyeke pir cidiye û tenê ne eve jî nebesiya perwerdê, kemasiyeke pir cidî ye. Yên ku dîroka xwe nizanin nikarin nasbikin, yên ku nasneke nikare araste bike û di vê wateyê de nikare rista fermandarekî rast jî raber bike. Ev ya ku herî zêde hevelê Ab. jî jiyan dike û hema rewşa ku her kes dikeve nave. Ji bo ku mirov bi rastî we nasbike, bi qasî çiyayan min dahûrandin kirin. Bi vê ve jî sînordar nemam, pir zêde perwerde dikim. Vana ne girîngin, lê ji bo naskirina we dibe ku xebata herî berfireh a dîrokî hat kirin, hûn hatin perwerde kirin. Êdî vê bi perspektîfekê we gihandiye behremendiya karkirinê. Encama ku divê tu ji vê derxî eve.

Divê ku rêveberî bi perwerdê nas bike, bi qasî ku naskir rêxistin bike, bi qasî rêxistin kir ber bi çalakiyê ve bikşîne û bi vî rengî xwe bigihîne qada ku dikare hêza xwe tê de raber bike. Ez zêde pêwîstiyê bi vekirina vê nabînim, bawerim bi perwerdê hûn ketin ferqê. Wisa bawer dikim ku, di demeke nêz de yên dişibin, heta di derbaskirina nebesiyên ku di wan qadan de tên jiyîn dikarî rist bilîzî. Em ê pir zêde vê destnîşan bikin, li ser vê bingehê ger pêwîst bike em ê lêpirsîneke hîn kûrtir jî bikin. Ji bo ku bibe mînak em li vir bi kurtî soz didin.

Li ser vî bingehî nebesiyên te hene, tenê ne ji bo xwe, ji aliyê çarenûsa hemû eyaletê divê ku tu vê bibînî. Dîtina te têr

nake, divê ku tu di nava hewldaneke mezin û azweriyê de bî. Nebesiyên xwe ji hemû aliyan ve derxistina holê, derbaskirin, rêya çareseriyê derxistina holê, valatiya rêveberiyê ya eyaletê yan jî valatiya rêveberiyê yên alanên wisa divê ku tu derbas bikî û hestyariyeke wisa li berçav bigrî. Tepe di rewşa xwe îmha kirinê de girtin, bawerim zirara herî mezin ku hûn li beramberî xwe bikin. Hîn jî pir zêde windahî tên dayîn. Bifikirin li wan çiyayan tenê ji ber nebesiya pêwendiyekê, çawa çav ji ewqas windahiyan re tê girtin? Ev, nebûna hêza fermandar, ji bo bûyîna hêza fermanadar perwerde nekirin, çêker baş li ber çavan negirtin û encamê di asta têrker de rojane rabarnekirina rêvberiyeke rastin.

Ev tê çi wateyê we di vê perwerdeya li vir de dît. Me pir balkêş nîşan da. Bawerim we fêm kiriye. Pîvanên saxlem ên partiyê jî hatin nîşandan. Me bi jiyana xwe jî balkêş bi kurtî gotin. Tu ne yekî ecemiyî, ji aliyê pêwendiya bi ezmûna fermandariya kadro ve tu bi şans tê hesab kirin. Te ev ezmûn di demeke kurt de jiyan kiriye. Ya rast te perwerdeyeke kûr jî jiyan kir. Naxapim û her weha tê jî qat bi qat xwe bikî xwediyê alikariyê, hem jî bo ku tu bikarî deynê xwe yê berê bidî û hem jî di nava daxwaza peywireke wisa destkeftên wê girîng de bî. Bi asanî dikare bê gotin ku di vê mijarê de ne xwe, ne jî me bixapîne. Ma gelo ez şaş im?

Ş.: Raste Serokê min. Bi rastî jî nebesiyên ku em di pratîkê de diketin nav, beriya ku bêm vê qadê rewşeke me ya nirxandinê nebû. Ev ji aliyê me ve bû şansekî pir mezin. Nebesiyên ku em diketin nav, di mercên îro de me zêde wate nedidayê. Em çawa ketin van rewşan? Min di vê pêvajoyê de bi baweriya telafî kirina perwerdê berê xwe da perwerdê, ez di vê çavçoveyê de nêzîkî perwerdê bûm. Dema ku çûm qada pratîkê min di vê çarçovê de pratîka xwe ya borî nirxand û ji bo vê xwe amade kir. Di vê wateyê de di rewşa xwe de biryardariya xwe diyar dikim.

---.: Belê yên ku dixwazin di derbarê hevalê Ş. de nerînên xwe bînin ziman, yên ku bixwazin li ser tiştên ku min gotin zêde bike heye?

Y.: Serokê min demeke dirêje heval nas dikim. Lê dema ku li vê qadê bû bi qasî ku min çavdêrî kir, li beramberî paşverûtiya xwe hinekî muhafazakar nêzîkbûn heye. Ya rast di

bin navê bi hêzbûna leşkerî de hinekî jî li beramber nerehetiya, neyêniyan paş-pêş axaftinên wî çêdibin. Ev qaşo durist nêzîkbûna hevale. Lê ji bo wî dikeve nav nêzîkatiyên neyênî. Yanî hinekî pirsgirêkan, neyêniyan bi çavê partiyê binirxîne dê sûdmend be. Rewşa heval a hesab pirsîna takekesî, parastina partiyê, bi armancê parastina partiyê tevgerkirina wî heye.

Ya din jî rewşa heval, li beramberî pirsgirêkan pir zû teng dibe. Ev jî wî ber bi sekterîzmê ve dibe. Di vê baweriyê de me di vê pêvajoya perwerdê de zehmetiyên mezin derbas kirin. Lê hîn jî bandora van tiştên ku min gotin li ser heye. Li ser vî bingehî ber bi pratîkê ve bimeşe wê erênî be.

---.: Wekî din?

Ab.: Bi hevalê Ş. re uslûbê kolanan pir bi giranî derdikeve pêş. Gelekî teysîna xwe li gotin, şêwazê xîtab, şêwaza xebata wî dike. Di berxwedêrî, îsyangerî û gihandina wî ya şêwazê gêrîla de zêde pirsgirêk nîne. Lê di şêwazê artêşê de, li beramberî şêwazê pêdiviya artêşê, xwe negihandina tevgerînên ku ew dixwaze hene. Di wê xalê de rewşa mehelî zêde di nêzîkatiyan de serwer dibe. Di rewşa wî ya pratîkî de jî bandora vê pir hatiye dîtin. Di vê pêvajoya perwerdê de me herî zêde di vê xalê de ew rexne kir. Guhertineke berçav pêk te, lê pêwîste pir zêde xwe veguherîne. Divê ku leşkertî, xalên sereke yên artêşê bi xwe bide xwarin. Di vê xalê de lewaziyên wî hene.

Di pergala xebatê de nêzîkatiyên wî yên qutebir, nêzîkatiyên qutker ên di pêwendiyên rêxistinê de gelekî zêde ne. Vekirî bûn, îknagerî, di xalên pirsgirêkên derdikevin holê de di çareserkirinê de hinekî lewaz dimîne. Pir zêde qutebir tevdigere, yê beramberî xwe îkna nake. Ev jî pirsgirêkan çareser nake. Di nava çêkera ku jê berpirsyare, di nava çêkera havalan û rêxistinê de rê ji cudabûnan re vedike. Divê ku şêwazekî rast esas bigre.

Asta zanyariyê pêşketiye, lê dikare zêdetir pêşbixe. Şêwazê meşa wî ya têkoşînê başe, yanî di berxwedêriya wî de ti pirsgirêk nîne. Di vê çarçove de xwe weke nêzîkatî, weke nêzîkatiya fermandariyê nû bike, dikare di pratîkê de peywir bigre.

---.: Wekî din?

Ş.: Serokê min, ji xalên ku hevalan diyar kirin zêdetir dikarim bêbêjim; ez di nêzîkatiyên heval ji rexneyan re nebesiyê

dibînim. Li beramberî mijarên ku bên rexnekirin, şêwazê destgirtina heval, yên ku ew dixwaze bîne ziman, di cîh de nedîtina rexneyan bi xwe re tîne. Di vê wateyê de ji aliyê uslûb ve nebesiyên wî yên cidî hene. Bi taybet di derbarê Eyaleta Amedê de rexneyên ku anîn ziman cihê xwe nedîtin, di vê mijarê de di xebatên me yên komîsyonê de mijarekî hat rojevê bû. Rexneyên ku dixwaze bîne ziman ji ber ku bi şêwazekî rast danîne holê, her tim tenê maye.

Di gel vê de hinekî jî feraseta heval a xwe kamil dîtinê heye. Yanî li beramberî rexneyan girtiye. Bi asanî nebesiyên ku kirine qebûl nake, hebûna nebesiyê di xwe de nafikire. Di vê wateyê de her tim di nava nêvenga ku tê de ye rewşa wî ya xwe cuda dîtinê dikare bê jiyîn. Nemaze ev jî hinekî wî xwîn tehl dike.

Di gel vê de min di nêzîkatiyên wî yên ji hevalan re jî nebesî dît. Dema ku nebesiyên heyî tîne ziman, asta tak, rewşa tak, wê çiqas bikare rexne rake raneke zêde girîniyê nade. Ger hebe kemasiyek vê jî di bin navê “rastîbînê” de nedanîna holê heye. Ev jî ji ber pirsgirêka uslûb dibe sedemê valederketina wî. Di vê baweriyê de me ku pêwîste heval vê xalê dîqat bike.

Mijarke din jî, taybetmendiyeke heval a vekirîbûnê heye. Di bin navê “alîkariyê”de hevalên ku nêzîkatî ji wan re raber dike yanî çêkera xwe, lewaziya hinek hevalên ku di nav kêmasiyan de ne bikaranîn, li gorî wê nêzîkbûn mijara gotinê ye. Di asteke jor de nebe jî, ji rewşeke wisa re vekirîbûna wî jî di vê pêvajoya derbasbûyî de derket holê. Divê baweriyê de me ku pêwîste heval bi ser vê taybetmendiya xwe de biçe. Lê wekî din jî, bi taybet parastina partiyê, di heman kêliyê de mudaxelekirina nebesiyan, di wê mijarê de çavê xwe negirtin taybetmendiyên wî yên erênî jî hene, lê vana bi uslûbekî di cîh û guncaw de divê ku diyar bike.

---.: Hat fêmkirin, wekî din?

A.: Serokê min, min heval li vir naskir. Di perwerdê de nîqaşên me yên komîsyonê çêbûn. Ya ku ez bi heval re dibînim, di jiyana pratîka pêşiya me de, hinek taybetmendiyên wî yên neyênî ku astengî ava bikin hene. Beriya her tiştî înadeke heval ya hişk heye. Ji ber ku xwedî înadeke hişke, dibe sedem ku tenê bi xwe re bimîne. Bi ti awayî xwe ji derve re venake. Ji ber ku ji hemû aliyan ve xwe bes dibîne, dibe sedem ku ya kevin biparêze. Ev jî taybetmendiyeke neyêniye. Taybetmendiyeke duwemîn jî ji

aliyê hatina xebitîna rêxistinî ve nebesiyeke wî heye, divê ku vê jî derbas bike. Ger divê mijarê de heval cidî bi ser xwe de biçe, van neyêniyan derbas bike dê bibe alîkar.

---.: Mehelî, takekesî û nêzîkatiyeke pêgihîştî ya polîtîk ji rexneyan re raber nekirin û bi taybetî ji aliyê leşkerbûnê ve heta dawî fermiyet, xebateke giran a pêgihîştinê dixwazin, bi taybetmendiyên amator xeteriya nêzîkatiyeke baş rabernekirin dixwaze bê ziman. Êdî tu ne amatorekî. Bawerim pratîka Amedê jî hinekî ji ezeziyê re zemîn pêşkêş kiribû, tu taxrîbatên wê dibînî. Pêwîstiya rêveberiyeke bandorker, rêvberiyeke fermî, rêveberiyeke têrker derdikeve holê. Dîsa bersiva ku divê ji rexneyan re bê dayîn, aliyên ku divê bên sererastkirin ji xwe dayîna despêkirina, pêwistiya taybetmendiya te ya erênî ku tu temsîl dikî.

Te perwerdeyeke bingehîn dît. Ez ne bawerim van tiştên ku me gotin ji niha û şûn ve bên dubare kirin. Pir baş tê zanîn ku, dubarekirin, di nava partiyê de, di artêşbûnê de wê bi asanî berteka xwe nîşan bide û ew ê bi xwe zirarê bibîne. Te ev pir baş dît û berevajî vê, tê çawa xwe veguherînî te ev baş fêm kir. Her wiha tu niha bi avêtina gavên guncaw re mijûlî. Em van fikaran erê nakin, em dubarekirin bi fikaran yan jî xalên ku hatin ziman erê nakin. Ji xwe rêxistin li beramberî vê bitevdîre. Eşkereye ku pêwistiya te bi vê nîne. Veguhertin, pêdiviyeke mezinbûnê ye. Qet pêwîstî bi ketina te ya nav nêzîkatiyeke mîna tu ji kesayetiya xwe tawîz dibî nîne.

Divê neyê jibîrkirin ku, tu hîn di despêka pêşketinan de yî. Yên ku nizanin xwe veguherînin nikarin zêde pêşve biçin. Serhişkiyeke zûwa bêwateye, wê te ji pêşketinan dûr bixe. Berevajî, zêde dîtin, fêmkirin, ji hemû kesî hêzgirtin, her kes mezinkirin, heta dawî lihevkirî, “di ya xwe de israrkirin” tê girîngiyeke taybet bidî xwenesipartina rêbazên paşketî. Her wiha Rêbertî baş tehlîl kir. Di binê herikbariyeke romanê de, divê çawa nêzîkatî ji Partî û artêşê re bêkirin, ji pêwendiyê re çawa nêzîk dibe, ji jiyanê re çawa nêzîk dibe; bi awayekî yekpare ji xebateke serkeftî re çawa nêzîkatî tê kirin, bi hemû aliyan ve hatiye nîşandan. Hem fermanbere, hem jî heta dawî fêrkere. Tak jî bi awayekî awarte mezin dike. Bawerim tê bibî xwedî soza ku li ser vî esasî.

Ş.: Raste Serokê min. Ji xwe xalên ku Rêbertiya partiyê anîn, dîsa rexneyên ku hevalan pêş xistin taybetmeniyên min ên kesayetî ne. Ya rast min di pratîka xwe de dît ku nabe çareserî. Ez ê ji niha û şûn ve nekevim nav van nebesiyan. Di vê mijarê de heval dikarin bawer bin. Li ser vî esasî… soz didim.

---.: Hevalê Y. Ev demeke tu di perwerdeyeke dirêj re derbas dibî.

Belê Y. Tu di vê meha sala borî de hatibû? Ya din jî te demeke dirêj pratîka Amedê jiyan kiribû. Te berê dewre dît?

Y.: Belê Serokê min.

---.: Te çend dewre dîtin?

Y.: Min îsal dîtibû.

---.: Tu li ku derê, kengî tevlî bûyî?

Y.: Ji Bîngolê, di sala 1990'î de tevlî bûm.

---.: Tu ji nava xwendevanan tevlî bûyî, welatê te ku derê ye?

Y.: Raste Serokê min, ji Bîngolê me.

---.: Malbata we hîn li wire?

Y.: Belê Serokê min.

---.: Tu di kîjan dibistanê de xwendevan bû?

Y.: İktisadî.

---.: Refa çend?

Y.: Çar.

---.: Temenê te çende.

Y.: Bîst û sê.

---.: Bi giştî çar sale tu di pratîkê de yî. Nêzîkî salekê ye jî tu di vê qadê de yî?

Y.: Belê.

---.: Bawerim tu tevlî du dewran bûyî.

Y.: Dewre û nîvek.

---.: Te ev dewre jî bi axaftinê cihazê ji nêz ve şopand. Bawerim te ev dewre jî jiyan kir.

Y.: Belê Serokê min.

---.: Em rastiya te ya pratîkî zêde nizanin. Weke ku me hemû pêvajoyên pratîkî diyar kirin, me pratîka Amedê jî diyar kir. Me di nirxandina kurt a hevalê Ş. de jî ev danî holê. Di rêveberiyê de ezezî hebû, ji kolektîvîzmê mahrûmî û ya din jî di navbera rêveberî û çêkerê de qutbûn. Rêveberiyeke li hewa dimîne. Pir

zêde kes li gorî kêfa xwe, nemaze taxtîkên wê li gorî xwe keritandin û rewşa pêkanînê heye. Em dizanin ku vê rê li ber gelek windahiyan vekir. Ji hemû aliyan ve nebesiyeke rêveberiyê û ya çavkaniya xwe ji vê digire encamên nêzîkatiyên kêyfî, amator bûn.

Di vê mijarê de tevî hemû fedakarî û niyeta baş a Amedê jî, serwernebûna taxtîka leşkerî, dîsa pîvanên partiyê bi perwerdê re weke tê xwestin nedan, ji amatoriyê re zêde fersend dayîn, yekbûna di nava rêveberiyê de di vê mijarê de ne bi xwestek be jî rê li ber encamên neyênî vekirinê de weke zemîn bikaranîn, bi qasî van windahiyan, dikare weke sedemên xwe negihandina pêşketinên mezin bên rêzkirin. Di nava vê de tu jî heyî û ev xisûs, di van dewrên perwerdê de tu yek ji wan kesên ku herî berfireh dîtiye. Belê rojane nûçeyên di derbarê welat de şopandina te jî bawerim heta dawî fêrker bû. Bi taybetî di dahûrînên rojane de kar kirina te, di ewqas fêmkirina arasteyê de, her wiha divê tu çawa li paşerojê binêrî, bi aliyên nebes ve, xeletî bi hev re meşandin, pratîkeke çawa bû tu niha baştir dinirxînî.

Divê tu bibî yek ji yê herî zêde rastiyan fêm dike. Ji bo kadroyekî, yê ku ewqas ezmûnên xwe heye, ev perwerde amûrekî pir mezin ê veguhertinê û ji bo xwe ji peywirên pir girîng re amadekirinê têrkere. Hemû nirxandinên kesayetî ku min kirin, lêpirsîn, bi xetên sereke ji bo te jî derbasdarin. Dîsa asta dahûrînê ku me di kesayetiya xwe de kir pir fêrkere. Her wiha tu dikarî encamên baş jê derxî.

Tu dikarî bibî yek ji xwendekarên bi îda yê vê dibistanê. Bawerim yên ku te ji vir girtine di veguhestina qadekê de û ji çêkera wê re birinê, li ser vî esasî di veguhertina çêkerê de hem bi şansî, hem jî di zanebûn û bendewariya vê peywirê de yî. Bi taybet ji bo hêz anîn ji xebatên herî bandor ên vê demê re yek ji kesên ku divê şopdarê vê de yî. Tu di asta kesê ku bibe xwedî vê îdaya bilind de yî. Bawerim di vê çarçovê de ji te re nêzîkatî raber kirin dê rast be. Dîsa bi qasî ku tu rast bê dahûrînkirin jî, dikare hinek bendewariyên te yên peywirê bibin. Ya ku li şûn de dimîne tiştên ku hatiye girtin hostayane pêşandane. Ev bêyî ku pratîk hebe ne gengaze. Dê ev şans bê dayîn, her wiha tê baş binirxînî, tu çi dibêjî?

Y.: Ev demeke dirêje ez li qada Rêbertiyê me. Ya rast dema ku tevlî nava refên şoreşê bûm, kûrbûneke min a pir cidî nebû. Rewşa min a bi azwerî hemêzkirina şoreşê nebû. Tevlîbûna min, bandorên giştî û dîsa tevlîbûneke hestî ye. Lê piştî ku hatim qada Rêbertiyê, yên nû û kevn bi hev re qeyas kir, pir zelal ferqa bi qasî çiyayan a di navberê de hebû min dît. Di vê mijarê de bi taybet pêvajoya konferansa ku min li qada Rêbertî dît, dîsa bi şêwazê du dewrêyên cuda ji bo min pêvajoyeke dîrokî bû.

Di venêrîna nêz ya Rêbertiya Partiyê de, di qada Rêbertiyê de min pêvajoyeke dirêj a xebatên pratîkî jiyan kir. Gelek bûyer û diyarde, di şêwazê jiyana Rêbertiyê de, şêwazê xebata wî de ji nêz ve dît. Di vê çarçovê de ez jî bi derfetên ku partiyê pêşkêş kirine, aliyên min ên nebes, kêm, aliyên xwe yên lewaz min bi zelalî dît. Dema ku diçim pratîkê jî ez ê bi şêwazekî pir bi îda biçim.

---.: Belê, di derbarê hevalê Y. de, di dahûrîna kesayetiya wî de, di derbarê bendewariyên wî yên peywirê de, yên ku dixwazin nerînên xwe bînin ziman hene?

Ş.: Serokê min demeke dirêje ez heval nasdikim. Ji xwe taybetmendiyên ji bo kesayetiya Amedê derbasdarin ji bo vî hevalî jî derbasdarin. Bi qasî ku kesayetiya Amedê tehlîl bike, wê xwe jî tehlîl bike. Xisûsa din, heval li beramberî pratîkê hinekî di rewşa bêkêr de ye. Ger vê rewşê di ber çav re derbas bike, di mijara peywirgirtina heval de dikare hinekî din sûdmend be. Ji ber ku heta niha zêde li beramberî peywirê rewşa wî ya westandinê nîne. Asta wî ya teorîk têr dike, tenê di pratîka wî de ji vî alî ve lewaziyên wî hene. Ger vê derbas bike heval dikare peywir bigre.

---.: Yanî tu dibêjî hunerê wî yê pratîkî nîne?

Ş.: Hunerê wî yê pratîkê nîne Serokê min.

---.: Nîne?

Ş.: Danehevên wî yên teorîk heta dawî zêde ne, lê li gorî wê bûyera pêşxistina pratîkê nîne. Niha xalên ku jê tên hêvîkirin hene, ez li gorî van xisûsan dibêjim. Ger na ji bo pratîkeke asayî têrê dike.

---.: Tê fêmkirin, wekî din?

Ab.: Di xebatên rêxistinê de, di pêwendiyên xwe yên bi hevalan re divê ku xwe bigihîne şêwazê têrker. Heval di vê mijarê

de gelekî xwe tenê dike. Bi kesan re eleqederbûnê pir zêde esas digire. Dibe ku piraniya tiştên ku dike bi nîqaşên girîng derbas jî bike, pir takekesî dike. Bi çêkera rêxistin û hevalan re zêde eleqeder nabe. Bi wî şêwazê xwe tenêkirin, weke ku di asta tê xwestin de bi hevalan re eleqederbûnê asteng dike, hem jî hinekî din dikarin li ser wî hesabê xwe bikin. Yanî dikare ber bi aliyên din ve bêkişandin. Dibe ku hinekî din bixwazin jê sûd bigrin. Yanî di kesayetiya xwe de li beramberî hinekî din derî vekirî dihêle. Ev jî dê ji bo wî bi xwe zirarê bide. Ji vî alî ve baldar be wê baş be.

---.: Wekî din?

Az.: Serokê min, ez gelekî bi heval re mame. Nebesiya ku bi heval re heye, bêtirî xwe di pêşxistina çareseriyê de nebese. Ji aliyê din ve jî taybetmendiyên heval ên serkutkirinê hene. Ji wê zêdetir, nêzîkatiya xwe ji Rêbertiyê re gelekî hestyare. Ya din jî heval di esas girtina Rêbertî de, tenê tevgerên teşeyî yên Rêbertî esas digire. Şêwazê tevgerînê, di taybetmendî esas girtinê de nebese.

---.: Wekî din?

Se.: Serokê min, ez jî demeke dirêj heval nasdikim. Raye nenirxandina heval mijara gotinê ye, yanî ji rayeyê tam ders nederxistin heye. Ji vî alî ve tevî ku pir tiştan fêm dike, weke tam ders jê dernexe, li beramberî van jî pir cemidî ma. Di gel vê de heval pir seransere.

---.: Ji ber ku pratîkeke giran jiyan nekiriye, di mijara ezmûnan de em nikarin destnîşankirineke teqez bikin. Dîsa ya ku me bida perwerdeyeke berfireh bû, ev hat dayîn. Bêguman di encam derxistinê de wê xwe di asta herî jor de berpirsyar bibîne. Dema ku pêwîst kir dê xwe jî nû ve şîrove û lêpirsîn bike. Bi taybet wê hêza lêpirsîna vê dewrê ji nû ve jiyan bike. Divê ku hinekî din ji nêz ve vê dewrê bişopîne.

Dîsa wê lêpirsîna pratîka Amedê bê kirin. Wê di wir de hinekî din baş xwe bibîne. Ya herî girîng jî bi perspektîfa fermanker wê xwe bigihîne dema pêşiya me. Dibe ku ew tam nedîtibe, wê ji nêz ve careke din bîne berçav. Êdî divê ev kesayetiya ku ewqas hatiye dahûrandin bersiv bide bendewariyên peywirê. Di vê mijarê de Partî rêxistinkiriye, di axaftina qûralên artêşê de di rewşeke bi îdea de ye, hemû kar êdî daxistiye asta

rêziknameyan tevî ku ev di holê de ye; bi amatoriyên kevn ketina nav kar, dîsa bi nîqaşên takekesî re xwe tenêkirina wî dê neyê qebûlkirin, zirara wê jî ew ê bi xwe bibîne. Bi kurtî divê baweriyê de me ku fêm kiriye.

Êdî qala seranser mayînê jî nikare bê kirin. Kûrahî hatiye dayîn, dîsa jî wê vîna xwe bi asanî bi vîna partiyê re bike yek. Bi taybetî jî dê giştî tevgerînê nîşan bide. Çarçoveya me pir vekiriye, di vê dewrê de me ewqas kûr kir, çarçove dayê. Dê wan ji xwe re fermander bibîne. Di ferqa vê de ye ku li ser vî esasî peywira wî tê diyarkirin. Ji bilî vê hemû corê tevgerînên ku derkevin dê pir hişk bên rexnekirin, hesab bê xwestin tê fêmkirin. Ger di van xalan hemûyan de baldar be,  dikare bibe kesê herî bi îda yê dibistana me û kesayetekî yê herî baş fêmkiriye û biteyîsîne. Ev jî şansekî gelek girînge!

Di her qadekê de di veguhestina vê de divê ku bi azwerî tevbigere. Di mijara teqez serxistinê de heta dawî pêwîste xwe tevlî bike. Ji aliyê vesaziyên nû ji bo xebatên Partî û artêşê wê peywireke bi bandor bigre. Di vê mijarê de wê xwe li gorî pîvanên rast binirxîne ev jî dibe peywireke heta radeya dawî jiyanî û ewqasî jî bi anûr. Serxistina wî ji niha ve bi despêkirinên saxlem ve girêdayî ye. Ya dimîne, weke ku di dahûrînên Rêbertî de hene, bi hesteke perpirsyariya mezin, pir zêde wê hesab bike, bi cerîbîne bike ezmûn û heta dawî girîngiya vê bêyî ku paşçav bike, uslûbê xwe ji bo hemû kesî, bi her pêwendiyê, her yekeyê re nêzîkatiyeke rasteqîn raberkirin divê ku bibe şêwazê meşa me ya vê demê. Di vê mijarê de herî kêm bi îda be, bi qasî îdayê hêza despêkirinên saxlem jî bikaribe raber bike. Hêvîdarim ku em naxapin.

Y.: Rexneyên ku hevalan pêş xistin, dîsa li ser esasê arasteya perspektîfên ku Rêbertiya partiyê pêşkêş kirin ez ê bimeşim. Ez ê vana ji xwe re weke emir, talîmat esas bigrim. Li ser vî esasî tevlîbûna xwe ji xebatên artêşê yên welat, xebatên yekeyên şer bi hemû hewldanên xwe tevlî bibim û di derbarê têrkeriyê de… soz didim.

---.: Di vê pêvajoya rexne û rexnedayînê de weke alîkarî ya ku min xwest ez bikim, hinekî di kesayetiya hevalan de hat nîşandan. Dewre bi van aliyan ve bi çeka partiyê bihêz kirin di cîh

de ye. Hem di lêpirsîna xwe de, hem jî ji hesta peywirê re, di ketina biryardariya peywirê de dê gelek sûdmend be.

Ger bê dîqatkirin, ya ku em dixwazin li vir raber bikin, berê di kesayetiya xwe de raberkirina xweşikiya ye. Dixwaze kevn, dixwaze berendamên nû yên kadro dahûrînên navxweyî, lêpirsinkirinên xwe divê ku rasteqîn bikin. Ev şayanî partiyeke bi hêze, partiyeke ji xwe bawer vê dike, di çareserkirina hinek pirsgirêkên diyar de rêya herî bibandor eve, nemaze ev rêbaz pir rasteqîn û di cîh de bikaranîn em ê ji bo we weke fersendekê binirxînin. Wekî din di diyarkirina peywirê de, di pêkanîna biryarê de çarçoveyeke saxlem hat xêzkirin. Bi qasî bi dema berê re neyê qiyaskirin peywir çiye, divê nêzîkatiyeke çawa ji peywirê re bêkirin, hemû despêkirinên saxlem kêlî bi kêlî çawa tên kirin vana hemû tên nîşandan.

Dikare bê gotin ku ev mezûniyeteke saxleme. Dibe ku di derbarê dema dewrê de bêgotin; “kurt”e, lê ya girîng berfirehiya dewrê ye. Ger ev berfirehî hatiye girtin, ji bo mezûniyeteke ji peywirê ku tên emirkirin re bersiveke serkeftî bibe têrê dike. Wane ji bo şoreşa her welatekî têr dike. Heta tenê ne waneyek dayîn, dahûrîna netewekî hat kirin. Hema bêje bi dahûrîneke çawaniya xwe bilind, me asta netewî ji nû ve ronî kir û ya ku di kes de hat dahûrandin asta netewî, rastiya cîvakî bû. Me nêvenga naxweyî ya partiyê zelal kir. Yên ku paş dixin, giranî ava dikin çi hebin, me danin holê. Girêdana vê bi jiyana civakî re jî pir sexlem hat destgirtin. Heta dikare bê gotin ku; şêwazê jiyana civakî û aborî ya PKK’ê çawa ye; di asta herî pêş de hat nîşandan.

Ya herî girîng jî, em ber bi jiyana leşkerî ve dikişînin. Nêzîkatiya herî rexnegir ên balkêş di derbarê jiyana leşkerî de hatin kirin. Vê carê artêşbûn dê çiqas bê îdakirin û pêşxistin ji bo her kesê ku dibêje; “ez bi îda me” zelal û têrker hat îfadekirin. Nêvenga navxweyî ya partiyê ku hat dahûrandin, dîsa xebatên artêşê tevlîbûneke ji rêzê ya durist û niyeteke ji rêzê jî, dikare we bike xwediyê meşeke bi îda. Di şexsê dewrê de ya ku hat dayîn ji bo serkeftinê biçûk nayê dîtin. Hûn bi rexne-rexnedayînê li ser xwe pêk tînin. Careke din bi xwe lêpirsînkirinê, hûn tehlîl dikin. Ev jî asta we ya amadekariyê teqez dike.

Weke mînak me hinek heval lêpirsîn kirin nêzîkatî ji diyarkirina peywirê re divê çawa be, ew nîşan da. Ji niha û şûn ve

hûn hemû dikarin di vê pêvajoyê re derbas bibin. Ev, di heman demê de wê di hemû xabatên me yên ku em di vê zivistanê de bimeşînîn jî bê teyisandin. Me bi vê dewrê ev bi awayekî berfireh pêş xist. Weke heyî wê teysîna xwe li ser xebatên lûtke yên ku di bin navê kongra 5 a partiya me de bike û di wir de bêtir bê kûrkirin, berfirehkirin. Pêvajoya lêpirsînê, di encamê vê de darizandin û ji hemû aliyan ve nêzîkatiyên têrker bên misogerkirin. Ev di heman demê de dibe amadekariya herî bi îda a derbasbûna 1995'an. Bawerim wê derfetên me ji vê re destûr bide.

Sengerên ku me xwe tê de bi cîh kiriye, ji bo ku em vî rêbazî derbasî jiyanê bikin guncav in. Bêyî ku windahiyên cidî bên jiyîn me dixwest em vê xebata dîrokî biteyisînin, bi qasî ji dest tê em ê ji niha û şûn ve bidin jiyankirin. Hem jî em ê bixwazin bilez nîqaş bikin. Ji xwe di nav we de hinek kom çêdibin û wê di nîqaşan de rist bigrin. Wê di qadên girîng, yên vê zivistanê de bigrin dest û ev jî ji niha ve dide diyarkirin ku wê ev dewra me, dibistana me çiqas bi bandorker û veguherêner be. Di ji nû ve vesazkirinê de, bawerim dewreya herî bixwe bawer a xebatê ye. Hem ji aliyê berfirehî, hem jî ji aliyê pêkhateya xwe ve ji asta netewî re têr dike.

Ev fersendeke girîng ava dike, berpirsyariya wê jî girînge. Di heman demê de kes jî bi anûr dike û di vê wayetê de hem em bi şansin, hem jî bi cidiyeta ku perpirsyarî didin em saxlemtir dest bi rojan dikin. Ya rast me ji niha ve despêkiriye. Nêzîkatiya çalak, nêzîkatiya têrker mijara gotinê ye. Ne ji paşde xistinê re, ne jî qutkirin û avêtinê, ne jî ji tengbûnê re nêzîkatiyeke fersendê nade. Ji her tiştî re di çarçoveya destnîşankirina me ya "hema niha dema wê ye" nêzîkatî bê kirin. "Dema hemû pêşveçûna ye, dema serkeftinê ye, êdî roj bi roj dema avêtina gavên serkefitnê ye" bi vî şêwazî me wate da dewrê. Ji her alî ve raste. Ya dimîne rexne-rexnedayîn û sozên ku li ser vî esasê bên dayîn careke din dê bên nîşandan.

Em di bandorkirina vê çekê de, yên ku rewşa wan herî girane jî di nav de, di vê baweriyê de ne ku wê bandorker bikar bînin û misoger wê yên di dema borî de windakiribûn telafî bikin, zêdetir jî bidin qezenc kirin. Ev çek ji bo vê dê di asta mînak de

bê karanîn û nemaze ya ku hem ji we hemûyan tê hêvîkirin, hem jî hûn ê soz bidin serkeftina ku şayane.

Em naxwazin vê carê bixapin. Em jî weke Rêbertî pir dijwar bi biryarin. Ez biryardariya xwe ya dijwar di ronahiya pêşketinan de raber dikim. Di vê mijarê de em xwedî nêzîkatiyeke çawa ne min nîşanî we da. Di jiyana xwe de ya ku ewqas hesab û kîtaban dike û helwesta xwe datîne holê dibêje; “ez im” hêza dewleteke wisa, weke kesayetiyekî şerê wê yê bê xedar pêşwazî dike û wê bizane we jî bimeşîne. Dîsa di bandorkirina rastiyan de, gelekî di ser ên heta niha hatine raberkirin de wê bi azweriyekê bimeşe.

Ti wateya tengavkirinê nîne, wateya avakirina astengiyan jî nîne. Eşkereye ku vana tiştekî nadin kesayetê. Dema ku dibêjim; “ji niha û şûn ve ez ê hinekî din ser de biçim” li vê çarçovê dîqat dikim, ji bo ku hûn nekevin nakokiyê emir çiye, pêwîstiya wê çawa tê bi cîh anîn, ev pêşketineke şanaze, ya ku şayanî hevaltiyê ye jî eve, ev tenê ne fermanek, çalakiya herî zêde bi azweriye bi zanebûna vê em ê nêzîk bibin dide nîşandan. Em naxwazin bi fermanên zûwa we bimeşînin. Me heya niha ev ne ceriband jî. Ya sereke xwebexşî û dîsîplîna wê ye. Dema nîşandana vê ye.

Dubare dibêjim; em naxwazin bixapin. Em ê derfet nedin ne xapandina me ne jî hûn xwe bixapînin. Ji ber ku di serî de navend, piraniya hevalên me bi xapandinên neyên bawerkirin nêzîkî me bûn û gelekî xwe xistin nav tengaviyan. Hinek ji wan çawa bêrehm hatin darizandin û heta xirab winda kirin hûn dizanin. Ji bo ku wisa nebin, bawerim pêwîstiya aqil û ya wîjdane.

Em hinekî din dixwazin şayanî dîrokê kar bikin û dixwazin bi vî gelî, mirovatiyê tiştekî bidin qezenc kirin. Ev hem mafê me, hem jî peywira me ye. Misoger divê ku em bizanin serkeftî bin.

15 Cotmeh 1994

## Di Çiyayên Kurdistanê de
## Yekîneyeke Enternasyonalîst Tercîha Me Ye

Dijmin ji vê sekna min re jî dibêje; "Çawa radiweste, çakêtê xwe çawa derdixe" û rexne dike. Tevgerîneke biçûk bi dehan car dixwaze bi teyisîne. Min çakêtê xwe çawa derxistiyê bê navber tîne rojevê. Bi gotinên weke "APO, lêpirsîn dike, Sakik biçûk dibe" nêzîkatiyeke watedar a ku me ber bi guftûgoyê ve kişandiye berevajî dike. Ne girînge, dijmine wê bike. Em karê xwe bidomînin.

Ya ku tê aqlê min eve; tiştên ku di asteke mezin de hûn ji pergalê daxwaz dikin, pergal jî nade bi hewaya ji me destxistinê nêzîkbûna we encam nagre. Hûn çi hîs dikin, çi nerm dikin, çiqasî li dijberîne em bizanin. Pêwîstî çine hûn nikarin texmîn bikin. Tiştên ku pergalê ne da ne, hûn ji partiyê dixwazin. Pevçûna we pevçûneke xelete. Em çawa rê li vê bigrin? Ya rast ev xwe bi bernamenekirina kesaye; hemû pergal jî di nav de, tê wateya fêmkirina hemû ketin û derketinan.

Dinêrim, qutbûna gelekan ji pergalê jî pir kême, pir bi xapandine û nebese. Ji şoreşê çi dixwaze yan jî wê bi şoreşê çi bê qezenc kirin, wê jî zêde texmîn nake. Dema ku wisa be jî wê nikare xwe bi bername, pîlan û rêxistin bike. Di jiyanê de nebesmayîna ku hûn raber dikin, kesayetiya fermanber a nebes eve. Ya ku hûn jiyan dikin tenê ne qondaxa cendirma ye, ya ku hûn jiyan dikin tenê ne hejariyên madî ne jî; serdestiya bîrdozî ya pir bihêz a pergalê mijara gotinê ye. Bi van hewldanên we yên sînordar çiqas dikare bê derbaskirin? Carekê asta we ya xwestekê pir lewaze. Daxwazên we yên heyî jî daxwazin di çarçoveya pergalê de ne. Ger hûn serbest bên berdan hûn ê bi çend coran xwe bifroşin pergalê.

Hûn dervî vînê tevdigerin. Ji ber ku ev kesayetiya mezin hatiye tepisandin, çiqas derfetê azadbûnê dest xwe bixe jî, di asteke girîng de wê bi şêwazê bijartina pergalê karbîne yan jî bi giranî ya ku tê karanîn dibe ew. Ji bo wê bi awayekî pir dijwar hemû pergalê amade jî pêşkêş bikin, hêza redkirina vê pêwîste. Ev jî kesayetiyeke mezin dixwaze.

Ger hûn di ferasetê de wisa bin, di pratîkê de hûn rewşên dil êş jiyan dikin. Ji xwe trajedî jî ji vir derdikeve. Çalakiyeke me

ya bi wate li dijberî pergalê heye û herî kêm saziya ku weke ya Rêbertî tê pênasekirin nêzîkatiya qutbûna wê pir cuda ye. Fêmkirina we ya vê pir kême. Teysîna vê ji pratîkê re jî pir trajîk dibe yan jî karesetên ku hûn dijîn vê jî derdixe holê. Em hewl didin bidin fêmkirin, sînordar dimîne. Ez qet bawer nakim. Di feraseta ku serwere hem dijmin û hem jî li beramberî rastiya me ya ku divê bêguhertin qet nafikirim dê wisa bimîne. Lê bi nerînên bêxwestek, belav, bi fêrbûnan hûn mezin nabin yan jî pir sînordar mezin dibin.

Ez dikarim xwe bidim guhdarkirin, lê ger hûn hinekî serbest bên hiştin hûn nikarin tenduristiya xwe jî biparêzin vê jî dizanim. Ger bêjim tenduristiya kesayetiyekî leşkerî çawa ye, dê qet haya we jî jê nebe. Ji bêçaretiyê ye, bi zanebûn nakin, lê yên ku dixwazin tevlî karên wisa bibin, di hemû wateyan de bilindbûnê, tûjbûnê, dijwarbûnê yan jî fikrandinê divê ku bizane. Herî zêde yên ku raye ji wan re hatiye dayîn encamê ku derdixin, tepisêneriyeke xirabe; cendirmetiye yan jî xulamtiya axayê gund a herî xirabe. Îdaya dijmin bi şêwazê; “hûn nikarin li beramberî me rawestin, vana malê me ne, milkê me ne, hûn nikarin bigrin dest” e. Ewqas xebat bike, lê di vê astê de mayîna we gelekî heyfe!

Hûn jiyankirin çawa ye, çawa pêşdikeve nizanin. Ya rastî ji bilindbûna zimanê dîrokê dûre, lewra azwerî û girêdanên manewî çiqas mezinin. Mirov li rewşa we dinêre; bêyî ku wan girêdanên ji rêzê yên ku civak dijî nebîne nikare derbas be. Girêdanên bê çare; girêdanên hêrs û kûraniya wan sînordarin! Mirovê bi namûs, bi taybet dema ku tenê ma, dixwaze di amadekirina xwe de, dixwaze di meşandina tevgereke bê xedar de be, dema ku vê rewşê dibîne bi şêwazekî çavsorane yê ku dizane ser xwe de biçe ye. Lê dema ku tam jî ev rewş tên jiyankirin, yan ji xeyalan re yan jî ji rewşên rastî re xwe berdan, kar ji dûvika wî girtin, bi texmînên ji rêzê dev ji xwe berdan, rewşên ku hûn rojane dijînin. Ev pir xeterin!

Ji bo çalakiya herî mezin a dîrokê, bi taybetî jî ji bo qehirkirina pergalê pêdiviyên wê pêkanîn li vir bîmîne, hûn ji muhaseba vê kirinê jî bêzarin. Qet nebe dema ku hûn tenê man divê ku hûn muhaseba wê bikin. Hûn dikarin hesabpirsîna hundirîn saxlem bikin. Hûn tenê ji we revê jî sînordar namînin, bi qasî hûn dikarin durişma xwe dijîn. Ditirsim ku vê carê me jî

weke tê xwestin xwe nedabe fêmkirin. Ger me hinek bi hêz jî kiribe, hûn ê vê çiqas ji kêrnehatiniya xwe re bidin xizmet kirin em ji vê ditirsin. Me cesaret da, ast pêş xist, kî zane hûn ê çawa xirab bi kar bînin? Li gel xirabekî, kî zane wê çend baş bişewitin û heta aliyekî we yê xirab, çiqas aliyên we yê baş bibe û hûn ê dev ji xwe berdin. Vana hemû me didin fikirandin.

Li gorî we jiyan bi baranê re tê bi lehiyê re diçe; wisa dibe, wilo jî dibe. Rewşa we ya tawanbariya îstîkamet, vîn, li ber xwe dan, afirênerî ya ku qet nayê aqilan ji dergûşê despê dike. Mirovê lewaz, mirovê bê çare, mirovê herî lanetkirî û divê ku mirov jê nefret bike. Li beramberî dijmin ewqas lewazmayînê çawa dilê we radike, ez wê fêm nakim. Dîsa li beramberî nirxên neyênî ewqas bejnkurtiyê hûn çawa bi xwe didin xwarin, bi rastî jî min hîn fêm nekiriye. Heta bê serkeftin mayînê hûn çawa bi xwe didin xwarin, bi demagojiyê ser wê digrin, bi asanî bi kelîma tê lîstin, bi asanî hûn xwe dixapînin, yê ku nebûye weke bûyî hûn didin diyarkirin. Vana çiqas belave tên jiyîn.

Şoreş daketiya asta mûçeyekî biçûk, veguheriye pêşbirka piraniya ji we jiyana ku di pergalê de neditiye û veguheriye bidestxistina van. Çiqas nêzîkatiyeke xafîlane ye! Mezinbûna ruhê şoreşê çiqas ji we dûrketiye yan jî we nedîtiye. Ez vê carê gelekî hêrs bûm. Di dewrên borî de ez ewqas bi ser mirovan de neçûbûm. Ger mirov bi nezanî bijî, hinekî rehet dimîne, lê dema ku pir tişt ketin nav serûbin dibe. Me jî xwest em hinekî wisa nêzîk bibin, me got em hinekî bikevin nav we û em bi zorê xwe li ser piyan digrin.

Ewqas rexne, li ewqas tawanbariyên ku hûn arasteyî hev dikin binêrin; mirov çawa li ber xwe dide, ev hemû ji ku derê tên? Matmayî neman gengaze? Kesê ku ewqas nebesiyan dijî, em ê bêjin xebateke artêşê û yên herî baş jî, yên ku divê perpirsyariya herî mezin jî bigrin ser milê xwe çil cor qusûrê wan derdikeve holê. Çend kesên ku ne tawanbarin hene? Li gorî we mirin jî, jiyan jî bi asanî tê pêşwazîkirin, lê ji bo yê ku bi dijmin difikire qet ne asane. Ne mirin asane, ne jî jiyan!

Em hewl didin ewqas bê qusûr bin, ewqas pêşxistina we ya qusûran, raberkirina we çawa we natirsîne? Yan jî qet nebe çawa ber bi kombûnê ve nabe? Dîtina çavkaniya wan kêmasiyan, di mijara derbaskirina wan de hûn ewqas dema heyî nanirxînin.

Hema bêje bi salane hûn heman nebesiyan dijîn û natirsin, heta hûn qiswet jî nakin. Vaye ez li vê matmayî dimînim

Bi salane em rexne-rexnedayînê dikin. Êdî dijmin jî henekê xwe dike. Darizandina Tendurekê di televîzyonê de nîşan didan û digotin; “Li wahşiyan binêrin, li van hovan binêrin” waye jiyan rêxistin nekirine. Bi sedan kes ketine şikeftekê, ji dûmanê difetisin, di deqeyekê de ji pêncî kesî dengê ku kuxikê derdikeve, rûyê wan reşî bûye. Wiha dijmin jî ji bo ku ji aliyê derûnî ve me bandor bike vî tabloyî nîşan dide. Gelo jiyaneke din negengaze? Di wan çiyayan de ewqas mirov di şikeftekê de komkirin, bi nexweşiyên xwe re rû bi rû hiştin neçarî bû, ti çareya wê nebû? Ger jiyan pêşwext bê pîlankirin dê cuda derbas bibe.

Jiyana me jiyaneke azadane tê vesazkirine. Qûralên neyî, hesabên neyî, xebatên neyî, di encam de ji dijmin re jî hemû corê amûran pêşkêş dike û di gelek cihan de trajedî wisa pêşdikeve. Ya herî xirab jî, dijmin vê bi kar tîne. Li şûna ku tu ewqas fedakariyê raber dikî, di dema xwe de xwe bide xebateke rast û nekeve nav van rewşan. Em vê dibêjin; piraniya we jî bi bertek pêşwazî dikin. Ne hûn xwe bi jiyaneke asan, ne li beramberî ya zehmet, ne di nava pergalekê de, ne li beramberî pergalê, ne di bûyera rêveberiyê de, ne di bûyera birêvebirinê de, hûn nikarin xwe bighînin rêvebirî û rêvebirinê. Ez her dem, hem mirovê têm rêvebirinim, hem jî dizanim rêve bibim.

Rewş min tam jî dişibe ya Hz. Mûsa. Dişibe dema derxistina ew eşîretên Yahûdiyan ji Misrê. Niha çareseriya Kurdan jibîrkirina demeke wisa ya lanetkirî gengaze. Te ew dîroka pêxemberan guhdar kiribû? Hinekî dişibe wê rewşê? Hz. Mûsa wê demê bi çi re mijûl dibe?

Fu.: Hz. Mûsa, ji aliyekî ve hewl dide gelê xwe îkna bike, ji aliyê din ve jî li beramberî Fîrewn şerê wî heye.

---.: Bangawaziyên ji esareta Fîrewn rizgarkirinên hene ne wisa? Dixwaze bibe ku derê?

Fu.: Axên azadkirî...

---.: Dixwaze vegere welat, ji ber ku bin esareta welat de ne. Dubare dixwazin vegerin welatê azad. Başe, pirsgirêkên ku qewm derdixe çine?

Fu.: Ew di nav nakokiyan de ne, zêde naxwazin ji wê jiyanê rizgar bibin. Tevî ku kolene jî, ya rast di koletiyê de israr dikin. Heta dibêjin; “tu me vedixwîne rizgariyê, lê em di van axan de weke kole mirîbana dibe ku baştir ba, niha jî tê me di çolan de bikujî.”

---.: Û pertekên wan ên mezin pêşdikevin. Bawerim gelekî bêserûberî, jiyana yoz belav dibe.

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Geleki jî tengav dibe, dixwaze gaveke netewî ya azadiyê bavêje, lê diyare ku pir zêde tengav dibe.

Fu.: Raste Serokê min.

---.: Ew lanetkirina wan a Kurên Îsraîliyan bawerim ji ber vê sedemê ye. Heta niha jî ji ber wê lanetê li ser rûyê cihanê belav bûne. Eşkereye ku bi pêvajoya hatiye jiyîn pêwendiya xwe heye. Balkêşe! Yên ku Hz. Îbrahîm jî kirine hene, te lêkolîn kiriye? Ew jî ji herêma Riha yê derdikeve û diça warên Fîlîstînê. Hûn ji dîroka Sûryaniyan tiştekî dizanin?

Nu.: Dizanim Serokê min.

---.: Qaşo tê jî dubare vegere welat, lê tu dizanî li ser Sûryaniyan laneteke çawa hatiye ferzkirin? Diyasporaya wan jî felakete! Tu jî rewşeke pir xirab, belawela dijî. Tevî hemû alîkariyên me, qewmê te vegerandina cihekî em jê re bêjin ax gelek zehmete. Tu nikare xwe bi rê ve bibî. Wê ev rewşa te çawa be? Ew qewmê te bawerim li çar aliyên cîhanê belav bûye.

Nu.: Raste Serokê min.

---.: Dê rewşa we çi bibe? Tu dikarî rehet bijî, pir bilez tu dikarî bikevî nebesiyan. Lê qewmê te li çar aliyên cîhanê belav bûye û dê biçe ku derê jî nediyare. Ewqas xwe bê welat hiştin, rewşeke lanetkirî îfade dike. Hûn bi çargavan ber bi emperyalîzmê, kapîtalîzmê ve dibezin.

Nu.: Di vê qonaxê de rizgarî encax li ser esasê Têkoşîna Rizgariya Netewî ya ku PKK’ê dimeşîne pêk were.

---.: Temam raste, lê mirovê ku tevlî wê bibe kiye? Mesele tu jî nikarî hêz jê re bênî. Ê tiştekî tu ji wê dîrokê fêm dike heye, te ew dîrok xwendine? Qala wan parêznameyên lanetkirî dikir, qala azadiyê, zehmetiya wegera welat dikir.

Nu.:Ya rast di pêvajoyên beriya mîladê de, girêdana Aşûriyan a bi axê ve heye. Lê zêdetir rêbazên ku bi kar tînin hov û wahşîne. Li pê xanimetê bezîna wan heye.

---.: Ew taybetmendiya hemû împaratorên serdema koletiyê ne. Ew taybetmendî gelê Aşûrî xist rewşa herî xirab a dîrokî, piştre gelek qewmên din jî tevî vê bûn. Kurdan jî wisa kir, gelek qewmên wisa hene, lê yên ku zirar dibînin gelin. Gelek meşên komên wisa biçûk hene. Ev ol, pêxember her tim wisa derketine holê. Li beramberî rewşa lanetkirî bertekeke. Gelo derûniya mirovan yan jî rastiya wan çawa şîrovekirine?

Fu.: Li beramberî mirovê ketiye.

---.: Armanca wan a sereke çiye? Hz. Îsa li beramberî Roma yê tê rewşekê. Lê despêkê li dijberî çi derket?

Nu.: Di despêkê de dijberî kralên Yahûdî ne. Di wê demê de kralên Yahûdiyan hene, ji xwe di dema koletiyê de ye. Îsyana yekem a Hz. Îsa, li dijberî kralên Yahûdiyane.

---.: Çima, li dijberî çî wan in?

Nu.: Zilmeke mezin heye Serokê min.

---.: Wekî din?

Nu.: Ya rast hewldana ji koletiyê rizgarbûne.

---.: Hz. Îsa li ser vî esasî çi kir hedef? Li beramberî çi propaganda heye? Te Încîl xwendiye?

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Divê ku tu vê fêm bikî. Ger bi cewherî em li dijberî çine vebêjin û encama ku em ji çîrokan derxin çiye, fikrê sereke çiye?

Fu.: Li dijberî kesayetiyê kevnin. Ya rast di civakê de rizîn heye; hem jî koletiya Roma yê heye, di binê vê de koletiya Romayê heye.

---.: Yahûdî girêdayî Romayê ne?

Fu.: Bi Romayê ve girêdayîne Serokê min.

---.: Di bin desthilatdariya Romayê de kraltiyeke?

Fu.: Ya dirizîn, ji nirxên xwe bêgane bûn heye.

---.: Pênaseya sereke ya vê meylê çawa dikare bê kirin? Di bingeh de Îsa çi dixwaze?

Fu.: Hz. Îsa, dixwaze ji pêwendiyên pîs yên pergalê qutbûnekê pêk bîne.

---.: Em şênber bikin, bi mirovê ku pergalê xistiye, di navbera mirovê ku ew dixwaze derxîne holê ferqa heyî em ê çawa derxînin holê? Mirovê lanetkirî kiye?

Fu.: Mirovê lanetkirî yê ku ji hemû aliyan ve berjewendiyên xwe yên takî girtiye dest, ti nirxekî nasnake…

---.: Em ji kesayetiyê heta dawî ketîbûna pergalê dijî re dibêjin.

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Li vê derê ji hemû aliyan ve ji bilindbûnekê re bersiv dide?

Fu.: Raste Serokê min.

---.: Ew fikra geş wisa pêşdikeve? Çiye xwedayê wê demê, hema bêje ew bi xwedê ve zeliqiye.

Fu.: Mirov karîbûye bibe xwuda.

---.: Teqez bûyera bilindbûnê jiya ye. Heta dawî perteka wî li beramberî nirxên madî heye, bi awayekî awarte manewiyatê diparêze. Dest ji hemû tiştên cihanî berdide yan jî li beramberî jiyana ketî ya madî heta dawî girêdayî rêgeza manewiye.

Fu.: Ji bo rêgez heta dawî bi sebir xebatê dimeşîne.

---.: Rêgeza çi?

Fu.: Rêgeza bilindkirina mirovatiyê! Ji ber ku mirov, ji tiştên ku ayîdî mirovan qut bûye.

---.: Weke Xirîstiyanekî, divê ku tu bizanê kîja rêgeze. Wekî din Xirîstiyan di nav we de hene?

Nu.: Serokê min ji bo Hz. Îsa rêgeza sereke mirove.

---.: Çî mirov?

Nu.: Di wateyekî de yên ku bilindiya mirov esas digre, ji hemû aliyanên wê esas digre. Mînak, ji hewariyên xwe re dikare bêje, “ger hûn min rast bişopînin hûn jî dikarin weke min bikin”

---.: Çiye ya ku Îsa dixwaze bike, dixwaze çi bike?

Nu.: Di serî de ya ku dixwaze bike eve; pergala heyî ji binî ve dihejîne, yanî li dijberî pergalê ye.

---.: Çî pergalê?

Nu.: Pergal bi hîle û gunehan dagirtiye Serokê min. Pergaleke gunehbare, hemû corê ji rê derketinê di nava wê pergalê de heye.

---.: Ya ku tu dibêjî yozbûn çiye? Dizektî heye?

Nu.: Dizektî heye Serokê min, heta dawî bê exlaqî heye, xesp heye, dagirkerî di wê demê de pir belave, yanî yên bi hêz yên bê hêz di eciqînin. Li beramberî tiştên wisa çalakiya dimeşîne van hedef digre.

---.: Wê demê çima Metropolît em û ew danberhev?

Nu.: Aliyê herî zêde dişibe hev ku ez dibînim eve Serokê min; nirxê ku ji mirov re tê dayîn û ji bo mirov hewldaneke zêde, dilnizmî, fedakarî pêşbîniyeke kûre. Dema ku ji van aliyên dişibin hev tevdigerim dikarim bi asayî bêjim hûn pir nêzîkî Hz. Îsa ne.

---.: Bi hişmendiya wî te ew fêm dikir?

Nu.: Belê Serokê min.

---.: Beriya ku em bêjin wî got. Belê, di rastiya gelên Rojhilata Navîn de gelek rewşên lanetkirî yên wisa hene, li beramberî wan derketinên perxemberî hene, ji ber koletiyê belavbûn hene. Gelek eşîret, kabîle û qewm çi bi zorê, çi jî ji bo azadiya xwe derketinên wan hene. Ez vê ji bo vê yekê dibêjim; ger hûn hinekî girêdayî dîroka xwe, rastiya gelane di kûrahiya wan de ev rewş hene.

Tiştên ku em dibêjin di wê demê de jî hene. Emperyalîzma niha, Roma ya cuda ya wê demê ye. Dibe ku emperyalîzm û siyonîzm, ji Roma ya wê demê, Yahûditiya wê demê çil qat xetertire. Li ser serê gelan, rêveberiyên girêdayî emperyalîzmê ku dixin hene. Felsefeya we ya jiyanê heta dawî xistine û felsefeya xwe li ser we serdest kirine. Çavên we ne dîrokê dibînin, ne jî rastiya azadiyê. Nemaze yên me ku dixwazin vê pêvajoyê derbas bikin yan jî perteka wan heye jî hûn tengav dikin. Ecêbe! Em jî dişibin ya kevn. Em bi îfadeyeke ewqas zanistî çalakî lidar dixin, bi dîrokê re bibîrxistinên wisa dike.

Berê mumîn bihêz bûn, niha hûn bi qasî wan jî nikarin bihêz bibin. Hinekî zanistîbûn mijara gotinê ye, ji ber ku hûn wê jî naşopînin ya herî xeter derdikeve holê. Mumînek dikara baş bê rêvebirin, tu dikarî mucahîdekî baş bidî şerkirin, hûn ne nêzîkî wî şêwazî ne jî. Hîzbûlah wê dike, tevgerên Muslumanan vê dikin. Sosyalîzmê hinekî din xwest vê bi zanist bike, ji wê re jî hêza we têrê nake. Nemaze hûn aloz dijîn. Ewqas rexne, mezinbûna tawan hinekî be jî diyar dike li gorî min. Em ê çi navî li yên ewqas bi qusûr bikin, yan jî em çibikin?

Hz. Îsa jî, wê demê dema ku dixwaze ola xwe belav bike, li serê çiyayan ewqas manastir avakirin û ew manastir hêjî dimînin. Hûn diçin, çadireke naylon datînin yan jî weke ku min çîroka şikeftê got hûn di şikeftekê de jî nikarin jiyana xwe rêxistin bikin. Em çawa we mîna camêran bigrin dest? Bawerim ev hêza emperyalîzmê nîşan dide. Li ser we hêza wê ya bîrdozî heta dawî bihêze. Em hewl didin qut bikin, wê demê jî em zehmetiyan dijîn. Gelo çend kesên saxlem ku bi me re bimeşin derketin?

Bila Papa alikariya Sûryaniyan bike, Papa û Metropolîtên wan hene. Min bangewazî kir û got; "bibe alîkar em damezrînin" Me ji Papa re jî agahî şand. Bila nerevin, ez çibikim?

Nu.: Serokê min, bawerim divê mijarê de hinek serlêdanên Metropolît çêbibûn. Di hinek mijaran de nivîsandibû, di encam de ji ber ku ew çalakî nehat rêxistinkirin, dibe ku zêde encam negirtibe, lê li gorî min Rêbertî ya pêwîst bi qasî ji dest hatiye kiriye.

---.: Bêguman, ji te re jî em bangewazî li ser bangewaziyê dikin. Hêza te heye? Ji gelê xwe tê bikare çend kesan di rêya rast de bigre?

Nu.: Dikarim bêjim ku, min nû nû xwe naskir. Yanî ji ber ku ez bi gelek aliyên xwe yên nebes bi qusûr hatim nav PKK'ê…

---.: Di asta gotin de nemîne, nû nû qebûlkirina me heye. .

Nu.: Bi rastî jî ez nû nû nasdikim Serokê min.

---.: Ji ber ku ewqas ji dîrokê, çandê bi şêwazê herî rezîl qutbûn, helandin û çûyîn gunehe. Ji vê çandê bûyîn û nebûn qebûlkirin, xiyaneta herî mezine ji vê çandê re. Madem tu hat, şûna ku tê dev ji xwe berdî, bikevî qet nebe li ber xwe bide! Çandeke mezin heye di holê de, mirov teqez di nava wê de tiştekî dibîne û bi axê ve girê dide. Lê binêrin, hûn hemû wisa ne û beşeke mezin a vana jî wisa ne.

Bifikirin, ez bi tena serê xwe me. Tu kes ji min re nabêje; " bê girêdan"lê ez vê dîrokê, daneheva vê ya çandê dikim meseleyeke mezin a wîjdan. Yê li beramberî me ger şivanekî tiştekî fêm nake be jî, em ê li ser wî qiyametê rakin. Lê hûn, çawa bi asanî devjê ber didin? Waya bi qasî ku hûn dikevin, dikevin. Heyf! Ez vê pirsê pir zêde jî xwe dipirsim; serdestiya bîrdozî heye, pergal bi îblîsî dixebite, lê ya din divê ku mirov jî dîrok û mirovatiyê re çi bêje? Pêwîstî bi mirovê ku vê bi asanî nede

binpêkirin jî heye, ew jî bijareyeke başe. Hûn xwe tînin asta ku nikarin bijîn. Difikirim, em we bi zehmetî didin jiyankirin. Wê kî, we çawa, li ku derê bide jiyankirin? Ger em rastiya mezin fikirandinê û bihîstinê nedin we dê heyf be.

Em çi dijîn Ab? Tu jî ji vî karî berpirsyarî yan jî di pir alozbûna kar de yekî ku rista xwe heye. Tu li pê xwe diherîkînî, yan tê herikandin? Tu sererast dikî, yan jî aloztir dikî? Divê ku bê fêmkirin. Me wê rojê hinek rexneyên xwe kirin. Ji tatmînbûnê em dûrin, hem jî dema ku tu dibêjî; "dixwazim leşkerî bim, ji wê re jî heme" nêzîkatiyên te me tatmîn nakin. Ez niha pê difikirim, gelo tu li ku dera leşkerîbûnê yî? Çiqas fêm kiriye? Ji xwe zarokê gelekî bêbandor, çiqas dikare hêza leşkerî ya serdestan bibîne? Çiqasî dikare ji hêza leşkerî ya gel re bibe bersiv? Gelo dema ku me ewqas peywir dan, em çiqas rasteqîn tevdigerin?

Ne gengaze ku ev pirs me nedin fikirandin. Dibe ku tu belengazekî xwedê bî, ristên wisa ji te re dayîn gelo çiqas rasteqîne? Lê bêyî ku em erkekê jî bidin şandina te dê çiqas bê pejirandin? Tu çiqas nêzîkî bûyîna fermanberekî yî? Dibêjin otoriteya te nîne, tu bi ferdiyeteke pir ji bêbandor re rû bi rû bûyî. Ji ber ku te xwe ji aloziyeke wisa rizgar nekiriye, pergaleke bihêz di dema wê de û di dema ku di tevgerê de nemaşandiye vê dibêjin. Ev di tevgereke artêşê de rewşa wahîm îfade dikin.

Em ê kî bikin leşker? Ya rast dev ji leşkerbûnê berde, ji aliyê manewî ve em ê bilez dijberê pergalê derxin holê. Qewm, civat bi xeteriya tevlîhevbûnê re rû bi rû ye. Teqez pêwîste em bilindbûna tevgera xwe temsîl bikin. Weke yên difikirin, fêm dikin gelo divê em çibikin? Em heta dawî di asta bi we re alîkar bin, gelo wê çi ji destê we bê? Bi min re alîkarî kirin dibe ku meseleyeke basît nebe. Di binê berpirsyariya we de gelek kesên dixapînin derdikevin holê, derewkar derdikevin, yên dixapînin dedikevin û ya ku dibe jî bi min dibe. Bi xêra cêgirên min ên nebes, belengaz û lewaz em darbeyeke xirab nexwin? Xirabek, dikare deh başan bêzar bike.

Mirov neçare ku pirs bike hêza we ya meşê heye? Dibe ku ji ber xatirê hevaltiyê hûn nabêjin; em nikarin li ber xwe bidin" lê raberkirina hêza li ber xwe danê jî giringe. Em ê çibikin? Di mezinkirin û rêkûpêk kirina xebatê de em zehmetiyan dijîn. Heta ez bi hemû hêza xwe li ser we radiwestim. Ger ez nebûma,

kî dizane niha hûn ê ji dest derketibana û çûbûna. Ya ku pêwîste mezinbûna behremendiyên manewî ne, behremendiya rêxistiniye? Dîsa hêza propaganda ye? Hemû jî di nav hev de ne.

Zalimên li beramberî we, ji Fîrewn, generalên Roma yên li beramberî Hz. Îsa, Hz. Mûsa jî xedartirin. Belê Fu. tê çawa nêzîk bibî? Tê bîra min te ber bi tevgerê ve kişandin me gelekî zehmetî jiyan kiribû. Ya rast te dixwest hinek ber bi pergalê ve bişemitî, îsyaneke te ya vî alî jî hebû, hema te dixwest bi îsyanekê dawî lê bîne. Îsyangeriya te jî dihat wateya windakirineke pir ji rêzê, wê jiyana te jî pir ji rêzê ba. Me xwest em rê li vê bigrin. Me çiqasî tu tengav kirî? Armanca me derxistina pêşengekî ji aliyê siyasî leşkerî û manewî yekî bihêze. Bîst sal derbas bû, dîsa jî têrê nake. Em ê çawa ji bin pirsgirêkê van mirovan derkevin? Hêza te heye, hêrs, îdaya te heye? Piştî te ewqas rastî dîtin, qet nebe tiştên ku pêk tên, pêşdikevin tu fêm dikî?

Fu.:

---.: Hûn zehmetiyan dijîn. Hûn nikarin bi îsyangeriyeke ji rêzê îdare bikin? Pergaleke mezin, venêrîneke mezin, taxtîkekî mezin ê rojane li ser vî esasê tê meşandin. Hûn çiqasî hene? Vana yên herî baş hatine perwerdekirinin, lê di îdarekirinê de hûn çiqas zehmetiyan jiyan dikin. KT van guftûgoyan bibihîze wê bêje; “binêre çawa ji binî dernakeve, APO lêpirsîn dike, Fu. biçûk dibe”a rastî rewşeke wisa nîne.

Fu.:Nîne Serokê min.

---.: Lê dixwaze wisa bibîne.

Fu.: Dixwaze wisa bibîne, min jî guftûgo temaşe kirin.

---.: Çima wisa şîrove dike?

Fu.: Bêbiryarî Serokê min…

---.: Weke bêbiryariyê şîrove dike?

Fu.: Belê, zêde nizanin wê çibikin.

---.: Dibêjin, “Çakêt jî ji pişta xwe danayne.” Ecêb! Çima wisa şîrove dike. Ya rast ne wisa ye.

Ab.: Ew mijara biçûkbûnê di pirtûkê de jî hatiye nivîsandin Serokê min.

---.: A rastî em bangewazî ji bo mezinbûneke awarte dikin.

Ab.: Ji navendeke hevbeş derdikevin Serokê min.

---.: Bêguman, eşkereye ku navendeke propagandayê ya hevbeşe, çima ew navend jî wisa şîrove dike? Ya rast hûn ê bêjin neçare wisa ji girseyan re biteyisîne, lê girse jî wisa fêm nake.

Fu.: Serokê min, peyama ku dixwazin bidin; "zilamê tenê" tiştekî wisa ye.

---.: Bêçare bi tena serê xwe…

Fu.: Yanî "rewşa çêkerê wisa ye, bi tena serê xwe nikare bibe" bi vê şêwazê şîrove dike. Bê biryarî jî heye…

---.: Zêde ne bextewere.

Fu.: Hewl dide vê ji raya giştî re biteyisîne.

---.:Watedare, ew bi xwe jî vê pir baş dizane. Dixwaze çêkera lewaz nixaf bike, dixwaze weke çavkaniya bê hêvîbûnê bide diyarkirin.

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Dibêje; "bê APO tu nikarî bifikirî" yanî dibêjin bifikirin û "ji me re baxivin." Lê ew jî bê me nayên fikirandin. Di van gotinan de çiqas belangazin wê diselmînin. Bê me, di serî de ew bi xwe kî dikare bifikire? Şev û rojên wan bi me re ne, deqe bi deqe em di mejiyê wan de ne. Dema ku dibêje, "gelo bê APO hinekî be jî hûn ê bikaribin bifikirin" ya rast bi vê hinekî dixwaze xwe vebêje. Em mîna kabûsê li serin.

Bêguman, dema ku me xwest em şer bikin em tam dikin. Ji şerkeriya xwe gumana min nîne. Rewşa min pir cuda ye. Rawestandina min ne gengaze. Ew bi xwe jî vê pir baş dizanin û ji xwe derketiye holê. Em dixwazin lêkolîn bikin bê ka em ê bikarin we jî bixin nava vê herikînê yan na. Dibêjim hineka bixim nava vê herîkîne, dibe ku gelekî rê li ber encamên baş veke. Yên ku vî şansî nenirxînin dê ji wan re pir heyf be. Ji ber ku taybetmendiya sereke ya ku dijmin bikuje, derfeta herikînê, hêza herikîn û taybetmendiyên herîkînê ne û me ev jî da.

Te kaset temaşe kirin? Me ev çîroka herikînê ya dawî pir baş xêz kir û nîqaş kir, hemû dîtin. Hûn dibin camêrên li gorî pergalê betonkirî. Yanî dijmin dixwaze wisa bibîne, lê em qebûl nakin. Dixwaze bêje matmayî ye, dibe ku, "di rewşa matmayî de be, nikare çakêtê xwe jî derxe" waya hêza xwe hesab dike, min ticarî dijmin biçûk nedîtiye. Tu kesê bi qasî min dijmin nirxandibe û li gorî wê gav avêtiye nîne. Ji xwe ev ji bo têkoşînê

jî merce. Yên ku bê dijmin hesab bikin û gav davêjin, yên ku xwe li berçav derbas nakin û gav davêjin camêrên wisa bi felaketê re rû bi rû dimînin. Em çi bikin? Em bi giranî bi hevdu rexnekirinê re rû bi rû ne.

Ab.: Wisaye Serokê min.

---.: Wê çibibe? Ji bo pêdiviya vê em bikin, em ê çi bikin?

Ab.: Em ê hewl bidin xwe bighînin çareseriyê Serokê min.

---.: Aliyê gelekan ji wan ên ku xwe dide dest çiye? Vana dixwazin birevin çi? Tawanbariyên wan di derbarê çi de ne?

Ab.: Taybetmendiyên ku ji pergalê hatine girtine Serokê min. Piraniya wan ên ku bi vê nêvengê re naguncin. Ya din jî kesayetiya ku dixwaze li gorî rewşa xwe kar bike derdikeve holê. Yanî ji pir zêde taybetmendiyên xwe yên takekesî, şêwazê xwe bi şêwazên cuda be jî dibe karê domdarikirinê. Ji têkoşînkirinê zêdetir, wê bi şêwazê xwe, çalakiya bi taybetmendiyên xwe meşandinê diyarker dibe.

---.: Ev rexne wê wan ber bi ku derê ve bibe? Ji ber ku tawanbarî zêde dibin, çiqas zêde dibin alozî jî pêşdikeve, damezrandineke artêşeke mezin jî nayê vê.

Ab.: Hevgirtina taybetmendiyên hevbeş pêşdixe. Nîqaş jî bêtir vekirina van rewşên takekesî, di derbarê pêşxistina hevbeşî û ji hev re nêzîkbûnê ne. Ji xwe wisa be dê wateyeke xwe hebe. Lê ger wisa neyê fêmkirin, yên wisa fêm nekin di demên piştre dikarin neyênîtir derkevin, lê bi giştî ne wisa ye.

---.: Rewşa munafiqiyê çiqas heye? Asta sîxwuriya dijmin a objektîf çiqase?

Ab.: Di nava jiyana pêşketî, teqezbûyî, kûrbûyî de gelekî derdikevin holê Serokê min. Bi şêwazên çors jî dernakeve, ger jiyana şoreşgerî bê kûrkirin di wir de rewş bêtir derdikeve holê. Gelek hene. Ji xwe pergal camêrê ku bi xwe pêgihandiye ji ber ku baş nasdike bangewazî li ser bangewaziyê dike, ji ber lewaziyan zane ewqas berxwedanî ji wir tê. Ewqas berxwedanî bi xwe re dîtina dijmin hinekî jî xwe dispêre vê.

---.: Bangewaziya, “paşde bizîvirin”dikin, ewqas ne girînge, divê ku mirov asta hatina pergalê û asta pîvanê çavdêrî bike, asta azadiyê çavdêrî bike. Divê ku mirov asta biryardariya ku ji vir bê derxistin çavdêrî bike. Ez ê ji mirovê her tim şiyaket

dike, her tim tawanbar dike guman bikim. Bi qasî ku yên rexne nakin, bi taybet jî yên ku rexne dikin alternatîfa wê nîşan nadin jî tawanbarin. Biqasî rexnekirinê divê alternatîfa wê jî mirov deyne holê. Beşek ji van a mezin, ji min re wisa tê ketina pêşbirka xirabiyê. Qusûran pir zêde dibînin, lê ne bawerim ji bo kesayetiyên xwe derbas bikin ewqas ked didin û ev jî taximê tawanbarkerên pergalê yên kevn dixin bîra min. Ev rexne dibin bi şêwazekî cuda dayîna axaftina pergalê. Herî kêm neçarin bidin derbaskirin. Li gorî te ez ji kîja mijarê ronî bikim?

Ab.: Ev rexne, nîqaş pêwîste rê li çi vebikin dikare bê gotin Serokê min.

---.: Dibêjim, rexne, nîqaş ger alternatîfa xwe, çareseriya xwe deyne holê bi wate ye. Berevajî mafê tu kesî ya rexnekirinê nîne. Ger rexne hene, pewîste hemû jî xwe bighînin hêza çareseriyê. Yên ku rexne dikin, tawanbar dikin ger ne namerdin, ne derewkerin, ne lafazanin, di serî de jî ew bi xwe divê ku çareseriyê tam deynin pêşiya rêxistinê. Ez jî rexneyên mezin dikim, lê ya rast jî datînim holê. Çareserî, fersend û derfetê wê pir zêde datînim holê.

Divê ku cewher bi biryar be, hatina pergalê û girtina berpirsyariyê, bi îda be. Pêwîste xwe gihandina xala; "cihanê jî bidin min, ez ê bi vê rêyê neguherim" pêşkeve. Ger ez li biryargeheke leşkerî bûma, di serî de hevalê Ab. minê lêpirsîn kûr kiribaya. Lê ez di asta Rêbertiya stratejîk de tiştên ku ji we re bên gotin dibêjim, hem jî ji bo we hemûyan dibêjim. Lê hûn çiqasî jê re dibin bersiv nediyare. Ger biryargeheke leşkerî ya şênber be, yên ku tên gotin me dikarî em heta rêziknameyê jî biteyisînin. Ew dibe peywira hinekî din, lê qet haya we ji tiştekî nîne.

Mînak, hûn di lêpirsîna leşkerî re tên derbaskirin. Divê ku tevgerînên leşkerî di asta ku têra dijmin bike de raber bikin. Bi şoreşgeriyeke têqûz, ew ast bi xetên sereke bi temamî ger bên dayîn, pêwîste bigrin yan jî li gorî heta niha yên ku me dane divê ku her yek ji wan hatibana vê. Ez dibêjim, divê wateyê de; "em ne bê çare ne."

Her çiqas dijmin dixwaze wisa bi teyîsîne jî, tê zanîn ku em çareya mezinin. Lewaziyên we me gelekî hêrs dikin û dibin zemînê hesab li ser kirina dijmin. Min derfetê hesab kirinê neda dijmin, hemû hesabên wan têk da. Min ev jî nîşanî we da, lê

jiyaneke we ya wisa heye ku, xayîn li ser hesaban dikin, faşîst hesaban dikin. Divê kesayetî wisa be ku, di nava hesab-kîtaba dijmin de bi cîh nebe, parçe parçe bike.

Pirgirêka me ne ya qewmê lanetkirî, tayfeyê ketiya ye, teqez di asta hatina pergala artêşê de ye. Em xelet fêm nekin; eşkereye ku gel tê pergalê, gel ji we zêdetir pêdiviya yên ku tên gotin pêk tîne. Qet pêwîstî bi netebitîbûnê nîne. Pêwîstî bi derbazkirina sînorê xwe nîne, nezaniyê û pîvan nenasînê nîne. Hûn ê bi pergal bikin, ev di dereceya yekem de pêwîstiya berpirsyariya we ye.

Em çawa bibin alîkar? Hinek heval mabûn, em di derbarê wan de çi bêjin?

Ab.: Rexnekirina hinek hevalan hatibû xwestin.

---.: Li gorî min hûn jî dixwazin.

Ab.: Serokê min rexne-rexnedayîn nehat dayîn?

---.: Rexneyên ku min di derbarê we de pêşxistin, her çiqas di asta giştî jî de bin, bêguman hûn neçarin encam jê derxin.

Ab.: Ne ku rexneyên we kêm bûn Serokê min, hevalan xwe rexnekirin û gotin me weke pêwîst rexne nekir, em fedyok tevgerîn. Êdî nêzîkatiyeke wisa dê neyê raberkirin.

---.: Mesele rexneyên di derbarê te de em dikarin berfirehtir bikin. Ger te fêm nekiribe, bi taybetî di hinek xalên sereke de, dema ku berê xwe dide arasteyeke leşkerî...

Ab.: Raste Serokê min, vê fêda xwe hebe.

---.: Waye ger ya pêwîst tu nekî wê gihana te derkeve. Vaye tu dema borî jî kehir bûyî, vê carê jî tu bê pirs-pirsyarî kehir dibî. Ketina ser rêya leşkerî bi serdeçûneke ji rêzê nabe. Ji nû ve bêrê xwe dana qada leşkerî ji rêzê nayê destgirtin. Li wê derê pratîkeke pir mezin, PKK' yeke mezin, kedên mezin û xebat hene. Wisa li gorî kêfa xwe hûn nikarin bikin. Uslûbê ferdî, hinek uslûbên ku we heta niha şayan dît, qala nêzîkatiyên wisa jî nayê kirin. Tê ji dehşeta wê jî bihejî. Ger tu dixwazî camêrekî ji xwe çêkî, tê li vana dîqat bikî. Weke ku gelekî tê gotin, "wê kurê min bixwîne, bibe zilam, an jî ker" ger tu naxwazî bibî yekî wisa, tu neçarî rastiyan bibînî.

Ş. seranser ma, em hinekî din kûrbûnê pê bidin qezenckirin? Ger gotin fêm nekiribe divê ku serê wî bê şikandin.

Fu.: Piştî wê demê dixwaze berfireh rexne bike.

---.: Bila rexne bikin. Lê yên ku me gotin bi naverok bûn. Ger na hinek nebesiyên ku ji vê pergalê qutkiriye têrkerî hesab bike û dê xafîlene bimeşe, wê qet qetî bibe; nezan hatiye wê nezan biçe. Wê bi gewjî bi xwe bilîze û tine bibe. Qaşo xwendiye, rewşenbîre! Qaşo rastî jî jiyankiriye! Ger bi aqil nabe, bi wêrek nabe em çibikin?

Ger tiştên ku dizane bi şêwazekî înadger ferz bike, wê bibe begê taxekê. Tu kes began nade jiyankirin. Di nava xeta PKK'ê de yên herî ji xwe bawer jî diceribînin, hebûn û nebûna wan dibe yek. Yên ku uslûbê KT'yê girtine, ên ku uslûbê axa û began girtine di nav me de nikarin li ber xwe bidin. Yên herî mezin jî li ber xwe nedan, ew ê çawa li ber xwe bide? Yan jî dema ku dixwaze bi demagojî veke, yên herî ji xwe bawer tiştek nekirin, ew ê çawa bike? Yanî ji pêkanîna pêdiviya kar wêdetir ti çareyeke wî ya din nîne. Ji yekî bi aqil re di hemû dewrê de yên ku hatin dayîn heta dawî têr dike. Em dibêjin bi aqile, ger xwe nezanekî wan erdaye, ji xwe mayîna wî li vir dûraqile, çûyîna wî jî ji xwe dê di demeke kurt de wî bibe. Yên ku hatine vê astê, ji daxwazên aqil û dil bersivdayîna wan mercê yekeme. Berevajî dê bên û biçin.

Em çend kesan rakin, kî heye? Ke. tu hîn nexweşî? Nexweşiya ruhî ye, nexweşiya fikriye, yan jî fizîkî?

Ke.: Na Serokê min, nexweşiya min a fîzîk nîne.

---.: Bermahiyê komê, tesadufî dijî. Mirov dema ku li te dinêre, di mijara ku tê bijî ango nejî de dikeve nava fikaran. Em dikarin sivîl bişînin, gelo wê bikare xwe bike leşker? Bi hostayî, veşirtî yan jî bi giştî tê bikarî weke mîlîtanekî bijî? Ewqas tiştên ku partiyê dane hene, tu çi qasî dikarî pêk bînî? Ez çi bikim? Ji dê û bavê xwe nebes ji dayik bûye yan jî ji malbatê tiştek negirtiye, hejar hatiye mezinkirin. Dibe ku pergalê ew wisa mîna miyeke belengaz lêkiriye. Ji bo bikim îsyangerekî mezin gelekî pê re mijûl bûm. Nizane lêde, çena wî hatiye belavkirin ez çi bikim? Wê çawa bijî? Em kesekî bi perwerdê encax ewqas dikarin ji şer re amade bikin. Rastiya te li beramberî dijmin dikare çi bike?

Ke.: Serokê min, ez ê hewl bidin bersiva kedên ku partiyê di ber min de daye bidim.

---.: Ev teqeze, dibe ku tu ji bo patiyê bijî, lê tê çiqasî bikarî bijî ango nejî girînge. Dîsa dema ku dijî tê çiqas bikarî şer

bike girînge. Dîsa dema ku tu şer dikî tê bikujî, ango bê kuştin girînge. Ger na tu di nava rêya rast de rêwiyekî, dikare bêgotin tê ji vê rêyê dernekevî, temenê te çend bû?

Ke.: 22 Serokê min.

---.: Tê çawa şer bikî? Tu mercên derketina çiyê dizanî? Tê bikarî hinekî xwe veşirtî bidî jiyankirin, qûrnaziyên te hene?

Ke.: Serokê min, hinekî heye, dibe ku ji derve re cuda teyisîbe.

---.: Mesele dema ku tu çû gêrîla, tê bikarî xwe weke hêzeke şoreşger derbixî holê? Di mijara bi asanî tasfiyenebûnê de tu ji xwe bawerî?

Ke.: Serokê min, di derbarê ku ez ê xwe nedim tasfiyekirin baweriya min heye.

---.: Lê yê din pir baş soz dan, li wir bi şêwazekî qet me hêvî nedikir hatin tasfiyekirin, hem jî bi şêwazekî pir trajîk û bê çare. A rastî divê ne ewqas bûya. Te dît tu nikarî di rêyekê de bimeşî, rêyên cuda bêne bîra xwe, te dît tu leşkerî naçî, sîvîl bikevê; te dît tu nikarî bi çek biçî, bê çek biçe.

Ke.: Ji bo nekevim van kêmasiyan ez ê dîqat bikim.

---.: Ma tu bi hêrsî?

Ke.: Belê Serokê min.

---.: Bi rastî tu çi dixwazî, kelecana serkeftina hinek tiştan bi qasî tê xwestin heye?

Ke.: Belê Serokê min.

---.: Ger tu pir bêhêzî em te neşînin.

Ke.: Serokê min, her tiştên ku diviya Partî bide bi derfetan da. Ji niha û şûn ve dora bersiva kedên ku hatine kirin dayînê ye.

---.: Ji bo bersiva kedê bê dayîn, heta ji bo ku tu şansê jiyanê ji xwe re bidî, divê ku berî her tiştî tu li xwe miqate bî. Hemû behremendiyên xwe rakî ser piyan. Tu di hewaya xortiniyê de yî, lê mirov li beramberî rewşa te xemgîn dibe. Ji ber ku yên wisa pir çûn, tiştek nekirin. Ger tu nikarî tiştekî bikî, şexsê xwe biparêze. Lê çûn, bêy ku fêm bikin dijmin ji ku derê ve tê hatin kuştin. Ya rast ev ne çarenûsek bû, bijareyeke din hebû. We xelet cesaret girtiye, xelet fedakarî kiriye yan jî we fedakarî xelet nirxandiye. Partî, rastiya herî bi aqil a xwe dayîna jiyankirinê

îfade dike, ya bi asanî nayê tepisandin, ya herî asan bin nakeve îfade dike. Şayanî keda partiyê bûyîn eve.

Kesî ku di derbarê heval de bixwaze tiştekî cuda bêje heye?

Ab.: Ji xwe heval wê ji niha û şûn ve di pratîkê de be, hinekî bixebite. Ji qadeke perwerdê ya wisa, ji qadeke ku her tişt tê de dê hilberîn ji vê zêdetir fêm kirina wî ne gengaze. Dikare bikeve nava xebata ji bo wê tê pêşbînîkirin. Ger bê şansiyek nebe…

---.: Kes bi zorê nabêje nebe leşker. Li gorî cihê her tişt dikare bê kirin. Kesyetiyeke têqûz a pêgîştî pêwîste. Li gorî cîh propagandagerî, li gorî cih rêxistingerî, li gorî cih grûpgerî, li gorî cîh çalakgerî, li gorî cîh li bajêr kar dike, li gorî cîh di çiyê de kar dike. Tu kes teqez talîmat nade. Em qadeke pir berfireh a însiyatîfê dihêlin. Wekî din çi dikare bê gotin? Hema bêje hemû tiştên ku bê gotin me pir zêde got.

Ab.: Raste Serokê min.

---.: Ger pêwîst kir ji nû ve rexne bikin, biryar bigrin. Ya ku bêjim min gotiye. Ji bo te wekî din çi heye?

Ke.: Serokê min, ya pêwîst hatiye gotin, ya girîng fêmkirin û ne fêmkirina me ye.

---.: Belê, lê ji bo fêmkirin jî divê ku mirov hemû tiştên xwe dane holê. Azadiya we ya nefêmkirinê nabe, fêmkirin û azadiya we ya nekirinê nabe. Di vê mijarê de tu bawerî, tu ji xwe bawerî?

Ke.: Belê Serokê min.

---.: Wekî din kî heye? Çe. Li ku derê ye? îhtîmaleke mezin wê sibê biçe. Di derbarê rewşa wî de difikirim, bi taybet piştî ku min ew rapor xwend û şûn ve pir zêde difikirim. Weke Almanekî çi temsîl dike, kîja Almanî temsîl dike min hewl da wî fêm bikim. Jiyana wî jî bi qasî ku nivîsîbû min hewl da fêm bikim. Ya ku herî zêde min difikirîne, ew di cîh de pênasekirine.

Ji dema berê zêdetir ketiye rewşeke bi bertek, gilîkere. Ez naxwazim weke Almanekî, heta weke Ewrûpiyekî darizînim; evê bibe bê mafîyeke mezin. Lê weke şoreşgerekî li pê armancên şoreşger dibeze ev rewş zelal nekirin jî ne gengaze. Yanî weke kesekî ji parzemînekê ber bi parzemîna din beziye û dîsa ber bi

Ewrûpayeke ji mêj ve ji şoreşan re hatiye girtin hinekî xemgîn dike.

Ya rast gelek tiştên ku bên darizandin hene, ew jî dema ku jiyana xwe bi ya me re qeyas dike jiyaneke wî ya ku dibêje, “min nekarî devjê berdim” heye, em jê re rêzdarin. Yanî di nava xwe de lihevkiriye jî û piştî ku jiyana me dibîne, ketina nava hêrseke mezin a wî jî di cîh de dibînim. Dema ku bi rê dikeve jî di niyeta xwe de tiştên ku dibihîze nirxeke mezin didim, difikirim ku ev rewş jênereve. Ji bo wê min zêde nedixwest we re.

Hinek Ewrûpî, heta ji qadên navnetewî ji bo serdanê dihatin, ji bo çend rojan pêşwazîkirina wan ji bo min gengaze û watedare. Ger ew bi xwe jî wisa hatiba minê bi asanî ew pêşwazîkiriba, rewşên ku hatin jiyîn dê derneketana holê. Cesaret kiriye, gaveke pir pêş avêtiye. Lê bawerim bi hinek tawanbariyên gelek giran, dixwaze xwe ji nav hinek pêvajoyên ku ketiye nav rizgar bike.

Dikarim bêjim ji hemû aliyan ve di rexnê xwe de mafdare. Bi taybetî jî rêveberiya me ya ku zêde nikare çêkera xwe perwerde bike her roj ez jî pir zêde rexne dikim. Ew qusûreke me ya giştiye. Ji xwe em xwe bigihînin asta têrker a xwe rêvebirinê wê gelek tişt bên çareserkirin. Ev mijûlbûna mezin ji bo xwe gihandina vê astê ye. Bi rastî jî ez nêzîkî sî salane ji bo pêşxistina vê asta rêveberiyê mijûl dibim. Nemaze nedîtina wî ya rêveberiyeke watedar, nedayîna xebitandina wî nebesiyeke mezine û li cihekî rewşa heyî jênereve.

Di pêwendiyên Alman-Tirkan de, bi taybetî jî di pêwendiyên leşkerî de nêzîkatiyek heye. Yanî gelek Alman, hewl dane Tirkan perwerde û araste bikin. Ji Moltke (Serokê dijî tevgera Naziyan)heta roja me ya îro bi hezaran di asta herî jor de xebitîne. Heta di pêşketina mîlîtarîzm, siyaset û aboriya Tirkan de para Almanan kêm nîne. Niha Ç. bi xwe li ser navê şoreşê tê, lê şoreşeke Kurdistanê heye, divê ku pêşwext fêm kiriba pirsgirêka vesazî û perwerdê heye; baş bizaniba nehatiye şoreşeke amade, wê şoreşeke amade nebîne. Mîna Almanên dozger ên fermî weke ku bi vê armancê hatin, niha baştir tê fêmkirin ku di nava nebesiyeke taktîkî de ye.

Diviya bû ku bêje, pirsgirêkên gelekî yan jî yên şoreşgerên wî yên perwerde, vesaziyê, rêveberiyê beriya her tiştî

tê û nêzîkatiyeke wisa raber kiriba, ne li benda karekî bi watebûya, dîsa ne li benda rêveberiyeke li gorî hişmendiyê guncav bûya, yek ser ev fêm kiriba, ji bo nekeve rewşa niha girîng bû.

Ez ê nebêjim ev pêvajoya ku jiya hemû vala çû, teqez wê di jiyana wî de bandoreke xwe ya kûr hebe. Dixwazim bal bikşînim ser hinek xalên xeter. Rastiya Ewrûpa, di vê navberê de pêwîste careke din rastiya Almanya rast fêm bike, hesabpirsîna xwe hinekî li ser vî esasî bike. Tirsa min, bi nerîneke emperyalîst seqetkirina vê ye. Weke ku dizane rexneyên mezin hene, ti rexne feraseta serdest a Ewrûpa, bêtirî xwe jî ya Almanya derbas nekiriye. Rexneya wî jî, di tehlîla dawî de ji hinekî din pêşxistina serdestiyê ye û wisa texmîn dikim ku, bêtir pêşxistina serdestiya nerîn û jiyana çavkaniya xwe ji Ewrûpa digre re mijûl dibe.

Ev feraseta serdestiyê ger ew ne di ferqê de be jî dibe ku bandora xwe li ser kiribe. Ferasetên serdestiyê bi asanî nayên terikandin. Naxwazim bêjim îlehî xirabe, ji xwe ew bi xwe jî dibêje; “ez nikarin dev ji jiyana xwe berdim, serdestiya jiyanê vekiriye.” Terikandina wê jê re mîna tiştekî weke întîharê dibe. Nemaze yê li beramberî wî gelekî tê çewsandine, dîsa dema ku ji bo kedkaran difikire divê ku pir baldar be. Li Ewrûpa, di Almanya de weke şoreşger mayîn gelek zehmete. Li dijberî şoreşa cihanê, bi taybet jî dijberî sosyalîzmê rastiya herî zêde bêxweşbînî, ya herî di jor de lêdinere îfade dike.

Di derbarê enternasyonalîzmê de jî hinek gumanên wî hene. Bi taybet; “enternasyonalîzm, weke ehmeqtiya Ewrûpa” nirxandin heye. Nerîna me ji enternasyonalîzmê re, bi temamî ne netewî, di çarçoveya mirovî de ye. Em dikarin bêjin taybetmendiyên herî mirovî heta dawî em jiyan dikin. Ger fêm dike, em feraseta di olan de mînak didin. Ger ew bi xwe Xirîstiyane em qala feraseteke mîna ya Îsa ya mirovî dikin. Enternasyonalîzma me eve. Piştî ku tu bû Partî û şûn ve netew, heta çîn jî wateya xwe ji dest dide, em weke xwe dibînin.

Enternasyonalîstbûna yekî Ewrûpî di vê qonaxê de gelekî zehmete. Bi vê naxwazim bêjim; “ji gelên çewsêner bêtir kesên enternasyonalîst derdikevin.” Na! Ew zêdetir paşkatîne, zehmetire, di vê qonaxê de ji bo herdu aliyan jî zehmete. Lê dîsa jî em nirxeke mezin didin mirovatiyê, humanîzmê. Mesele tevî ez

bi xwe ji gelekî pir başketî me jî, niha ji ber ku di asta Rêbertiyekî de me, em devjê ber din xwe di nav serdestiyê de dîtin, ger şermeke mezin bibihîzim, ez ê bêjim çi bextewer im. Lê dema ku mirovên dervî xwe jî dadirizînim, çiqas bela li ser serê mirovatiyê barandine, dixwazim hesabê hemûyan jî bipirsim.

Di wateyekê de jî Ewrûpayiyekî feraseta xwe ya jiyana serdest heyî gelekî bêşans dibînim. Ji ber ku ji bo mirovatiyê di vê qonaxê de ne di rewşeke zêde bên parastin de ne. Tevî hemû paşverûtiyên min, ez ji hemû corê tevlîbûnê re heme. Dibe ku sebir û tehamula min hebe, lê ya wan pir zehmete.

Vê tenê ne ji bo wî, ji bo hevalên me yên ku dibinê bandora Almanya, jiyana Ewrûpa, heta di binê bandora jiyana burjuvaziya Tirkan de mane jî dibêjim. Em pirsgirêka herî mezin ji destê van dikşînin. Nikarim wan bikşînim nav jiyaneke mirovî, humanîst. Ji bilindbûnê bawer dikim, lê dijberî feraseteke wisa ya bilindbûnê me jî. Bi min re feraseteke enternasyonalîst heye.

Dibe ku bi xwe îsyan kiribe û gotibe; “ez zêde fêm nekirim.” Ne wisa ye, dibe ku bi qasî ew pê nefikiriye min hewl da ez wî fêm bikim. Zêde tiştek ji destê min nayê. Yanî ez ê bêjim sax selamet ew gihandina cihê wî, dibe ku wê jî cuda pêşwazî bike. Dema ku çû bila jiyanê ji nû ve binirxîne, lêpirsînê bijî. Ger gengaze bila qet bi me re eleqedar jî nebe. Ger dibêje îlehî mijûl bibim, bila fêmkirina rastiyan pir alî jî bizane.

Bi me re eleqedar bûn, bi me re mijûlbûn heta dawî trajîke. Bi vê rewşa xwe weke kes ne xwazyarê kişandina wî ya vê êşê me. Ger bikare xwe kom bike îdayên wî hene, armancê wî hene, ger bikare wate bide wê û îlehî dê bi me re di nava piştevaniyê de be, ji pîvanên vê re jî bi pîlan xwe bidê, dîsa jî me qebûle. Em çiqasî jî bi hevrêtî bi hev re jiyanê bixwazin jî, ji vê re hêz anîn pir zehmete.

Dîsa jî divê hêviya xwe qut neke, wekî din baweriya me bi me heye. Îdaya me ya karên baş kirinê mijara gotinê ye. Em wisa bawer dikin ku, di demeke herî nêz de em ê bikarin Şoreşeke Kurdistanê ya rêkûpêk kirî bafirînin û ger tiştek ji wî neyê jî hêvîdarim bibîne. Wê demê pêşwazîkirin dê watedartir be, ger bixwaze rist bilîze, dê di asta serkeftî de rist lîstin be.

Bi xetên giştî yên ku ez jê re bêjim evin, dibe ku rexneyên hevalan jî hebin, yê wî bi xwe jî hebin, em dikarin guhdar bikin.

Çe.: Min rexnedayîneke çar rûpelî amade kir, ger guncaw bê dîtin dikarim vê bixwînim. Ev gotinên di rexnedayîna min de pir pê fikirîm û min nivîsand, hem jî bi şêwazekî binamûs min hewl da deynim holê.

---.: Tu dikarî cewherê wê bêje, ez ê fêm bikim. Dikarî bixwîne jî, ji bo min ne pirsgirêke. Ya rast ji van rexneyên min re bersiveke şênber bide, ji aliyê wî ve dê sûdmendtir be. Ji ber ku beriya ez baxivim rapora xwe nivîsîbû. Vê bihêle paşê, zêdetir qebûla me ye û wê berhemdartir be.

Çe.: Xwendina rexnedayîna min ji bo min dê sûdmendtir be.

---.: Ya rast her kes rexnedayîna xwe dide. Dikarin nivîskî jî pêşkêş bikin, lê guftûgo dibe ku hilberênertir be. Tu dikarî cewherê wê bînî ziman, di heman demê de xalên ku zelal nebûne jî bipirse. Em hinekî tevgereke bê mantiqiyê jiyan dikine, fêm kirina mantiqê me gelek zehmete. Ez dixwazim vê ji re bêjim. Ger tu asta mantiqê Almana fêm nekî, tê yî biçî di derbarê min de çi dibêjin, bi çavê Almanekî bibînî.

Ji bo me çi dibêjin?

A.: Diktator, terorîst.

---.: Stalînîst.

A.: Stalînîst, Ortodoks.

---.: Ya rast hemû tên gotin, nikare bê gotin ku ev pênaseyeke zelale. Liyaqdîtinên neteweperest, olî hene. Ji ber ku rewşa me ya ku di çarçoveyekê de bicîh bikin nîne. Ji xwe zehmetiyên ku dijî jî ji ber vê sedemê ne. Ev, tenê ne pirsgirêka wî ye, rewşeke giştiye. Ev rewşa şêtî ji bo me jî derbasdare. Ji xwe em hişmendiya kenveşop ser û bin dikin, ew bi xwe jî rastiya vê afirêneriyê dibîne ya rast. Gelê me gelekî şêt bûye, ya rast hatiye şêtkirin. Û em jî dahûrîna şêtîtiyê dikin. Tengevbûna wî bi vî alî ve wê pir balkêş be.

Dibe ku di dîroka Almanan de jî qonaxên wisa çêbûbin, ji ber ku min nexwediye nizanim. Pirtûkeke Erasmûs a bi navê; “pesindana şêtiyê”heye. Her wiha, asta me ya mantiq ser û bin dike, pergala wan a mantiq di gel hev de jiyankirinê pir zehmete. Tu di navbera herdu mantiqan de di eciqî, tu dikarî xwe bizanî. Di heman demê de ev xwezaya kare. Ji ber ku ji gelê me re jî gotin; “tu ne gelekî, tu ne dîrokekî, tu ne mirovekî asayî yî” û hukmê

îdamê jê re dan. Ev nirxdarazî tenê ne weke daraz, ya din jî di hinavê de tê bicîhkirin. Ev weke şêwazê jiyanê lê hatiye kirin. Ev rewşeke pêkhatiye. Nemaze rewşa ku em dijîn rewşeke îstîsnayî û cuda ye. Lê ji ber polîtîkaya ku tê pêkanîn realîteyek e.

Bi vê hişmendiya wî ya heyî tevlîbûna wî ji vê re dê bi îşkence be. Ez wan yan jî Almanan tine hesab nakim yan jî “weke dijmin dibînin”bila bi vî şêwazî fêm neke, nêzîkatiyeke wisa nîne. Di navbera cihanan de kendal mezine. Ji bo girtinê jî divê ku di jiyana xwe de dûredest bike. Pêwîste hinek rewş wisa bê dîtin. Hurmeta min jê re heye, ji ber ku hewl daye bibe PKK’yî yek. Karekî pir zehmete. Nabêjim nikare bibe, lê di nav me de şerekî partîbûnê yê pir mezin heye. Vaye ev taybetmendiya wî, dikare bi partîbûyîneke rê li pêşiya pêvajoya li navbirinê pêk bîne û divê bi vê ferasetê pêşwazî bike.

Weke min got, partiya pêşeng a rastiya civakî ku hatiye şêtkirin yan jî em berandamê partiya herî bi aqilin. Ji ber ku şerê mezin mantiq dixwaze. Ji bo ku tevlî têkoşîna ku ez dimeşînim bibin, ya rast ez bangewazî li ti hevalan nakim. Vaye vana hevalên bîst salane. Dema ku partîbûna wan jî destnîşan dikim, xemgîniya ku ji wî re dibêjim dibihîzim. Vaye rewşa wan di holê de ye, pir tengav dibin. Li gorî xwezaya kar bawerim me xwest em hinekî xwe vebêjin.

Çe.:Ger min pêşwext het tişt zelal kiriba, bi tevlîbûnê re ev pirsgirêk nedigihîştin vê astê.

---.: Temam di van tiştên ku te diyar kirin de, tevlî te dibim.

Çe.: Dixwazim pirseke wisa araste bikim, dema ku çûm Almanya ez ê bi vê pirsê re rû bi rû bibim; hevalên min ên Alman wê ji min bipirsin; “te sal û nîvekê li wir çi dît, çi jiyan kir û tu çûyîna wir pêşniyar dikî” wê wisa bipirsin.

---.: Me hewl da em nihekî bersiv bidin wê. Beriya her tiştî divê cudabûna mantiqê me bê diyarkiririn. Ger pirsê bi şêwazê; “divê em vî gelî, van camêran çawa nasbikin” bipirsin wê rastir be. Ger ji xwe bawerin ku me baş nasdikin, bila wê demê daxwaza tevlîbûnê bidin diyarkirin. Ji vê re ev bersiv dikare bê dayîn. Bila despêkê bêjin: “em nasbikin” ger wê hêzê bi xwe re dibînin hemû corî alîkariyê dikarin bixwazin. Bila rêxistin ava bikin yan jî hinek derfetan derxin holê.

Di van xisûsan de bila xwe bi xwe biryar bidin, ger pêwîst kir bişêwirin. Ger ez sax bim, dikarin heta gel min jî bên. Lê bi rastî ji divê gelek bi sebir bin, heta jiyankirina Hz. Îsa jî divê bigrin berçavê xwe. Li wir jiyana madî, gelekî mirov ji rê derxistiye. Bi wê rewşê bi me re jiyankirina wî gelek zehmete. Mesele li şûna ku weke sosyalîstên ku derketine ortê bin, weke Xirîstiyanekî werin baştire. Papazekî kilîsê ji bo min ya ku bê tercîhkirine. Ji sosyalîstên wê zêdetir papazek, rahîbek dikare bê tercîhkirin.

Çe.: Kilîseyên li Ewrûpa xwedî paşerojeke bixwînin. Yanî îro, weke sed sal berê bandora wan nîne. Bi sedên sale şovenîzma ku li Ewrûpa pêşketiye di heman demê de berpirsyariya kîlîsê heye.

---.: Na, min qala bawerpêkirina rast kir. Misoger wisa ye. Di wateyeke qismî de kîlese durûne, yanî şirîkê tawanin. Ez ji vê re tiştekî nabêjim, ez di wateya takekesî de dibêjim. Mesele sosyalîzma pêkhatî jî mîna kilîsê ye. Çend xortên ji Rûsya hetine hene, ew jî heman zehmetiyan dijîn. Yanî ji aliyê qiyaskirinê ve nabêjin, nayê wateya ku ez tercîh dikim.

Çe.: Yên ku dixwazin tevlîbûn ji têkoşîna Kurdistanê re bikin, ne ji ber ku bawer dikin, ji ber ku fedakarane xwesteka alîkariyê dixwazin bikin dixwazin vê tevlîbûnê pêk bînin.

---.: Ew fedakarî wê gelekî wan tengav bike û ez ne bawerim şêwazekî rast be. Ne wisa bifedakarî, bi hestên dilê xwe pê dişewitînin, bi xwe gihandina tiştên ku min gotin tevlîbûn watedartire. Bila min mînak bigrin. Ne ji ber ku ez Kurdekim, heta fedakarî, heta ez ji bo di oxirê de bimrim diçim jî na, dibe ku ez kesekî paşketî bim jî. Dibe ku ez ji Çe. jî başketîtir bim. Ewqas fedakarî û cesaret jî bi min re nîne û ji xwe ez wisa ketibama yê niha ji zû ve miribama, minê nekariya tiştek jî bikira.

Şêwazê tevlîbûna min pir cuda ye; hesta bi bêmantiqiyeke pir mezin re şerkirinê! Li beramberî nêzîkatiyeke mirov li şûna mirov danayne, li beramberî bê mantiqiya yê beramberî min; li beramberî nêzîkatiya mirovbûn, şeref û hesta anûrê li ber çav nagire; ya herî girîng jî li beramberî rastiya me ya pir biçûkbûyî, bejnkurtî, li beramberî rewşa lenatkirî, înkar û xayîn bûyîn taybetmendiyên ku ez ber bi şoreşê ve kişandim bûn. Yanî divê taybetmendiya tevlîbûna PKK’ê bê dîqat kirin.

Çe.: Naxwazim tawanbar bikim, lê beriya ku ez bên min armancê hatina xwe nivîsandibû.

---.: Min bi xwe nedît, lê dema ku min ji dûr agahî girt di derbarê ku wê zehmetiyan bijîn de ez xemgîn bûm. Rewşeke ew xweş nabîne heye. Min ev perspektîf da hevalan; "hewl bidin wan bidin jiyankirin" ya rast ji vê aciz bûye. Min ji bo vê gotibû; dîtina wan a rastiyê, jiyankirin, ji pêşwext îmhabûna wan baştire. Hema xwe kirina qurban weke ku hesteke bilinde, diviya bû bi wan re gelek rastî jî bihatana binaxkirin. Ger encameke wisa ne serkeftî be jî –eşkereye ku wisa jî nabêjim- li gorî min ji bin axbûnê zêdetir ya bê tercîhkirine. Ji ber ku ger bixwaze dikare niha baştir lêpirsîn bike û tevlîbûneke saxlemtir pêk bîne.

Niha rastî mîna şerîda fîlmekî li ber çavên minin. Li gorî min di vê wateyê de jî gihiştiye armanca xwe. Lê ya ku wî bi xwe jî dixwest fedakarî bû, dibe ku şehîtbûn bû. Dibe ku serkeftina wisa bûya, lê li gorî min ev encam serkeftîtire.

Çe.: Beriya bêm nava gêrîla, dibe ku di derbarê gêrîla de zêde agahiyên min nebûn. Lê bi asanî dikarim vê bêjim; di gêrîla de parastina kes a xwe ne gengaze, yanî derfetê xwe parastinê nîne.

---.: Derfetê xwe parastinê hinekî bi van dahûrînên me re pêşdikeve, berevajî di îsyangeriya Kurd de berxwedan û mirin bîst û çar demjimêran derbas nake. Ji xwe nakokiya min a sereke eve. Gêrîla demdirêjkirin, ger ew bi xwe dev ji îdaya xwe bernede, ew jî gihandina asta gêrîlatiyeke demdirêje. Armanca min a sereke eve. Dizanim kesayeta te bi vê re nakoke. Dizanin ew bi xwe jî bi vê re di nava nakokiyan de ye, lê vebijêrkeke din jî nîne.

Bi şer ber bi mirinê ve çûyînê her kes raziye, lê ez ne razî me. Nakokiya ku ew bi xwe jî dijî, ne nêzîkatiyeke wisa ya Rêbertî yê ye û misoger divê ku vê jî baş fêm bike. Ji ber ku bi salana her tim li ber xwe daye, vaye rewşa ku dibêje di gêrîla de nîne, hemû hatine binaxkirin û encam vaye derketina holê ya rewşa me ya binketiye. Belê, di nava me de ya zehmet ne mirine, jiyankirine.

Çe.: Ez tevlî vî alî dibim, erê dikim. Waye ez naxwazim biçim gêrîla û di demeke kurt de bimrim. Ez ji bo di gêrîla de

peywir girtinê dixwazim bên perwerdekirin. Yanî min perwerde dixwest, lê ev derfet, ev şans ji me re nehat dayîn.

---.: Ew xisûsên ku we di nivîsa xwe de anîbû ziman min xwend. Bi taybet di derbarê nêzîkatiyên hevalê C. De rexnên wî hene. Dibe ku mafdar be, hinekî ji ser serê xwe avêtiye, nêzîkatiyên hevalê me hinekî giştî ne. Yanî li ber çavgirtina taybetmendiyên wî, ew sebir û kûrahiya ku em raber dikin, raber nake. Dîsa rêveberiyên wan, bê kar hiştina wargehan nexweşiyeke, feraseta piraniya rêveberiyan wisa ye. Dizanim ku wê jî gelekî hêrs daye avakirin.

Ya rast di demeke diyar a ceribandinê de jî, hem baş dikarîn bên perwerdekirin, hem jî hinek kar bihatana dayîn bi asanî ber bi jiyana gêrîla ve bihata birin. Nîşan nedana vê bi temamî nebesiya rêveberiyê ye, tawanê rêvberiyê ye, ango neya wî ye. Di vê mijarê de rexneyên wî di cîh de ne, ji vê re tiştekî nabêjim.

Çe.: Li Ewrûpa naskirina Kurdan ji aliyê me ve zehmete. Ji ber ku wêjeyê partiyê bi giranî bi zimanê Tirkî û Kûrdî tê nivîsandin, nemaze naskirina vê ji aliyê me ve pir zehmet dibe.

---.: Bawerim hinekî dît û ev jî destkeftek gelekî li pêşe.

Çe.: Ez vê bêjim; çavdêriyên ku min li Kurdistanê kirin, ezmûn, ez gelekî guhertim, yanî guhertinên mezin bi min re çêkir.

---.: Diyare tu gîhiştiyî armanca xwe.

Çe.: Yanî bandoreke her tim di jiyana pêşerojê bijartinê de ye.

---.: Bêguman, wê ji niha û şûn ve kabîliyeta vebijêrkê rast pêşkeve. Ne ji bo me, wê ji niha û şûn ve cuda li bijareya xwe ya jiyanê binêre. Bi taybet li vir pergaleke pê re li hev nake heye. Ger dijderketina xwe ya li beramberî pergala ku pê re li hev nake bidomîne, bi vê wê baş bikaribe ferqa navberê biparêze û misoger di vê wateyê de yên ku dest xistine deskeftinên binirxin. Li gorî min divê di vê mijarê de kûr bibe û îdaya xwe jî bihêz bike.

Ger ji pergala serdest a Ewrûpa re serî netewîne wê gelek baş be. Bi taybet divê girîngî bide qûralên civaka xercker a ku di Almanya de pir pêşketiye ji wan qûralan re serî netewîne. Li gorî min zehmet be jî divê ku mirov şansekî bide vebijêrka jiyana partiyê. Ne ji ber ku pir ditirsim, yan jî xwe jê şûn de didim, lê jiyana fermî herî kêm bi qasî paşverûtiya di nava me de

lanetkiriye, esef dide û alçaxî dibînim. Çiqasî em daxistina asta heywanên herî di jêr de dîjîn, ew di ser wê re jî ewqas û heta bi şêwazekî hîn xeter hatine hovkirin û heywanîkirin. Ev şerê mezin ku em li beramberî paşverûtiyên xwe dimeşînin, pêwîste ew jî li beramberî wanê herî jor di tepe de derketine pêş bimeşînin. Ji ber bi rastî ew jî hatine heywanîkirin.

Di dîmen de em pir ji hev cuda ne, lê heywantiya li wir û ya ku dixwazin li ser gelê me pêş bixin di navbera wan de zêde ferqek nîne, heta ya li wir xetertire. Tu vê fêm dikî? Pir balkêşe! Rewşeke me hinekî nêzîkî hev bike ye. Bi vê Kemalîzma ku li Tirkiyê, ya ku ferqa xwe ji Hîtlere Alman ya nîne du rastiyên di bin bandorên wisa de mijara gotinê ne. Heta di reweşeke ji ya heywanan jî xirabtir de ne. Dibe ku di dîrokê de bilinbûna herî fetisêner be jî. Herdukan jî mirov kirine kerî. Yanî divê ji hevdu fêmkirina me re bibe mînakek.

Çe.: Ya rast em, li Almanya ne şoreşger bûn, îsyanger bûn. Ji ber ku dema me digot berxwedanî me tenê dij derketina qûralan fêm dikir.

---.: Hinekî anarşîzme.

Çe.: Hinekî cudaye, ji ber ku di vir de anarşîzm weke tawanbariyekê tê karanîn, ez wê qebûl nakim.

---.: Ez wisa nabînim. Ji xwe ev bertek di cihê xwe de dîtin jî ji bo min girînge. Lê hinekî belengazane dibînim. Ji ber ku dişibe rewşa pir hişk, kulmê xwe li dîwarekî bi pola hatiye çêkirin, serê xwe lêdanê. Pergal gelek bi zirxe û îsyana wan jî belengazî ye. Dibe ku ji bo xwe bêjî, “ez xwe ji Kurdistanê re amade dikim” em berevajî wê îda dikin. Ger israr bike, çi dibêje bila bêje, em ê wî li beramberî rastiya fermî ya Almanye emade bikin. Divê ku ji vê bawer be. Dê wext bigire, lê wê bibe.

Tu dixwazî bi rastiya Almanye re şer bikî? Yanî li beramberî rastiya fermî, rastiya faşîst, rastiya paşverû dixwaze şer bikî.

Çe.: Ev ji daxwazekê zêdetir, yek ji armancên hatina min ya Kurdistanê ev bû. Dema ku çûm Besta yê, me bi hevalê C. re nîqaşek da despêkirin, lê beyî ku em ber bi encam ve bibin nêvî ma. Mijara nîqaşê jî ev bû, di navbera çêkera mîlîtan ya Ewrûpa û ya vir de pireke çawa dikare bê avakirin bû.

---.: Berî her tiştî li wir avakirina çêkereke mîlîtan li gorî min dê sûdmend be. Hinek endam dikarin bên gel me û baştir bên perwerdekirin. Hinek derfetên Ewrûpa hebûn û ew bi şêwazekî mîlîtanî nirxandin gengaze. Mesele pir ji me ditirsin. Dikarin wê weke alîkariyekê bibînin. Gelek endamên eleqeya wan heye û dixwazin pêşkevin hene. Rêxistineke wisa ku bibe pir dikare bê avakirin. Li ser rêxistina pir divê ku mirov baş bifikire. Ji xwe toreke pir berfireh a sempatîzanan ji niha ve heye. Li Almanya em weke partiyekê ne. Ev ne potansiyelên kêm in. Lê rastiya Kurdistanê jî mirov pir baş fêr dike, bihêz dike.

Mînak dikarin weke yekîneyeke di nava xwe de rêxistinkirî werin. Ez wê tercîh dikim. Heta hem Kurd, hem jî ji Almanên li wir wisa yekîneyeke xweser ya enternasyonalîst, tabûrek dikare bê komkirin. Ji xwe li vir jî hinekî dikarin perwerde bibînin. Divê ku ev yekîneyeke perwerda Rêbertiya partiyê di nava xwe de dîtibe. Mesele em dikarin vê komê, weke xwe bînin berpirsyariya çiyayê Cûdî, Gabarê bidinê. Li gorî min ev dikare modelekî serkeftîtir be.

Çe.: Ya ku ez difikirim, dostaniya şoreşgeriye û ev jî dozeke demdirêje, wê pêşbikeve.

---.: Ji xwe divê ku ev mesela Kurd, tenê weke meseleyeke netewî neyê fikirandin. Pergala Alman vedişirê, lê dikarim bêjim ku herî kêm bi qasî Tirkan pergala Alman jî eleqedar dike. Ger ew bixwazin jî, ne xwazin jî dê eleqedar bibin. Şoreşa Kurdistanê ya ku pêş dikeve, şoreşa Tirkiyê ya ku pêş dikeve ye; şoreşa Tirkiyê ya ku pêş dikeve, dê Almanya bi dijwarî bihejîne. Ev eleqe her ku biçe dê pêşkeve û bi sedemên objektîf pê ve girêdayî ye, jênereve. Li ber çavgirtina vê divê ku xwe bi kar bîne. Lê weke ku min got, îlehî dixwazin tevlî tiştekî bibin, vê carê bi alîkariya hevalan jî, di binê alîkariya me ya nêzîk de dikarin xwe weke hêza yekîneyekê lê bikin. Di demê pêş de em dikarin pê bifikirin. Weke dixwazin bila şer bikin, dibe ku ev jî tatmîn bike, yanî divê ku mirov vê jî paşçav neke.

Çe.: Ev pêşniyareke divê cidî bê girtine.

---.: Ya rast eve. Li gorî min pêwîste li ser bê rawestin. Ji ber ku yekî li Almanya mezin bûye, heta ji bo hevalên ku li Ewrûpa mezin bûne jî tiştekî wisa pêwîste. Niha bi hezaran ciwanên Kurd dixwazin bên. Bila bi hevalan re di vê mijarê de

hevdîtinên xwe pêş bixin, bawerim di demên pêş de egeriya pêşxistina yekîneyekê heye ku, dostên Alman dikarin di nav de bin. Hejmara wan ne zêde ye?

A.: Bihêz in. Bandora vî hevalî zêde li ser derdora wî nîne, lê yên bandorker û derdorên wan fireh hene. Ev weke model dikare bê bidest girtin.

---.:Yekîneyek, heta tabûrek jî dibe. Her wiha li Îspanya jî bi yekîneyên wisa enternasyonalîst şer kirin. Li gorî min ji bo Kurdistanê dê ev model baştir cihê xwe bigre û gelekî jî encam bide. Ev ê nakokiya me ya rêveberiyê jî bi asanî derbas bike. Bi rastî jî ev encam ji bo me niha gelekî sotênere. Ya rast nakokiya te ya sereke eve. Li gorî min em dikarin ji vê re jî çareseriyê bînin. Dibe ku hinekî demdirêj be, lê şayanî li ser rawestandinê ye. Ji xwe ji dostên Alman hejmareke zêde berendam hene.

Çe.: Piştî demeke dirêj, rojane ev eleqe di çi astî de ye ez nizamim. Çawa ku bi hevalên Kurd re cidî tê axaftin, di heman demê de bi vana re jî di nava cidiyetekê de, rastî weke heyî divê bên destnîşankirin.

---.: Lewra kî bixwaze risteke erênî bilîze, dikarin di bin însiyatîfeke serbixwe de aliyên erênî yên Kurdistanê raber bikin. Bawerim pêwîste aliyê wê yê teknîkî jî rêxistinkirî be, gêrîlatiyê jî bi awayekî hosta bi kar bîne. Ger însiyatîf ji wan bi xwe re bê dayîn, ya me jî dibe alîkariyek ya rast. Bawerim dikare rista bûyîna modelek ceribandinê bibîne. Bi vî rengî taybetmendiyên me yên neyênî di bandorkirinê de û veguhertina aliyê erênî de jî ristek lîstina wê gengaze. Di demên pêş de dikare bê firekirin, dixwazim wê bêjim. Ji ber ku her ku biçe dê pêşbikeve, wê tevlîbûn zêde bibim.

Dikare mîsyon biguhere, înşaya aborî, xebatên perwerdê, xebatên tenduristiyê pêş bixe. Dikare ji her holê ve bi van re bibe alîkar. Divê ku mirov wisa demdirêj lêbinêre. Pêwendiyên xwe dîsa bidomîne, ji xwe texmîn dikim, bixwaze jî wê bi asanî nikare dev jê berde. Dikarin di nav xwe de nîqaş bikin. Divê şêwazê xebata xwe ya rast derxin holê. Xebatên weşan-çapemeniyê jî hene, rêxistinkirina dostan heye, heta gelek xebatên mîna vê yên dîplomasiyê hene. Bawerim di demên pêş de dikarin rist bilîzin.

Em ê dîsa weke PKK'yî yekî lê binêrin. Ev ê hîn jî pêş bikeve. Bawerim ji niha ve avaniyeke wisa ya ku xwe gihandiyê

heye, dibe bi hev re bûn. Ji niha û şûn ve ew dikare bi van aliyan ve bibe alîkar. Ji ber ku gelek zanabû. Bila ji jiyana xwe re li gorî nexweşiyên civaka xercker xêzikekî xîz bike. Di gel me de biwêjek heye; dikara qala jiyaneke hinekî mîna derwêşan, hinekî mîna arifan bê kirin. Yanî jiyanake dijî pergalê! Ji xwe jiyana wî jî hinekî wisa ye, bawerim wê zêde zehmetî jiyan neke. Ev ê fikrandin û tevgerîna şoreşgerî zêdetir pêş bixe. Ferqa jiyaneke wisa, yanî divê dijraberî wî netirsîne.

Çe.: Em xwedî vê nerînê bûn; hestên îsyangeran dibe, lê divê yên şoreşgeran nebin. Li Almanya deh sal, yan jî panze salan di legalîteyê de jiyankirin hestên mirovan ji holê radike.

---.: Şoreşger mirovên dil mezin û kesên hestyarin. Ya ku bê hestiyê ewqas kûr dike pergale û divê neyê qebûlkirin. Teqez ev berevajî kirineke, bi şoreşgeran re hestên mezin jî hene. Ez jî serkeftina xwe bi temamî li beramberî kesayetiya ku pergal ferz dike, hema di her qadê de destxistina serdestiyê didomînim, teqez serkeftina min eve. Bila ew jî jiyaneke wisa biceribîne. Naxwazim zêde rexne bikim.

Ewrûpa zêde xerckere. Hema bêje mîna kurmê darê, koka darê xwarin û tinekirine û van jî bi xwarina koka dara mirovatiyê hindik maye xilas bikin. Kurmê darê heye, kurmê ku koka dara dixwe ye, piştre dara ku dixwe dirizîne û tine dike. Rewşa niha ya civaka xercker a xwezayê û civakê asta keritandinê mirov dikare bişibîne kurmekî wisa. Ji xwe weke pertek ji vê re tevgera tûrîzmê pêşdikeve.

Mesele min du Alman dîtibûn, li vir tişta ku herî zêde jê hezdikirin digotin di binê xerabeyên dîrokî de xwe dirêjkirine. Dema ku digerim bi komên wisa re rû bi rû têm ku, ev ji aliyekî ve reve ji dehşeta ku civaka xercker dide mirovane. Ji xwe ger wê di Ewrûpa de şoreşek pêk we re, teqez wê vê rastiyê jî li ber çav bigre. Ev berpirsyariyeke mezin a hawirdorê, texrîbata xwezayê û her ku diçe rewşa civakê ya ku ber bi cinawarekî xercker tê, ev jî dê teqez şoreşekê pêwîst bike. Pêwîste kesayetiya xwe hinekî jî li ser vî esasî û bi vê armancê amade bike. Ez vê peywirê ji Papa re dihêlim, ji ber ku saxteye, ji xwe rewşeke wî ya ku bikare vê erkê ser bixe jî nîne.

Çe.: Pêwendiyên pir bihêz ên Papa bi mafya re heye. Mafyayê herî mezin Papa ye.

---.: Dil dixwest ku bi çar desta ve fêrkeriya Hz. Îsa hemêz bikin. Min her tişt fêm kir, lê ez demokratiya van a Xirîstiyaniyê fêm nakim. Ger bêjin, du tiştên ku herî zêde pêwendiya wan bi hev re nîne çine, ez ê bêjim; Hz. Îsa û Papa ye. Tevgera durûtiyê ya mezine! Divê ev hemû bên nirxandin. Di nav Almanan de rexmegirên wisa mezin derdikevin. Di dîrokê de mînakên wê jî hene. Di avaniya fikra min de jî bandora fîlozofên Alman heye û em dişibin hev. Dibe ku ew jî fîlozofên rastiya me bin, divê ecêb neyê dîtin. Ya ku dixwazim bêjim, aliyên dişibin hev ên jiyanî jî wisa nekêm in.

Çe.: Fikreke Ewrûpa di bîst-sî salan de di bûnya kîlîsê de pêşxistiye heye; ji vê re dibêjin; "teoriya rizgariyê." Teoriya rizgariya ol û yên ku vê teoriyê diparêzin dibêjin; "çima pêwendiyên baş di navbera Misilman û Xirîstiyanan de nebin."

---.: Tenê ne pêwendiyên baş. Mesele ne pêwendiya yekîtiyê ya di navbera Misilman û Xiristiyana jî de ye; li beramberî ew tevgera cinawirbûnê ya ku min got divê rizgariyek hebe, pirsgirêk eve. Mîna berê dijbertiya Xiristiyanî, Misilmaniyê nabe. Ya ol jî ger hebe taybetmendiyeke baş, di serî de taybetmendiya bi anûr xirab bi kar anînê de hev digrin. Tenê divê ku mirov aliyê van ê manewî ku paqij maye dîqat bike. Divê ku mirov nirx bide ji parêzvanên nirxên pergala ne durû ne.

Dibe ku di nav wan de jî, fikra rizgariyê ya ku min qala wê kir hebe. Vaye mirov bêje Xirîstiyanin, kilîseye û wan cidî negre ne raste. Li Emerîka Latîn jî di nav wan de rizgarîxwazên pir watedar derketin.

A.: Serokê min, ev dibe şêwazekî din ê fikrandina Lûther. Yanî teoriya rizgariya ol parastine; "di Xirîstiyaniyê de dijberbûna serdestan, yan jî li beramberî serdestan berxwedêriya bindestan, berxwedan, yan jî ya ku mîna gêrîlatiya ku li Latîn Emerîkayê pêşket, li gorî wacibên olî guncawe" nerîneke bi vê şêwazê peşdikeve.

---.: Pêwendî dikare bi wan re baş be, bi wan re hevgîştin watedare.

Çe.: Ev ê pêwendiyan hinekî tengav bike.

---.: PKK tiştekî wisa ye ku, yê ku carekê bikeve nav, nikare xwe careke din jê rizgar bike. Bi rastî jî ev tenê ne tevgereke netewiye, ez ê nebêjim tenê tevgereke komînîste jî, em

tevgereke gelekî wateya xwe ya enternasyonalîst hene. Îro tirsa ku serdestên Alman li beramberî PKK'ê dibihîzin, bawerim ji doktrînên dijber ên ku di nava Ewrûpa de pêşdikevin kêmtir ne xetere. Û ya herî watedar jî, ji ber ku em tevgereke netewî ne, berevajî, li gorî xwe navekî dehşetwarî jî lê dikin. Ne girînge, bila bêjin, lê em tevgereke cuda ne. Ji ber ku em tevgereke serî li ber şêwazê jiyana wan radikin, ji faşîstên Tirkan bêtir dijminin. Vana hemû vê didin diyarkirin, ger tu bi xwe di xeta berxwedanê de bi îda bimeşî, wê ev hevaltiya me pêş bikeve.

Tevgera netewî ya Kurdistanê, tenê duriyane, şêwazekî navbere. Nemaze keda ku heta niha daye watedare. Divê ku hinekî jî li benda dawiyê be. Hinekî rexne jî kiriye, divê ku hinek ferqên din jî pêşbixe, sebir bike, ger tenê berxwedaniya niha û hêza fedakariya xwe jî raber bike, di demên pêş de bihevrebûnên watedar jî, dibe ku em têkoşînên watedartir jî bijîn. Li ser vî esasî hem jê re serkeftinê dixwazim, hem jî dixwazim baweriya xwe ya domandina pêwendiyên şoreşgerî yên ku dubare hêz bide wê bidome.

Ji dostên wisa re jî, di vê navberê de ji bo rast fêmkirina wan min fikrên xwe di vê çarçoveyê de diyar kirin. Ger wê yekîneya wan pêşbikeve divê ku em di vê çarçovê de pêş bixin. Ew bi xwe jî weke yekî me ji nêz ve nasdike, li ser esasê nûnertiya me dikare kar bike. Ji ber ku girînge. Derdorên fermî yên Alman jî tên û bi me re hevdîtinan dikin û ji derdora xwe ya fermî re radigihînin. Ew jî weke kesekî pir zêde armancê xwe parve dike, dikare baştir temsîl bike. Ez vê jî bi taybet diyar dikim. Herî dawî dikare sozekê bide hevalan.

Çe.: Weke kes ez dijberî soz dayînê bûm. Li ser vî esasî dijber bûm; yanî dema ku soz hat dayîn divê ku xiyanet lê neyê kirin, pêdiviyên wê pêwîste bên pêkanîn. Di derbarê rewşa Almanya ya ku niha tê de ye tu fikreke min nîne. Ev pêvajoya ku sal û nîveke ez li Kurdistanê me ji bo min pêvajoyeke watedar bû. Min da diyarkirin ku ez ê jiyana xwe ya pêşerojê li ser vî bingehî pêşbixim. Nemaze dikarim bêjim li ser vî bingehî min soz da.

---.: Ev e. Li ser esasê waneyên ku dîtine wê li hevkirî tevbigere, ev ji me girînge. Dema ku me di dema pêş de hev dît li ser esasê van waneyan ew bi xwe jî dikare ji me bipirse. Dikare bêje; "we çiqas pêş xist" em ê jî bêjin, "tu çiqas pêşketî" û jê

bipirsin. Ji gotinên xwenîşander bawer nakim, wateya wan jî nîne. Lê ev wane sotênerin, em jî ji niha û şûn ve naxwazin wî vala bibînin. Ji ber ku bêrîkirineke wî jî ya wisa heye; bi îdaya ku wê vala nemîne barkiriye. Ew jî dibêje em wî vala nebînin, weke kesekî ji rêzê nebînin ku, em jidil pê bawerin.

Bi taybet di feraseta min a mirovî de, mirov biçûk dîtin nîne. Hêvîdarim ku ew bi xwe jî ne xwe, ne jî me û li ser vî esasî mirovan basît nabîne. Divê ku ji xwe bawer be. Ne bawerim bi qasî min mirovekî ji rêzê be, niha di vê çarçovê de nirxa ku ji xwe re raber dikim, xwe herikandina min, xwe afirandina min mijara gotinê ye. Dibe ku Alman bêjin "terorîstê herî mezin" lê ez bawer dikim ku, di cihanê de şoreşgerekî weke min nîne. Ji bo bawerî qezenc bike dibêjim, yên ku dostaniya wan a ji rêzê jî bi me re hebe em nirxeke mezin didinê.

Ez divê mijarê de dîroka tevgera me baş dizanim. Rastiya Tirkiyê jî baş nasdikim, heman tişt ji bo Almanya jî derbasdare. Wê dostanî û hevrêtî pêşkevin, ger pêwsît bike em ê tengav bikin. Ew li ser mirovatiyê çiqas bi îdane, em zêdetir bi îda ne. Em ê ne li beramberî hev bin, bi hev re bin. Hêvîkirina vê li gorî min di cihê xwe de ye. Tu dixwazî tiştekî bêjî?

Çe.: Di mijara sozdayînê de dixwazim xalekê bînim ziman. Ez li vir bûm şahidê vê; gelekî soz tên dayîn, lê pir kêm pêwîstiyên wê tên pêkanîn.

---.: Raste, hêvîdarim tu pir kêm soz bidî, pêdiviyên wê jî mezin pêk bînî. Ya ku tu dibêjî hema bêje di nava me de bûye xetek.

Çe.: Li welat di hinek dadgehan de, ji bo hevalên ku dihatin darizandin ji tawanê wî re ceza dihat dayîn, lê ti carî helwestekî; "te soza xwe pêk ne anî em ji bo wê ceza didin te" pêşneket.

---.: Nebesiyeke me ya pir cidiye, tevlî wî dibim.

Çe.: Ji bo min tenê weke pêkanîneke rojane ya rêxistinê hat, yanî min wate nedayê.

---.:Mijara hatî destnîşan kirin di cîh de ye. Bila îdaya xwe bidomîne. Ez ji bo ku bidim diyarkirin biçûk nabînim vana dibêjim. Dibe ku wî demeke dirêj tenê jiyan kiribe, xwe jî wisa dît, lê wekî din jî dixwazim bidim diyarkirin ku ne wisa ye. Dibe ku asta hevalan paşketî be. Ez jî dixwazim vê astê bidim

derbaskirin û hewldaneke mezin didim, lê ev rastiyeke… Şoreş, di îdaya guhertinê de ye, ez jî di îdaya guheritnê de me. Ev rexne di heman demê de di derbarê min jî de ne. Ji bo ku rastiya xwe ronî bikim min ev xal destnîşan kirin. Dibe ku ew wisa bin, lê ez ne wisa me.

Dema ku li Kurdistanê bû her roja ku derbas kiriye nirxeke mezin didimê. Di asta mêrxasiyê de pênase dikim, watedare. Çima zêde serkeftî nebû tenê rexneyeke min a biçûk jî nîne. Jiyan jî nirxeke pîroze, me ev vekirî danîbû holê. Ev dilmeziniyeke û di mirov de nirxên din hebin jî, nikare nirxekî ewqas mezin derxe holê. Dibe ku bê nirx jî bibînin, vaye dikare bêjin; “em fêr nebûn, me zêde sernexistn.” Na! teqez nerîna min wisa nabe. Nirxandina min, pîvanên min eve û di wê baweriyê de me ku rast e. Bawerim me bi vê jî hêz dît.

Şoreşger ji hev re spasiyê nakin. Peyveke wisa di nava me de nîne. Ji bo wê ez vê ji bo wî nabêjim, lê dubare, dibêjim bi hêviya di demeke serkeftî û baştir de bi hevgîştinê. Bawerim ku wê ew roj jî bên, dubare serkeftinê dixwazim.

Keremke heval Ro. Ji ber rewşa te ya tenduristî, dîsa ji bo ku tu ezmûnê xwe ji girseya me ya Ewrûpa re ragihînî dibe ku sefereke Ewrûpa guncaw be meyleke me ya wisa heye. Hevalan jî guncaw dît. Texmîn dikim, ger bigihêjim armancê, di serî de gêrîla, vegereke welat a pêşketî û hîn bi wate dikare bibe. Me destnîşankirineke armancê ya wisa kurt pêk anî.

Dîsa perwerda ku te li vir dît heye. Bawerim te pêvajoya rexne-rexnedayînê jî dît, jiyan dikî. Te pratîka xwe di pratîkên xwe de dirêj vekir, teyisand û te em guhdar kirin. Bawerim ji dewrekê zêdetir tu di perwerdê de ma. Wisa bawerim ku, di dema borî de gelek mijarên ku te xwe tê de nedigihan asta partîbûnê pêşketin çêkirin. Partîbûna rast di vê pêvajoya perwerdê de jiyan kir, pir tişt fêm kir. Ezmûnên xwe niha baş tehlîl dike û divê ku ev jî te ber bi şoreşgeriyeke bandorker ve bibe. Ji vê bawer im.

Ji bo te ne em dikarin bêjin vala derbas bû, ne jî pir baş serkeftî bû. Bi niyeta xwe ya baş te xwestiye hinek tiştan bikî, lê lewaziya asta teorîk, dîsa bi şêwazekî saxlem xwe negihandina te ya asta partîbûnê, taybetmendiyên neyênî yên qada ku we tê de jiyan dikir, derfet nedaye ku hûn serkeftina dihat xwestin pêk bînin. Ji hemû aliyan ve karê behremendiyê ye, mesele hêze. Ji

ber te ev bi tamemî raber nekiye, pêşketina ku dihat xwestin te pêk ne aniye.

Te li ber xwe daye, di gelek fedakariyan de û bi wêrekî di gav avêtinê de dudilî jiyan nekiriye. Lê te dît ku bi vê şoreş bi temamî naçe serkeftinê. Ji bo şoreşgeriyê sereftin esase. Ji bo serkeftinê xwe pêgihandina te esase. Di vê mijarê de bi hestan, bi mirinê xwe fedakirin jî weke ku dê şoreş neyê kirin, bi xwe teng girtinê, nebes hiştinê jî xwe parastin nayê wateya xwe dayîna jiyankirinê. Bi rastî, ya ku li wir careke din em di hişmendiyê de diteyisînin şoreşgeriye. Partîbûna wê, şêwazê şerê wê ye.

Bawerim bi zana bû, wê ji niha û şûn ve bimeşe. Tu çi difikirî? Ger nemeşe wê xwe bi xwe…

Ce.: Ger nemeşe êdî mirov dikare bêje bi zanebûn nameşe.

---.: Belê, ev jî dibe oportonîstî û nayê efukirin. Ji hevalên jin ên ku dixwazin nerîn diyar bikin hene?

Pe.: Serokê min, ya ku ez bi hevalê Ro. re dibînim nêzîkatiya wî ya herî li berçav, pir zêde xwezayîkirina xwe ye û wisa dizane ku wê bi vê rewşa xwe bikare di nava rêxistinê de bimîne.

---.: Raste, xala ku te bal kişand ser girînge. Xwe bi awayekî xwezayî zaroka PKK’ê dibîne. Li şûna ku asta PKK’ê ya siyasî, heta leşkerî bibîne tevlî bibe, “dibêje ez PKK’yî me û divê ku wisa ji min re nêzîk bibin.” Ev pir xetere. Ji xwe rexneyên min jî li ser vî esasî bûn.

Pe.: Ev jî pir zêde bi xwe re lihevkirinê tîne. Pêwendiyên ku bi xwe re, derdora xwe re pêş dixe zemînê lihevkirinê pêş dixe.

---.: Meyleke xetere. Bila ne ew bi xwe wisa bi kesî re lihev bike, ne jî bila kes ji bo lihevkirinê tengav bike. Tu duristî di vê mijarê de armancên te hene, lê paşverûtiye. Asta PKK’ê ya niha ya fermî, siyasî, leşkerî xwezayîbûnên wisa qebûl nake, heta xeter dibîne. Tê vê bibînî. Dîsa jî em xwezayîne, ez jî xwezayî me. Dibe ku bi Ab. re jî xwezayîbûn hebe, lê tê bibînî xwezayîbûn di kîja çarçovê de ye. Di serî de pîvanên leşkerî siyasî pêwîstin. Bi xwezayîbûna xwe re hûn nikarin min bi herikînin, banrod bikin.

Taybetmendiyên ku em niha dixwazin xwe bigihînine fermiyet, dîsa pîvanên leşkerî, bi taybetî pîvanên mîlîtaniyê ji ya ku tê payîn zêdetir mijarên mirin-mayînê ne. Kes bi qasî min hişyar, hestyar nîne. Ya rast hûn hemû dizanin, gelekî bandora min heye, hestên min, bertekên min hene, lê hêza mantiq, hêza fermî û siyasîbûn esase. Vê jî weke hûn texmîn dikin ne ji bo bêzar bikî, ji bo serkeftî derbaskirina qonaxeke dîrokî pêwîst dibînim. Asta netewekî ya fermî, asta netewekî ya leşkerî dafirîne.

Li gorî we dikare di çarçoveya hevaltiyeke xwezayî de bê bi kar anîn. Me ji wê ehbab-çawîşiyê re jî rexne pêşxist, tawanbarî kir. Hûn dibêjin ma wê çi bibe em ehbab-çawîşiyê bikin, hemşeritiyê bikin, wê çibibe em yarentiyê bikin. Raste, di nava xwe de ti xirabiya wê nîne, lê di asta netewî de hûn çiqas fermî bûne, çiqasî di nava hevgirtîbûneke siyasî, leşkerî de em tevdigerin ger bînin berçav, hûn ê qebûl bikin ku ev xirabiyeke çiqas mezine.

Em hevalê Ab. her roj tengav dikin. Hîn ew bi xwe jî bi gelek aliyan ve ne di ferqa uslûbê leşkerî de ye. Nabe! Yekî ku berpirsyariyên herî giran ên leşkerî bigre ser milê xwe divê ji hemû aliyan ve xwe edapteyî formansyona leşkerî bike, ji stîla fermî re bi temamî xwe edapte bike. Ger neke wê mîna bela xwedê dê bigrin û bavêjin goşeyekê. Di vê xisûsê de baldar be, hêza we heye. Dixwazim vê bêjim, em tevlîhev nekin.

Em asta partiya xwe ya siyasî, leşkerî û pêwendiya xwezabûnê tevlîhev nekin. Dîsa divê xwezayîbûn hebe di partiyê de, lê dîsa bingehê her tiştî asta siyasiye, çarçova vê ya pêwendiyê, qûralên wê pergala wê ne. Bawerim tu fêm dikî.

Ro.: Fêm dikim Serokê min.

---.: Wekî din, keremke heval.

So.: Serokê min, heval pir zêde xwe xistiye qaliban. Hema bêje wisa teşe daye kesayetiya xwe. Pêwîste hinekî wê bişkîne, derbas bike. Ya din divê li ser pratîka xwe raweste û binirxîne. Divê dewrê de bi qasî ku min dît, di derbarê vekirina pratîka xwe û li ser sekinandinê muhafazakariyek hebû. Dîsa heval pir bê hedefe. Hewldana wê ya hedefek xistina pêşiya xwe, xwe gihandina kesayetiyeke milîtan nîne. Ger hebe jî pir lewaz

dimîne. Divê ku di giştina kesayetiya milîtan de bi rêgez be, rêgeza şoreşgerî esas bigre.

---.: Ber bi her karî ve dibeze. Ev jî hedefa wê ji holê radike. Ev jî çavkaniya xwe ji wê jîna wê ya kevn ku tê zanîn digre. Girêdana bi hedef, rêgezê, ew weke çareseriya pratîkî anîna sehê zêde pêşneketiye. Mîna kedkareke ji rêzê ber bi her tiştî ve beziye. Ji xwe asta wê jî hinekî wisa bûye berê. Dîsa di qadeke xwe tê de perwerde bike nemana wê, ber bi xwe bi xwe dayîna jiyankirinê ve biriye. Ji xwe bêçareseriya wê ya demdirêj jî çavkaniya xwe ji vir digire. Bawerim wê bi xwe jî niha dîtiye. Divê ku bi rêgez, bi şêwazê ku hatiye vesazkirin, bi hêza çareseriyê xwe bibe. Di vê wateyê de ji nû ve dibe partiyî. Di pratîka berê de nebûna çareseriyên giran hene, ber bi her karî ve beziye, lê zêde negihîştiye serkeftinê. Bawerim ew bi xwe jî van dizane.

Ro.: Nêzîkatiya hemal heye Serokê min.

---.: Di vê mijarê de çareserî di ya ku me got de ye. Şêwazê xebata navxweyî ya partiyê zelal bûye. Ji aliyê din ve taybetmendiyên çawa raber dike?

Şi.: Serokê min, li ser şêwazê leşkerî weke zêdekirin di mijara rêveberiyê de ji taybetmendiyên fermandareke mîlîtan zêdetir, bi nêzîkatiya xwuşkekê hewl dide rêvebertiyê bike. Divê ku vê jî derbas bike.

---.: Ev jî çavkaniya xwe ji paşvemayîna wê digre. Ev serdestiya taybetmendiyên xwezayî ye. Ji xwe ev rexne min jî pêşxistibû. Xwe weke PKK'yiyeke xwezayî, partiyê jî mîna malbatekê dibîne. Ne weke koma mîlîtanan, di nava pêwendiya xwuşk-bira de ye. Neçare vê jî derbas bike. Tu kes nikare ji me li benda eleqeyê be; bi vî şêwazî li benda eleqeyê mayîn bêrêziye. Min berê jî ew jî te re got, hestên te yên wisa bi temamî hêsanbûna te diyar dike, ne tiştekî dine. Hestên van hemûyan heye, lê di heman demê de hinekî jî siyasî ne.

Ji xwe asta ku em dixwazin xwe bigihînînê hat îsbatkirin, wisa di asta girêdanên erzan ên xwuşkatiyê de, dîsa em dixwazin ji asta pêwendiyên xwezayî yê erzan bigihînin asta fermî. Niha şerê min ê herî mezin eve. Ji bo zilaman jî dibêjim, bi taybetî ji aliyê jinê ve ya ku zêdeye aliyên hestî divê ku xirab neyê bi kar anîn. Fermîkirin, siyasîkirin yek ji peywirên herî sotênere. Di

pêwendiyên we de ger hêza we hebe, asta fermî ya siyasî ji ti cîhî kêm nekin. Bi hestên dil bi xwe şewitandinê, bi yarentiya nedin xerckirin! Bi taybet girîngiya vê baş fêm bikin.

Ez dubare bêjim, yê herî nêzîkî we be jî, mêrê we be jî, çi we dibe bila bibe, ti carî ji asta siyasî ya fermî tawîz nedin. Ev pir girînge! Hûn ê bêjin; "pêşî em siyasî ne, pêşî em fermîne" û ev ji ya ku hûn texmîn dikin zêdetir jiyaniye. Ji bo wê yarentiya ti kesî, şalûsiya tu kesî qebûl nekin. Ne di pêwendiyên nav xwe yên hevalên jin de, ne jî di pêwendiyên xwe bi hevalên xort re cîh ji vê re nedin. Em ji van re dibêjin pêwendiyên ehbab-çawîşî, yarentî, sempatî-antîpatiyên basît. Şoreşger xwe naxin nav pêwendiyên wisa bê ast.

Ev nayê vê wateyê ku hestên şoreşgeran nînin yan jî germbûn, ji dilî nabe. Na! Hemû hene, lê divê pêşî ji armanca siyasî hêz bê girtin, asta pêwendiya siyasî esase. Divê ku em vê hêzê raber bikin. Ev ji ya tê payîn jî girîngtire. Ez ji yên ku bi hestên xwe, bi pêwendiyên basît dixwazin mirovan bandor bikin nefret dikim, lê yên ku birêgezin, bi rêgezên xwe radibin û rûdinin û vê pir zêde li berçav digrin, ji bo min şoreşgerên herî hêja ne. Yên ku li ser vî esasî pêwendiyên xwe rêkûpêk dikin, di dîmen de germ, pêwendiyên jidil, yên ku pêwendiyên balkêş pêş dixin, tê wayeta ku xwedî nêzîkatiyeke pir girîngin. Ji vê bawerim ku min ev xisûs ji bo we hemûyan diyar kir.

Bi we hemûyan re pêwendiyên kûr ên balbat û qabîlê hene. Beriya niha demek kurt aliyên we yên ku hevalê Alman jî rexnekir hebûn. Ji asta vê pêwendiya paşketî, ji asta civaka paşde mayî weke mîrat ji me re mane. Li ser esasê ku me bi hev re girê dide, divê ku pêwendiyên fermî yên profesyonel ên rêxistînî hebin. Dibe ku piranî eleqeyeke nêzîk nîşan didin, ji xwe eleqe heye û pir zêde ye; lê pêwendiya herî nêz, ya herî şayan, pêwendiya ku herî zêde ji we re pêwîste, pêwendiya ku ez dixwazim li vir pêş bixime. Dibe ku gelek ji bo me bêjin, "qet mirovan fêm nake yan jî pir dûrî vê ye" na pêwendiya xwe pê re nîne! Yên ku nabihîzin hûn in. Yên ku dil û mêjî nakin yek, dîsa bi serkeftinê, pêwendiya vê bi siyaseta me re ava nake paşverûtiyên we ne. Me ev di hemû dewrê de pir zêde girt dest.

Rewşa pêwendiya bîrader a ku xwe sipart me pêwendiyeke çawa bû û çawa bersiv jê re hat dayîn we bi wayekî

balkêş dît. Bawerim hema her kes di vê mijarê de pêşketineke berçav dijî. Armanceke pir girîng a vê dewrê ye. Sempatiyeke paşverû ya ku nayê asta civakî, paşketî ku nayê asta netewî, nêzîkatiyeke, aste eleqeyekê em wisa dixwazin bilind bikin. Bawerim di rexne û rexnedayînan de her kesî di asteke girîng de ev derbas kiriye. Ev ji me re pêwîste. Bi tevgerînên me yên takekesî, bi ehbab-çawîşiyê, xwe tenêkirinê ev pêş nakevin.

Hinek hevalan rexne kir; hinek ji wan gelemper hatin rexnekirin, hinek jî bi şêwazekî hestyar rexne dikin, hinek jî pir bi bertek rexne dikin. Min got ku ev aliyên lewaz yên divê her kes derbas bike. Fikra giştî, fikra siyasî teqez dê ji bo her kesî di asta têrker de be. Divê ji vê tawîz neyê dayîn. Uslûbê vê jî heta dawî wê ji dil û li ser esasê hevaltiyê be.

Ger bê dîqatkirin, min jî dikarî bi hestên pir erzan xîtabî we bikira yan jî xwe bi tenê bihişta, dikarî taybetmendiyên xwe yên takekesî ferz bikira, lê min dahûrandineke wisa kir ku, di vir de jiyana min hemû çawa veguherî jiyaneke netewî, bi şêwazekî mînakên wê pir kêm tê dîtin û ev jî bi hestên mezin, bi hesasiyeta herî mezin, girêdana wê ku bi ruhê mirov re heye min danî holê. Bawerim ku we encamên girîng jê derxistin. Bawerim hûn ê me naxapînin.

Belê, cuda?

Ha.: Serokê min, di şêwazê xebata heval de pir zêde yekalîbûn heye. Hinek pêşketinên ku di nava xebata giştî de pêk anîne jî paşketîne. Di derbarê mezinkirina van de jî hewldaneke cidî raber nake. Ji aliyê din ve tenê xwe bi qada xwe ve sînordar dike, di xebatên giştî de, xwe li ber pirsgirêkên qadê yên giştî berpirsyar nabîne. Yek ji xalên din a ku li pêşiya heval astenge, înadgeriya gundîtî pê re heye. Li pêşiya pêşketina wê ev xal astenge.

---.: Înadgeriya gundîtî, bi asta paşketî ya civakî ve girêdayî ye. Yekalîbûn jî, bi serkeftina giştî xwe têr dîtin hemû çavkaniya xwe ji van paşketîmayînan digire. Di vê mijarê de gelek zehmetî jiyankiriye, weke min got dahûrîna wê li vir hat kirin. Em ê pratîka wê ya ji niha û şûn ve bişopînin. Raboriya wê hema weke hat gotine. Wê bi berxwedanê ve girêdayî bimîne, lê rêya çareseriyê çiye? Vê jî nizane. Ev jî girêdayî gundîtiyê ye û bi asta paşketî ya civakê ve girêdayî ye.

Heta niha perwerdeyeke cidî nedîtiye, dîsa jî li ser piya mayîna wê em weke serkeftinê dinirxînin, lê dil dixwest ku bibe xwediyê serkeftinên mezin. Pir kêm heval vê nîşan didin. Lê ji niha û şûn ve wisa berdewam bike em ê jê re qebûl nekin. Em ê bêjin bi zanabûn şêwazê rast di xebatê de pêk nayîne, dîsa em ê bêjin xwe rast tevlî nake. Wê demê jî wê bi rexneyên herî dijwar di cihê pêwîst de bê rûnişkandin. Lê bawerim dê berevajî bibe. Perwerdeyeke ewqas berfireh heta dawî zelalkiriye. Hedef, ji hemû aliyan ve şêwazê xebatê, jiyana hevaltiyê heta dawî hatiye zelalkirin, baweriya wê jî pê heye. Wê înadê li ser vê bingehê bi kar bîne. Ev, wê teqez wê ber bi serkeftinê ve bibe. Bawerim naxapim.

Ro.: Serokê min, xalên ku hevalan diyar kir rastin. Min li vir derxist zanebûnê, min hemû tiştek dît.

---.: Bêguman. Her kes li vir dibîne, te jî li vir dîtiye. Tu dikarî ji vê zêdetir tiştekî ji me bixwazî? Ji niha û şûn ve ev ji te re nebesin?

Ro.: Bese Serokê min.

---.: Wekî din, Fu. tu tiştekî dibêjî?

Fu.: Serokê min, teqez divê hestyariya xwe ji ser xwe bavêje, ji ber ku pir zirar daye.

---.: Careke din dubare bibe em ê berdinê. Ez wê jî dubare bêjim. Ez tenê ne ji bo vê hevalê, ji bo we hemûyan dibêjim. Di nava partiyê de, bi avakirina hestên erzan rewşan ne afirîne û nekeve nav hewldanên bandorkirinê. Heta ne ji aliyê erênî, ne jî ji aliyê neyênî ve. Beriya niha hevalê Alman jî xwest qala wê bike. Hestên erzan, taybetmendiyên civakên paşketîne. Ez jî dikarim ji bo we gelekî xemgîn bibim, dikarim bêjim; “wey ev hevalê min çawa wisa di zehmetiyê de dijîn.” Ger hûn dîqat bikin, min qet nepirsî. Ya rast jî eve. Berevajî, xwe xistina rewşa xemgînî, paşketî hiştin eybe, ne şayane.

Ji bo ku netewekî ber bi yekîtiya hestan ve bibim pir baş tevdigerim. Mesele her kes hem di xemgînî, hem jî di hezkirinê de dikare serêjî bike, dîsa dikarin di nava rêxistinê de bixwazin hestên erzan bidin jiyankirin. Heta hemû corên yarentî, ehbab-çawîş, heta hev redkirin jî dikare bibe. Ev dijminê me yê herî mezine. Di dema borî de we hinekî wisa jiyan kir. Tu dibêjî xwe tenêkirin, lê ew jî ya pir seqete. Ez ê vê di demên pêş de baştir

vekim, dîsa di asta rêveberiyê de teqez pêwîste ji aliyê hest û fikrî ve hemû çêkerê pêşwazî bike; tê xwe bigihîniyê, di tetîk de yî û di pêwendiyê de yî.

Li gorî xwe sed kes xistina nav bendewariyê gotina; “bila hinekî li benda min bimînin, bila hîs bikin ku çiqas mecbûrî minin”tê wateya xirabiya herî mezin kirinê. Ji niha û şûn ve ez ê bêxedar bi ser kesên wisa de biçim. Her wiha we dît bi sedan kes xistine nav bendewariyê. Îsyan nekirina wan jî weke mûcîzeyekê ye. Kesekî sed kes avêtine derekê, dibêje; “bila li benda mirinê bin.” Hinekan dixin pêvajoya li nav çûnê. Tenêbûna wisa nabe, raye wisa nayê bi kar anîn. Tê demjimêreke tu kesî vala nede sekinandin. Ev ne feraseteke rast a navxweyî ya partiyê ye.

Tu ne ji bo xwe, ji bo derdora xwe heyî. Tu hêza wan a fermandarî. Tê pêbigihînî, mercê wê eve. Ger tu ranakî, bi qasî ku tê bikarî rakî xwe biguvêşe. Mesele ez niha nûneratiya hemû netew û partiyê di çarçoveya pîvanên me de têrkeriyê temsîl dikim. Di asta Rêbertî de, têrkeriya fikrê, têrkeriya rêxistinê heye, heta pir zêde li pêşe. Ev girîngin! Ji bo we hemûyan dibin xalên encam jê bên derxistin. Zorê li xwe bikin û bila di sînorê têrkirinê de jiyaneke we hebe.

Gelek astên paşketî pêwîste bên derbaskirin, astên pêwendiyan bên derbaskirin. Bi dijwarî pêwîstiya me bi vê heye. Ya din jî hûn nûneratiya partiyê dikin, ne ya xwe. Vê ti carî ji bîr nekin! Nûneratiya keda bi hezaran şehîd tê kirin. Hûn nûneratiya bi hezaran berxwedêrên çiya û girtîgehan dikin, tevgereke mûazam a partiyê dikin. Hûn ê vê mezinbûnê di dil û mêjiyê xwe de binexşînin û bijîn. Ji vê re bi hestên wisa, bi gîrî-nalîn nêzîkbûn wê camêran bavêje goşeyekê. Wê bêjin; “ev belayê xwedê çiye” û bavêje goşeyekê. Hûn ê hemû vê wisa bizanin.

Min her tim ev ji we re got; mafê tu kesî ji we yê dilê xwe girtinê, xeydandinê jî nîne. Bi qasî min tu kesê ku mafê xwe yê xeydandin û dilê xwe girtinê hebe nîne. Ji ber ku di vê cîhanê de tişta ku li beramberî min nehatiye kirin nemaye, hem jî ji aliyê hevalên herî nêz û dostan ve. Lê hûn dibînin, berevajî ez weke takekî awarte, hinekî fedyokim, şermokim. Nûneratî wisa tê kirin. Divê ku bi şêwazekî awarte mirov xwe bigihîne asta pêşwazîkirina daxwazên netewekî, gelekî, li gorî daxwazên partiyê xwe bigihîne asta guncaw. Tevî ku gelekî zehmetiyan jî

dijîm, ji bilî vê nikarim tenê deqeyekê jî cuda nîşan bidim. Hûn ne di ferqa vê de ne. Li beramberî vê matmayî dimînim. Mafê we ji vê re nîne. Hem em ê di ferqê de bin, hem jî hûn ê baş nûneratiya wê bikin, ger soza we ya partîbûnê rasteqîne, ger bi rastî hûn bi soza ku we daye ve girêdayîne ev ê jî we mezin bike.

Di pêwendiyên rojane de bi israr bi vê pêwendiyê ve girêdayî bimînin. Ger na ez ne di derdê ferzkirina dîsîplîneke bê wate de me. Ast pir başkatiye divê hûn derbas bikin, hêvîdarim ku di vê pêvajoya pêşiya me de, hûn ji hemû pirsgirêkan re serkeftî bersiv bidin. Hûn bi îda ne?

Ro.: Bi îda me Serokê min.

---.: Tu bi hêrsa xebatê dagirtiyî?

Ro.: Bi hêrsim Serokê min.

---.: Karên li qadê bên kirin pirin. Hûn ê peywirên berfireh bigrin rojeva xwe û nîqaş bikin. Teqez li ser esasê derbaskirina van rexneyan hûn nêzîkî pratîkê bibin. Ne asta hevalan a paşketî, asta pêşketî tengav bikin û rista xwe bilîzin. Bawerim hûn ê bikarin vê pêk bînin.

Ro.: Belê Serokê min.

---.: Hûn dikarin sozeke dawî bidin.

Ro.: Dizanim heta niha di nav partîyê de min asta Partîbûnê pêk ne aniye. Li vir weke şansekî partiyê da min, ez tevlî dewreyekê bûm. Bi van tiştên ku min ji vê dewrê girtin, bi taybetî jî bi hêza ku min ji dahûrînên rêbertiyê girtine, bihêz ketina nav pêvajoya pêşiya me, li ser vî esasî teqez partîbûn esas girtin û di mijara serkeftî bi ser peywirên xwe de çûyînê, ji xwe bawerim.

Lê herî dawî dixwazim dubare daxwaza xwe ya çûyîna welat bikim. Yanî di vê watê de dixwazim pêşniyarekê bikim. Bi vê zanabûnê, dîsa bi ev hêza ku min ji vir girtiye pêkanîna vê, li ser vê bingehê bi îda û hêrsbûnê yên pêwîst li vir hatine dayîn. Ji niha û şûn ve di pratîkê de pêk anîn dimîne. Li ser vî esasî… soz didim.

---.: Bawerim me nîqaşeke watedar bi we re kir. Dîsa di vê civîna me de me hewl da em perwerdeker bin. Ger bê dîqatkirin, gelek xisûsên watedar û girê didin hene. Teqez em ê rojên xwe vala derbas nekin. Bi taybet yek bi yek bi hevalan re

niqaşkirin, ji bo ku bibe mînak dikim. Lê encam ji bo we hemûyan giştiye. Hûn ê kun bi kun bikin û bigrin.

Ji çawa bûnê zêdetir, di navbera îda me û ya dijmin de hûn ê di nava şerekî bêxedar de bin. Hûn valatiyên pir mezin dihêlin, lewaziyan raber dikin û dîsa bi şêwazê ku em qet fêm nakin, qet ne li bendê ne winda dikin. Divê ku hûn rê li vê bigrin. Li asta giştî ya ku me afirandiye nenêrin û xwe nexapînin, wisa hesab nekin ku hûn xwe didin jiyîn. Dayîna jiyankirina we gelek zehmete. Weke ku beriya niha jî min got; ya rast a herî asan mirine. Lê niha demdirêj jiyankirin pêk anîn, bûye pirsgirêka min a herî zehmet. Vê bi min nedin çareserkirin. Erkeke we jî ya bi şerkirinê dirêjkirina jiyanê heye. Ya zehmet eve, ya bê serxistin jî eve. Bi şêwazên cuda hûn ê çawa bikarin vê pêk bînin nîşanî we didim. Divê ku hûn qîmeta vê jî bizanin.

Li gorî min hûn hîn jî li beramberî jiyanê xapêner nêzîk dibin. Berpirsyariya jiyanê, bi hemû aliyan ve watedayîna jiyana şoreşgerî ye. Bi taybet jî nirxandina demê, li beramberî peywiran hesasiyet raberkirin, wê karek çawa bê kirin, çawa bê destgirtin pir girînge. Ev peywirên di derbarê hevpariya partiyê de ne. Ya herî girîng jî nêzîkatiya ji gêrîla re ye. Gelek erkên teqez divê ku bên pêkanîn hene, aliyên ku bên sererastkirin hene, divê ew ji niha ve bên dîtin. Ger em vê pêk neyînin, em ê nikarin bidin jiyankirin.

Lê bi tena serê xwe jî dikarim artêşbûnê pêk bînim. Ji ber ku berê hejmar kêm bû, dikarim pê re mijûl bibim, lê piştî ku em ewqas bi ser de çûn, mîna berê her tim ji me hêvîkirina we wê bibe bêwîjdanî. Divê ku êdî qonaxa şoreşgeriya dema zaroktiyê, dema xortiyê bê derbaskirin. Ji ber vê sedemê em ewqas bi ser wê dewrê de hatin. Berpirsyariyên me yên serkeftinê hene, neçariya serxistinê heye.

Li rastiya dijmin binêrin, xedar bi ser me de tên. Naxwaze zêde şansê jiyankirinê ji kesî re bihêle. Di heman demê de ji hev ketine, dê winda bikin. Ji bo winda nekin, bi înad serde hatina wan heye. Li bermaberî vê jî hinekî şêwazê me diyare. Me ya herî zehmet ser xist. Çima piştî ku me ya herî zehmet ser xist di bin navê em, "rehet bûnê" de dev ji xwe berdin. Ev dişibe vê; tu hatiyî, heke nîv metrê din derkevî, nîv demjimêr bimeşî tê bigihî, lê dev ji xwe berdide. Dibêje, "nîv demjimêr maye, pêwîstî bi

ecelekirinê nîne" Lê hûn dizanin ji ber vê nêzîkatiyê çiqas yekîne linav çûne. Ji ber vê nêzîkbûne, em nikarin bikevin nava rehavetê. Berevajî, ger em rawestin yê herî xirab winda bike dê em bin.

Bê despêkirin windakirin ne gengaze, lê bi şêwazê herî xirab windakirin, dema ku hindik dimîne bigihe hedefê windakirin ya herî xirabe. Û hûn hinekî vê dijîn. Me ji gelek aliyan ve nirxandina vê kir. Êdî fêmkirin merce! Ji ber ku ez dimeşînim, karan rêkûpêk dikim, xwe ber bi rehavetê nexin, nekevin rewşên bê hêrs, bê îda. Mafê we ji vê re nîne. Eşkereye ku ev ji bo we xetere. Xwe parastina min, xwe meşandina min yan jî jiyan bikim ango nekim rista xwe lîstina min gengaze. Rista we bi temamî nehatiye lîstin. Ji bo serxistinê bi hêrseke mezin, bi kîneke mezin, di heman demê de bi fikrandineke mezin divê ku hûn dest bi kar bikin. Encama herî girîng ku hûn ji rexneyan derxin eve.

Ji niha û pê ve ti tiştek bi qasî dubarekirina heman rexneyan mirov bêzar nake. Bi salane hinek rexne dubare dibin. Ev şerma herî mezine. Ji dehan yek, ji hezarî yekê van rexneyan hûn ji min re bikin ez ê xwe parçe parçe bikim, dîsa jî pêwistiyên wê pêk bînim. Çima ez nayêm rexne kirin? Em van pêngavên reşkirinê li aliyekî bihêlin, pêdiviya şerên taybet in; dijminê me jî dizane ku me çawa serxistiye.

Rexne, hinekî jî ji bo pêkanîna şoreşgeriya hatiye serxistine. Divê ku serê kêliyê carekê mîna savara her tim tê kelandin, heman kêmasiya negre devê xwe û xwe nexe şûna bizina gunehbar. Di vê wateyê de we wate daye rexne-rexnedayînê. Li ser vî bingehî ji rexneyan encam girtin pir girînge. Divê ku hûn bêjin; "teqez xalên ku hatin diyarkirin ez ê nekevim û ez ê teqez vê bi pratîka xwe re hevgirtî nîşan bibim" Divê ku girîngî ji vê re jî bê dayîn. Teqez bi van aliyan ve çeka rexne-rexnedayînê rast bi kar bînin, bi vê xwe bihêz bikin û vê çekê ji bo zêdekirina derfetên xwe yên serkeftinê bi kar bînin û girîngiya vê destnîşan dikim.

Êdî di dîroka PKK'ê de rexne jî bi vî şêwazî ber bi encam ve diçe, ji rexne-rexnedayînê re weke ku heta niha bûyî nêzîkatiyên bê wate hatine derbaskirin, rexnekirin di heman demê de çareserî bi xwe re anîne, divê ku hûn bidin nîşandan. Hem yên ku rexne dike, hem jî yên ku rexnedayînê didin divê ku bêje;

“çaraserî di min de ye, min çareserî dîtiye.” Di vê wateyê de êdî hûn dizanin sondxwarineke. Bi temamî hûn vê çekê wisa bi kar tînin û misoger hûn ber bi encamên serkeftî ve diçin.

Ger pêwîst bike ez dikarim hinek xalên navxweyî jî rexne bikim. Lê li gorî min pêwîst nake mirov vê jî zêde tengav bike. Rexne giştîne, tên derbaskirin ferman dikin, astên ku tawanbariyê pêk tînin hatine zelalkirin. Li ser vê bingehê ji xwe wê darizandin jî pêşkevin. Pêşiya we ji niha ve hatiye vekirin. Ji bo ku hûn bi encamekî xirab re rû bi rû neyên, di nava partiyê de, dîsa ji ber xisûsên ku ji aliyê dijmin ve dibim mijarê rexnê ji bo bêlayên wisa neyên serê we, vî şansî baş bi kar bînin. Ji ber ku pêvajoyên paşê, hem xemdariyeke mezin dide mirov, hem jî mezin aciz dike. Pêwîstî bi vê nîne!

Dema ku we ev çek rast bi kar anî, her dem karê ku hûn dikin, karê we ser xistiye. Xebat gelek pêşwext hatiye fikirandin, ji kêmasiyên xwe hatiye şuştin, nemaze karekî şansê xwe yê serkeftinê zêde ye. Hûn ê bizanin vê bikin. Hûn ê vê rexnekirin-rexnedayînê jî serê kêliyê carekê ku hûn dikin ji rewşa gunehbariyê derxin. Bi dijwarî pêdiviya we bi vê heye, hêvîdarim ku hûn vê carê wisa binirxînin û serkeftinê pêk bînin.

**18. Îlon 1994**

## Rexnedayîn; Soza Bidawîkirina Paşverûtiyên Dîrokî Ku Hûn Dijîne

Alîkarî û rastiyên civînên rexnedayînê derdixin holê, rê ji nû ve kesayetiya xwe dîtina me re vedikin çine? Misoger pêwîste hûn girîngiya van xebatên ku em dimeşînin bizanin û divê ku ber bi encam ve bibin. Pêwîste her kes hem ya ku tê awatkirin, hem jî asta tê pêşdîtin bi xwe re pêş bixe. Ger perwerdê ev pêk anîbe serkeftiye. Wisa difikirim ku divê hûn teqez vê bibînin û ser bixin.

Ji bo ku xwe bigihînim astekê min xwe pir belav kir, lê hîn jî taybetmendiyên xwe yên kesayetî, xwe di çi halî de çiqas li hevkirî dîtina min, bi min re îsyan li ser îsyanê dafirîne. Hûn hem dixwazin jiyan bikin, hem jî li gorî pêdiviya devjêneger a jiyanê xwe rêkûpêk nakin. Hûn dikarin bifikirin bê ka ev çiqas hêrsê dide avakirin? Mêrxasiya we heye, divê ku hûn vê li beramberî dijmin nîşan bidin. Ji çareseriya nakokiyan re, ronîkirina xalên tarî, di derbarê bihêzkirina aliyên xwe yên lewaz de bi kar bînin.

Em ewqasî xwe deynin holê, hûn ê jî hîn yan bixwe veşartinê, yan jî mîna pîrejina bixwe razandina rast û çep re mijûl bibin. Ger rexnedayîn vê derdixe holê, rewşa paşketî ya ku derdikeve holê diyare. Ji bo we ev mehana çawa hatin dahûrandin? Hîn jî ya pêwîst weke tê xwestin dernexistina holê, ji eyba herî mezin a mirovatiyê jî wêdetir, dibe bê exlaqiyeke mezin. Fêm nekirin bê exlaqiya mezine, ne fikirandin zêdetir wisa ye.

Em ne xebateke ji rêzê, em dixwazin vê xebatê serkeftî bi encam bikin. Ya herî rast yan jî rasteqîn eve. Bi israr hûn kesayetiyên xwe yên nebes, yên ku nikare xwe bigihînê, ser bixe yên kesayetî jiyan dikin. Hûn pir baş dizanin ku, evê we nemeşîne. Çima hûn nabînin? Ev nakokiyeke mezine û hîn jî bi şêwazekî xedar li ser radiwestim. Bi we re ne wîjdan maye, ne hişyarî, ne jî gaveke biçûk ya pratîkî. Yên ku xwe belav dike, belav kiriye, ber bi bayê derewa ketine, ketine nava hewaya dijmin, yê xwe ber bi şêwazê bê hêziyê xistiye biber ketiye. Ji bo ku mirovek wisa be encax qesta canê xwe kiribe. Ji vê re rê dayîna mirovê şoreşger qet nayê fikirandin.

Ez ewqas bi xwe re mijûl dibim ku, ev bûyîna min a xwe, tê wateya berpiryariyên ku ji aliyê partiyê ve hatine dayîne. Em nikarin weke we jiyan bikin. Hem hûn ê bêjin berpirsyariya netewî, şer, Partî, hem jî dema ku pêdiviyên wê bûn mijara gotinê, hêza we wê têra fikrandinê jî neke. Vaye xwe xapandina mirov bi vî rengiye û bi lafazantiyê tiştek nayê rizgarkirin. Tevgerînên nebes jî wê we ber bi windakirinê ve bibe ku, mixabin ev pir zêde bi we re tê jiyankirin.

Dema çûyîna mêvantiyekê jî, hûn dizanin ku hûn çawa xwe rêkûpêk dikin, di dema çûyîna şerê mirin-mayînê de ewqas giran-kulek, ewqas bê pergal ma meş dibe? Em dikevin nav çalakiyên herî mezin ên dîrokê, mirov ewqas xwe bi nebesiyan dadigire? Divê ku hûn ji xwe bipirsin; “çima min ewqas axatî ferz kir, îdaya min çiye?” Dibe ku dayikên we hûn berevajî welidandibin, berevajî mezin kiribin, lê erka şoreşgeran jî ji nû ve xwe rêkûpêk kirine, ji nû ve avakirine.

Gazincên we ji kê re ye? Hûn ji xwedê re şikayet dikin, ji dewletê re şikayet dikin. Wateya vê heye? Şikayetên we ji nalînên zarokan wêdetir tê çi wateyê? Muhafazakariya ku hûn raber dikin, hemû corê nêzîkatiyên ber bi encam ve nabin, hestyarî, dilê xwe bi xwe şewitandin, xwe xistina rewşa belengazan tê wateya ji kê çi xwestinê? Gelo hûn qet bi van difikirin? Me xwest em hinek derketinên mêrxasane bi we bidin kirin. Me baş kir yan na nizanim, lê hebûna we çiqas ji vê re destdayî bû em jî texmîn nakin.

Hûn di bîst saliya xwe de ne, deh qat ji min zêdetir bêhêzî, heta ji aliyê fîzîkî ve jî hûn bêhêziyê raber dikin. Di oxira veguherînê de me ewqas dahûrîn pêşkêş kir. Hûn çawa eleqe nîşan nadin ez ecêb dimînim. Aliyên we yên tiştekî nadin qezenckirin ewqas pirin ku, haya we ji bayê felekê nîne. Çima hûn ji kûr fikrandinê hejarin, çima hûn nayên bihêz tevgerînê? Qurnazî, çîrokên kenv ên bavê minin, meseleya bermahiyên civaka kevnin. Mirovên mezin yan jî mirovên ku mohra xwe li serkeftinên girîng bidin, yên ku ji bingeh ve pirsgirêkê fêm dikin, bi înadeke mezin ser de diçin, kesayetiya heta ku ser dixe şansê henase girtinê jî ji xwe re nasnake. Me ev pir vekirî nîşan da. Çima hûn dûr disekinin?

Bi hêrs pêşwazînekirina vê ne gengaze. Ger yê li pêşberî me sûbayekî dijmin bûya, bawerim ku minê hemû rakirana ser piyan. Teqez ji vê bawerim ku minê ew serûbin kiribana. De bila amûrek di destê min de hebûya, we yê bidîta bê ka min çawa bi kar tanî. Lê hûn, bi taybetmendiyên ku ji jiyanê darbe xwariye, hûr û mûr bûye tên. Ez vê ji bo tawanbarkirina we nabêjim. Pir li we xistine, hûn pir hatine xistin û hûn mîna ku bêjim me rizgar bike tên. “Ne ji ber ku şervanên rizgariyê ne.” Hûn dibêjin; “em hewcedarî rizgarkirinê ne” û hûn ji bo vê hatine. Ev jî heta dawî bijareyeke xelete!

Ez pir zêde li sedemên di bin pêşneketina we de razayîne digerim û sedema sereke eve. Hûn ne hatine gel rizgar bikin, hatine xwe rizgar bikin yan jî hûn giraniyê didin wan. Hûn dibêjin; “Despêkê ez, piştre welat” “despêkê pirsgirêkên min, piştre pirsgirêkên gel” û hûn bi vî rengî rêz dikin. Dixwaze di ferqê de bin, dixwaze ne tê de bin gotina we eve.

Tê bîra min, guftûgoyên min bi mamosteyên min ên zabit re çiqas watedar bûn. Min bi edeba xwe di asteke awarte de bala wan dikişand û bi rastî jî dikarim bêjim di asta mînak de bûm. Gelo camêr dixwest min perwerde bike? Li gorî ku mamosteyê leşkeriye, li gorî ku di dibistana herbê de xwendevan perwerde dikirin, diyare mirov naskirin, pîşeya wî ye. Îhtîmaleke mezin dît ku ez xwendevanekî wisa me û hinek taybetmendiyan raber dikim. Bi jiyaneke pêwendiyên nîvço mayî û ji armancan re ez gelekî cuda nêzîk dibûm. Ya girîng asta pêgîştinê, asta eleqeyê ya asan raber kirin bû. Me li beramberî mamosteyên xwe heman performans raber kir.

Ji bo aliyên gelekan ji we yên nayên terbiyê, ez di vê baweriyê de me ku min waneyên herî bi wate yên dîrokî dan. Lê we çiqas girt, şayanî lêpirsinkirinê ye. Ger me ev wane dabûna kadroyên dijmin ên bijare, me yê zêdetir encam bigirta. Wiha ya wan meseleya xetê ye; xeta faşîst a xilaskirinê. Ger li pêşiya wan xeteke weke ya me hebûya, bi wan danahevan dê camêrên çawa ji wan derketiba? Lê hûn ji ber ku ji jiyana herî jêr, herî jihevdeketî, herî matmayî tên, daneheveke we ya rêk û pêk nîne. We xwe wisa avêtiye holê ku, ji yê tê re dibêjin axê min, ji yê diçe re dibêjin paşayê min, ger ji rastê ve li we bê xistin ji çepê ve temam dibe, heke lingê wî bişkînî, çavê xwe jî derdixe, hûn ji kombûna

taybetmendiyên ku di jiyanê de ji van hemûyan zemîn pêşkêş dike pêk tên. Me girîngî da nîşandayîn û derbaskirina vê. Ji ber ku bi perwerdê mirov di asteke mezin de dikarin pêşkevin. Dibistaneke mîna şer sotêner teqez vediguhere.

Nizanim me çi fêrî we kir. Rastiya ku derketiye holê çiye? Dubare dibêjim; rastiya sereke ya vê dewrê, ji bo partiyê, yê ku cihê yekane veguherîna netewiye ji vê derê rastiya ku divê di şer de bê teyisandin çiye? Rexnedayînan çiqas bandor kiriye, hûn ji ku derê ber bi ku derê ve birine? Gelo ast daye qezenckirin, we fêmkiriye?

Ab.: Serokê min, ya rast ev dewre dibe berdewamiya dewreyên din. Ya din jî bi wesîleya salvegera pêngava 15'ê Tebaxê nemaze dewreyeke gelek tijî derbas bû. Dahûrînên dewrê dahûrînên girîng bûn. Ji aliyê partiyê ve, ji aliyê artêşê ve û ji aliyê nûnertiya gel û rêveberiyê ve gelek tişt ronî bûn. Di partîbûn, dîsa artêşbûnê de, di derxistina holê ya esasên artêşê de û di pêşxistina vesaziyan de, li ser esasê ji nû ve sererastkirinê, rewşa derxistina holê ya dahûrînan heye.

Guftûgoyeke me ya zêde bi gel re jî derbas bû. Asta netewî, pirsgirêkên çalakiya gel jî hatin nîqaşkirin û tehlîl kirin. Di asta meclîsan de, dîsa di asta enî de rêxistin, di asta çalakiyên girseyî de vekirinên nû hat pêşxistin. Di pêvajoyên ji niha û şûn ve çalakiyên Partî, artêş û gel divê ku çawa mezin bibin jî hat nîşandan. Dahûrînan ev ronî kir.

Hevalên ku tevlî dewrê bûn di perwerdeyeke dagirtî re derbas bûn. Di vê wateyê de di asta zanyariyan de pêşketineke girîng hat destxistin, dîsa di asta tevgerîn û perwerdeyên din de pêşketin heye. Vana niha bi pêvajoya rexnedayînê temam dibim. Di tevahiya vê dewrê de perwerdeyên ku hatin dîtin û di dawî de pêvajoya rexnedayînê, bû pêvajoyeke hemû corên nêzîkatiyên bêhêvî, nêzîkatiyên şopê binketinê li ser xwe digerînin a rexnekirinê. Ji nû ve bawerî, teqez nêzîkatiya serkeftinê, bawerî derxist holê. Hem hevalên ku tevlî dewrê bibûn, hem dahûrîn ger ber bi bûnyeya Partî û artêşê ve biteyîsin, dê heman ristî bilîze.

Milîtaniya partiyê, xalên sereke yên artêşê, rast artêşbûyîn, xalên sereke yên rast partîbûnê derxist holê. Di vî alî de nebesiyên heyî çine di asteke giring de derxist holê. Hemû

corê nêzîkatiyên keyfî, yên ku xwe esas digre nebes, takekesî hatin rexnekirin û li şûna vê nêzîkatî divê çibin derxist holê.

Dahûrînên vê dewrê, di bingeh de dê di bûnya artêş û partiyê de rê li ber pêşketinan veke. Çêkera hevalan a vê dewrê, di asta ku mirov bikaribe xalên sereke nîqaş bike de ye. Ji qadên têkoşînê, çêkera rêxistinê re dikare bê veguhestin, dikare hêz bide, ji nû ve di sererastkirinê de dikare rist bilîze.

---.: Pêwîste hûn nirxandina wêje ya dewrê jî baş bikin. Yek ji we dikare vê veguherîne esereke wêjeyî jî. Li beramberî nêzîkatiyên mirî, ji xwe bêzar, bêhêvî, belav, hemû corên ji rêderketinan sengereke mezin, qadeke navxweyî ya mezin, bi mafê êrîşeke mezin me şerek da. Hema bêje me di hemû qadên weke bawerî, zanîn û edebê leşkerî de şerek meşand. Ger hebe rêzeke we, divê wijdanê we, xwe lêpirsîn bikin. Rexne dayîn eve. Ez têra çi dikim, çi dikim, ji bo kê heta ku derê heme? Heta ku hûn van pirsan ji xwe nekin nikarin bikin.

Ger em nêvengê ji we re bihêlin, çîroka ku bi hezaran sale dijmin bi rê ve dibe ya; “parveke, parçe bike, rêve bibe” hûn ê li ser hev ango li ser me ferz bikin. Hem bi niyeta baş, hem jî li ser navê îdayên mafdar dikin. Hûn heta gewriya xwe bi van dagirtîne. Vê bibînin. Hîn jî çiqas ev hatiye derbaskirin şayanî lêpirsînê ye. Hûn ê bibin çiqas nebesiyên mezin, çiqas rewşeke bi yê kevn zindîkirinê re dagirtiye. Kesayetiya xwe dixapîne, ya ku bi asanî dixapê ye. Ya rast min ev çîrok lêkolîn kir, lê pir sînordare.

Ab.: Ber bi vî alî ve hinekî tê kişandin Serokê min. Ya din jî ji bo rêgirtina li helwestên dijber, astengkirina wan û dibe tinekirina wan. Pêşketin dê ji bo pêvajoya niha û şûnve bê nirxandin. Gotina; “her tişt li vir hatiye temamkirin”pir zêde ne raste. Lê ber bi arasteya erênî ve ji meşê re amadekirin girînge.

---.: Araste hatiye xêzkirin, perspektîf hatiye dayîn, perspektîf hatin dayîn, dîsa xalên sereke hatin nîşandan. Yên ku wê bêxedar bi teyisînin, bişopînin kiye? Wê dîsa bêjin; “bi hêza ku me ji Rêbertî gitiye” lê piştî çend mehan hûn vî hêzî xilas dikin bi awayekî rûreşî derdikevin pêşberî me. Çîrok eve! Em çiqas we bihêz bikin û bixin ser rê, piştî demeke pir kurt hûn xwe tînin asta bê henase, dest û ling şikestî, marol çûyî. We heta niha her tim wisa li xwe kir. Ev çarenûse, çiqas nêzîkatiyeke rêzdare? Di nava me de yên wisa pir zêde ne. Ya rast karên wisa giran ku

mirov nikare ji bin derkeve jî nînin. Ev bêrûtiyeke, rastiya bê terbiyebûnê ye. Wê biçin, nirxan çarçûr bikin, paşê jî ala îflasê rakin û bêjin; “Ya pîr me rizgar bike.” Vana zêde tiştên rast nînin û divê ku mirov vê biguhere.

Li gorî te Fu. divê em çi çawa bigrin dest? Bi vî rengî her demjimêrê jiyankirin mirov şêt dike. Ez ê çawa ji binî derkevim? Bawerim tu dikarî bi çavekî wêjeyî bibînî. Weke ku ji dilê te tê baxive, dê ev rewşa me ber bi ku derê ve bibe? Her tiştî vekirî bêje, em xwe nexapînin. Ji hemû alî ve, bi hemû aliyan ve em di xeteke ecêb de ne. Ger tu dîqat bikî, ya ku li ser me serwere ne helwestekî ji rêzê ye.

Fu.: Serokê min, ne ji aliyê Rebertî ve, ez ji aliyê me ve zêdetir difikirim.

---.: Tu dikarî li ser xwe bifikirî?

Fu.: Bi giştî dikarim di derbarê koma hemû hevalan de bifikirim Serokê min. Ya rast hema bêje em hemû pir ji paş ve dişopînin yan jî pêşketin di wateya rast de nayê fêmkirin. Divê wateyê de pêkanîn jî paş de dimîne.

---.: Hûn pir tengav dibin yan jî ev xeterî heye; mesele tevî ku ewqas şûnde ne jî tengav dibin, dibe ku bûnya we ranake.

Fu.: Serokê min bawerim pirsgirêk ne takekesiye, hinekî giştiye. Hema bêje weke teysina taybetmendiya Kurd…

---.: Temam, teysîna wê, lê wisa serdeçûna me jî çiqas raste? Bêyî ku hûn zorê li xwe bikin divê ku vê bêjin, ji ber ku hûn pir zorî dikşînin.

Fu.: Belê Serokê min, ev nebe kar nameşin.

---.: Hûn ê çiqas bikarin li ber xwe bidin? Piştre veneguhere teqînekê. Bi gelekan re veguherî bertekeke paşverû. Heta niha jî pir zêde vediguhere. Lê em we li goşeyeke pir rehet bihêlin yan jî em bêjin em ê we weke hêzeke rêveber bigrin, hêza we têra wê jî nake. Hûn di xaleke ecêb de ne. Rewşa şervanan jî wisa ye. Hemû şervan û xebatkar di heman rewşê de ne. Ji bo pêkanîneke dîrokî, ya rast bi qasî ku bi ser de diçî, ser de çûn ya herî başe. Lê divê ku mirov malê xwe jî pir baş nasbike, kereseyên xwe baş bizane. Îdaya we, hirsa we çiqas mezine, hûn çiqas bi azwerî ne? Gelo hûn fêm dikin ku ji çi hez dikin? Hûn zanin hûn ê çi çawa bijîn? Teqez pêwîste di van de zelalî çêbibe.

Ya rast provakatorên di nava me de, gelekî hewl didin wateya serdeçûyîna min bidin. Çi dibêjin? Dibêjin ku ez jiyana mirovan ser-bin dikim, tînim asteke neyê naskirin. Ya kevn bi şêwazekî baş ew tînin ziman; yanî parastina ya kevn pir xweşik tînin ziman.

Ab.: Serokê min, di îdaya jiyan tê tinekirinê de ne. Jiyana takekes…

---.: Belê, yek ji provakatoran dibêje; "jiyana me dizî"yên din jî; "ger jiyana wî di sala 1973'an de jidayik bû, bi wê şêwazê divê ku mirov bixe bin erdê; ji bo rizgarkirina jiyanê divê ku ev bêkirin, ji ber ku ne tenê dizîna jiyanê, niha tine dike" wisa dibêje.

Ab.: Dibêje; "Jiyana mirov, jiyana tak tine dike."

---.: Gelo wisa ye? Na! Badorên min çine, divê ku em wê baş fêm bikin. Ger pêwîst bike tine bikin. Ez her tim dixwazim bêjim; şûna ku bi bênamûsî bijîm, bi şerekî giştîbûyî mirin baştire. Ez van vekirî dibêjim, li beramberî we hemûyan dibêjim. Xwe bi ferasetên xelet bi me ve girê nedin. Heta dawî me fêm bikin, heta pirtûkên provakatoran jî li hev din, ji bo fêmkirina me ger pêwîst be bikin. Paşê nebêjin em xefîl hatin girtin. Her kes nikare bi me re bimeşe, her kes nikare bijî. Ez jî nikarim her kesî tevlî jiyana xwe bikim. Ji xwe li gorî provakator, dibêje mîna sihrê girê dide. Dibêje; "mirov çawa girê dane." Hinekî jî matmayî ne.

Ab.: Bandorkirin û rêxistinkirin tişta ku tê fikirandine Serokê min, di vir de asê dimînin.

---.: Bandorkirin û rêxistinkirinek bihêz. Sala borî rûsipiyek, kesekî emniyetê yê asta herî jor ê dewletê digot; "tê min jî rêxistin bike." Yanî zemînê rêxistinkirinê çiye dizane, ji ber ku şev û roj di nava heman xebatê de ye û ya me bêtir bandorker û rêxistingere. Bêguman piraniya xwe di bin bandora vê de ne. Çav nedayîna vekirin, ji ber bandor û rêxistingeriyê ye. Dil dixwest ku hûn ji wisa bandorker û xwedî hêza rêxistinkirinê bin. Ji xwe xala sereke ya ku bi wêneyan dixwaze ji we re bê dayîn jî eve. Bandor û rêxistin bi me re di asteke awarte de ye, lê bi we re berevajî ye. Dîqat bikin, ez bi bandorbûna we asteng dikim? Berevajî, ji bo ku hûn bibin xwedî kesayetiyeke bandorker

waneyên dîrokî didim. Lê mirovên bûne kevir bandorkirin hunerekî awarte ye.

Fu.: Serokê min, ya rast yên ku wan nivîsandiye, bi taybet ger pirtûka provakatorê dawî bê destgirtin, çiqas ji Serokatî bandor bûne vekiriye.

---.: Bêguman! Ez Rêbertiya wanim jî. Ji ber ku niha ez hemûyan bi rê ve dibim.

Fu.: Ya rast berevajî xirabiyan jî heye.

---.: Ez wan dixebitînim. Eşkereye ku heta mirinê rizgar nabin. Ew jî bi min ve girêdayîne.

Fu.: Rêbertiya netewî hinekî jî wisa ye.

---.: Netewî heta şoreşa civakî pir vekirî dibînim. Ez nikarim weke we bibim. Ev asta we ya bandorkirinê, şefîtiya malbata gundiyekî jî derbas nake. Ya din jî azweriya we lawaze. Lê bi min re ji bo ku tiştekî mirovan bandor dike bêjim azweriyeke. Ez ê mirov bi çi bandor bikim, ji bo min bi qasî nan û avê pêdiviye. Girêdanên rêxistinî hema bêje ji bo min sedema jiyanê ye. Me xwest em vana hinekî bidin. Lê ji ber ku hûn pir înkargerin fêm nakin. Mirov çawa we tehlîl bike? Wê biçin û hemû xelet pêk bînin.

Nakokiya sereke ya ku ez niha pê re di nav pevçûnê de me; nakokiya di navbera bandorkirin û rêxistinkirinê û nakokiya ku bertek û bê rêxistiniyê ferz dike. Ez di asta netewî û partiyê de vê pir baş dijîm. Ez çiqasî we dikşînim em ewqas bertek dibînin. Ya rast ev çîrokeke mezine, şerekî mezine! Çavkaniya xwe ji nehatina rêxistinkirina jiyanê digre. Ez wisa jê nefret dikim ku, ger serdemên navîn bûna, heta em di pêvajoyên paşketîtir de bûna em ê weke Cengîz Han bibûna.

Hinekî jî me bi wî re qiyas dikin? Ya rast di wateyekê de mafdare, di wateyekê de jî nemafdarin. Ji aliyê azweriya şer, bandorkirin, rêxistinkirinê ve xalên dişibin hev hene, lê ji aliyê bîrdozî, siyasî, vesaziyên civakî ve ferq hene. Ji xwe perteka we ya mezin li beramberî vê ye. Bifikirin malbatek, eşîreteke we heye û hemû bi girî û nalînan dagirtîne. Hûn ê di nava vê pergalê de çawa bijîn? Ma wê qet damarên şeref û namûsa we neqetin, nefreta we, hêrsa we nebe? Asta netewî sed hezar qat ji wê girantire. Malbateke bi bejnkurtan, nexweşan, li ser cîh ketiyên nale nal dinalînin, bi mirovên ku rêya xwe şaşkirîne re dagirtiye!

Ya rast berpirsyariya we hinekî jî di vir de ye, girtina dilê we, hişkbûna wîjdana we jî dîsa di vir de ye. We, dilê xwe pir hişk li beramberî rastiya netewî girtiye. Wîjdana we li ku derê ye. Wîjdan, dîtin lêpirsîn kirin li ku derê ye? Ev bi hev ve girêdayîne. Li şûna vê takekesiyeke pir hişk û paşverû, cihaneke pir zêde hatiye tengkirin û ez ê nebêjim, felsefeyeke jiyanê ya ku bi xwe ve hatiye sînordarkirin jî, ya rast asta herî hovane ye, hest pir lewazin.

Ya rast dema ku min xwest Kurd hinekî vekim, min dît ku divê teqez ez xwe bigihînim rastiya Kurd. Xwe gihandina asta netewî ya giştî jî girînge. Mesele, yên din gelekî ji te cudatire. Pir zêde ji dest derketiye, heta dawî ji dijmin re dixebite, derewker û pir saxte ye! Dema ku azadiya wî bû mijara gotinê, pir kore, pir înkargere! Dema ku tu dixwazî rastiya wî fêm bikî, şemitoke û dikeve nava revê. Û hîn jî ez hewl didim Kurd bigrim. Ma hûn nabînin, bi awayekî metirsîdar çavên xwe yê revokane.

Reva we ya ji azadiyê mîna yê ku kel û pelê xwe kom dike, lê nizane wê biçe ku derê ye. Ji hemû damarên nijad pêwendiya xwe qutkiriye, kesayetiyên ku ji normên mirovî yên sereke pêwendiya xwe qut kirine. Ya rast divê ku mirov vê bi fîlmekî biteyîsîne. Kesên weke Yilmaz Guney ceribandin, lê zêde pêşnexistin. Ger ev xebata şoreşgerî nebûya, ger min li ser bûyereke hunerî lêhûrbûn bikira, li gorî min bi qasî hinek senaryonên serkeftî, bîzat lîstina wan jî minê bikariya pêk bînim. Mixabin ji ber ku şoreş girîngtire em nikarin eleqeder bibin. Lê girtina vî Kurdî, ya we pir girînge. Ji xwe ya min jî meraqeke min a mezin heye.

Di tevahiya jiyana xwe de min hewl da ez xwe bigihînim rastiya we. Ev kîne, dixwazin birevin ku derê, dixwazin bigihijin ku derê ez pir baş dizanim. Ev belengazane, bêhêzane, derewkerane, înkargerane, xefîlane, yên xwe nizanin, qirêjone û hejarin! Ya rast bi meraqeke mezin li pê me. Bêguman ev pir girînge. Bi çarenûsa gelekî re eleqeder nebûn, teqez bi asta mirovê heyî re li hev nake. Vaye rêxistinkirin, bandorkirin ji ber vê sedemê ye. Em dikarin dev ji vê berdin? Hûn pir bi rehetî dev jê ber didin. Hûn dûmana cixarekê ber bi bayê dixin, hema bêje hûn di nava dûmana wê de xwe winda dikin. Ji xwe rahênana we ya cixarê jî eve. Gelek fêrbûnên we yên dişibin vê hene, xewek,

ehbab-çawîşî, xwe rahênan ya rast we ji rastiyan qut dike. Ev xwe rehetkirineke, ji bo vê hûn vedişêrin.

Ger hûn bi ser rastiya giran de biçin, serê xwe bi wê dagrin, wê feraseta we ya rehetbûn û hêrsê biguheriya. Ya din jî hûn neçarin bibin hêza çareseriyê. Lê hûn nikarin wê jî bikin, ji bo wê bilez pêwendiyên ehbab-çawîşî, gelek fêlbaziyên dişibin vê, rewşa sereke ya xewê û hemû corê jiyana xafîl derdikevin holê. Çima? Ji ber ku şêwazên jiyana xafîl hene. Çima? Ji ber ku ketina cewher we ditirsîne, hûn netirsîn jî eleqe nîne. Ez ê di vê mijarê de jî bi ser we de bêm.

Ya rast heta ku ev provakator hebin wê bi ser me de hatinê jiyan bikin. Ji ber ku mûçeyê wan jî bi xebatên dijberî min dimeşînin ve tê pêşwazîkirin. Ji bo ku rojane mîdeya xwe tijî bikin, pêwîste bi min re şer bikin û ev jî pir vekiriye.

Niha bifikirin, hûn xistina rewşa yên herî bêrêz li beramberî jiyanê. Heta neyê çareserkirin hûn ê çawa jiyankirinê bifikirin. Îro li mîlyonan zarokan binêrin, çavê hemûya bi rondik û hêvî nîne. Li temen mezinan binêrin, li jinan binêrin, li ciwanan binêrin, di rewşeke xirabtir de ne. Ev ê biçin ku derê? Ev rewşa we çiye? Ne xwendin-nivîsandina we heye, ne jî bi awayekî rêkûpêk tenduristiya we, ne jî pîşeyekî we heye. Tiştekî we nîne. De başe hûn ê çawa rehet bibim? Di demên borî de afyon didan vexwarin, hinek mezheban jî ditevizandin, di nava partiyê de jî ji rêderketinên rast-çep ve ditevizinin.

Em ê jiyanê li ser we ferzkirinê bidomînin. Li gorî min reveke mezin heye. Divê ku jiyana şayan û pêwîste mirov xwe bigihînê bê afirandin. Lê ez ji we jî ditirsim, ji ber ku hûn pir zehmetiyan dijîn. Hûn di ketina qada jiyana fermanker de, bi taybet jî di ketina jiyana fermî, siyasî, leşkerî de gelekî tengav dibin. Ez jî li beramberî we xemgîn dibim. Qaşo hûn milîtanin, camêrên çalakiyê ne. Lê şansê we dilê mirov bi we dêşîne, mesele ez ne wisa me. Hûn ji bo rewşa min xembar dibin? Ez dîmenekî wisa didim? Bi mehane hûn dişopînin, hewaya ku ez di teyisînim çawa ye?

Fu.: Kesekî hukim dike, bi taybetî jî bi israr…

---.: Wekî din Ab. ya ku ji hewaya min tê fêmkirin çiye? Bê tirs bêje.

Ab.: Tirsa min nîne. Li ser jiyanê serwer, ji xwe bawer, yê ku armancên xwe yên diyar, di meşandina çêkera xwe ya navxweyî de her tim rê dibîne, di nav mijûlbûnê de mayînê hez dike, yanî hewayeke afirêner û pêşdixe dide. Ger na, hewayeke di qerisîne, radiwestîne, sînordar dike nîne. Berevajî vê hewayeke wisa.

---.: Pêwîste hûn taybetmendiyên hukumker rêz bikin.

Ab.: Tevgerîn heye, zindîbûn heye û ev jî li ser hemû jiyanê, xebatê raste rast bandora xwe dike.

---.: Jiyankirin ango jiyan nekirina min zêde ne girînge. Hûn dikarin bi pirtûkên dîrokî û kesayetiyên dîrokî re jî berawird bikin. Provakator berawird dikin, hûn jî bikin. Ez ne xwe, her tim taybetmendiyên giştî diteyisînim û li vê nenêrin û xwe nexapînin. Ya ku tê teysîn kombûna taybetmendiyên mirovî ne. Hema ji hemû Pêxemberan, ji her kesayetiya siyasî tiştek tê de heye, ez di vê baweriyê de me. Ya ku di kesayetiya min de jiyan dike ne take, dîroke, kombûna taybetmendiyên mirov hemû ne. Teyîsîna gelemperiya ji holê rakirina ferdiyetê ye. Li hêza Kurd bifikirin, hêza giştî kirina wê raber kirin çiye?

Hinekî bi çavê wêjeyî provakator çawa dinivîse, hûn jî dikarin binivîsînin. Provakator ketine nava kelecanê, hîn jî di nava xofekê de bi sedan pirtûk dinivîsînin. Bila binivîsînin, lê dikarin cuda jî binivîsînin. Çima vê dibêjim? Ez vê li rewşa we dinêrim û dibêjim. Çend fetihkarên jiyanê di nava me de hene? Yê ku pêwendiyekê fetih dike heye? Difikirim ku, ji we hemûyan re di bin navê rayeyê de hinek tiştan pêşkêş bikim, gelo hûn ê bizanin bi kar bînin? Em zêr pêşkeşî we bikin, hûn ê bikarin bi qasî tenekeyekê binirxînin? Hîn jî munafiqên ku nehatine îmanê di nava we de hene? Em çawa şer dikin hinekî fêm kirin?

Ab.: Dikarin wane jê derxin Serokê min.

---.: Dîsa xeteriya ji rêderxistinê heye, em rê li wê bigrin. Ger di têkoşînê de hûn bi xwestekin, tevî ku gelek derfetên di dîrokê de ji dest revîne hene hûn dikarin vê binirxînin. Lê hemû wisa difikirin; mesele di dîroka Tirkan de Mûstafa Kemal dibêje; “min Wahdettîn çawa bi kar anî, Çerkez Ethem çawa di destê min de bû, di nav lepê min de bû, lê rizgar bû, ya rast min Karabekîr kir zilam” û hwd. gelek tiştan dibêje. Ev hemû çima tên gotin? Li beramberî ya ku pêş dikeve cih û rista xwe fêmnekirine.

Mûaviye çima li beramberî Hz. Elî serdest bû gelo? Çawa ser xist? We nihîniya vê fêm kir? Tu qet pê fikirî, çima ji pişt ve xencer li Hz. Elî dan? Yekî ewqas mêrxas, ewqas eqîd, çawa bi asanî hat tasfiyekirin?

Fu.: Ji ber ku pir saf bû, ne kesekî wisa zêde ji nakokiyan encam derxistibe.

---.: Di safîtiyê de dişibe gelekan ji we ne wisa? Saf û ji piştê xencer bûn! Hem jî li beramberî Mûaviyê, li beramber Yezîd binketin pir bi êşe. Lê divê ku mirov li lehengiya Huseyîn jî binêre. Di çolê de ji tî û birçîna difetise û herî dawî serê wî tê jêkirin, li mizraqê didin ji Yezîd re tînin. Serê yên me jî wisa têne jêkirin. Heman Yezîd, heman nêçîrvanên kelleyan, di çolan de heman fetisîn. Dibêjim ji dîrokê wane derxistin lê, hûn wê jî ser naxin.

Çiye di çolê de di nava tîbûn û dorpêçiyê de fetisîn? Ev dişibe yekîneyên me yên gêrîla. Ya rast ne çarenûs bû, Huseyîn dikarî cuda jî tevbigere, hinekî siyaset pêwîst bû. Hûn dizanin Mûaviye Quran xist serê mizraq û wisa bi ser wî de hat. Yanî bi asanî dikarî derbas bike. Ne merc bû li beramberî Qurana ku xistibûn serê mizraq şer rawestîne. Diviya bû hema bi wê fêlbaziyê bihesiya û ev jî wê baş bûya. Rewşa yekîneyên me yên gêrîla, rêxistingerên me jî dişibe vê. Safbûn lewaziyeke û rê ji serdestiya pergalê re vedike. Lê mixabin ev jî bi we re pir bihêze.

Ez jî hewl didim ji dîrokê wane bigrim. Tevî cihê min tenge jî, ez ne ewqas saf û xefîlim. Ger hûn xwe bi min re berawird bikin, di navbera me de bi qasî çiyayan ferq heye.

Ma kesayeta ku nehatiye dahûrandin ma? Tu bi temamî hatî tehlîlkirin Yi..? Te cilê leşkerî jî li xwe kiriye, bejna te zirave, lê erk giranin. Niha rewşa te cuda ye, tu çawa li Amedê dinêrî?

Yı.: Hatiye wêrankirin Serokê min.

---.: Dev ji wêranbûnê berde, tu bi çavê şoreşgerî çawa lê dinêrî? We di berxwederiya feodalî de hinekî li ber xwe da, gelo hûn ê bikabin bi mêrxasiya şoreşgerî bimeşin?

Yı.: Çareyeke me ya din nîne Serokê min.

---.: Di nava bê çaretiyê de we nefetisînin? Ji pirsgirêkên qadê re nêzîkatiyên şênber mîna yên ku me kirin pêwîste. Gelo dê şansê guhertin û veguhertinekê hebe?

Yı.: Em ê ked bidin Serokê min.

---.: Eşkereye ku wê hewldan hebe, lê ev jîrî û behremendiyê dixwaze. Tenê yek tişt pêwîste; henase dayîn-stendin! Piştî ku ew hat pêkanîn gelo wê pêşketinan pêk bîne? Tê bikarî bibî hêzeke baş ê rêveberî, hêza perwerdê, sengergirtin û hêza moralê? Tu yê xwe ne weke ku me avakiriye, ma tu yê bi şêwazê zirav yê xwe yê kevn ferz bikî?

Yı.: Wê tiştekî wisa nebe Serokê min. Teqez nebe. Ger em winda bikin dê ji ber safîtiya me be.

---.: Tu ji me çi fêrbûyî? Bi mehane me got em te kûr bikin. Ger tu bi xwe re qiyas bikî ka em çawa nin?

Yı.: Pir cuda ye Serokê min.

---.: Çima? Bi gotina provakatoran tu dibêjî min çi diziye? Dibêjin; "mirovê me û berxwedaniya me, hema her tiştê me diziye? Wisa dibêjin? Çi ye ev dizîn? Ez dibim dizê şoreşê, dizê civakê?

Ab.: Ya rast ew difikirin li ser hinek tiştan bijîn Serokê min, dema ku dibînin ji vê re derfet nayê dayîn, derfet nabînin…

---.: Dixwazin asta civakê ya nezan, nerêxistinkirî, ne şiyar bi şêwazê tacîr û tefeciya bidomînin. Ji vê re îcaze nedayîn jî meziniya me ye.

Ab.: Ji aliyê nirxên şoreşgerî ku derketine holê…

---.: Mîrateya şoreşgerî jî bi alçaxî îstîsmar dikin. Waye min jî tiştek bi wan nekir. Diviya bû van hêzeke serweriyê bi we re pêşxistiba, lê ew hêza we nîne. Ew dixwazin xwîna şoreşê bidizin, dixwazin dilê şoreşê, asta sînordar a jiyana civakê bifiroşin. Çiqas tawanekî mezine. Hûn bi nûneratî nekirinê re çiqas ji me dûr, nebes dimînin. Halbikî li beramberî van divê ku mirov çawa rabe ser piyan. Mezinbûna fikrê di vir de derdikeve holê. Yên ku di oxira nirxên mezin de şer dikin xwe negihandina wan a fikrandina mezin, çare û tevdîr pêşnexistina wan nayê fikirandin. Hûn asê dimînin û asta we cesaret dide van, ji bo wê bi asanî hespên xwe dibezînin. Mirov pir dixwaze taybetmendiyên we jî bandorker, rêxistinger, encamgir bûya. Ya herî girîng jî divê hûn bi asanî nemrin.

Gelek taybetmendiyên te li gorî berê hatin guhertin?

Yı.: Belê Serokê min, tengbûna berê heyî hinekî hat derbaskirin.

---.: Tengbûn ne tişteke, divê ku gelek têgehên din pêşketinên pir mezin derxîne holê, hêz, serxistin, tevî ku derfetê serkeftinê nîne jî, evîndarê hinek taybetmendiyên xwe ne. Tevî ku bê rêxistinî, bê parastinî, dev ji xwe berdan pir vekiriye jî, hûn evîndarî xwe bûn û we taybetmendiyên me yên partiyê yên pir mezin bandorker, rêxistinger paşçav kirin. Ev nêzîkatiya xafîlane, ev derfetên ku bi dest me ketin û îmkan bi vî rengî destgirtina we, çiqas rê ji dest derketina fersendan re vekir?

Xwezî firseta min hebûya, ez her roj wisa li ser qadan rawestiyabam. We bi çi û çawa lîst, we çi çawa ji dest revand; bi hemû aliyan ve me danîba holê. Ji xwe min bi xwe ji filan û bêvan re vegotinê, ji yê din re gotinê belav kiriye; wî da revandin, vî revand, ew berevajî hat, ev xirap nêzîk bû, hîngî min wisa got, êdî wisa lêhat ku ez ê ji kê re çi bêjim ne diyare. Ez bawerim ku, yên ku pîvanên xwe bi temamî girtine dikarin destana binivîsînin. Ev qonax, qonaxa destan nivîsandin û dayîna nivîsandinê ye. Lê heta niha bi qasî ku hat dîtin, gelek bi asanî xebata ku dikarî bê rêkûpêk kirin we ser nexist. Pir zêde serê min meşxûl dike. Niha ez ê çawa bijîm ez bi xwe jî texmîn nakim. Çawa dijîm yan jî ez çawa bijîm? Em bi we re mijûl dibin, em ê bibin jî. Rêyeke me ya din a derketinê nîne.

Wekî din ê ku nehatibû dahûrandin kî hebû?

Ab.: Hevalên Ya. û Nû. hene Serokê mim. Em berê hinekî eleqedar bibûn.

---.: Weke din kesên ku hûn bi wan re tangav dibin kî hene? A. jî xwe dahûrand. Ya din jî texmîn dikim Ce. heye.

Ab.: Serokê min Heval A. jî, Ce. jî hatin rexnekirin.

---.: Yanî Ce. veguherî?

Ab.: Di pêvajoyeke wisa de ne Serokê min.

---.: Hema bêje parçeyekî hestî maye, dibe ku bişke. Dibe ku veguherîna wî zehmet be.

Ab.: Dikarim bêjim me rê li şikestinê girt. Demek rewşeke wisa hat jiyîn, lê pêşketin heye.

---.: Bi rastî ber bi bûyîna xwendevanekî dibistana me ve diçe? Gelo dikare xwe ji nebesiyên mezin rizgar bike?

Ab.: Araste wisa ye Serokê min, serkeftin encax bi pêvajoyê re girêdayî bê dîtin.

---.: Dikare bibe xwedî karekî sûdmend? Yek ji wan hevalên ku ez dibêjim westandin û bêhîvîtî ji rûyê wan tê xwendine. Bi kurtî Nû. çi temsîl dike?

Ab.: Me zêde nîqaş nekir Serokê min.

---.: Tevlîbûna te ji Şirnexê ye ne wisa? Di nava PKK'ê de rewşa te çawa ye, hêza te çiqase? Tu tê jiyanê? Em çi ji te bikin? Te dewreyek ji me xwestibû, nêzîkî saleke tu li gel me yî, lê tu mîna çar hezar sal beriya niya yî. Tê çawa xwe nû bikî, hêza te heye?

Nu.: Serokê min hêza min heye.

---.: Em nizanin çi di kesayetiya te de heye. Te çi ji vê partiyê, vî şerî fêm kir? Tu hevalê kevn ê Ab. belê Ab. tu çima hevalê xwe yê kevn bi hêz nakî? Ne erka te ye, ma wê jî ez bikim? Madem te di 85'an de ew dît, min ji bo wê anî vir, hevalê te yê kevne tê fêm bikî. Ma tu bi taybet pê re mijûl bû?

Ab.: Zêde nebûm Serokê min.

---.: Ma dibe? Divê ku tu hevalê xwe yê kevn bihêz bikî. Ez hevalên xwe yên kevn çawa bihêz dikim ne wisa Fu?

Fu.: Raste Serokê min.

---.: Her kes neçare hevalê xwe yê kenv pêş bixe. Tu dikarî çi bikî, te xwe derbas kir?

Nu.: Serokê min, ji xwe min rexnedayîna xwe da.

---.: Çiye rexne dayîn, ev tiştên ku ez dibêjime.

Nu.: Di dahûrînên ku Rêbertiya partiyê kirin de min kesayeta xwe pir vekirî dît. Li ser esasê rastiya dahûrînan ez bawerim ku ez ê bibim endamekî partiyê û vê jî di pratîka xwe de nîşan bidim.

---.: Hêza te heye?

Nu.: Hêza min heye Serokê min.

---.: Tu dikarî di çiya de bimeşî, lingên te saxlemin? Astengiyek, nexweşî, seqetiyeke te heye?

Nu.: Astengiyek nîne Serokê min.

---.: Biryara te bihêze, zanyariyên te jî ne kêm in. Lê neh sale ewqas xwîn hatiye rijandin, tê hesabê van çawa bipirsî? Ewqas şehîdên Botanê hene, ji me bersivê dixwazin.

Nu.: Serokê min, ji xwe deh sale di nava refên partiyê de me. Piştî ku hatim vir, dema ku li pratîkên xwe yên borî dinêrim, min dît ku pratîka min a borî neketiye xizmeta partiyê. Lê piştre

min hêdî hêdî kesayetiya xwe naskir û dixwazim biguherim. Min heta roja îro xwe negihand xeta partiyê. Bawerim ku ji niha û şûn ve ez heta dawî bersiv bidim keda Rêbertiya partiyê, xwedî li vê kedê derkevim, bi biryar bimeşim.

---.: Tê bimeşî, reva te, an jî ji şer dûrketina te ne gengaze. Lê di nava vî deh salî de diviya tu bibûya fermandar. Leşkerbûneke ji rêzê, şerkeriyeke ji rêzê nayê qebûlkirin. Ger tu duristî di soza xwe de pêwîste ku tu barê sedan heval rakî, şervanan bimeşînî. Em ji bo vê li ser te rawestiyan. Di deh salan de yê ku xwe pêş nexe ahmeqe. Ez nabêjim; “tu pir paşketiyî.” Na, te jî gelek tişt girtine, ji gundiyekî weke te jî divê ku fermandar derkeve.

Nu.: Raste Serokê min.

---.: Divê ku tu mirovan bafirînî, îdare bikî, mirovan li ser esasê polîtîk jî, li ser esasê siyasî jî araste bikî. Te karî tiştekî ji me bigrî?

Nu.: Rêbertiya partiyê bi taybet nêzîkatiyên wî ji welatparêzên ku ji Ewrûpa hatibûn, a ji rojnemavanan re çiqas li ser mirovbûnê radiweste, çiqas nirx dide mirovan min dît, ez ji vê pir bandor bûm.

---.: Ev tişteke biçûke. Wekî din tu çawa bandor bû?

Nu.: Ji kesayetiya Rêbertî bandor bûn çêbûye. Di kesayetiya xwe de dahûrandin kirin, bi wateyeke din ji bo bûyîna mirov, li ser mirov bandor afirandine.

---.: Tu çend hevalên li derdora xwe jî nikarî îdare bikî, ez jî gundiyekî weke te bûm. Rewşa min jî berê weke ya te bû, dibe ku tu ji min bihêztir be jî. Lê min xwe afirand. Çi taybetmendiyên min ên zarokatiyê, çi taybetmendiyên te. Weke te çavê min jî ditirsiya, ez li ser xwe ne serwer bûm. Min piştre xwe gihand vê rewşê. Ez mirovekî wisa bêçare bûm, lê niha mirovekî bihêz derket. Te ev jî dît?

Nu.: Raste Serokê min.

---.: Li ser vî esasî ji niha û şûn ve xwe bi hêzkirina te gengaze.

Nu.: Ez ê ji niha û şûn ve xwe bihêz bikim Serokê min.

---.: Min li vir taybetmendiyên xwe vekir, te guhdar kir ne wisa? We ji îsyana yekem heta îro jiyana me bi çavê xwe dît.

Bawerim tu kesekî bi aqile, ne bawerim ku te axatî jî kiribe. Ger tu fersendê bibînî tê tenezulî axatiyê bikî?

Nu.: Serokê min, ger min axatî bizaniya min ê bikira, lê nizanim.

---.: Te zanîba tê bikira, yan na? Fersend çêbû, te dît ku derfetê axatiyê heye, di wê demê de tê bikî, tenezul bikî yan na?

Nu.: Ger beriya niha bûya minê kiriba, lê niha…

---.: Beriya niha diviya bû ku min kiriba, lê piştî vê demê ne gengaze. Tu dibêjî ez cesaret nakim axatiyê bikim. Dibe ku tu ji partiyê jî qut bibî, pêwendiya te jî qut bibe. Dema ku hinek derfet pêşketin, hema mîna axayên Tataran nexe xizmeta dijmin, dema ku fersendek pêşket nexe xizmeta dijmin.

Nu.: Na Serokê min.

---.: Axayên Botanê, li axayên ku di nava me de ne binêre, li gorî texmîna min tê dijberî van rawestî ne wisa?

Nu.: Ez ê dijberî wan rawestim Serokê min.

---.: Ji te gundiyekî bê çare, kole jî dibe ku derkeve. Ez bi te re ne axatiyê, gunditiyeke bêçare dibînim.

Nu.: Serokê min, çare nebûya ez ê xwedî li vê têkoşînê derneketa ma.

---.: Deh sale tu di nav şer de yî, lê tu weke gundiyekî bê çare yî. Na, PKK bê çaretiyê qebûl nake. Mirovekî ne serwer nikare di nav refan de bimeşe. Divê bêje; “yan wê bimeşe, yan bimeşe, yan wê bibe, yan bibe” wisa bike. Nizanim, ji vê wêdetir em çi ji te bikin?

Nu.: Serokê min, ger hatibe fêmkirin yên ku hatine dayîn bese.

---.: Bêguman, ger tu bi aqil bî bese. Temenê te çende?

Nu.: 26 Serokê min.

---.: Ne zêde ye. Salên te yên yekem, weke xebatên te yên yekemin. Min di 25 saliya xwe de dest bi xebatên Partiyê kir. Tu hezar qat ji min bihêztir despê dikî. Divê ku bi te re armancek, hêviyek hebe. Mirov li te dinêre dibêje; “ev bê çare, ev hejar kiye xwe xistiye vê rewşê.” Ez tenê bûm, ji te lewaztir bûm, lê me xwe ji van rewşan derxist. Baweriya xwe bi mirovan bîne, bi cîhanê bîne, bi xwe bîne. Xwe bêçare nehêle, tenezulî axatiya erzan jî neke. Tu fêrî pir tiştan jî bûyî. Li ser xwe raweste û me bîne bîra xwe, bi ser xebatan de biçe. Ji xwe bê xebat, bê şer hûn weke

miriyekî ne. Di şer de tê xwe bafirînî. Piştî wê mirin jî nîne. Ji bo te mirinên erzan jî nayên qebûlkirin.

Di derbarê heval de kî dixwaze nerîn diyar bike? Şervanekî kevne, lê nizaniya xwe pêş bixe. Hevalên ku hevalê Nu. nasdikin, dikarin di derbarê wî de nirxandineke kurt bikin.

Ha.: Serokê min, ez hevalê Nu. berê nasdikim. Di bûyera rêveberiyê de gelekî lewaze. Li beramberî ferasetan lîberal, yanî temaşeger dimîne. Pêwîste di vê xalê de xwe bihêz bike. Ji aliyên din ve jî, di çareseriya pirsgirêkên çêkerê de lewaz dimîne. Bi dahûrînên Rêbertî heval xwe bihêz kiriye, lê ferasetên pergalê ji ser xwe bavêje dikare gav bavêje.

---.: Ji kîja alî ve bihêze?

Ha.: Serokê min, aliyê wî yê leşkerî bihêz bû, bi hatina vê sehê re ji aliyê siyasî ve jî bihêz bû. Ger biçe welat ez ji vê bawerim wê gav bavêje.

---.: Dikare perpirsyariyê bigre?

Ha.: Belê Serokê min.

---.: Wekî din?

X.: Ji aliyê pratîkî ve pirsgirêk nîne, lê di mijara rêveberiyê de ger li ser xwe raweste dikare di pratîkê de gavên mezin bavêje. Bi taybetî di rêveberiyê de hevalên ku berpirsyariya wan digre pêwîste girîngî bide perwerda wan, li beramberî ferasetan xwe berpirsyar bibîne. Heval divê mijarê de heta ku yek nebêje xwe berpirsyar nabîne.

---.: Wekî din?

X.?.: Ev demeke dirêje ez heval nasdikim. Em bi hev re hatin. Heval piştî ku hat seha Serokatî şûnve hinekî taybetmendiyên xwe yên kesayetî tehlîl kir. Di ronahiya van dahûrandinan de dema ku li pratîka xwe nerî got pratîka kontra. Lê li beramberî wê alternatîf çênake, di çareserî dîtinê de lewaz dimîne. Ji bilî vê hevalê Nu. ji seha Rêbertî pir hêz girt.

---.:Ab, tu ji bo hevalê xwe yê kevn dikare çi bêjî?

Ab.: Serokê min, taybetmendiyên wê herêmê hene. Hevalên ku ji wê herêmê tevlîbûne gelekin. Ji xwe hevalên ku ji wê herêmê tevlî bûne jî pêşketinên dawî diyarkirin. Lewaziyên wî yên artêşbûnê hevalan diyar kir. Îsyanê, berxwedanê pêş dixin, lê ketina nav artêşê, pergala artêşê, di pêşxistina nîzamê de lewazî çêdibin. Ev rewş ji bo heval jî derbasdare. Di şer de afîrênerbûn û

raberkirina di afirêneriya taktîk de lewaziyan dibînim. Yanî li şûna dewlemendiya taxtîk, bi hinek taxtîkên tên zanîn şer sînordarkirin, di wê xalê de rewşa muhafazariyê mijara gotinê ye.

---.: Yanî ji şerkeriya kevnar a gundîtiyê wêdetir naçin.

Ab.: Berxwedêrin, heta dawî dikevin nav şer, lê bi qasî ku asta fermandariya şer û artêşê pêş dikeve, di fermandariya wê de lewaz dimînin.

---.: Beşekî girîng ên tevlîbûna Botanê taybetmendiya wan ya gundîtî, niha asta bîrdozî-siyasî ber bi bêbandoriyê, zêde pêşneketinê, nemaze giranî hatina taybetmendiyên gundîtiyê û ev jî rê li ber pêşneketina şer vedike. Nu, tu fêm dikî? Di kesayetiya te de û piraniya wan ên ku tevlîbûnên gundîne divê ku di kesayetiya te de xwe bigihînin xeta partiyê. Divê ku hûn xwe bigihînin xeta bîrdozî, siyasî, heta ya leşkeriya partiyê.

Gundîtiya xwe, şerkeriya xwe ya gundîtî li pêşiya xwe weke astengî nebînin, bi şêwazê din jî hûn pir baş dikarin şer bikin. Ger fermandarekî we yê baş hebe, hûn ê bibin şervanên baş jî, lê ger fermandar nebe, hûn ê jî xwe bi erzanî bidin jiyankirin; bi vî rengî jî hûn ê zirara herî mezin bidin xeta partiyê, jiyana partiyê, jiyana gêrîla.

Te fêm kir Nu? Pêwîste tu van xalan dîqat bikî. Rexneya min a herî mezin li ser vî esasiye. Tevlîbûnên bi eslê xwe gundî, bi taybet yên Botanê û tevlîbûnên derdorê dema valatiya fermanberiyê derket yan jî bi behremendiyên pratîkî ristekî weke fermandariyê ket ser milê wan, mehandina xetê, xet ber bi bêkarî, muhafazakarî, tengbûnê ve birin û nemaze bêxetî û rewşa helandinê heta dawî pêşdikeve.

Em vê xeteriyê bi hewldaneke du alî radikin. Yekem; ji asta bîrdozî-siyasî tawîz nedan. Ya duwem jî; bi temamî temsîla siyasî kirin, hevalên bi eslê xwe gundîne vesaziya wan di nava şer de rast kirin. Yanî ew di bin fermandariyeke şer a xelet de negirtin û bi gelek tevdîrên dişibin vê hûn dikarin rista xwe bilîzin. Em ê li ser vî bingehî vesaziyekê pêş bixin.

Li ser vî bingehî, yekîneyên dema pêşiya me ji nû ve gihandina fermandariyekê û di gel gundiyan de teqez pêwîste yekî ji xeta partiyê fêm dike jî li gel hebe. Ji xwe yekane encama ku em ji kesayetiya Nu. jî derxin eve. Nu. tenê bi serê xwe nikare şerekî serkeftî bide. Dema ku kesekî asta xwe ya siyasî baş li gel

wî hebe, teqez dê bibe şervanekî serkeftî, karên baş jî ji destê wî tên. Ev rexneyên kurt û hinek pêşniyar têr dikin Nu, te fêm kir?

Nu.: Fêm dikim Serokê min.

---.: Bese?

Nu.: Bese Serokê min.

---.: Lewra tu neçarî fêm bikî. Divê hem tu fêm bikî, hem jî weke me bimeşî. Li ser vî bingehî tu dikarî soz bidî?

Nu.: Belê Serokê min.

---.: Temam tu dikarî bidî.

Nu.: Tevî ku ewqas pratîka min heye jî, li dijberî ferasetan di rawestandinê de nebesî, hemaltî, rewşên weke xwedî derneketin li keda Serokatî min jiyan kirin. Waneyên ku min ji vê pratîkê derxist wê di pratîka dema pêşiya min de ji min re bibin alîkarî. Ewqas keda ku Rêbertî di ber min de da, dikarim bêjim ku min ji xeta partiyê fêm kir, ez ê di pratîkê de pêk bînim û heta dawî partiyê biparêzim… soz didim.

---.: Em serkeftinê dixwazin.

Hevalê Ya. hebû. Hêza te ya soz dayînê heye?

Ya.: Serokê min…

---.: Ka were em hinekî bi te ra jî mijûl bibin. Yên ku hevalê Ya. dijî pirsgirêkeke mezine. Bawerim hatina te ya vê sehê sê sal derbas dike. Tê bîra te me hevdîtina xwe ya yekem di bin çadira li qampê kiribû. Sê sal çêbû?

Ya.: Belê.

---.: Belê, tu yek ji tevlîbûnên herî dawî yê wargeha me bû, bêguman seranser hatiye fêmkirin. Gav avêtiye nav berxwedaniya Hîlwan-Sêwerekê jî, hevalekî demeke dirêj di girtîgehê de jî maye. Piştî dewreya perwerdê tu dîsa çû welat û salekê ma?

Ya.: Sal û nîvek Serokê min.

---.: Sal û nîvekê li çiyê ma.

Ya.: Belê.

---.: Ezmûneke pir mezine! Me dixwest pir bi aqil û di cih de pêşbikeve. Bi taybet dema ku min dît, ya ku min pê re dixwest bibînim ev bû. Berxwedaniya Hîlwan-Sêwerekê û encamên wê di holê de ne. Dema PKK'ê ber bi têkoşîna çekdarî ve kişand û bi taybet dema ku me bêrê xwe da pêngava 15'ê Tebaxê rista vê berxwedaniyê û cihê wê çiye? Ger em di binê berxwedana

Hîlwan-Sêwerekê de eciqîbana; wê hem Partî, hem jî tevgera netewî xilas bûba û ji holê rabûya. Pirsgirêkên pratîkê bi xwe re derxistin holê, tê fêmkirin ku çareserkirina van çiqas girînge. Wiha ji ber ku wan bi xwe re çareser nekir yan jî ji ber nebesiyên cur be cur bi tasfiyê re rû bi rû man, me hinek nirx bi zorê rizgarkirin, tê zanîn ku em hewl didin van di qada Rojhilata Navîn de bigirin dest.

Ber bi pêngava 15'ê Tebaxê çûyîn, cihekî pir girîng a vê pratîkê heye. Bi taybetî jî ji ber nebesiyên wê em ber bi dervî welat ve hatin û domandina wê jî kedeke mezin dixwest. Pêngava 15'ê Tebaxê gava herî girîng a berdewamiya vê bû û teqez pêwîstiya rast nirxandina vê vekiriye.

Wekî din berxwedaniya girtigehê jî hebû, rast fêmkirina vê di wê demê de xwe derxist holê. Xeteriya xwe li ser berxwedaniya girtîgehê ferz dikir û niha wisa tê fêmkirin ku, hinek kesayetiyên ku dijmin bi taybet pêşxistin, ferasetên ku wan belav dikirin baş dîtin, pêşxistina helwestê rast û bêyî ku dirêj bike, di xeta berxwedaniya PKK'ê de girtina cihekî saxlem, hem jî di asta mînak de, di asta Rêbertî de temsîlkirin girîng bû. Ji şoreşgerekî ewqas salî hûn dizanin dê helwestekî din neyê hêvîkirin.

Me heta dawî nêzîkatiyên hevaltiyê û niyeta baş raber kir. Demeke dirêj a pêvajoya perwerdê hat jiyankirin. Di vê pêvajoya perwerdê de her çiqas di asta tê xwestin de veguhertinek nehatibe destxistin jî, dîsa jî em di fikra ku wê di pratîkê de temam bike de bûn. Dema ku me care duwem te şand pratîka Hîlwan-Sêwerekê hêviya me ev bû ku em bi pêngaveke berxwedaniya nû ve vê derbaz bikin. Me xwest em gaveke bersivdayîna şehîdên wê berxwedanê pêş bixin. Mixabin ev gav, xwe bi xwe bi tasfiyekirina vê qadê re bi encam bû.

Şehadetên pir hêja hatin jiyankirin di pratîka Hîlwan-Sêwerekê de, niha jî dewam dike. Lê me xwest pir serkeftîtir bê pêşxistin. Gengaz jî bû, lê mixabin kadroyên me rista xwe ya afirêner nelîstin. Li ser vê bingehê careke din mudaxele hat kirin, me heval kişandin vê sehê. Bawerim bi wê pratîka girtigehê ve girêdayî hinek rikeberiyên te çêbûn. Hinek xisûsên ku wî di fêmkirinê de zehmetî dikişandin hebûn. Bawerim çavkaniya xwe ji pêşneketina asta siyasî digirin. Dîsa bi sedemên takekesî nêzîk

dibû. Ev gelekî ew tengav kir, heta ber bi pêvajoya tecrîd û lêpirsînê ve bir. Ji ber ku pêvajoyeke pir xeter bû, lê bi sebreke mezin dîsa jî ji bo ku ew pêvajoya lêpirsînê serkeftî bêderbaskirin em bi girîngî li ser rawestiyan. Me nedixwest bi asanî tasfiye bibe. Çi ji derdorê, çi jî bi giştî nebesiyên ku hatin jiyîn, di serî de jî nêzîkatiyên wî bi xwe ew heta ber bi tasfiyebûnê ve anîbû.

Em zêde dirêj nekin, tu hatî û tevlî vê dewrê bû. Ji xwe berê jî, rewşa wî ya baş fêm kirina pêvajoyan heye. Bawerim bi tena serê xwe rewşa xwe li berçav derbaskirin hebû. Di serî de jî girtîgeh, pratîka şerê çekdarî û dîsa ya herî girîng xebatên me yên dahûrandinê yên li vir dît. Ez ê zêde dirêj nekim, tiştên ku ji bo her kesî hatin gotin ji bo te qat bi qat zêdetir derbasdarin.

Ji bo te du rê hene; yan tê ji van hemû bûyerên ku diqewimin û bi dawî bûn rexnedayîneke watedar bidî. Ya tu yê mîna milîtanekî têkoşer tevlî şer bibî bersiveke bi bandor a şereşgerî bidî. Yan jî tê bi şêwazê xwe yê kevin berdewam bikî ku ev ê jî te ber bi encamên qezazadeyê şoreşê ve bibe. Ewê jî ber bi ku derê ve bibe di texmînkirinê de mirov zehmetî dikşîne. Tu xwe bavêjî ber lingê pergalê jî, derketina te wê zêde diyar nabe. Ger tu bixwazî rista provakator bilîzî wê ev jî bibe bijardeyeke herî xirab. Bi şoreşgeriyeke nîvçe, weke berê jî tu nikarî bijî. Bawerim niha derxistiye zanabûnê; sedem, niyet çi dibin bila bibin, hatiye fêmkirin ku ew jî ne şoreşgeriyeke watedare.

Nemaze pêfikirîn jî pir xetere, li şûna ku tu hinek xisûsên xeter şayanî xwe bibînî, layîqî xwe dîtin, derfetê şoreşgeriyeke pir dîrokî, bi şeref, serkeftî şayanî xwe dîtin û teqez serkeftin şayanî xwe dîtin xwedî girîngiyeke mezine. Me weke ku ev di kesayetiya her hevalekî de, em şayanî te jî dibînin. Vî şansî binirxîne û jiyana xwe ya ji niha û şûn ve bigihîne îfadeya herî watedar, baş bizane jiyan jî eve, ji bilî vê fikirandin jî ti wateya xwe nîne me nîşan da.

Hêza partiyê diyare, li beramberî partiyê berxwedanî nabe. Her wiha Partî hêviya jiyana me hemûya ye, îfadeya pêkhatî ya jiyana me ye. Bi wê re hevgiştîn, bi wê re pênaseya xwe kirin, aramiyê dide, hêz dide, ezezî bêwate ferzkirin jî ziwêr bike. Ev ji hemû aliyan ve derketine holê. Li ser vê bingehê te hinek veguhertin dîtin, pêwîstiya wê fêm kir û di kesayetiya xwe de pêk tênî. Ger tu pir ji xwe bawerî, tu bawerî ku duristî û teqez tê mîna

şoreşgerekî bijî, di vê wateyê de bi lêpirsîneke watedar bersiv bide paşerojê. Ji bo di şoreşê de tevlîbûneke şans dide serkeftinê, em dixwazin vî şansî bidin. Tu dizanî partiyeke her roj ewqas şerê wê heye, berxwedaniya wê heye divê ku mirov bi rêkûpêkî tevlî bibe. Hem jî bi tevlîbûneke serkeftinê raber dike jê re bersiv bide.

Ez ji dervî vê naxwazim bikevin kûrahiyan. Naxwazim jiyana wî ji hemû aliyan ve bixim nav lêpirsînê. Yên ku min di derbarê giştî de kirin ji bo te jî derbasdarin. Taybetmendiyên sereke ji hemû aliyan ve dişibin hev û her kes çawa derketinê dike, di wateya giştî de pêwîste tu jî bibî xwedî derketineke mîna vê, ya tê hêvîkirin eve, hem jî ya herî raste û garantiya jiyanê bi xwe ye. Dereng be, zehmet be jî, şansê xwe li ser vê bingehê bi kar anîn a herî raste. Naxwazim bixapim, ji ber ku ez dema li niyetên xwe yên berê dinêrim, dibînim ku hinekî di derbarê kesayetan de xapiyame, lê ji ber ku rastî eve, dîsa jî divê ku ez înad bikim. Hûn çawa dibin bibin, divê ku ez di rastiyan de înad bikim û hûn jî girîngî bidin nexapandina me. Ya rast eve, ya şayan eve.

Yên ku dibêjim tên fêmkirin?

Ya.: Tê fêmkirin Serokê min.

---.: Tu çi dibêjî, em çi ji te bikin? Pêşerojeke çawa, em biryareke çawa pêş bibînin? Bila vê carê hinekî misoger bibe, pratîk û soz hev temam bikin da ku, jiyan ji bo te jî, ji bo partiyê jî bihêz derbas bibe.

Ya.: Çi di jiyana pratîkî ya beriya girtîgehê de, çi jî piştî girtîgehê, nêvenga pratîkî ya ku ez jê hatibûm, tevlîbûna min a despêkê her çiqas hestyarî be jî, bi taybet di pêvajoya girtîgehê de di xala bi partiyê re meşandinê, dikarim bêjim teqez bi partiyê re di meşandinê de biryara min zelal bû. Di pêvajoyên berxwedaniya girtîgehê de, di despêka 1981’î de dema ku îşkenceyên dijwar dihatin jiyankirin, di pêvajoyên teslîmkariyê de, pêvajoyên piştre yên temaşekirina meşên berxwedaniya girtîgehê, bi şêwazê şopandinê meşek esas girtin, di vê mijarê de li dijberî dijmin helwest girtin, min ti dudilî jiyan nekir. Di vê mijarê de heta dawî li gorî hêza xwe tevlî pêvajoyê bûm.

Li beramberî tasfiyegeriya ku hat jiyîn helwesta min zelal bû. Di asta fêmkirinê de xiyaneta ku hat jiyîn min dît. Di vê mijarê de, di asteke diyar de min helwest jî nîşan da. Lê weke ku

di hevalên din de jî heyî, ji ber ku min şêwaz û uslûbê Partiyê neda girtin, di encam de bi tasfiya tasfiyegeran re rû bi rû mayîna min çêbû.

---.: Di vê xalê de vê bêjin; te ev dahûrîn li vir guhdar kirin, li gorî min bi taybet jirêderketina ku Şener Rêbertî jê re dikir û li vir berevajîkirina berxwedaniya Hîlwan-Sêwerekê serûbin kirin arasteyeke bi zanabûn bû. Ji ber ku gelek hevalên ku min pir baş nasdikirin hebûn, ya rast ew ber bi derveyî jiyana partiyê ve dahfandin. Bawerim nakokiya te jî hinekî ji wir derketiye. Tu bi derxistineke cuda re rû bi rû yî û divê ku te ev çiqas tehlîl kiribe ji xwe bipirse.

Li gorî min piştî 1984'an, bi taybet Celalettîn Delîbaş, Fuat, Mûstafa Keser xebatên van ên pir berfireh hebûn. Lê paşê her çi bû tenê man û hema bêje gîştin asta ku ji partiyê îstîfa bikin. Hevdeh caran îdam girtiye û kesekî ewqas bi partiyê ve girêdayî ye. Ev lîstokeke. Berxwedanvanên Hîlvan-Sêwerekê, ji aliyê rêveberên şerên taybet ên Amedê ve daxwaza tasfiyekirina wan diviya ku bihata pêşbînî kirin. Di kesayetiya Şener de êrîş li ser vê berxwedêriyê, li gorî min bi pîlane. Ez rûyê wê yê hundirîn ji hemû aliyan ve nizanim, lê berxwedêriya Hîlwan-Sêwerekê hestiyê piştê yê PKK'ê ye û di parastinên Amedê de esasin. Hinekî xwestin vê vala derxin, li gorî min di asteke girîng de serxistine.

Di nirxandinên ku min di sala 1986'an de kirine hûn ê bibînin ku min gotiye hizîbgeriyeke derketiye holê, beşek ji hêza PKK'ê di bin bandora wê de ye, beşê din jî li dijberî ye û ev gihandina asta ku bi hev re bikevin nava pevçûnê.

Xwestin vê dabeşbûnê li derve jî biteyisînin. Ger serxistibana, wê ji hemû aliyan ve ev meyla siyasî ya ku bi dijmin re lihevkiribû, wê li beramberî têkoşîna çekdarî bertek pêşxistiba. Ji xwe di hundir de jî li ser vê bingehê hatibû pêşxistin û dabûn qebûlkirin. Îhîtmaleke mezin berxwedêran hinekî li beramberî vê bertek girtin. Lê ji ber ku zêde siyasî tevnegeriyan, berteka xwe li ser bingehê xeta PKK'ê nemeşandin, dîsa îhtîmaleke mezin hêza beramber jî ji ber ku bi dijmin re di nav hevkariyê de bû hêza xwe ji dijmin girtin. Ji ber ku ev hêz raber nekirin ji dervî partiyê tên dahfdan.

Nemaze dikevin nav feraseteke kîndar, sekterîzma çep û her yek ji wan dibe dijbereke partiyê. Yanî tenê nayên tasfiyekirin jî, di heman demê de tên asta kesayetiyên ku dijberî partiyê şer bikin. Yên li gel wan jî hinekî wisa ne. Partiya ku digrin rojeva xwe li beramberî wê risteke taxrîbkar dilîzin. Ev pêkanîneke şerê taybete. Vê xalê ji berxwedaniya Çileya 1984'an despê dikin û heta 1987-88'an derketinê jî didomîne. Piştî wê ji xwe hat seha me û hûn dizanin xwest çibike.

Ev taybetmendî çiqas dervî şerin, bi feraseta pêwendiyê tasfiyeke çiqas metirsîdare tê fêmkirin. Ger em li beramberî ranewestiyana, dê ji berxwedêriya PKK'ê esewarek nemaba û ev jî dê darbeya herî mezin a bihata kirin bû niha tê dîtin. Li vir tu ji nû ve xwe şîrove dikî. Ji xwe berxwedêriya girtîgehê ji nû ve xwe şîrove kir. Gelek nirxandin kirin û rexnedayîn dan. Xwestin hinek hevalên jin bikar bînin. Ger em nav jî bidin; bi taybetî hevala Sa. –dibe ku dilê xwe jî bigre, niha di nava refên me de ye- hêvîdarim ku ew li ser esasê şer bin neketiye. Lê di rast dîtina wê ya raboriyê de jî bi israrim. Bi feraseta jiyanê ya ku pêş xist, feraseta pêwendiyê, bi feraseta Rêbertî re di asteke xeter de ye. Niyeta wê çi dibe bila bibe hinekî wisa ye.

Di holê de bû ku dê berpêyeke wisa bavêjin ber lingê we jî. Bayanek hebû –dibe ku sîxwureke objektîf be jî, ferzkirineke îlehî sîxwur bû nîne- lê bandoriya xatuna ku me da diyarkirin, ew bi hevala jin re bû. Ew jî bi provakator re bû, xwedê zane provakator jî bi kêre bû? Yanî eşkereye ku bi bandorbûneke ne yekser hebû. Her wiha rewşa wê malbatê jî pir zelale û vana jî weke kes yan jî dibe ku çîrok cuda be jî, lê meyla giştî ya ku di girtigehê de hat kirin bi şêwazê ku hat ferzkirin bû. Tê fêmkirin ku çavkaniya bertekên we jî, nelihevkirinên we jî ev e.

Ji bilî vê xaleke ez wate nadimê heye: Hûn berxwedêrin, bi rastî jî yekî ku girtigeh ewqas bi berxwedaniyê derbaskiribe fêmnekirina wî ya têkoşîna çekdarî, fêmnekirina şerê ku divê li dijî dijmin bê meşandin, fêmnekirina rêxistinê, piştî ku şer giştiye qonaxeke dîrokî qîmeta vê nezanîn nayê fikirandin. Li gorî min diviya bi temamî berevajî bûya. Mesele diviya hûn di rewşa herî kamil, yê ku qîmeta şer dizanin, bi ezmûnên girtîgehê jê re dibe alîkar di rewşeke wisa de bûna. Ez hêjî vê îdaya xwe didomînim. Ji bilî vê hemû corên nirxandin û şîroveyan xeletin. Ger encamên

cuda derkevin, ger bêjin nêzîkatiyên cuda jî şoreşgerî dikare bê kirin, ez ê bi guman lêbinêrim. Ji ber ku encam di holê de ne, dahûrîna girtîgehê di holê de ye, dahûrîna gêrîla di holê de ye, ya li şûnve dibîme rewşa rast tevlîbûnê ye.

Li ser vî esasî, ji min re wisa tê ku tu jî hinekî bi zehmetî hatî tehlîlkirin. Pêwîste tu pêgihîştî bî. Berxwedaniya te heye, rewşeke te ya ku ji dijmin re bike amûr, ji hêviyên wî yên qirêj re bike amûr nîne. Ya ku dixwazim bêjim, tu bi xwe jî datînî holê ku li berxwedaye, rewşa yên din ji bo te ne diyarkere. Dibe ku hinek bi zanabûn, hinek ji ne yekser di nava pêwendiyê de bin. Medem te heta dawî li ber xwe daye, wê demê ya ku encama herî watedare pêngava 15’ Tebaxê û ji hemû pêşketinên wê yên dema pêşiya me divê ku tu tevlîbûna herî ji dil pêk bînî. Encama xwezayî ya berxwedêriyê eve. Hem tu li ber xwe bidî, hem jî rast tevlî nebî em ê bêjin; “nakokî heye” û ravekirina van nakokiyan wisa asan nîne. Yekî ku ewqas berxwedêriyeke mezin jiyaye divê ku teqez bibe kesê bersiva herî bi wate dide şer û tevlîbûnê pêk tîne.

Tiştên ku dibêjim tên fêmkirin ne wisa?

Ya.: Tê fêmkirin Serokê min.

---.: Belê dewam bikin.

Ya.: Ji xwe di wê demê de rewşa ku ketina navê çêbû, yanî di xala partîbûnê de, bi taybet li beramberî tasfiyeger sedema sereke ya pêşnexistina helwesteke rast ev bû. Yanî kesayetiya li gorî xeta partiyê pênegihîştiye, xetê esas nagre, li gorî wê xwe nagihîne teşegirtina kesayet, bi taybetî negihîştiye şêwazê jiyana partiyê, uslûbê wê, dîsa di nav rêveberiyê de nebesiya sereke ku ket navê, di emcam de em anî asteke wisa. Ji xwe armanca sereke ya tasfiyegeriyê jî ew bû.

Yên ku li dijberî wî radiwestiyan jî bi taybetî ji ber ku hevalên di berxwedaniya Hîlvan-Sêwerekê de cih girtibûn, di serî de yên ku bi ser wan de çûn hevalên ji wê herêmê hatibûn. Ev rewş dihat ferqkirin, lê ji ber ku bi giştî hevalên di rêveberiyê de cîh digirtin girtibû pişt xwe û ji ber ku bi vê rêyê li ser çêkerê venerîn pêk anîbû serdeçûna me gelek zehmet dibû. Me di navbera xwe de bi awayekî vekirî nîqaş dikir, daxivîn, li beramberî vê tevdirên ku divê bên pêşxistin çine, herî kêm di nava wê komê de yekitiya fikir hebû. Lê nebesiya ev bi rêxistinê

re çareserkirinê ku em ketin nav, di encam de hem em bi rêxistina girtîgehê re rûbirûyê hev kirin, hem jî di xala têkoşîneke rast a li dijberî tasfiyegerîyê de em lewaz xistin. Nemaze ji ber ku me bi çeka partiyê şer nekir, piştî ku em li beramberî rêxistinê ketin rewşeke nemafdar, di nav çêkerê de rewşa teşîrbûnê hat jiyankirin. Ji xwe di encam de rewşên rikeber, xayîn ragihandina me ji aliyê van ve bû mijara gotinê.

---.: Belê, arasteya ku dixwest jî ev bû. Yanî du xalên serben avakirin, ya rast herdu serbend jî li beramberî partiyê şer dikirin. Bi awayekî objektîf derxistin holê.

Ya.: Belê, raste.

---.: Û dixwestin gelemper bikin. Xwestin li ser derve jî biteyisînin. Ger me ev pêşwazînekiriba, wê PKK, ji PKK bûnê derketiba. Ger hûn dîqat bikin, bê aman bi ser hev de çûyîn heye û heta dawî tasfiyekirin heye. Ev ê bibe ku derê? Partiyeke bi aqil, endamên wan ên jêr, hêzeke xwe ya mîna dêwan di pevçûneke wisa de tinekirin dikarin bigrin berçav? Ya rast pir vekiye ku lîstokeke. Ji xwe yekî bi aqil hinekî şopandiba wê fêmkiriba. Ez ji bo wê, dibêjim nirxandina kes pêwîste bi hêz be.

Vî camêrî dema ku çêker kiribû du kom, dem dem di nav berxwedêrên Hîlwan-Sêwerekê de cîh digre û di nava komê de tevlîhevî çêdike. Heta ku di navbera herdu koman de mesafe vekir bi vî rengî diçû û dihat. Piştî ku di nava çêkerê de bi temamî dabeşbûn avakirin, giraniya sereke dide tasfiyegerên rastgir û yên din zêdetir tasfiye dikin. Vayê rêbazekî ji rêzê yê şerê taybet.

Ez li beramberî vê rewşê matmayî mam û pêşketina rewşên bi vî rengî min bi paşketîbûna asta polîtîk, mercên bêrehm ên girtîgehê ve girê dida. Ji me re bû waneyeke mezin. Divê ku hûn vê di cîh de, têrker bibînin û teqez encam jê derxin. Hûn ê di derbarê uslûb de hinek encaman jê derxinîn. Hîlekariya camêr bibînin, we parçe dike, lê hûn nikarin vê binirxînin. Ma ewqas nebesiyên rêbaz dibin? Hûn xwe davêjin dervî partiyê, heta dixin şûna partiyê. Dîqat bikin, ya rast ew hêza wî nîne. Tu çiqas bibî alîkar jî, ez ê tenê xeletiyên we xwedî bikim. Ji ber ku hûn fêrî tiştekî wisa hatine kirin ku, hûn dibêjin; “ya hero, ya mero” “yan ew, yan em.” Partî ne eve, ne jî yê din. Partî xeta xwe bi xwe ye, Partî rastiya xwe bi xwe ye.

Ya rast bi te re hîn jî bermahiyên vê tên dîtin. Rêzdarî ji partiyê re, ji xeta partiyê re şîrove, îtîbar ji rêveberiya partiyê re, heta ku îtîbar ji şêwazê partiyê re nebe, li dijberî dijmin şer nayê pêşxistin. Bandorên vê yên hejêner hîn jî çawa didomin? Ez bêjim tu tasfiyegerekî bi zanabûnî; nîne! Bêjim tu provakatorekî bi zanabûnî; nîne! Heta bi niyeteke baş li dijberî hîlebaziya camêrekî te xwestiye helwest pêş bixî. Lê te gotiye, "ez mafdarim" û uslûbekî dûz girtiye. Lê camêr çikiriye, camêr rêxistin çawa tine kiriye, heta ku derê biriye? Di van mijaran de xebateke rêkûpêk, rewşa serdeçûnê nîne. Camêr dixwaze li gel bi sedan yê zûwa yên ter jî bişewîtîne; ev ji hev cudakirin nîne. Weke min got, girtina kûrahiya xeta partiyê nîne. Bi gotina, "ez şervanim, mafdarim" şerê navxweyî yê rêxistinê nayê kirin, dîsa nikare nirxandinên wisa berfireh ên siyasî bikin. Ya ku we jiyan kir ev bû.

Ger cewher hebe, rêza te ji keda te re hebe, divê ku tu bibî yek ji kesên ku herî watedar partîbûyînê dizane. Di serî de nêzîkatiya min jî ev bû. Ya rast tê fêmkirin ku wê demê te fêm nekiriye. Te çima Partî ne şopand? Diviya bû ku te em baş şopandiba, ji ber ku bi karê destan partîgerî nayê kirin, her kes nikare partiyê bide axaftin, xetê bimeşîne. Meşandina xetê gelek zehmete. Bawerim te xwestiye tu di wir de bi ecemitiya dema koma yekem bimeşî. Şêwazê meşa koma bi nebesiyan dagirtiye. Bi piraniya wan re hîn bandora wê diteyise. Partiyeke ewqas mezin dibe, fermî dibe, siyasî dibe, partiyeke leşkerî dibe û bi taybetmendiyên dema komê tevlîbûn ne gengaze. Hinek nebesiyên ku vê bi xwe re anîn te ber bi jiyaneke wisa biêş ve dahf da. Me ji vê tangaviyeke mezin bihîst. Hêvîdarim te niha derbas kiribe.

Ya.: Ez rastiya niha li gorî berê baştir dibînim. Di vê mijarê de bi taybet di ronahiya dahûrînên Rêbertiya partiyê ên di derbarê 1994'an de lêdinêrim baştir dibînim. Di derbarê pêvajoya girtîgehê de, di dema konferansa girtîgehê de Rêbertiya Partiyê, di kesayetiya hevalê F. de rastiya girtîgehê û berxwedêriya Hîlwan-Sêwerekê destnîşan kiribû. Hem hevalên ku di bin bandora tasfiyegeriyê de mane, hem jî hevalên ku dijberî wê derketine li beramberî partiyê di du censerên cuda de şerkirina wan pir baş danîbû holê. Bi rastî jî weke binesaziya kesayetiya xwe min hinekî di wir de dîtibû. Lê ji ber ku bi kûrahî fêmkirin

çênebibû, bi taybetî jî di mijara ew pêwendiya bi jinê re nêzîkatiya xapêner…

---.: Nêzîkatiya klasîk.

Ya.: Belê, di paş de kişandinê, tevlîbûnê, lêhûrbûnê…

---.: Te ew mînak guhdar kir. Ji ya ku we jiyan kir re mînaka herî başe. Tê bîra hevalê Fu. jî, min wê demê got; "Di dîmen de Fatma û Semîr bi hev re bêxedar şer dikin, lê di cewher de li ser xeta partiyê heman lîstokê dilîzin." Te name xwend?

Fu.: Min xwend Serokê min.

---.: Lîstoka jinê jî di nava lîstokê de ye.

Fu.: Belê Serokê min.

---.: Te ew çîrok guhdar kir? Ji despêka PKK'ê ve nokeriya provakatoran ya bi dewletê re pir şênbere. Mînak yekî bi navê Bakî hebû, di nava xwe de dixwestin nakokiyeke lihevanî bafirînin. Ger nebe wê bi Semîr bikin. Rewş eve; wê em daxistana asta rewşa tevlîkerekî ji rêzê. Ya rast ên ku şer dikin du cemserin û her du cemser jî bi awayekî objektîf ji dijmin re dixebitin, di pîlana sûbjektîf de jî şênberin. Bi vî awayî dixwestin di nav pevçûnên xwe de bihelînin.

Di girtîgehê de xala ku hûn pê xapiyan ev bû. Ew jin jî tahma vê ye. Min di vê mijarê de dûr û dirêj çîrok vegot. Ya rast hûn bi heman ferasetê re rû bi rû mane. Bingehîn girtina vê a dest, min di despêkê de ferq nekir. Ger pê fikirîbam dê kesayetiya we ewqas pê bandor bibe, minê cudatir girtiba dest. Min texmîn nedikir ewqas di kûrahiyê de xwe bi cîh kiribe, lê tê fêmkirin ku bi kûrî xwe bi cîh kiriye.

Ev çîrok dibe ku hema di hemû demên pratîkî û qadên xebatê yên girîng de teysîna xwe dike. Ez van dubare nîqaş nakim. Yanî di nav PKK'ê de rewş eve. Ger hûn duristin, ji xwe bawerin, bi van bandorên provakator jiyan kirin tê çi watê, di bin bandora van kesan de mayîn tê çi watê? Ne şayane, navê wê jî divê ku mirov negre ser devê xwe!

Rewşeke pêwendiya taybet ya ku Fu. jiyan kir hebû. Me dît ku bi partiyê dîlîze, me jê re got; "Fu. binêre ev pêwendiyan di tinekirina partiyê de bi kar tînin, baldar be!" Min ev ji te re got. Ya ku jê re tê gotin pêwendî çiye? Bila çil pêwendî hebe, heta pênsed pêwendî hebe, ger xizmet ji partiyê re nekir ti wateya vê nîne. Bi giştî di wê demê de me girîngî da derbaskirina malbata

klasîk a ku li Kurdistanê tê zanîn û ji holê rakirina pêwendiyên klasîk. Bawerim tu li vir baştir fêrî vê bû û tu niha aramî

Bawerim ku te waneyên mezin jê derxistiye. Ez bawerim ku tê weke dema borî nebî. Ger tu wisa bibî, tawanbar jî tu ye û ji me li benda rehmê nebe. Ji ber ku, tu nikarî xirabiya mezin bi xwe bikî. Nikarî ewqas hewldanan bê encam bihêlî. Ger tu bihêlî pêwîste cezayê herî giran tu bi xwe bidî xwe. Ma tu dixwazî xirabiyê bi xwe bikî? Kîna te li beramberî vî gelî, vê xetê heye? Ma tu çima li beramberî keda xwe wisa bêrêziyê bikî? Ma ti hesabê ku tu ji dijmin bipirsî nîne? Erkeke te ya li beramberî partiyê tu pêk bînî nîne? Ji van mirovan re bi ewqas ezmûnan tiştekî tu bidî wan nîne? Ger tu bêjî na, “tê wateya tu jî tine bûyî.”

Ya ku dixwazim bêjim vekiriye. Bi xetê re yekbûn, bi jiyana partiyê re yekbûn pêwîste nebe mesela grûrê. Berevajî, weke rehetiyeke mezin, pirsgirêka mezinbûnê bêfêmkirin û wisa xwe bigihîne çareseriyê.

Ya.: Di wê mijara pêwendiyê de, bi pêwendiya wî ya bi Sa. re ez dikarim vê bidim diyarkirin; ji xwe di despêkê de bi rêya wê tevlîbûna wî ya nav partiyê, ji ber ku demeke dirêj di girtîgehê de mabûn, li beramberî Sa. girêdaneke wî hebû. Yanî ji aliyê şêwazê jiyanê ve jî di bin bandor wê de bû.

Di nêzîkatiyên ji min re, tevî ku çûye gel dijmin, xiyanet kiriye jî, min pir baş dizanî ku ewê nikaribe min ji têkoşînê dûr bigre, paşve bikşîne, hem ji aliyê kesayet û hizrî ve nikare bandora xwe li ser min bike. Nemaze piştî ku ji seha akademiyê cuda bûm, dikarim bêjim ku bandora wî li ser min nema.

Di bêrê xwe dana welat de jî ya rast ji despêkê ve nêzîkatiyên Rêbertiya partiyê li beramberî min kêm zêde min fêm dikir. Nêzîkatiya sereke ya di derbarê mezinbûna min de jî min fêm dikir. Lê weke ku min got, em di pêvajoya konferansê de, hem jî di pêvajoyên paşê yên perwerdê de, ew bandora neyênî ku pêwendiyê li ser kiribû di tevlîbûn û lêhûrbûnê de di şêwazê paşde kişandinê de bû. Wê demê her çiqas min ev îfade nekiribe jî, rastiya kar ev bû.

Di pêvajoyên piştre min ev baştir fêm kir, dît. Lê tevî vê jî, di dîmen de her çiqas min tabloya kadroyekî bi îda, israr û biryardariya ber bi welat ve çûyîn, biryara kirina hinek tiştan û bawerî û girêdan hebû. Di vê wateyê de piştî qutbûneke demdirêj

a ji rastiya têkoşînê, rastiya partiyê, rastiya şer, asta vê ya pêşketinên rêxistinî, siyasî rewşa hineke din a fêm kirinê hebû. Di vê wateyê de, baweriyeke diyar ya min jî bi min hebû û bi armanca kirina hinek tiştan min berê xwe dabû welat.

Dema ku em gîştin eyaletê, bi taybetî jî bi hevalên di asta rêveberiyê de, di serî de çi ji aliyê asta ku ew di nav de bûn, çi jî ji aliyê nûnertiya me ku di nava nêzîkatiyên me yên ji pirsgirêka nebesiyên ku em ketin nav, em bi wan hevalan re rû bi rû kirin. Heta tevî derketinê me yên bêrêbaz jî, nêzîkatiyên wan ji pirsgirêkan re, asta paşketî ku di nav de bûn, ji aliyê hevalên din ve jî hat ferqkirin.

Hevalên De. û Çe yên ku ji aliyê Rêbertiya partiyê ve hatibûn şandin hebûn. Di mijara destwerdan û pêwendî ji destê rêveberiya kevin girtin, pêşniyara hevalan pêşket. Me hewl da em bi Rêbertiya partiyê re bi rêya telefênê pêwendî danin. Tevî ku di destê hevalan de telefon hebû heval bêxwestek tevgerîn. Nemaze piştî hefteyek deh rojan em bi hev re man, bêyî ku di derbarê eyaletê de, herêmên ku em ê biçinê agahiyeke rêkûpêk bidin, hema bêje ketin nav nêzîkatiyeke me ji ser serê xwe bavêjin.

Ev rewş, di demên piştre di mijara bi wan re lihevnekirin bû sedema sereke. Erka me ya sereke û asta amadekariya partiyê di vê mijarê de ji aliyê siyasî û rêxistinî ve diyar bû. Ya ku diviya bû me kiriba, afirandina rêxistinê, parastin, pêşxistina nirxan û li ser vî esasî peywir pêkanîn bû. Lê ji ber ku derbasbûneke wisa nelihevkirî hatibû çêkirin, bi taybet jî di pêvajoyên paşê de ji ber ku rêveberiyê jî zanyariyên xelet dabûn partiyê û bênavber talîmat û nerînên Rêbertiya partiyê di derbarê min de pêşketin.

Bi rastî jî heya wê demê wan hevalan di derbarê min de tenê rexneyek jî pêşnexistibûn. Di derbarê helwesta neyênî de bêyî ku tenê tiştekî diyar bikin, di derbarê min de zanyariyên xelet dan partiyê, dema ku talîmatên Rêbertiya partiyê jî hatin, wan ev weke çekekê li beramberî min bi kar anîn. Ez hîn jî nizanim di kîja xalê de rexne hebûn, yan jî zanyarî dane.

Demeke pir kurt ji Hezîrana 1992'an ve heta Tebaxê li Qerejdaxê mam. Me li wir karî em hinek pêwendiyan ava bikin. Heta ji bo ku hinek gundên bûne cerdevan devjê berdin, bi taybetî di navenda Çinarê de pêkanîna komîtebûnê, dîsa di navenda bajarê Amedê de ji bo dîtina hinek kontrayan, bi taybetî ji bo

Hîzbî-kontra û ronahîkirina wan min hinek xebat kirin. Demeke pir kurt bû, lê di nava wê pêvajoyê de pêşxistina hinek çalakiyên neyênî bû mijara gotinê. Her çiqas ne di bin berpirsyariya min jî de be, di pêvajoya ku ez di wê herêmê de mam li darxistina çalakiyek-du çalakiyên xelet, bi taybetî jî ji ber kêmbûna çavkaniya îstîxbaratê bûn mijara gotinê. Ev rewş jî xelet ji partiyê re hat ragihandin.

Di wê demê de kesekî bi navê Şerîf ku hat kuştin hebû. Ji gundê Xatûniyê yê ser bi navçeya Çinarê bû. Şexsekî girêdayî eşîreta Metîna ya Dêrikê bû. Ji 1987'an ve biryara kuştinê ya ku hevalan li ser girtibû hebû. Di wê demê de hat cezakirin. Piştî cezakirina wî, tevî ku rêveberiya eyaletê ev rewş pir baş dizanî jî, dîlekçeyeke ji aliyê xizmên wî şexsî ve –nêzîkî çarsed kesî bi hev re îmzakiribûn- piştî ku ji Rêbertiya partiyê re ragihandin, ya rast nêzîkatiyên sereke li beramberî min radixist ber çavan. Yanî bi rastî jî piraniya wan şehîd ketin, demeke dirêj jî me bi hev re kar kir…

---.: Ew dem çi ji aliyê te ve, çi jî ji aliyê wan ve nebes destgirtin linavçûna wan jî bi xwe re anî. Heta niha jî neyîniyên wê nayên derbaskirin. Dema ku van diyar dikim, hûn ê vê encamê derxînin; nêzîkatiyê nebes ên lipêşberî hev encax ber bi linavçûnê ve dibe.

Ya.: Belê, raste. Dema li welat bûm min cudabûna wê dîtibû Serokê min.

---.: Em vê dizanin, ez tawan tenê navêm ser sitûyê te û yê wan jî. Bûyerên ji rêzê yên ku mirovên me gelek xelet, bêdem, ne di cîh de, bê uslûb nêzîkî hev dibin û hevdu mahf dikin ne. Hûn bûne qurbana vê. A rast ew jî di nav berxwedaniyeke mezin de bûn, te jî li ber xwe dida, dixwest kar bikî. Lê nebûna hêza rêveberiyê, vesaziyeke baş nekirin, rabernekirina rêbertiyeke zîrek, tevî ku hemû pir hêjabûn jî serkeftin li vir bîmîne, heta dawî herêm xistin xeteriyê. Niha jî xeteriyên gelek mezin ên berxwedaniyê hene. Negihandina wan a vê astê li gorî min ne çarenûsek bû. Vaye nîqaşên bê uslûb, tawanbariyên bi vî rengî di derbarê hev de nirxandinên bi vî rengî, ya herî girîng jî di cihê herî xeter de nirxandinên wisa di derbarê hev de pêşxistina we tê zanîn. Ji xwe ji bo ku em li vir derbas bikin me kedeke mezin raber kir.

Dema ku em te digrin dest, tawanbariyeke yek alî yan jî di bin bandora wê de mayîn rewşeke me ya wisa nebû. Dema ku me tu ber bi vir ve kişand jî, tirsa me ya sereke ji tasfiyebûnê rizgarkirina te bû. Bawerim we demeke dirêj wate nedaye vê, te hinek gotinên weke; “çima ez kişandime ”kirine. Ger tu bimaya tu yê jî mina wan lê bihatiba. Sedemê kişandina te eve. Ya rast ji wan zêdetir, me kes rizgar kir. Ji ber ku rêbaz ji rê derketîne, ne li ser bingeha hevdu bihêzkirinê ye. Ji ber ku li ser bingeha hevdu lewazkirinê bûn. Ji xwe çendek ji wan hatin tasfiyekirin, pratîka wan hat darizandin. Piraniya rêveberiyên din tasfiye bûn, beşeke mezin ji wan derbasî Botanê hatin kirin, tu jî hat vê derê.

Rewş eve; hûn jî pir baş dizanin ku, rêveberiyeke hukmê herêmê bike çênebû, potansiyela herêmê nehat nirxandin. Tawanbar kiye? Tawanbar ên ku xwe pênegihandin, pîvanên Rêbertiyê bi tamamî di kesayetiya xwe de nedan rûnişkandin, kesayeta pîvanên fermandariyê pêşnexist bi xwe ye. Li şûna tawanbarkirina filan-bêvanî, objektîf nêzîkatî ji herêmê re raberkirin ya herî raste. Sedema sereke ya girtina te ya vir jî eve. Ger na wekî din em ê li vir çi jî te bikin? Ger armanca me ya li navbirinê hebûya yan jî tawan hemû bi ser de hiştinê û xirabiyeke wisa bi te kirinê hebûya, me yê ev di roja yekem de jî kiriba. Mesele dîtina te ya vê rastiyê û qet nebe di vê pêvajoyê de xwe gihandina şoreşgeriyeke hukmî pavajoyê dike. Tu niha vê dîbînî?

Ya.: Ev rewş, weke ku Rêbertî jî îfade kir, rastiyan diteyisîne. Nebûna rêveberî, temsîl nekirin û pêk ne anîna rêveberiyeke li hev dike, nebesiyê li pêşberî hev dikevin nav, di encam de jiyankirina pratîkeke tasfiye jî bi xwe re anî. Lê bi taybet di kesayetiya hevalê koordînator de rastiyeke dihat jiyîn hebû. Ji despêkê ve esas girtina jiyanake xwe dispêre gundan, bajaran û rewşa heta yekeyên jêr jî ev teyisandin mijara gotinê bû.

---.: Me çiqas kes windakirin tu dizanî? Bi sedan şehîd hatin dayîn. Li navçûna ewqas derfetên madî, sedema reva bi sedan kes çibû? Tenê jiyanake basît a ku xwe dispart gundan bû.

Ya.: Belê Serokê min.

---.: Dîrok niha kê mafdar dike? Ger hinekî dev ji wê jiyanê hatiba berdan, gelo dê ev pêk bihata? Di bajarê Sêwerekê de milîtanên bi qasî çiya çawa li nav çûn? Ma qada bejahî nebû? Dibe ku hinekî zehmet bûya, lê bi asanî dikarin xwe bi paraztana

û dîrok bihata rizgarkirin. Em dev ji çapûlcitiya Bûcakan berdin, ew der niha dê bi hezaran şervanên ku şoreşa me xwedî dikin derxistiba. Ji xwe potansiyel wisa bû, hîn wê demê bi mîlyonan nirxên madî dihatin derxistin û niha di cerdevaniyê de bû cihê herî bihêz. Vaye yek ji encamên herî balkêş ê nebesiya rêveberiyê û nekirina şoreşgeriyeke bi aqil; niha cihê ku dijmin pê pesnê xwe dide.

Çend roj beriya niha min di televîzyonê de dît digot; “çar Bûcak hebin wê mesela PKK’ê xilas bibe.” Lê dema ku hûn çûn me baş dizanî ku hûn dikarin bi pifekê Bûcak li nav bibin. Ger baş hatiba dîqatkirin, bi pîlan tevgerîbana, karê ku nehata kirin nebû. Ez tenê ji bo te nabêjim, DEP’î (Pariya Demokratîk a Kedê-jî çûn xelet girtin dest. Hevalên me ez jî xistim nav dudiliyê. Hat gotin ku; “bi vî zilamî re naxive” wisa dudil tevgerîn çêbû. Ya rastî tenê tesbîta yekî rastbûya, di roja yekê de dikarî bi îmhayê re bi encam bibûya û bi çalakiyek-du çalakiyan çarenûsa her tiştî dikarî ji serî de bihata guhertin.

Bi giştî ji bo Riha yê wisa bû. We ev raber nekir, hûn ê dûr û dirêj li ser sedemên vê rawestin. Mîna ku di çalakiya Bûcak de bû, ya rast rewşa ku hûn dijîn bûyera duwem ya Bûcaqe. Rêkûpêk tevnegerîn, tewişîn. Di nava gel de tê gotin; “har kirina mar” Bi Bûcaqê yekem jî me mar har kir û me bela li serê xwe vekir. Rewş eve! Ji ber vê me bi sedan şehîd dan ji ber gezkirina van.

Divê ku mirov hinekî kûrahiya berpirsyariya xwe îdrak bike. Berpirsyariya bi hezaran di vê de heye. Asta guhdarkirinê, fêmkirina gotinê nîne. Re. wê li Sêwerekê maba, piştre A.Î dawiya wî anî. Li pê hev çar koordîneyên me li nav çûn. Heta niha koordîna heyî jî rewşa wan ne saxleme. Ewqas kadroyên me yên di asta pêş de şehîd ketin. Ji bo çareserkirina vî karî yekeyek fedaî têr dikir.

Ev bi vegotinê xilas nabin. Tenê bi kesekî ve jî nayê girêdan. Ji bo her derê jî derbasdare. Milîtanekî bi aqil hebe bêje, “ez jiyankirinê wisa qebûl nakim, xeterî heye, li nav çûn heye” li gorî wê xwe rêxistin bike û ji me jî hêz bixwaze, ji xwe ji bo ku em vê bidin we hemûyan em hemû hêza xwe datînên holê. Çîrok bi xetên sereke hinekî bi vî rengiye. Ger tu dixwazî vebêjî, tu dikarî di derbarê van de raporake berfireh jî binivîsînî. Li vir ya

ku ji me re pêwîste, xwe gihandina encamekî balkêşe. Bawerim we ev rastî bi baldarî dîtin, li gorî min we Partî bi kûrî fêm kir.

Ya.: Dikarim bêjin rast naskirina min ji partiyê re di vê pêvajoyê de çêbû. .

---.: Teqez di vê mijarê de tu xwe nexapînî?

Ya.: Ez di vê mijarê de baş fikirîm, lêhûrbûnên min çêbû.

---.: Ger di dilê te de pertekek hebe rast bêje. Min vegot, Partî wisa ye. Li beramberî te jî vekirî dibêjim, ger tu nikarî ez ê bêjim, “malnişîn bibe” yan jî ger hîn jî dewre pêwîst bike tevlî bibe. Bawerim, tu di rewşa baş dîtinê de yî, pertekên di dilê te de jî divê ku li beramberî xeletiyan be. Tu dikarî dewre bibînî. Dikarî wan pertekan di cih de bidî rûnişkandin û heta tu bi partîbûneke rast re rû bi rû yî. Bawerim daxwaza te ya têkoşînkirinê pir vekiriye, xwesteka te ya berxwedanê jî pir vekiriye, ya li şûn ve dimîne van dahûrînan kirine. Ji min re wisa tê ku ev jî ew girtîbûna bi te re vekiriye. Pêwîste pirsgirêkên din nebin, ma wisa hene?

Ya.: Di wê wateyê de pirsgirêka min nîne. Min rabûrî jî, pratîka xwe jî baş dît; xwe jî, karakretê kesayetiya xwe jî baş dît û dikarim bêjim min dahûrand.

---.: Bi wêrekî ser xwe de biçe.

Ya.: Di vê mijarê de ti pirsgirêka min nîne.

---.: Tengasiyên te nînin?

Ya.: Na, bi misogerî.

---.: Daxwaza te ya têkoşînê çawa ye?

Ya.: Daxwaz jî heye, ger zêde tiştek nebe ez ê hinek pirsgirêkên xwe jî ji holê rakim.

---.: Belê wê bihêz bibe.

Ya.: Ew çalakiya Qereqola herêma sêyem jî di nav de, paşê bi wê bayanê re hevdîtin jî, bi rastî xelet ji partiyê re hat ragihandin. Wê demê hinek fikrên min hebûn, ez dîsa bi wan difikirim. Weke ku em hema çûne gudnan, “kesên bê tawan, gundiyên gineh derxistiye, û gule li wan reşandiye” wisa agahî dan partiyê. Vaye “tabanekî me yê wisa bû, wilo bû”bi rastî jî ne raste. Cewhera kar ev bû.

Du şervan revîn, hevalan mudaxele kir. Malbatan xwestin wan derxin derve. Me got em ê bibin alîkar. Vê carê di bin re bin re bi dijmin re pêşxistina pêwendiyê çêbû. Di encam de

mudaxeleya hevalan, axaftinên wan, xebatên îknakirinê heta dawî çêbûn. Pêwendiyeke me ji nêz ve bi yekeyê re jî nebû. Van zarokên xwe radestî dijmin kirin. Berî wê jî hevalan di gund de tehdît dikirin. Dema ku zarokên xwe jî radest dikin heval mudaxele dikin, bi ser wan de diçin.

Beriya wê, hevalê ku ji wê herêmê berpirsyarbû pirsî bû, “rewşeke wisa heye, em çibikin?” Helwesta me ya despêkê diyarbû, “Du şervanin, ger revîbin jî zêde ne pirsgirêke, ger malbat jî dixwaze wan derxe Ewrûpa bila bişînin, bila pirsgirêk bê girtin.” Yanî rewşa gund ji aliyê me ve dihat zanîn. Me di mijara radestkirina zarokan de bersiveke wisa da. Talîmateke me ya, “herî dawî ger nebe, yanî piştî rêbazên îqnakirinê hatin bikaranîn û şûnde ger encamek neyê girtin, di mijara hevkariya bi dijmin re kî vî karî birêxistin bike bi ser de çûna wî gengaz dibe.” Lê me ev talîmat yeser ne da wan hevalên ku di vê yêkeyê de cîh digirtin, me ji hevalê berpirsyar ê ji wê herêmê hevalê Ri. re ragihan. Piştî wê sê-çar roj derbas nebûn me çalakî di radyo de bihîst. Berteka me ev bû “kê ev çalakî kiribe ev çalekî ya kontra ye.”

---.: Yanî tu dibêjî pêkanîn nebes bûye.

Ya.: Ji dervî însiyatîfê pêşket. Ne biryareke me ya wisa, ne jî tesbîteke me ya hedefeke wisa hebû.

---.: Ji nişkê ve pêşdikeve?

Ya.: Bi misogerî ji nişkê ve pêşket Serokê min.

---.: Ne pirsgirêke, ger radestî dijmin kiribin, kuştina çend kesên noker em xirab pêşwazî nakin. Polîtîkbûn, hinekî din cuda tevgerînê pêwîst dike. Ji ber ku derdoreke wan a xizman heye, derdora wan a gundan heye. Mirov ceza dike, lê di demeke cuda de dike. Dema ku çalakiyek tê lidarxistin bêyî ku tu encamên wê yên polîtîk liber çavan bigre nabe. Ev vekiriye, lê girtina şêwazê polîtîk jî di her çalakiyê de girînge. Bawerim ev çalakî ji vî alî ve tê rexnekirin.

Ji xwe pêwendiya bi wê jina din re kêm-zede hatiye fêmkirin. Di pêwendiya bi vê jinê re em texmîn nakin tu ketiyek bî. Tu dikarî çi bêjî? Ew jin ne xisûseke ewqas neyê fêmkirine. Di vê mijarê de meselekirina te li gorî min ti wateya wê nîne.

Ya.: Ez bi asanî dikarim bêjim ji serî ve min ew nekir mesele. Ji wê meselê jî bi misogerî xebera min nebû.

---.: Te nedizanî?

Ya.: Misoger min nedizanî û di wê pêvajoyê de heke min pêdiviya lêgerînê bihîstiba min dikarî lê bigerim. Heta ku ji Derya Reş agahî nehat, min nedizanî çiye jî. Tenê min ji çapemeniyê bihîstibû ku hatiye girtin.

Rojekê, dema ku min hewl dida di derbarê herêmê de agahî bidim Rêbertiya partiyê hevalê Do. ê ku derket telefonê rewşa wê vekir. Got ku di herêmê de ye, serbest hatiye berdan, dixwaze bê nava partiyê Ewrûpa pêşniyar kiriye, dîsa ev ji Rêbertiya partiyê re pêşniyar kiriye û dema ku got ez jî bibim alîkar, bi rastî jî ji min re hinekî ecêb hat. Min jî got, "Agahiyên ku berê di derbarê wê de hatine hinekî cuda ne, yanî hem di derbarê malbatê de, hem jî di derbarê wê bi xwe de, hem helwesta ku ketiye nav, ji aliyê ast ve cuda ye, tiştên ku hûn dibêjin hinekî bi van re nakokin, agahiya we heye?" Bersiva ku hevalê ji Derya Reş da ev bû; "misoger ne girînge, ya girîng hatina wê ya vê sehê ye. Dixwaze bila di ser Ewrûpa re be, dixwaze yekser, bi însiyatîf û qenala xwe bişînin, di alîkarî kirina we de ti pirsgirêk nîne" wisa hat gotin.

Heta tevî vê jî ez zêde bawer nebûm, min xwest vê rewşê bi hevalê K. re baxivim. Ji ber ku ez bêrê jî li wî geriyabûm wî bi xwe jî got, "ez li Ewrûpa li hevalê Ka. geriyam, heval jî derxistina min guncaw dît"wisa gotibû. Piştre ji ber ku cihaza we nedixebitî min jî pêwîstî bi lêgerîna we nedît. Yanî mijara hevdîtinê bi niyeta xwe ya baş min bi vê xalê ve girêda. Min dema borî ev got, "Nêzîkatiyeke min a xapêner çêbû herî kêm dixwazim vê telafî bikim" Yanî di wateyekê de xwe li beramberî partiyê dayîna efukirin û rewşa tawan be jî, şandina wê ya nav partiyê bû.

Me ev jî got û ger ne ez bûma, hevalekî din bûya, misoger wê rewşa hevdîtinê neba mijara gotinê. Min bi asanî ev didît. Baweriya xwe bi min anîna wê ti sedemeke wê ya din nebû. Ez bi asanî dikarim vê îfade bikim. Yanî baweriyeke wê ya diyar hebe ew jî ev bû; herî kêm dizanî di derbarê rewşa wê ji rêxistinê re ragihandin ez ê ji bo wê nekevin nav helwesteke neyênî. Ger na sedema baweriya xwe bi min anînê nebû. Ev rewş jî bû mijara nîqaşê. Bi şêwazê ku, "pir baweriya xwe bi te tîne, lê baweriya wê bi partiyê nîne" hat nirxandin. Di encam de hat, di hevdîtinê

de jî rewşeke neyênî nehat jiyîn. Mijara ku herî zêde ez tangav kirim ev e; şehadeta hevala Ber. û De. bi vê hevdîtinê re girê dan.

---.: Temam, di vê pêwendiyê de ez jî, di niyata wê jî de, ne bawerim tu yekî ketibî. Di anîna te ya vir de jî ev vekiriye. Di wê mijarê de divê ku ev bê fêmkirin; jiyana ku wan dixwest di nav partiyê de belav bikin, jiyana ku em dixwazin dahûrînin. Bi hemû xebatkarên xwe, pere, çek û bi sedan mirovên xwe ve Stenbolê mezin û Îzmîrê bi giştî radest dike û ev piştî 15 rojan derdikeve holê. Berpirsyara eyaletê, perpirsyara Îzmîrê bi dehan çalakî kiriye, kesayetiyeke mînakên wê kêmin û ji cesareta wê re jî mirov heyran dimîne. Diçe, dixwaze di nava partiyê de vê jiyanê birêxistin bike. Miroveke çawaye fêmkirina wê jî gelekî zehmete!

Tu girtiyên PKK'ê yên ku berpirsyar bin di nava demeke kurt de yanî 15 rojan de berdana wan ne mijara gotinê ye. Eşkereye ku ev kesayet bi gumane. Tenê ne radestbûn, bi dijmin re hevbeş jiyankirin di hemû astî de şayanî xwe dibîne. Ya rast di girtîgehê de jiyaneke wisa hatiye pêşxistin û aliyê ku em jê guman jî dikin eve. Xetên me yên çînayetî jêbirine. Bi komser re bi asanî dixwun-vedixwun û şa dibin. Diyariya xwe digre, cixara xwe digre, xwarina xwe digre, bi ehbab-çawîşî dijî. Ji xwe ya ku tê jiyîn ji aliyê malbatê ve jî, ji aliyê wê ve jî wisa ye. Dixwazim bêjim di girtîgehê de meyleke wisa hatiye pêşxistin.

Dişibîne vê; ne bi niyeta xirab ez biçim sîxwuriyê bikim, bi şêwazê; "jiyana min eve, ez biçim veguhezînim nava PKK''ê jî." Û ya herî xeter jî eve. Di vê mijarê de dijmin heta dawî rehete, dibêje; "biçe" şêwazê jiyana wê dereng ferqkirina me bawerim nebesiyeke siyasî bû. Diviya bû me pêşwext îspatkiriba, yanî di 1986-87'an de dema ku di hundir de bû me ev ferq nekiriye. Bandorên wê yên ruxêner paşê derketin holê.

Para te sînordare, yanî di hundir de jî bi zanebûn yan jî bê zanebûn bandorkirina te em ewqas neyênî nabînin. Lê em bawerin ku armanceke wan ya wisa hebû. Yoz kirina jiyanê, xistina nirxa bexwedanî, nirxa siyasî, di pêwendiyên bi xwe re şirîkiya tawanbarî zêdekirin em dizanin ku xebatekî wisa bi pergal jî hebû. Lê me negot ji aliyê we ve tevlîbûneke bi zanebûn û niyeteke xirab heye. Berevajî, bi şêwazekî polîtîk ew ber bi

partiyê ve kişandin helwestekî raste. Ya rast erêniye, ji bilî vê pêwîst nake tu encamekî din derxe.

Encama ku divê tu jê derxî, waneyên dahûrandina girtigehê ne. Wan jî ji xwe tu derdixî. Girêdanên hestî ji hemû aliyan ve çawa tên destgirtin, tu vê jî bi şêwazekî baş dibînî û dinirxînî. Taybetmendiyeke min bi te re dît, tiştên bi te re pêwendîdarin tu dikî meseleyên mezin. Ger partiyê li cihekî dahûrîn pêşxistibe û ev dahûrandin rast be divê ku ji vê re tevlîbûn bê çêkirin. Ger na, “Do. çima wisa got, eyaleta din çima wisa got” bê wate ye. Piraniya yên ku ev gotin jî niha şehîd ketine. Li şûna ku tu vê wisa ji partiyê bipirsî, pêwîste tu ji xwe bipirsî; çima ev paşverûtiyên me, me tenin vê astê? Gelo çima ev heval di nava helwestekî wisa teng de man û ya herî girîng jî di dema xwe de çima me hev pêş nexist? Pirsgirêk eve.

Gelo em ê çawa bikarin tevlî jiyana pratîkî ya rojane bibin? Niha pirsgirêka me eve. Gelek hevalên wisa paşketî hene. Ji aliyê pratîkî ve em zêdetir çawa dikarin jiyanê çareser bikin? Tekane encama ku divê bê derxistin eve. Ger na tu li qusûra bigerî, tu bêjî; “kî çima rê ji vê re vekir?” ji xwe qet ji nav vî karî derketin çênabe. Ne bawerim tu bikarî hesab bidî tu kesî û ger bê israrkirin, pir zêde xwe tasfiyekirine. Vaye di rêveberiya te de jî qusûra yekem ku tê ditin di vê derê de ye û ev xaleke xetere.

Tu kesayetiyeke çawa yî, te çawa teşe girtiye? Di hundir de bi taybet neheqiyên heyî, ferzkirinên pirsgirêkan dibe ku te anîbe vê astê. Paşê jî tenê ji bo rizgarkirina ferasetekê yan jî tê gotin; “niyeta min başe, min xwest ya rast bikim, çima rêxistin fêm nake?” Dema ku fêm jî nake hêrsbûn, ketina nav bertekeke hestyarî heye. Rêxistin vê kesayetê qebûl dike, lê rastiyê zêde dibîne, tevdirên xwe girtiye rêya çareseriyê jî daniye holê.  Yê ku nabînin, yên ku teng nêzîk dibin kesayet bi xwe ne. Di vir de vîn bi rêxistinê re kirina yek, dîsa jiyana şoreşgerî esas girtin girînge. Bi daxwazên xwe yên takekesî, bi rewşê re nakok be jî, ew hêz nîşandan, ji serxistina şoreşgeriyê wê, ber bi şoreşgeriya profesyonel ve birin pêdiviya qonax pê dayîna kirinêye. Her milîtanekî şoreger piştî ku gişt vê astê û şûnve, neçare ku wisa be.

Bawerim di vê mijarê de te gelekî xwe tehlîl kir, tevlîbûna xwe, te bi partiyê re yekbûn pêk anî, vîna te saxleme. Ji xwe wekî din jî ne gengaze, ya rast jî eve.

Ya.: Raste Serokê min.

---.: Bawerim hêza te ji vê re heye. Hem di ferasetê de, hem di hevgirtinê de tu tevlîbûnê pêk tînî, hevalên ji rêzê, ewqas kêmasiyên şer, yên ku nebesiyên wan heye jî vê hêzê raber dikin, ma tê nikarî raber bikî? Yên ku kêmasiyên herî mezin dikin jî, hêza bi rastiyan re hevgirtinê dikin, azweriya xwe ya zêde şer kirinê diyar dikin, ma tê nikarî van diyar bikî? Wê demê ez ê bêjim tu yekî dinî.

Ez di demên berê de jî di derbarê te de neyênî nedifikirîm, yanî divê bi asanî tu hevgirtinê pêk bênî, hêjî vê nerîna xwe diparêzim. Te pirsgirêk ji xwe re derxistin yan jî ji ber nebesiyan te jiyan kir. Li gorî min tu hêjî wisa yî. Ger şêwazê ku ez dibêjim tu esas bigirî, tu di asta ku dikare bi asanî hevgirtinê pêk bînî û hinek peywiran jî weke ku şayane dikare biser bixe. Ger tu berevajî ferz bikî tê winda bikî, ger tu zêdetir israr bikî li beramberî bûyera partiyê, li beramberî bûyera xetê tê tengav bibî. Rêbaze, uslûbe di van mijaran de baldar be, ya ku ev heval herî zêde dijîn eve.

Ez her roj bal dikişînim ser fermiyeta partiyê, ez vê vala nakim. Fermiyeta partiyê, asta siyasî ya partiyê xeta partiyê bi xwe ye. Yanî em wê li gorî xwe şîrove nekin, em wê di safoka xwe re derbas nekin. Ji dil, bidîsîplîn û hinekî jî em vina xwe radest bikin. Partî jî eve. Berevajî dê bibe şerê bi şêwirî, bi hesab-kîtab. Dibê, “bila Partî ewqasî bide me, ez ê jî ewqasî bidim.” Ev dibe şêwazê tevlîbûna burjuvaziya biçûk û baş dizanim ku ev şêwaz wê îfleh nebe. Bi van dahûrînan pêwîste te ev jî dîtibe.

Bawerim veguherîna herî radîkal tê di vê xalê de bikî û bawerim hêza te jî heye. Li gorî min paşeroja te di şer de windahiya eniyê ye, ne şewişîneke, heta weke min got, derxistina te ya van pirsgirêkan bi şêwazê xwe bi xwe mijûlkirinê ye, hinekî jî bê wate bû. Ger tu hîn jî israr bikî, ez ê bêjim di nava vê de tiştekî din heye. Tê nikarî min bidî bawerkirin, ji ber ku bêwate, çima tu dixwazî bi zanabûn zirarê bidî? Bi şêwazekî din, yan tu şêtî, yan jî tu kesekî hizirsabîtî; ez ê biçim vê şîrovê. Ger tu ne wisa bî, wê demê meşa te ya bi tendurist, tevlîbûna te ya bi tendurist, hem mafê te ye, hem jî azweriya te ye. Wekî din nayê fikirandin, tê fêmkirin ne wisa?

Ya.: Tê fêmkirin Serokê min.

---.: Tiştekî din ku tu bixwazî diyar bikî heye?

Ya.: Di mijara meşê de ti dudiliyên min nîne, fikarên min nînin. Di xala nirxandina wan xisûsan de, di serî de nebesiyên min, kêm mayînên min di bingeh de ye. Di vê mijarê de dema ku bal bikşînim ser nêzîkatiyên hevalan, bi niyeta xwe ya baş li ser kîja xalan tevgerîm min xwest wê diyar bikim. Lê di dema lêpirsînê de hemû bûyerên ku hatin jiyîn, diyarde bi encam û sedemên wê ve pir vekirî ne. Ez jî di vê mijarê de heta dawî vekirî tevgerîm.

Helwesta min, her çiqas di fêmkirina rewşa heyî de nebes bûbe jî, xala sereke ku ez tengav kirim, di ferzkirina hinek rexneyên bê rêbaz de bû. Bi rastî jî weke ku dihat xwestin hinek tiştan îspat bikin, hema bêje arasteyên ku feraseta dijmin nîşan bidin hebûn ku, sedemên sereke yên ku ez tengav kirim bûn.

---.: Dibe, qenheteke dijminî bi zanabûn mirov tengav dike, dizanim di vê mijarê de hinek tengavî hatin jiyankirin. Ji xwe ger em jî di wê fikrê de bûna, her wiha me bi te re pêwendî wisa nedidanî. Ji bo careke din tu nekevî vê rewşa xeter tu yê dîqat bikî, ji ber ku kêmasiyek jî mirov ber bi darvekirinê ve dibe, di encam de her roj dibe, vê jî bikin guhar bikin guhê xwe.

Di nava partiyê de li her derê yên ku weke min, hemû tiştî berfireh digre dest li benda kesên wisa nemînin. Kurd çawa Kurdan tine dikin, çîroka vê tê zanîn. Dev ji vê berde, yên herî nêzîkî me jî dixwazin me di çi rewşê de bigrin. Ger hêza min a mezin ya xwe parastinê nebe, yên herî nêzîkî me jî dê dawiya me bînin. Têkiliya bi rastiya Kurd re ava bikin, tu dev ji vê hişmendiya teng, seranser berde, hinekî dakeve nava realîteyê. Ya ku tu dijî li ber tiştên heyî ne tişteke. Başe tê ji tiştên ku em dijîn re çi bêjî?

Ewqas liyaqdîtinan di derbarê min de dikin, çawa ewqas serdehatinan dikin. Eşkereye ku, rojane netewek bixwe mijara gotinê ye. Di van mijaran de hinekî fireh be. Dibe ku pirsgirêk hebin, tê kamil bibî, ya din jî tê li beramberî van rewşan bi emadekarî bî. Dema ku tu ket tengaviyê yan jî di ketinê de xisûsên ku tu pir jê êş dikşînî, ji bo hemû partiyê nefikire, nexe, hevalên xwe ji vê biparêze, girîngiyeke taybet bide vê û tê ji vê jî waneyekê derxî. Ya ku li şoreşgerê kamil tê eve. Wekî din hesab-

kîtabê vê nayê kirin. Uslûbê rêxistinê eve, ya ku şoreşgerê kamil şayanî xwe bibîne jî eve.

Ya.: Raste Serokê min.

---.: Waneya min jî bi temamî li ser vî esasî ye.

Ya.: Di mijara xala paşketî de, berteka min, bi taybetî jî dema ku hevalên di wê astê de ketin nava nêzîkatiyeke bi vî rengî, nemaze, "ger Partî wisa nêzîkî min bibe ez ê jî xwe wisa ferz bikim" şêwazekî protesto dike nêzîkatiyeke wisa pêk hat ku, heta hatim vê qadê jî min di vê helwesta xwe de israr kir. Min dizanî ku ev xetere, lê çûyîna dijmin, mijarên ji partiyê rev misoger di aqlê min re derbas nebû. Tevî her tiştî jî ji partiyê cuda jiyankirin, yan jî qutbûn min di aqlê xwe re derbas nekir, min nêzîkatiyeke wisa heta dawî raber kir.

Di vê wateyê de hem min cesaret nekir rewşeke wisa ji Rêbertiya partiyê re vekim, hem jî ji ber serdema wê helwesta xelet a ku ji despêkê ve ketibûm nav, ji ber ku min rewşeke ruhî ya şermê jiyan dikir, yanî min mafê raporeke wê rewşê îfade dike nivîsandin ji xwe re nedît, teysandina van rewşan jî min rast nedît. Di encam de dema ku hatim vê qadê ez xwedî fikra, "baweriya partiyê bi min nayê" bû. Di wê demê de min pir baş didît ku Partî dixwaze min dubare qezenc bike, lê ew ferzkirin, rexneyên nerast, ji ber ku ez tengav dikirim, hema bêje ji nedîtî ve dihatim. Di bingeh de her tim nêzîkatiya qezenckirinê li pêş girtin, tevî her tiştî jî dema ku hatim vê qadê cudabûna di rêveberiyê de, nêzîkatiyên hevalan ên îknakirinê dikarim bêjim ku di saleke dawî de nêzîkatiyên erênî yên ku di vê sehê de ez pê re rû bi rû hatim, berdêlî wan hemû nêzîkatiyên ku li wir min derbas kiribûn.

---.: Bawerim te waneyên herî girîng guhdar kirin tu gihîşt hinek encamên balkêş.

Ya.: Raste Serokê min.

---.: Partîbûneke pir cidî bawerim te ji hemû aliyan ve dît.

Ya.: Raste Serokê min.

---.: Û hûn di vê mijarê de me naxapînin.

Ya.: Misoger ne xapîn, ne jî rewşeke xapandina partiyê nîne.

---.: Ji bo me ev girînge. Ji bo te despêkirineke nû ye. Em dixwazin te wisa binirxînin û ev jî pir girînge. Ji ber ku hem ji bo xwe, hem jî ji aliyê yên ku tê bidî qezenckirin ve girînge. Em

nikarin mirov ji rêzê bigrin dest. Yekî ku ewqas ezmûn jiyankirine em ê qet nikarin bigrin dest. Weke beriya niha jî min got, divê ku mirov pir zêde ehmeq û niyet xirab be, dibe ku ji niha û şûn ve tu xiyanet li xwe bikî. Divê ku tu şansê şerê dîrokî, şansê qezenckirina dîrokê rast bi kar bênî. Yên ku tu ji partiyê bixwazî, têkoşîneke baş û peywirên ku tu bikarî rake dibe ku hebin. Bawerim di vê mijarê de Partî di hemû corê alîkarî kirinê de girîngiya pêwîst nîşan dide.

Tu nikarî bê têkoşîn bijî, bê PKK'ê nikarî bijî. Li ser we ferzkirina vê dibe cezayê herî mezin. Bawerim ya herî rast xwe gihandina vê statuyê û girtina vê çarçoveyê ye. Ya ku ji dest me hat me raber kir. Ne ku bi hemû hêza xwe qezenckirina te ya partiyê, berevajî wê bibe hêz bidestxistina daxwazek, azweriyeke jiyana partiyê û qezenckirina te ya pariyê. Dîsa divê heta dawî bawerî hebe û pêwîste tu dilnizm bî.

Li vir pirsgirêka netewekî tê çareserkirin, hinekî jî dîrok tê vegotin. Divê ku meseleyên takekesî qet mirov nexe serê xwe. Em tevgara ku bi mîlyonan re mijûl dibin û barê şoreşê radikin. Kadroyê vê, kûrbûn, kamilbûn çiye, divê ku êdî bê dîtin, û di vê çarçoveyê de teşe ya xwe bigre. Tu vê dibînî, em her roj vê bi hevalan re pir zêde jiyan dikin, ya rast jî eve. Wekî din çareserî nabe. Wekî din asta paşketî, ya ber bi li navçûnê dibe mijara gotinê, nikare şêwazê xwe bi xwe linav dibe rake. Te ev gelekî bi balkêşî dît û bawerim rêyeke din jî nîne.

Ji bilî vê di derbarê hevalê Ya. de hinek nirxandinên Kurt hene? Tu çi dibêjî Ab?

Ab.: Rewşa Ya. rewşa hinek hevalên ku piştî 1980'î ji wê qadê derketin tîne bîra mirov. Dibe taybetmendiya Hîlwanê. Hevalên ku ji vê qadê derketin pir zêde bê polîtîka man. Ji ber dîtina bûyerên wisa biçûk, giştî nedîtin. Ev ji aliyê polîtîk ve nehatin şîrovekirin, gelekî tengav bûn. Ya herî girîng jî pir zêde tevlî berxwedaniyê bûne, ya rast zanebûna wan jî heye, di wê mijarê de jî pêşketîne. Lê ew bi polîtîkayê re nekirin yek. Her tim bûyerên wisa di serê wan de ma, di mijara tevger û giştî de zehmetî jiyan kirin.

Bi hevalê Ya. re jî teybetmendiyên herêmê zehmetiyan dide afirandin. Tevî ku ezmûn û danehevên wî yên zanyariyan heye jî, tevlîbûna pêwîst ji hevalan re nake, têkoşînê lewaz dihêle.

Ya rast ew jî dixwaze danaheva heyî bide, lê ji ber nêzîkatiyeke wisa nikare bide. Bi qasî ku têkoşîn pêşdikeve her tim sutxwariya wî dijî û her tim tengav dibe. Di nêzîkatiyên wî yên vir de jî diyare, berê jî me ev gelekî pê re nîqaş kir. Eşkereye ku nêzîkatiya wî neraste, derbaskirina wî ya vê rewşê di holê de ye.

Ya rast nêzîkatiyeke hinekî polîtîk û ev di asta netewî de, di asta partiyê de dest negirtin, pir zêde bûyer û xwe esas girtin heye; ji dîtina xwe cihekî din nabîne. Ev, hinekî fikrandina wî difetisîne. Pêwîste van derbas bike. Hinekî rewşa li beramberî giştî berpirsyarî, nirxandina polîtîk, fikra wê, çalakî di vê astê de pêşxistin, nêzîkatiyên xwe firehkirin û heke bi gelemperî kirinê ve bijî wê vê derbas bike.

---.: Xusûsa ku te got ji xwe bi aliyên têrker ve hatin dahûrandin. Wekî din Fu. tu çi dibêjî?

Fu.: Bi taybet dixwazim li serê wê xala ku hevalê Ab. destnîşan kir rawestim. Ya rast nêzîkatiya wî li şûna xwe vekirinê ber bi girtinê ve dibe.

---.: Me van hemû baş vekirin. Ji xwe dewrê ev kesayet dahûrand. Yanî dahûrandina kesayetiya Kurd a ku aliyê xwe yê polîtîk zêde pêşneketiye, nayê netewbûnê, partîbûnê û şer bi awayekî pir baş hat kirin. Ji salekê zêdetire dişopîne, bawerim perwerdeyek bingehîn girt. Di asta ruh de bêyî ku aciz bibe, bikeve nav kompleksê tê bibîne, fêm bike. Ne şerme.

Min çima îsyana yekem vekir? Ez çawa polîtîk bûm, çawa leşkerî bûm, civakî bûm, birêxistin bûm ji bo yên weke we bawerim gelek bi balkêşî hat nîşandan. Hûn hinekî berevajî wê dişopînin, ev xeternake. Nirxên dewrê yên perwerdê gelek bilindin, bi taybet ji bo ku yên di rewşa we de ne hîn bilindtire. Di vê baweriyê de me ku tiştên pêwîst hûn bigrin we zêdetirin girt. Van xalên ku hevalan destnîşan kirin te dît û bawerim ji bo derbaskirinê hem weke têgeh, hem jî ji aliyê fêmkirinê ve em dikarin bêjin te jiyan kir.

Ji dervî vê, yên ku di derbarê hevalê Ya. de dudilî, pêşniyarên wan hebin hene? Di vê astê de ji nû ve biryara xwe dayîna te gelek girînge. Xalên din ên ku qala wan hat kirin bi raporên berfirehtir, veguherîna nivîsan û ya herî girîng jî veguherandina hêza partiyê pêwîst dibe. Ez dubare ji te re

pêşniyar dikim ku tu tengaviyên xwe derbas bikî, hinekî veguherîne û vê jî di uslûbê xwe de pêk bîne.

Ez çawa vediguherînim rêxistinê, siyasîbûnê, netewîbûnê; nakokiyên te jî hinekî wê wisa bên çareserkirin. Nemaze pir zêde hewl bide me fêm bike û bişopîne. Di vê mijarê de ya rast hîn hêza te jî heye û biryardariya te jî heye, lê te şêwaz negirtiye. Bûyîna siyasetmedarê mezin fermandar, her wiha ne bûyereke asan û ji rêzê ye, te ev raber nekiriye.

Dubare dibêjim; ev encax bi xêra partiyê dibe. Rêbertî ji bo vê merce. Ger her kes bibe rêber, bikariya partiyê damezrîne, herhal de wê heta niha di Kurdistanê de ev kar ji zû ve bi ser ketiba. Tu dibînî nikarin damezrînin. Tevî ku ewqas dibim alîkar jî, her kes nikare bibe rêberekî baş. Bûyîna Rêbertî li aliyekî bimîne, çavê hev derdixin. Em care yekê dahûrîna rêbertiyê dikin. Yekîtiye, rêxistine, ev karên ku hatine serxistine. Tê êdî vê pir cidî fêm bike.

Şêwazê we asêmayîne di taybetmendiyên mehelî yên serdema komê de. Ev jî dibe rewşeke pir zêde tê jiyîn di heman demê de. Di taybetmendiyên mehelî de asêmayîn hema bêje di hemû herêmên Kurdistanê de tê dîtin, her kes dibe evîndarê taybetmediyên xwe yên mehelî. Ger em derbas nekin em nikarin netewebûnê pêk bînin, civakî nabin, ji aliyê siyasî û leşkerî ve em ê nikarin pîvan bidin rûnişkandin. Weke me got li ser hemû gel û partiyê hatiye ferzkirin, dê ev hemû di lêpirsîneke cidî re derbaskirin jî pêwîs bike. Tê jî para xwe bigre. Ev perwerdeyeke. Ger tu hinekî dixwazî xwe hinekî bi êşandinê veguherînî, rizgarî û pêşveçûn merce. Ji bilî vê xwe parastina tak ehmeqiye. Yên ku dibin evîndarê tengbûna xwe, xwe dixetimînin, seranser dibin û her ku diçe dikevin rewşeke tasfiyeger ehmeqe. Her wiha berjewendiya şoreşgerekî ji vê yan jî şansê wî yê serkeftinê qet nabe.

Tu di rewşa ku van hemûyan bibîne de yî. Bawerim xwesteka te ya meşê heye, li ser vî esasî di meşê de derfeta serkeftinê heye û tê bi kar bînî.

Ya.: Belê Serokê min.

---.: Ger tu dixwazî vî şansî bi kar bênî li ser vê bingehê sozekê jî tu bide.

Ya.: Demeke dirêje pêwendiya min bi partiyê re hebû. Min hewl da bi partiyê re bimeşim. Di encam de rastiya ku hat dîtin; heta ku tevlîbûneke rast nebe, ev veneguhere girêdaneke rêxistinî, di kesayet de veguhertineke teqez neyê pêkanîn, çiqas niyet baş bim jî, girêdayî û bi biryar bim jî, di encam de ev meş zêde tevlîbûnê ji şoreşê re pêk nayîne.

Fikra min her dem di derbarê şoreşê, tekoşîn û partiyê de bû. Lê ji ber ku min şêwazê rêxistinî-polîtîk ê partiyê negirt, uslûb, rêbazê wê neda girtin, li şûna bûyîna yekî barê partiyê radike, her tim nebe jî dem bi dem tevî ku min karî di demên pir dîrokî de alîkarî bikim jî, di xala parastina partiyê de xwe kirina pirsgirêk, bi partiyê, rêxistinê re xwe rû bi rû anîn, yanî bi giştî meşa min niyet çi dibe bila bibe, encama ku derket holê ji partiyê re bûme bar. Ya ku mohra xwe li pratîka min xist ne pratîkeke têkoşîn pêşxistiye, berevajî vê, bi awayekî objektîf dibe pratîka ji dijmin re xizmet dike, tasfiyeger û xeta navîn.

Ji xwe taybetmendiyên ku kesayet pê teşe digre di vê wateyê de nehatine veguhertin, di her derfetê de di pratîk û jiyanê de diteyisin, ev jî bi lîstinê dijmin ên li ser kesayet ji nêz ve girêdayîne. Bi taybetî jî di pêvajoya girtîgehê de ev ji aliyê şerê taybet ve hatin pêşxistn.  Di encam de taxrîbatên ku li ser tak hatin afirandin demeke dirêj nedîtin di dema ku dît de jî weke tê xwestin mahkûm nekirin bi xwe re gelek nexweşî û xeletî anîn. Ev jî ji kesayet zêdetir zirara wê gihîşt partiyê.

Di nav partiyê de bimeşim. Her çiqas ji aliyê fîzîkî ve di nava partiyê de meşîbim jî, ji aliyê fikrî ve di kêleka wê de meş hat jiyankirin. Di encam de hat dîtin ku ne fêda vê ji tak re, ne jî ji rêxistinê re heye. Di vê wateyê de Partî, bi taybetî jî piştî pêvajoya girtîgehê, min ji aliyê rêxistinî, polîtîk ve bi çekên bihêz amade kir û di pêvajoya derfeta berê xwe dayîna welat da, tevî ku min hinek rastî, pirsgirêk dîtin jî, ji ber ku min xwe negihand rêbazê rast, li wir tenê ne şehadeta bi dehan heval, ji destdayîna parçeyekî girîng ê şoreşê, parçeyekî girîng ê welat hat jiyankirin.

Ger îro dijmin li wir otoriteyeke pir bihêze, li beramberî şoreşê serkeftineke demkî destxistiye, ev ne ji ber bihêzbûna dijmine. Ev, ji hemû aliyan ve bi nêzîkatiyên me yên dervî partiyê, şêwazê xebat û jiyana me ve girêdayî ye. Pratîka li ser vê

teşe girt, di wateyeke rast de bû pratîka tasfiye, ya kontra. Bi awayekî objektîf be jî ev hat jiyankirin.

Dîsa piştî vê pêvajoya darizandinê û helwestê paşketî ku min raber kir, paşê dîsa di mijara partîbûnê de biryar dayîna min, ji nû ve partîbûyîn, di xala ji nû ve welidîn afirandinê xwe gihandina asta biryardariya min, di wateya zelalbûna min de dikarim bêjim pêvajiyeke girîng hat jiyankirin. Dahûrandinên Rêbertiya partiyê ên di 1994'an di derbarê ji nû ve partîbûn, rastiya me ya şer, rastiya Serokatî, nêzîkatî ji pirsgirêka jinê re û di derbarê diyarderya dijminê navxweyî de pêşxistina nêzîkatiyeke nû, di ronahiya vê de dema ku pratîka xwe ya borî dinirxînim, dikarim bêjim ku raborî di asteke girîng de min derxist zanabûnê.

Dem, ji her demê zêdetir meşeke hîn saxlem, derketinê neçar û pêwîst dike. Milîtanekî partiyê, weke şerkerekî, di pêvajoya pêşiya me de, heta roja îro erkên ku min xwestine bikim û pêk ne aniye, armancên min ên şoreşgerî ku min xwestiye xwe bighînimê û negîştimê ji bo xwe gihandinê li ser esasê xet û taxtîkê partiyê, bi şêwazê rêbertiyê destdayî ez ê heta dawî bimeşim. Li ser vî esasî di rêya ku serkeftinê ya dîrok, Partî û gel ferman dike heta dawî bimeşim û di derbarê ku ez ê bibim xizmetkarekî gel… soz didim.

---.: Platforma A. Serkeftî bi encam bû? A. xwe tehlîl kir?

A.: Serokê min, di asteke girîng de min rewşa xwe danî holê.

---.: Ji der ve A. yê ku nehat rexnekirin kî ma?

Ab.: A. hat rexnekirin Serokê min.

---.: Ez dikarim çi bêjim? Bawerim dema ku raporên ji Ewrûpa hatin te xwend û te jî dît. Di raporan de brokras mayîn, pêwendiyên dîplomasî û siyasî-leşkerî teng girtina dest hatiye vegotin. Min jî bi qasî ku di hinek raporan de dît, nêzîkatî ji mirovan re gelekî li paş pîvanên me ye. Her wiha demeke dirêje tu li wirî. Perwerdeyeke cidî nedîtina te dibe ku di vê de rist lîstibe. We ev xal hemû nîqaş kirin?

A.: Belê Serokê min.

---.: Çi derket holê?

Ab.: Bi partiyê re pêwendî daniye, yek alî xwe tevlî partiyê kiriye, pir zêde bi pîvan şoreşgerî û partiyê xwe perwerde

nekiriye. Ya rast hinekî li gorî pîvanên pergala Ewrûpa polîtîka kirin heye. Asta têgîştina heval a polîtîk heye, lê kûrbûna wî zêde nîne. Bi qasî ku pêdiviya rêxistinê heye, bi qasî Partî pêwîstî dibîne yên ku nekevin nava xebata polîtîk, di jiyana rêxistinê de brokratîk, yên ku rêgezên partiyê yên bîrdozî temsîl nakin, bi taybet jî yên ku ji perwerdê, kadrobûnê re, ji perwerda kadroyan, rêveberiyê re bi şêwazê partiyê nêzîk nabin, di van mijaran de her tim sînordar maye kesayetiyeke wî ya wisa heye. Ne dijberî partiyê û şoreşê ye, yê ku pê re ye, di vê de ti didiliyê wî nîne, lê kesayetiya ku weke tê xwestin jî pêk nayîne rewşeke wî ya wisa derket holê. Di derbarê derbaskirina van de, di vê mijarê de heval soza biryardariyê da.

---.: Di derbarê A. de bi taybet hevalên ku ji Ewrûpa hatine çi dibêjin? Bingeh hat avêtin? Kî hevalê me yê A. nasdike?

X.?.: Ez û hevalê A. me bi hev re kar dikir. Serokê min, li gorî min helwesta ku hevalê A. li beramberî rexneyên hevalan pêşxist erênî bû. Ev rexne ji bo veguhertina heval, di derbarê xebatên heval ên pêşerojê de, ronîker bûn. Ji xwe xalên kêm mayî hevalê Ab. diyar kir. Li gorî demê xwe perwerdenekirin, dîsa xwe negihandina uslûb û disîplîna rêxistinê nebesiyên heval dihatin dîtin. Li ser esasê rexneyên ku hatin pêşxistin heval dide diyarkirin ku wê di asteke mezin de veguhertinê pêk bîne, gelek tiştan ser bixe.

---.: Tu ji bo xwe çi dibêjî A?

A.: Serokê min, pirsgirêka min pirsgirêka rast partînebûn û xwe negihandina pîvanên partiyê ye. Ji bo min di nêvenga Ewrûpa de xwe gihandina van pîvanan bi rastî jî gelek zehmet bû. Nemaze pirsgirêk dibe birgirêka perwedê. Yanî hem nêzîkatiya rast, hem jî dibû pirsgirêka perwerdê. Ev nêzîkî du mehane ev seha ku ez tê de me, bi taybetî jî di dahûrînên bihêz ên ku hatin kirin de ji aliyê xwe ve min encamên pir baş jê derxistin. Di vê pêvajoyê de di nava xwe de hesab pirsînek jiyan kir, min aliyên xwe yên paşdemayî baştir dîtin, bi taybetî jî şêwazê partiyê divê ku bê girtin û şêwazê takekesî çiye, di dahûrînên ku hatin kirin de, waneyên hatin dayîn û di nîqaşan de bi awayekî pir bihêz dikarim bêjim min girt.

---.: Yanî vê rê li ber çareserî û asta fêmkirinê vekir.

A.: Belê Serokê min.

---.: Bawerim te Partî, hemû xeta polîtîk a partiyê, xeta leşkerî ya şer dît. Jiyana Ewrûpa, xeteriyên wê yên xebata yekalî dît. Bi temamî ne nirxandina mirovekî, ji aliyê polîtîka dîplomasiya PKK'ê ve tê çi wateyê, dîsa wisa teng destgirtina te ji hemû aliyan ve derket holê. Bawerim em ê ji niha û şûn ve nekevinê.

Baş meşandina xebatekî karê derve, herî kêm bi qasî gêrîla rastiya partiyê, veguhertina jiyankirinê pêwîst dike. Çawa ku bûyîna fermandarekî baş a gêrîla di partîbûnê re derbas dibe, bûyîna rêveberê xebateke dîplomasî jî di partîbûnê re derbas dibe. Ev bingeh ji bo her kesî û hemû erkan merce. Berevajî, ger tê di bin navê; "ez tenê ji dîplomasî fêm dikim, ji çandê fêm nakim" tu xwe ferz bikî, wê demê tu nikarî xwe ji tasfiyebûnê rizgar bikî. Ji bo we jî pîvana pêwîst; pîvanên Partiyê yên giştîne.

Em cudabûna erkê û biçûkbûnê jî nakin, lê ger tu ji xwe bawerî û dibêjî; "ez ê bibim kadroyekî PKK'ê" di vê de bi israrim, tê veguhertina vir hinekî di kesayetiya xwe de jiyan bikî. Bawerim di vê de jî biryara te di cîh de ye, ezîm û vîna te jî bihêze.

A.: Belê Serokê min, di vê mijarê de tu dudiliya min nîne.

---.: Rewşeke ta ya cidî ya fikira sabît çênabe ne wisa?

Ab.: Na Serokê min. Pêwîste hinekî ezmûnên pratîkî qezenc bike. rastiya gel…

---.: Ne pirsgirêke. Wê gel bibîne. Tê pir zêde xwe ji vê xeteriyê biparêzî; ew sehayên pêwendiyên derve qadên xeterin. Ez bi xwe jî bi asanî cesaret nakim bikevim nav. Şopên qirêj ên emperyalîst-mêtingeriyê li ser xwe digerînin, divê ku mirov bi dîmenê wê nexape.

Ji bo mirov bibe gurê pêwendiyê, divê ku mirov bibe fêmkerê esasên xeta partiyê. Di dîmen de tê pir taktîsyen bî, bi taybet tê di uslûb de gelek nerm bî, lê di asta rêgezên pratîkê de gelek tiştên ku neyên efukirin hene. Dibe ku sibê dewletek bixwaze bi te re pêwendî dane, dibe ku gelek tawîzan jî bide. Di vir de wê hema rêgez bê bîra te. Weke hêzeke emperyalîst yan jî heta ku tu şêwazê pêwendiya ew dixwaze nebînî, ketina nav pêwendiyeke rojane, xwe ji xeta rast, ango nokeriyê re razandine.

Di dîplomasî de ev xeterî bi awayekî diyarker derdikevin holê. Van hêzên Başûr jî ji bo pêwendiyekê çil teqla davêjin. Em

nikarin vê qebûl bikin. Em tenê ne Tevgereke Rizgariya Netewî ne, di heman demê de tevgereke bi rêgez a sosyalîstin. Pîvanên me, ferqa jiyana me ji van heye. Heta ku tu van li ber çavan negirî tu nikarî partiyê temsîl bikî.

Weke min got, herî kêm xebateke bi qasî çiya zehmetiyên xwe heye. Çawa ku bi feraseta gundiyekî hov fermandariya gêrîla nikare bê kirin, bi hinek pêwendiyên li Ewrûpa, bi hinek qalibên li gorî jiyana Ewrûpa jî tu nikarî bibî pisporê pêwendiyên derve. Hema mîna şervanên gundî ku di fermandariyê de weke ku xwe dixapînin, encax tu jî xwe bixapînî. Ev jî lêhûrbûnê dixwaze, jiyaneke fedakarî dixwaze, ezîm û hêrsê dixwaze, dahûrandineke pir saxlem dixwaze. Di derbarê hêzên beramberî te û bi taybetî jî di uslûb de hostatiyeke mezin dixwaze.

Mînak, camer hîn jî hewl didin min fêm bikin. Bawerim hîn jî xwe ne gihandine asta me. Hêzên serdest ên emperyalîst hîn jî di derbarê em çine, çawa ne de bi temamî nikarin biryar bidin. Ev jî asta taxtîk çawa tê rêvebirin wê dide diyarkirin. Ya ku ji hemû aliyan ve xwe dide dest, ew feraseta ku ji hemû aliyan bi milê rast radizîne re em nikarin bêjin ziraviya dîplomîsiyê ye. Ji aliyê şoreşgerî ve ev ne gengaze. Lê bêyî ku rastî li ber çavan bê girtin, bi şêwazekî çors gotina; "ez şoreşgerek im, komînîstekî çar çar im" pir zêde ne nêzîkatiyeke aqilana ya polîtîke. Bi qasî girêdaneke mezin bi rêgezê ve, bi naverokê uslûbekî polîtîk, asta wan jî çiqas paşketiye, em çiqas di asteke bilind de ne, di formasyon û uslûb de em nîşan bidin.

Di derbarê van mijaran de ger pêwîst bike dikare berfirehtir bê nirxandin. Ji bo we jî em naxwazin zêde dirêj bikin. Nûneratiya pêwendiyê PKK'ê ne asane. Dê ber bi xapandinê ve bibe û di encam de tê xwe bi tengezariyên ku te bixwe jî, heval jî qala wan kir rû bi rû bimînî. Ev jî wê te vala derxe. Xeta PKK'ê bi qasî bîreweriya gêrîla, bîreweriyeke dîplomatîk jî pêwîst dike. Tê zêdetir lêhûrbûn bikî. Tê hem lêhûrbûna teorîk, hem jî ya pratîkî careke din bi şêwazekî berfireh di kesayetiya xwe de bidî jiyankirin. Di vê mijarê de peywireke te ya bibe mînak heye.

Gelek pêwendî îtîraz dikin, te gelek pêwendî jî cidî negirtine, te sivik girtiye dest, perwerde nekiriye, te rê nîşan nedaye. Ev jî, te çiqas zirar daye derdixe holê. Weke beriya niha jî min got, em bi qapasîte, kûr bin, teqez bi erzanî winda nekin.

Şêwazê pêwendiya ku her tim dide qezenckirin pir girînge, têrkeriya nêzîkatiyên me yên pratîk a rêgezî jî em dibînin. Bawerim li vir te ev bi berfirehî dît.

Di jiyana Ewrûpa de, ger te jî taybetmendiyên ku xetê derbas dikirin dîtibe, her ku diçe weke ku min ji hevalên din ên Ewrûpa re jî got, bi qezenckirina kûrahiya kapasiteyê bi qasî têr dike ji hemû aliyan ve bi xwe temam kirin gengaze. Ji xwe pêdivî jî pê heye. Tê hinekî din ji nêzîk ve eleqeder bibî. Bawerim tu bikarî serkeftî bi ser peywiran de biçî.

Hemû ezmûn vê didin diyarkirin; fermandarên herî baş dîplomatin. Di şerê Rizgariya Netewî ya Tirkan de jî, Înonu fermandarê eniya Rojava bû, paşê çû bû dîplomat. Vana ji hev nayên cudakirin. Tu carekê lê binêrî tu li çiyê bû fermandar. Tê wisa bi kapasîte nêzîk bibî.

A.: Li ser vî esasî ez ê rewşa xwe sererast bikim. Heta niha tevlîbûna min çewt bû. Di vê tevlîbûna xwe de ji bo ku di demê pêş de zirarê nedim partiyê, di derbarê ku ez ê bikarim tevlîbûneke rast, fêmkirinekê pêk bînim dikarim bêjim ji xwe bawerim.

---.: Yên ku divê bên diyarkirin hatine diyarkirin. Pêwîste tu zêde li ser van rawestî û vê jî bi rastî, bi qasî li welat, tê bi ziraviyeke bilind meşandinê biştguh nekî. Wekî din ne şayanî te, ne jî ya partiyê ye. Tê di pratîkê de bi şêwazekî awarte nerm be, bi qasî wê jî bi rêgez be, tê bizanî perwerdekerî û rêxistingerî esase. Dibe ku sibê dema bi KT'yê re gav hat avêtin tevî ku em dizanin li beramberî van hostatî pêwîste, hevalekî me yê herî ji xwe bawer jî, ger raste rast bi KT'yê re bikeve pêwendiyê dibe ku xulam jê derkeve. Ez bi vî alî ve xeteriyeke mezin dibînim.

Bi emperyalîstan re ketina pêwendiyê, hema bêje ez ji her hevalî fikar dikim. Lê dîqat bikin, di mijara bi min re hevdîtin di cihanê de rewşa herî zêde tê kişandin min daniye holê. Wisa pir hatiye diyarkirin û di pêwendiya bi min re kî çi dibe, çi tîne dizanin. Lê çima bi asanî dixwazin ewqas ser we de bên? Ji ber ku asta we dizanin.

Ev xal negirîngin. Hêvîdarim ku asta pêwîst hûn ê di dorfirehiya xwe de pêk bînin. Li gorî min xusûsên ku min diyar kirin ji bo we hemûyan girîngî îfade dike. Ev waneyên me teqez pir berfirehin. Ez ji niyeta we ya baş guman nakim. Ez ji daxwaza

we ya serkeftinê ewleme. Lê bibînin me ev wane ji ku derê girt, em ber bi ku derê ve dibim, me çi çiqasî rexne kir? Ez jî bi asanî nikarim ji bin derkevim. Çima? Ji ber ku ev kar êdî weke berê me jiyan dikir û em bejdar dibûn nameşe. Bi milyonan tevlîbûne, ez jî weke berê rêve nabim. Ger kadroyên pir pêşketî pêkneyên, bi vê asta xwe ya paşketî hûn nikarin tiştekî bikin. Divê ku hûn pir bilez bin. Bi şêwazê beriya ku tu bêjî leb, leblebî fêm bikin û ger hêza we ya ketina tevgerê nebe, ev tevger mezin nabe û xilasbûna wê jî dê gelek xeter be.

Pêwîste ji bo partîbûnê biryareke baş bê dayîn. We biryar daye, pêwîste ew ji hemû aliyan ve bê fêmkirin. Ya ku ez dibînim; hîn kar bi şêwazê zarokatî digrin dest. Hinek jî hîn wisa dizanin ku dê kar îstîsmar bikin. Yên ku pêşnûmeyên wisa li ser pişta me jiyankirinê jî pêş dixin nekêmin. Gotina min ji hevalên bi aqil, hişyar re ye. Em ti carî derfet nedin kesên bi vî rengî. Ji ber ku dixwazin çi ji me bikin di holê de ye. Em çima di nava xwe de bigrin, çima em bikin berpirsyarê yekeyê û li serê xwe bikin bela? Ger em girêdayî bîranîna ewqas şehîdin, di bersiveke bi temamî dayîna gelê xwe de bi îdane, wê demê pêwîste em sînorên têrketiyê bi temamî raber bikin. Hêjî gotina; “ez pê re nehîştim, min xwe negihandê” şerma herî mezine.

Her wiha dema ku dijmin dikuje nahêle bêhna xwe bide, demê nasnake. Min ji we re derfetê demeke sînordar nasî. Ev pêvajo bi taybetî amade kir. Hûn dibînin vê dewrê û dewreyên beriya vê me bi taybetî amade kir. Di gel karên din de we dît me tevlîbûneke çawa ji vê dewrê re pêk anî. Li pêşberî we me, em ji nêzîkatiyan bigrin, heta şêwaz, uslûb, yek bi yek daxistina asta kesayetan, çawa hestyar û bi ziraviyan dagirtiye, çawa fêrkere. Lewra hûn ê encam jê derxin. Ger piştî van hemûyan jî, hûn hîn jî bêjim me fêm nekiriye, hewl bidin xwe bidin axaftin, hûn ê hesabê vê jî gelek bi zehmetî bidin.

Êdî bi wan helwestên ku we berê şayanî xwe didît meşa we ne gengaze. Divê ku di vê mijarê de mêrxas mayînê em ser bixin. Ji bilî vê ti vebijêrkên din nikarin azadiyê ji me re waad bikin. Asta ku me girtiye dîrokî ye. Niyeta tu kesî ya takekesî, li ser esasê mafdariyê be jî, ji zirardayîna vê astê re nikarin cesaret bike. Ev ast ji ya ku tê payîn zêdetir dîrokî ye û niha di nav şerê ku em dixwazin bi meşînin de rêya çareseriya yekeme. Wekî din

em nikarin pêşengatiya partiyê di vî şerî de bibînin, we ber bi pêş ve bibin.

We xwe avêtiye naverastê, ger hûn bînin berçav bi rêkûpêkî xwe perwerde nakin, hêza bi qasî taximekî jî nikarin vesaz bikin û heta nikarin jiyana xwe pîlansaz bikin, hûn ê bibînin ku hûn pir zêde ne hêjayî qîmet dayînê ne. Derfetên heyî, raye bi destxistin ne mêrxasî û partîbûyîne. Nêzîkatiya seqet a ku oportonîst dikine. Me hewl da em baş nîşanî we bidin. Vê carê baldar bin, xusûsekî em li pêne heye. Ez vê tenê di derbarê we de nabêjim. Ji bo min her şans pir girînge, lê em dixwazin hemû pêvajoyê teqez bikin. Ger rêza we li beramberî jiyanê hebe, her kes rabûye ser piyan, dijmin di hatina ser me de teqez bi biryare; wê demê biryardariya me, biryardariya me ya hebûnê jî divê ku bê nîqaş be. Em nikarin bibin xwedî ti nirxandineke vê ji rûmet de bixe, ber bi binketinê ve bibe. Weke her demê dibêjim bi binketin û tengbûnê azadî nayê xwestin, aliyên me yên nebes nayên efukirin. Ji wan nêzîkatiyên we yên bi asanî we teng bihêle, bejnkurt bigire, pir xweşiya we biçe jî ji fêrbûnên we re, weke devjêneger bê xuyakirin jî azadî nayê naskirin. Ji ber ku tê zanîn ku, bi ya herî xirab dê her tiştî ber bi windabûnê ve bibe. Em nikarin navê xirabiyeke wisa li xwe kirinê jî bikin azadî.

Dikare bê gotin ku em hemû tiştî berfireh digrin dest, asta netewî, asta mirovî, asta leşkerî, rêxistingerî, di pêwendî û jiyanê de bi bandorbûnê, heta dawî hestyar û berpirsyar tevgerîn jiyankirinê me xistiya nava derfetan. Rexnedayînên we asta vê ya ronikirinê, îtirafkirina vê û daxistina cewher dide diyarkirin.

Ji bo rizgarkirina xwe rexnedayîn nabe.

Rexnedayîn, soza bi dawîkirina paşverûtiyên dîrokî ku hûn dijîne.

Hemû tiştên nebes ên ku didin windakirin hûn dijîn çi hene, bi misogerî ew redkirin, di gel wê de yên didin qezenckirin çi hene, soza gotina, “erê”ye.

Bawerim sozdayîneke wisa, ji bo şoreşgerên weke we yên hemû tiştên xwe danîna holê û peywira kesên ku ewqas nêzîkî partîbûnê ne.

Bi taybet di nav demeke kurd de, weke şerê germ ya herî xeter a jiyanê, nemaze ya ku herî zêde baldariyê dixwaze, di yên girtine teqez derbasî meriyetê kirinê de, ya ku hestyariyeke mezin

ferman dike ji bo pêvajoyeke têkoşînê ya wisa pir gîrînge. Ji ber ku min ev dizanî ya rast hinekî xwe tevlî kir. Bi taybet sotêneriya pirsgirêkên şerê germ, çiqas pêwendîdar be, ji ber ku pê bawerim pêwîste hûn hata dawî bi vê rastiyê ve girêdayî bin. Ji ber vê min evqas girîngî da vê dewreyê. Yên ku min kirine divê ku hûn kêm bibînin, jê zêdetir di wateya ku hûn bi xwe bi afirînin divê ku derxînin holê. Ya me di çarçoveya mercên xwe de alikariya herî sînordare. Ger em li biryargehên welatbûna, hinekî din di nava gel de bûna, bawerim ku, xebat dikarin leztir bihatana kirin, kapasîte bihata firehkirin û teqez meyê ser xistiba.

Eşkereye ku ev tenê ne peywira min e. Ev qad qadên we ne. Sehayên Serokatiya taxtîkî ne. Ji vê re bersiv dayîn, pêdiviya bersiva herî bi wate dayîna we ya ji rista xwe fêmkirinê re ye. Hêvîdarim ku vê dewrê bandoreke erênî li ser we hemûyan kiribe û di vê baweriyê de me ku tenê hevalekî bê çareserî nemabe. Ev, dibe derfeteke pir mezin a azadiyê, di heman demê de dibe fersenda herî girîng a jiyana azadiyê.

Hûn dibînin em bi asanî qezenc nakin, ji bo windanekirinê jî hemû hêza xwe ji her demê zêdetir biparêzin û ji bilî qezenckirinê zêdetir şansekî din yê jiyankirinê nehêlin.

**20 Cotmeh 1994**

**PÊŞENGÊN GEL HESABÊN TIŞTÊN DIKIN, DADGEHA WÊ JÎ YÊN KU DESPÊKÊ DI NAVA XWE DE DIKIN Û DIDIN KIRINE**